# ÎDEOLOJÎ

**Rustem Cudî**

**Amedekar: Fehîma Deştan**

# ÎDEOLOJÎ

## Rustem Cudî

## Amedekar: Fehîma Deştan

**Çapa 2.**

**2021**

**WEŞANXANEYA ŞILÊR**

**QAMIŞLO**

**weshanashiler@gmail.com**
**www.shiler.info**

**Danasina Nîvîskar:**

**Rêheval Rustem Cudî**

Ev berhema bi nirx û hêja ya di destê we de di derbarê îdeolojiyê de ye. Ev yek ji waneyên ku Şehîd Rustem Cudî di Dibistana Navendî Ya Partiyê Ya Mazlûm Dogan de dabû, hatiye berhevkirin. Bi dirêjahiya salan Heval li ser van xalan lêhûrbûn kiribû, di heman demê de weke wane gelek caran dabû hevalan.

Hevalê Şehîd Rustem di nava Têkoşîna Azadiyê de di gelek qadan de di asta kadroyekî pêşeng û rêveberiyê de kar û xebat daye meşandin. Em hêvîdar in û di wê baweriyê de ne ku ev lêhûrbûnên Hevalê Rustem di derbarê vê mijarê de wê ji hevalan re di aliyê fikrî û jiyanî de bibe pêşvekirinek.

Rustem Cudî kî ye? Hevalê Rustem Cudî bi navê rast Rustem Osman, di sala 1965'an de li Rojavayê Kurdistanê, li gundê Xirbê Dibsê yê girêdayî Serê Kaniyê ji dayîk bûye. Navê dayîka wî Huseyîna, navê bav Yûsif e. Hevalê Rustem, ji malbatêke welatparêz û netewhez bû. Dibistana seratayî, navîn û amadeyî li Serê Kaniyê xwendiye. Da ku zanko bixwîne berê xwe daye paytexta Suriyê Şamê. Li wir beşê zîraetê xwendiye. Di sala 1985'an de dema li Şamê dixwîne rêxistina PKK'ê dinase. Wê demê Rêheval Rustem Cudî, di nava Tevgera Çepên Sosyalîst de cih digire. Bi hezkirina

xwe ya zanistê hemû rewşa welat ji aliyê siyasî ve ji nêz ve bişopîne, timî di nava liv û tevgerê de ye.

Timî xwedî nerînên azad û kesayeteke di aliyê lêgerînê de serbixwe bûye, herweha hêza xwe ya analîzkirina rewşên siyasî û civakî timî di pêş de ye. Ew dema ku di nava lêgerîn û lêpirsînê de ye, têkoşîna azadiya gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê dest bi pêngava 15'ê Tebaxê dike. Weke giştiyê gel gelê me yê Rojavayê Kurdistanê, malbata hevalê Rustem jî ji qonaxekê derbasî qonaxa din a şoreşa gelê Kurd dibin. Bi vê taybetmendiya xwe ya lêgerîn û kûraniya lêkolînê dereng namîne û tevgera azadiya gelê Kurd PKK'ê nas dike. Bi naskirina xwe ya ji rêxistinê re tevlî xebatên ciwanan dibe. Piştî wê navê xwe yê tevgerê dike Rustem Cudî. Di sala 1987'an de li Lubnanê tevlî civîneke ku Rêberê gelê Kurd Abdulah Öcalan tê de diaxive dibe, tavilê digihîje wê baweriyê ku nêrînên Rêbertiyê û şoreşa PKK'ê şoreşek xwedî wate û bi nirx e û bi gelê xwe ve girêdaye. Ji lewre bi biryareke bêhampa tevlî refên Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê dibe.

Piştî wê, di sala 1989'an de derbasî qada Lubnanê, dewreya perwerdeya Akademiya Mahsûm Korkmaz dibe. Di sala 1989'an de ji dewreya perwerdeyê derdikeve û derbasî nav xebatên gel dibe. Li wir di nava xebatên gel de jî hêza xwe ya pêşengiyê dide diyarkirin û baweriya hevaltiyê û gel bi xwe tîne. Bi wê sekna xwe ya bi prensîb, tevlîbûna li gorî xeta jiyana pêşengiya ji militanên PKK'ê tê xwestin pêk tîne. Herwiha di dawiya sala 1989'an de derbasî qada Gapê

dibe û li wir di asta berpirsyariya qadê de cih digire. Piştî vekişandina gerila ji herêma Gapê hevalê Rustem di sala 1993'an de derbasî herêma Botanê dibe. Piştî wê di dirêjahiya salan de li Botan û Gabarê bi awayekî çalak tevlî xebatên gerîla dibe. hevalê Rustem, di sala 1995'an de tevlî kongreya 5. a PKK'ê dibe. Piştî kongreyê careke din berê xwe dide herêma Mêrdînê.

Bi taybetî li deşta Êlih,Bişêrî Misircê û çiyayê Mava maye, mirov dikare bêje qada ku negihîştibiyê nînbûye. Li Mêrdînê bi tevlîbûna xwe ya çalak di sala 1998'an de ji qada Mêrdînê vediqete û piştî wê di asta temsîlgerê rêxistinê de derbasî qada xebatê ya nav gelê me yê li Rûsyayê dibe. Piştî ji Rûsyayê vedigere di xebatên din de jî cihê xwe digire. Di sala 2003'yan de tevlî kongreya gel dibe, di kongreyê de weke endamê konseya rêvebir tê hilbijartin. Di wan salan de weke tê zanîn li hemberî xeta îxanetê ya ku pêşketî têkoşîneke dijwar dide meşandin. Li hemberî xeta tasfiyeyê xwedî sekneke ku tu carî tawîz neda û bi sekna xwe weke têkoşerekî azadiyê bi serbilindî têdikoşe. Herwiha cihê xwe di meclîsa PKK'ê ya nû de jî digire.

Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan jî li ser rêheval Rustem Cudî vê nirxandinê kiribû: "Hevalê Rustem xwedî kesayeteke kadroyê şoreşger û xwedî sekneke bihêz e."

Hevalê Rustem di encama êrîşeke hewayî ya hovane ya dewleta Tirk a li ser qadên parastina Medyayê li Xakurkê di

10’ê cotmeha 2011’an  de bi  şeş hevalên xwe re jiyana xwe ji dest da û tevlî karwanên şehîdan bû.

## NAVEROK


**1- ÎDEOLOJÎ ÇI YE? .................... 13**

Îdeolojî Nasname Û Kûrbûna Di Fikir De Ye .................... 17

Ji Hêza Îdeolojyê Mehrûm Mayîn Bi Xwe Re Çi Tîne .................... 18

Emperyalîzm Xwe Wek Sîstema Heqîqetê Dibîne .................... 21

Kapîtalîzm Civaka Xwezayî Hoveber Dibîne .................... 22

**2- TAYBETMENDIYÊN ÎDEOLOJÎK ÇI NE .................... 27**

Kûrbûna Îdeolojîk Xwe Bi Serkeftinê Ve Kilîtkirin E .................... 29

Îdeolojî Hêza Însan A Berxwedanê Ye .................... 30

Di Rojhilata Navîn De Cihê Kurdan .................... 32

Dijmin Serkeftinên Xwe Yên Îdeolojîk Di Pûçkirina Jiyanê De Pêk Tîne .................... 34

Terîfên Berê Yên Ku Ji Îdeolojiyê Re Hatine Pêşxistin .................... 36

Marksîzm Têkoşîna Îdeolojîk Tenê Bi Serkêşiya Karkeran Dinirxîne .................... 37

Wê Terîfa Me Ya Îdeolojîk Ji Civakê Re Çawa Be? .................... 39

Însan Bi Îdeolojiyê Serbixwe Dibe .................... 42

Îdeolojî Hêza Baweriya Mirovan e .................... 43

Hemû Derfetên Emperyalîzmê Di Bin Xizmeta Mayîndekirina Sîstema Kapîtal De Ne .................... 46

Têkoşîna Îdeolojîk Bi Kedê Pêk Tê .................... 49

Îdeolojî Xebateke Her Demî ye .................... 54

Têkoşîna Îdeolojîk Çareseriyê Peyda Dike .................... 56

Îdeolojî Li Gorî Tevgera Demê Xwe Nû Dike .................... 61

Îdeolojî Bê Wijdan Û Zanyarî Nabe ........ 66
Di Îdeolojiyê De Rola Aqil Û Wijdan Çi Ye? ........ 67
Pêwîst e Îdeolojî Bi Rastiya Cih Û Demê Ve Girêdayî Be ........ 76
Pêşengên Îdeolojiya Azadiyê Jin Û Ciwan in ........ 78
Divê Têkoşîna Îdeolojîk Xîtabî Hêzên Zindî Yên Civakê Bike ........ 83
Me Li Gorî Tevgera Zeman Îdeolojiya Xwe Nû Kir ........ 83
Îdeolojî Her Tişt Bi Îradeyê Ravekirin e ........ 86
**3- NASNAMEYA ÎDEOLOJÎK ........ 89**
Fermîbûna Îdeolojiya Çaxa Navîn ........ 90
Nasnameya Kapîtalîzmê Ya Îdeolojîk Çi Ye? ........ 100
Nasnameya Bingehîn A Îdeolojiya Kapîtalîzmê ........ 101
Şêwazên Dagirkeriya Kapîtalîzmê ........ 119
Kapîtalîzm Lîberalîzmê Ji Bo Xwe Esas Digire ........ 121
Kapîtalîzm Xwe Bi Miliyetperestiyê Rave Dike ........ 126
Kapîtalîzm Bazara Serbest Esas Digire ........ 130
Pêwîst E Îdeolojî Ji Dogmatîzmê Dûr Be ........ 131
Dagirkeriya Li Ser Jinê Ne Fizîkî Ye Îdeolojîk E ........ 142
Jin Bi Îdeolojiya Desthilatiyê Hatiye Reşkirin ........ 142
**4- NASNAMEYA ÎDEOLOJÎK A TEVGERA AZADIYÊ ........ 145**
Ji Bo Azadiyê Têkoşîna Gelên Rojhilata Navîn ........ 147
Nêzikbûna Tevgerên Kurd Ên Berê Ji Azadiyê Re ........ 149
Tekoşîna PKK'ê Di Rojhilata Navîn De Hêviya Serkeftinê Pêk Anî ........ 151

Sermayeya Navnetewî Di Rojhilata Navîn De Ji Xwe Re Hevkaran Çêdike ........ 155

Îdeolojiya PKK'ê Lîstikên Ku Li Ser Kurdistanê Pêk Tên Xera Kir ........ 161

Dijmintiya Li Dijî PKK'ê Ji Ber Nasnameya Wê Ya Îdeolojîk E ........ 166

Endam Û Pêşengên Îdeolojiya PKK'ê Şehîdên Wê Ne........ 167

Pêvajoya Destpêka Têkoşîna PKK'ê Ya Lêhûrbûn Û Lêkolînê Bû ........ 174

Erdnîgariya Rojhilata Navîn Ji Bo Berjewendiyên Hêzên Desthilatdar Giring E........ 176

Prensîbeke Bingehîn A Îdeolojiya PKK'ê Îradeya Serbixwe Ye ........ 180

**5- RÊBERTIYÊ BI HÊZA XWE YA ÎDEOLOJÎK DERFETÊN TÊKOŞÎNÊ AFIRAND ........183**

Îdeolojiya Azadiyê ........ 185

Di Kurdistanê De Çaxa Qehremaniyê ........ 191

Rêbertî Çavkaniya Pêvajoya Gerîlatiyê ya Îdeolojîk e ........ 195

Îdelojiya Azadiya Jinê û Pêşketina Wê ........ 197

Cinsiyetparêzî Nahêle Kesayet û Civak Azad Bijîn........ 199

Vegera Jinê Ya Li Cewherê Xwe Çavkaniya Jiyanê Ye ........ 200

Di Rojhilata Navîn De Îrade, Îdeolojî Û Rêxistina Azad Bingehê Têkoşîna Me Ye........ 201

Di Cewherê Vê Nasnameyê De Demokrasî Heye ........ 205

Îdeolojiya Me Li Ser Hîmê Neteweya Demokratîk E ........ 208

Dewlet-Netewe Tu Carî Hêvî Û Azadiya Gelan Pêk Nayne .... 210
Şîdet Tu Carî Divê Ji Çarçoveya Parastina Rewa Dernekeve 212
Neteweya Demokratîk Çi Ye? ........................................................ 213
Di Nasnameya PKK'ê Ya îdeolojîk de Ne Ferdiyetparêzî; Komunalîzm Û Kolektîvîzm Esas e ................................................ 214
Li Dijî Cinsiyetparêziya Civakî Azadkirina Cinsan .................... 216
**6- GIRÊDANA EKOLOJIYÊ BI ÎDEOLOJIYÊ RE .......................223**
Tevgerên Hawirdorparêz................................................................ 224
Ekolojîstên Kûr Çawa Tevdigerin? ................................................ 225
Ekolojîstên Femînîst....................................................................... 225
Ekolojiya Civakî ............................................................................. 226
**7- AVAKIRINA CIVAKA EXLAQÎ Û POLÎTÎK..........................231**
Di Avakirina Civaka Exlaqî Û Polîtîk De Rola Çand Û Hunerê ........................................................................................................ 236
Di Roja Me Ya Îro De Ragihandin Cîhanê Beralî Dike ............. 239

## 1- ÎDEOLOJÎ ÇI YE?

Em herî zêde li ser xala girêdayî îdeolojiyan tiştê pêwîst e pêk bên çi ne, rawestin. Lewra îdeolojî ji bo çi ne, bi taybet jî em ê nasnameya îdeolojî li gorî sîstemên cur bi cur bigirin dest. Bi giranî em ê li ser nasnameya kapîtalîzm û emperyalîzmê ya îdeolojîk rawestin. Di heman demê de em ê nasnameya tevgera azadiya gelê Kurd, têkoşîna wê ya îdeolojîk şîrove bikin? Qada vê tevgerê ya îdeolojîk li ku ye û çawa tê meşandin; rexên wê yê ragihandin, zanyarî, çand û hunerê, em ê herî zêde li ser van mijaran bisekinin.

Dema îdeolojî tê gotin, gelek nirxandin li ser tên kirin û gelek tişt di vê derbarê de tên ziman. Lê belê di bingehê de her çîn, gel û neteweyek di her qadeke têkoşînê de li gorî çarçoveya berjewendiyên xwe li îdeolojiyê temaşe dike. Yanî îdeolojî tiştekî wiha mutleq nîne. Ji bo her kesî, her demê ji her çînê re, fikrek û rêkûpêkbûna fikrekî nîne. Bi gelemperî formulasyona tespîtan e. Kûrbûn an jî zêdehiya fikrî ye. Di çarçoveya berjewendiyên çînekê yan jî gelek çînan bi hev re ye. Yan jî di çarçoveya berjewendiyên civakê bi gelemperî de ye. Lewra mirov nikare îdeolojiyê wek têgîneke gelemperî bigire dest. Ji bo her demê û her kesî ne weke hev e.

Gelek fikrên îdeolojîk xwe bi vî rengî nîşan didin. Yanî hinek formulasyonan çêdikin. Hinek siyasetên diyar çêdikin. Di aliyê fikir de, vê mutleq dikin, an jî dixwazin teqez bibe. Ev ji bo her derî pêk tê û wiha didin nîşandan.

Mirov di vê çarçoveyê de dikare fikrên dînî mînak bigire. Reng û dengê mirovan çi dibe bila bibe, li ku dibin bila bibin, li ser kîjan axê dibin û erdnîgariyê dibin bila bibin di encamê de yek xweda, rêûresm, pîvanên exlaqî, çandî, pêwîst e li ser wî esasî bimeşin. Lewra ev çiqasî rast e, bêguman tecrûbe îspat dike ku ev nêzikbûn ne rast e. Hewldaneke wiha heye û heta dereceya dawiyê ji van aliyan ve di pêkanînan de jî şêwazên dijwar ên bi zorekê têne meşandin. Ji bo ku li her derê ji însanan tîpekî wekhev di çarçoveya berjewendiyên hinek qismên serdest de pêk bînin. Her tim ev hewldan ji aliyê hêzên serdest ve hebûye.

Em dikarin weke mînak li tevgerên dînî temaşe bikin. El-Qaîde, Talîban, an jî tevgerên weke wan; ev tevgerên îrtîcaî selefî, însanek heta çi cilî li xwe bike, kîjanî li xwe neke ew diyar dikin. Li Siûdî Erebîstanê, li Efxanîstanê yan jî li Sibîryayê dibe, divê weke hev bin. Ev hewldan pêk tên an jî pêk nayên ev mijareke din e. Tecrûbe û tiştên berbiçav ên madî îspat dikin ku fikrekî ji bo xwe kûrkirî be, li ser esasên berjewendiyên çînekî serdest tên birêvebirin. Ew fikir rastiya xwe li her derê îspat neke jî, li cihekî dibe ku rast be, lê li gelek cihên din berovajî ye. Li gelek cihên din bi rastiyên civakê re rû bi rû dimînin. Bi demê re lewaz dibe û pirsgirêkan bi xwe re derdixe. Wiha krîzên civakê peyda dikin. Bi taybet jî dema dixwazin van pêkanînên xwe bi zorê dixwazin pêk bînin, ev pirsgirêk derdikevin.

Ji ber vê jî mirov nikare îdeolojiyê weke rengekî mutleq bigire dest. Lê belê di roja me ya îro de bêguman sed nav li

îdeolojî, têkoşîn û xebata îdeolojî tên kirin. Ev nêzikbûna ji îdeolojiyê re gelekî girîng e. Ji ber çi hindê girîng e? Îdeolojî wer bi rengekî tewş û gelemperî be, dema mirov terîf dike divê çi bîne ziman?

Îdeolojî sîstemeke fikrî ye, yanê ew fikrê ku xwe birêkûpêk kiriye ye. Ev birêkûpêkbûna fikir bi çi awayî ye, mirov dikare ji ku bigire dest? Dîsa em dikarin bêjin ku exlaq, çand, bîr û baweriya mirovan digire dest. Ango fikir, an jî bîrbirina tiştan, derxistina wan a zanebûnê û zanistê derdixe pêşberî mirov. Rêkûpêkbûna fikir di aliyê exlaqî, çandî, bawerî û zanistê de dema ku yekbûneke wan hebe, ji bo tiştên hevpar hatibin formulekirin mirov wê demê dikare ji wê fikrê re bêje îdeolojî. Têkiliya vê mijarê bi civakê re rasterast heye, tiştek wiha bi civakê ve girêdayî ye. Wê demê em dikarin ji vê re çi bêjin? Civaka însanan û kombûyîna wan, mezin dibe û herwiha biçûk dibe. Dema ku di çarçoveya berjewendiyên xwe de gihîşt asteke ku hevpar bihizirin, baweriya wan wek hev be, çand, exlaq û pîvanên wan ên exlaqî hevpar bin, wê civakê bi vî rengî karibûye xwe bide nasîn. Karibûye ferq û cudatiya xwe ji yên dîtir bide nîşandan. Bi çi awayî karibûye wiha xwe bide nasîn? Di qada exlaqî, bawerî, zanist û çandî de, dema ku ev civak karibû xwe bide naskirin û xwe derbixîne zanebûnê, xwe wiha bide zanîn û xwe ji yên dîtir wiha cudatir diyar bike, wê demê mirov dikare bêje wê civakê xwe gihandiye nasnameya xwe ya îdeolojîk.

Wê demê îdeolojîkbûn, îdeolojî fikreke jixweber nîne. Mînak: her mirov dihizire, lê belê girêdayî wê hizirandina ku dike hewldanên wî/ê ji bo gihandina rastiyê û asta têkoşîna ku dike,  çand, exlaq û baweriyên wî/wê dema ji wî fikrî cuda bin, wê demê mirov nikare bêje ew mirovê ku dihizirî mirovekî îdeolojîk e. Herwiha di roja me ya îro de însanê nefikire tune ye. Lê mirov nikare ji her kesên difikirin re jî bêje îdeolojîk in. Dema ku mijar bû îdeolojî, wê demê rêkûpêkbûna wê gelek li pêş e. Yanî însan xwe bide nasîn, ji yên din bide cudakirin. Ev jî rexekî girîng ê girêdayî îdeolojiyê ye.

Em bala xwe bidinê, mesela gelek caran mirov dibêje filan netewe, filan çîn, gelo em çima van gotinan dibêjin? Mînak dema em dibêjin Yahûdî çi tê bîra mirov? Baweriya wan a dînî tê bîra mirov, exlaq, rêxistinîbûn, yanî rêkûpêkbûneke ji çand, exlaq û baweriyê û hewldanên wan tê bîra mirov. Di heman demê de ev nasnameyek e û diyardeyekî nîşan dide. Ji bo vê gelek caran dema em dixwazin mirovekî biwesfînin, em dibêjin ev kes weke Yahûdiyan e. Çima em dibêjin wek Yahûdiyan e? Ji ber ku nêzikbûna xwe ji nirxên madî û manewî re ji rêzê nîne em wisa dibêjin. Lewra em di vir de dikarin bêjin ku teşegirtineke Yahûdiyan a xweser heye, nasnameyeke wan heye, bi vî rengî ji yên din cudatir in.

Yan jî dema em dibêjin filankes wek Japonan e, yan jî wek Çîniyan e, gelo em çima van şibandinan dikin? Yan jî dema em dibêjin weke Çîniyan e di serî de tiştek tê bîra

mirov; mirovek bêsekin bixebite, di aliyê fikir de felsefeya Konfuçyus di danûstendinên xwe de esas bigire, yanî bingehek wî/ê ya exlaqî û çandî hebe, asteke zanistê li gel hebe, nêzikbûna ji kar re li ser esasê çandekê be, em dibêjin weke Çîniyan e. Ev bi me re çi  pêş dixe? Qismek însanan bi me dide nasîn. Tevî ku li rexekî cîhanê yê dûrî me dijîn jî, ew qismê mirovan bi me dide nasîn.

## Îdeolojî Nasname Û Kûrbûna Di Fikir De Ye

Me weke terîfeke gelemperî îdeolojiyê diyar kir. Lê dema em dibêjin îdeolojî gelo aliyê çîn û mirov di nav yekparebûnê de digire dest? Bêguman di nav de cudatî hene. Lewra bi gelemperî di nav de aliyên hevpar hene, li ser wî esasî mirov çi dike? Wesfandin û naskirinekê çêdike.

Ji bo vê îdeolojî nasname ye, îdeolojî kûrbûnek di fikir de ye û li ser wî esasî îradê derdixe pêş û îradebûyînê çêdike. Lewma sînoran diyar dike, erêkirin û nakirina wê jî nîşan dide. Bi gotineke ku em pir bi kar tînin: pîvanên red û qebûlê di civakan de dide nîşandan.

Heke civakek ji nasnameya îdeolojîk hatibe mehrûmkirin, yanî ji nasnameya îdeolojîk dûr be, pîvanên wê civakê yên red û qebûlê tune ne. Ew civak, civakek ji bo dayînê na, her dem ji bo stendinê hazir e. Tiştekî nade, nateyîse, ronahiyê nade û her dem digire. Tu demê nabe çavkaniya belavbûna nirxên civakî. Nabe çavaniyeke ji bo

belavkirina fikir û zanistiya nû. Wê demê ew civak dibe civakeke çawa? Dibe ciheke wiha ku timî li ser esasê girtinê xwe birêve dibe. Ji Ewrûpa bigire heta Asyayê, li ku tiştek hebe ji wir digire, afirînerî (xulikarî) tê de pêş nakeve, bi xwe bawerbûn tê de tune ye. Li gor berjewendiyên xwe tevnagere. Tim li pey xelkê dimeşe. Li pey kesên din dimeşe. Ji bo xwe nîne, her û her ji bo kesên din e. Civaka ku ji hêza îdeolojî mehrûm bibe bi vî rengî ye.

## Ji Hêza Îdeolojyê Mehrûm Mayîn Bi Xwe Re Çi Tîne

Rêxistina ji hêza îdeolojîk mehrûm bibe, tu hêza wê ya madî ya hejmarê nikare wê rêxistinê li ser piyan bigire. Hejmar çiqas dibe bila bibe, hêza madî çiqas dibe bila bibe, heger hêzeke ruhî tune be, îradeyeke xurt pê re çêneke, tu carî bi hejmara madî û derfetên madî rizgar nabe. Mînaka herî mezin a li ber çav Sovyet e. Sovyet di cîhanê de cebilxaneyeke ji sîlahên nuklerî, artêşeke mezin bû. Di şer de xwe îspat kiribû. Li beramberî faşîzmê serketî bû, li hemberî artêşa Hîtler di şerê Cîhanê yê Duyemîn de bi ser ketibû. Bi çekên xwe, bi teknolojiya xwe ya ezmanî, bi hemû derfetên xwe yên hejmar û şêniyan, serî ji cîhanê re radikir. Lê demeke şûnde dît ku sîstema wê hildiweşe, lê ew çekên wî nikare sîstema wî biparêze. Yek guleya tangê neteqiya, yek fuze nehate avêtin da ku sîstema wê hilweşe. Sedemê vê çi bû? Sedem ew bû ku sîstema wê di aliyê ruhî de feqîr bû. Îrade tune bû, di dest de sîlah heye, lê mêjiyê wê

sîstemê ji fikrê derve re vekirî bû. Yanî hêza ku parastina mêjî bike tune bû. Hêza parastina fizîkî hebû, sînor baş diparast, lê hêza parastina mêjî tune bû.

Lewra hêza parastina mêjî çi ye? Nasnameya îdeolojîk e. Heger di aliyê îdeolojî de bi awayekî têkûz te xwe amade nekiribe, yanî ger sîstema te ya siyasî û rêvebirî pala xwe nede zemîneke îdeolojîk, te îqna, bawerî û girêdaneke bi vî rengî çênekiribe, ne gengaz e ku ew sîstem karibe li ber xwe bide.

Ji ber çi nikare li ber xwe bide? Ji ber ku ji derve re vekirî ye û ji wan digire, lê mixabin nikare bide. Tiştan ji derve digire, li pey derve ye. Ji aliyê siyasî ve te çiqas dewleta xwe bihêz ava kiribe bila be, ew sîstem nikare te ji qonaxekê bavêje qonaxeke din. Di roja me ya îro de ev tişt hîna zêdetir hesas e. Mînak di roja me ya îro de ev tê gotin: Dema îdeolojiyan xelas bû, dema şerê îdeolojîk xelas bû, dema wê derbas bû. Lewra vê demê têkoşîna îdeolojî jî nerast e, ji bo vê jî hemû rengên têkoşînên îdeolojîk hem xerab tên dîtin û hem jî tên teşhîrkirin. Heta di roja me ya îro de cîhana lîberal, ya ku Emerîka serkêşiyê jê re dike, welatên Rojava û Ewrûpa serkêşiyê jê re dikin, dixwaze sîstema xwe ya kapîtal li her deverê cîhanê bide rûniştandin. Di vê cîhanê de gotina îdeolojîk weke sûc tê dîtin. Mînak dibêje: “filan nêzikbûn, nêzikbûneke îdeolojîk e.” Em bala xwe bidinê li Tirkiyeyê jî bi vî rengî ye. Di Tirkiyê de jî serokên partiyan derdikevin ser kursiyê, ber mîkrofonan û dibêjin: “filankes nêzikbûnên wî îdeolojîk in.” Dijminên xwe hemûyan bi vî

rengî sûcdar dikin û li ser wî esasî dixwazin civakê jê dûr bixin.

Çima vê nêzikbûnê dikin? Ji ber ku nêzikbûnên îdeolojîk bi pêvajoyekê re hemwate dikin. Ew pêvajo jî, pêvajoya şerê sar e. Pêvajoya şerê kûr ê sar di navbera soyalîzm û emperyalîzmê de pêk hat. Wê çaxê nûnerê van herduyan jî Sovyet û Emerîka bûn. Ew şerê di navbera van herdu sîsteman de wek şerekî îdeolojîk dihate hesibandin. Lewra vê serdemê gelek tiştên nebaş bi xwe re anîn, ji bo vê hemû rengê têkoşîna li hemberî sîstema desthilatdar rasterast mohra îdeolojiyê lê didin da ku civak jê dûr bikeve. Çima wiha dikin? Ji ber ku bîranînên xerab ê di pêvajoya şerê sar de gel naxwazin bi bîr bînin. Naxwazin careke din wê pêvajoyê bijîn. Bi vî rengî emperyalîzm bi taybetî listokeke wiha dide meşandin, da ku civakan ji hêza wê ya îdeolojîk mehrûm bihêle.

Em bala xwe bidinê, civakek ji hêza îdeolojîk hate mehrûmhiştin, mehrûm ma û bê îdeolojî ma, ew civak dûvik e. Hêza wê civakê ya redkirinê tune ye! Hêza wê ya bersivdayînê jî nîne, çi bê serê wê dê ew civak qebûl bike. Ji ber ku ne di zanebûna berjewendî û nasnameya xwe de ye. Wê çawa bijî, ji bo çi bijî nediyar e. Li ser wî esasî her dem ji bo li pey bimeşe hazir e. Ji ber vê emperyalîzm dixwaze civakan ji hêza wan a îdeolojîk mehrûm bihêle.

## Emperyalîzm Xwe Wek Sîstema Heqîqetê Dibîne

Têkoşîna ku emperyalîzm li hemberî îdeolojiyê dike têkoşîneke ji rêzê û bi rengekî xwezayî jî nîne. Çima em dibêjin emperyalîzm? Ji ber ku emperyalîzm dixwaze hinek pîvanên nû di cîhanê de bide rûniştandin. Emperyalîzm, ji hemû sîsteman zêdetir a xwe ye, ji bo xwe ye. Ji hemû sîsteman zêdetir jî desthilatdar û otorîter e, serwer e. Bi derfetên xwe yên madî, teknolojîk, weke ku hemû şaneyên civakê xistibe bin kontrola xwe.

Taybetmendiyeke emperalîzmê ya din jî heye, emperyalîzm van taybetmendiyên weke desthilat, çînî, serdestî û hwd. li ser xwe qebûl nake. Emperyalîzm wek sîstema heqîqetê li xwe dinêre. Heqîqetê di çarçoveya perspektîfên xwe yên fikrî û siyasî de diyar dike. Ji bo vê hemû hêzên li dijî emperyalîzmê têkoşînê bikin weke hêz in, wan li dijî heqîqetê nîşan dide. Taybetmendiyên emperyalîzmê yên wiha hene. Yanî emperyalîzm heta asta dawiyê rastî ji rê derxistiye. Ew derfetên wê hene ku rastiyê ji rê jî derbixe.

Em hîna jî li ser vê meselê bi nazenînî radiwestin. Dema ku em hûrûkûr li ser bisekinin, em ê bala xwe bidinê ku di dîroka civakan de, em behsa mîtolojiyê dikin, dînê yekxwedayî dikin, gelek dînên pirxwedayî hwd. dema em behsa van dikin di naveroka hemûyan de jî peyamek wan a hevpar heye. Ew peyama wan a hevpar çi ye? Serdema berê serdemeke baş bû, lê em ji rê derketin, ji ber ku em ji rê

derketine, ev êşên em dibînin hemû cezayên ku xweda, yan jî hêzek nepen heye ku me ceza dike. Ev xaleke hevpar e, dînê yekxwedayî û jixwe mîtolojî jî wiha difikire. Her dem li bihuştekê (cinetekê) tê gerîn. Cinet bi xwe çi ye? Vegera rojên berê ye. Mirovahî vê dizane, yan jî dizanibû û bîra vê dibir. Dev jê berdana civaka bi taybetmendiyên xwe yên xwezayî dijî, bû sersebeba xerabiyê.

## Kapîtalîzm Civaka Xwezayî Hoveber Dibîne

Dema ku însanan dev ji taybetmendiyên civaka xwezayî berdane û bi nirxên xwezayî re îxanet kirine, însaniyetê êdî rojek xwe ya xweş nedîtiye. Hemû fikrên beriya kapîtalîzmê vê nîşanî me dide. Tenê kapîtalîzm û emperyalîzm vê nakin. Tu carî behsa demên derbasbûyî nakin. Tam berovajiyê vê kapîtalîzm dibêje; "her tiştê beriya kapîtalîzmê hovitî ye. Çiqasî em ji wê hovitiyê birevin, ew qas em nêzikî heqîqetê ne." Yanî tu çiqas ji van nirxên xwezayî weke wekhevî, piştevanî, taybetmendiyên însanî dûr bikevî, ew qas nêzikî heqîqetê dibî.

Di kapîtalîzmê de civaka xwezayî tune ye. Di kapîtalîzmê de civak hemû çêkirî ye, li ser esasê berjewendiyên serdestan hatiye çêkirin. Ji bo vê emperyalîzm di van aliyan de ji hemû sîstemên berê xeternaktir e. Çima ew qas xeternaktir e? Ji ber ku xwe weke sîstemeke nayê guftugokirin dibîne. Kapîtalîzm xwe tu carî lêpirsîn nake, dema dikeve nava zor û zehmetiyan, neçar dibe ku hinekî

rexnedayînê bide, di asta ferdan de wê rexnedayînê digire dest. Yanî sîstem baş e, têkûz e û di navê de hinek kes tevlîheviyê dikin. Ji van ferdan re jî dibêjin çavbirçî, çavteng û timah. Ev bûye sersedema ku sîstem hinek pirsgirêkan bijî, ji bo vê jî hinek tevdîrên teknîkî, burokratîk dixwazin her dem krîzê çareser bikin. Ne ku sîstemê bi xwe lêpirsîn bikin, tu carî sîstema xwe lêpirsîn nakin!

Wê demê kapîtalîzm vê dibêje: “Hemû dîroka cîhanê dîrokeke hoveberiyê ye, dîrokeke paş de mayînê û xerabiyê bûye. Cîhan di şexsê kapîtalîzmê de gihîşt rastiya xwe.” Tevî vê rastiyê jî hinekan qebûl nekirin, hezim nekirin û herwiha têkoşîn li hemberî kapîtalîzmê dane meşandin. Kî bûn ên şer kirî û sîstema kapîtalîzmê qebûl nekirin? Sosyalîzm bû, komunîzm bû, dewletên sosyalîst bûn. Di encamê de ew jî şikestin. Herwiha sîstema kapîtalîst sîstemeke mutleq e, sîstemeke heqîqetê ye, her kesên ku li dijî wê têbikoşin mehkûmê binketinê ne. Kapîtalîzm xwe bi vî rengî dide nîşandan.

Ji bo vê li gel kapîtalîzmê îdeolojî tune ye, dema têkoşîna îdeolojî jî tune ye. Tenê tiştek heye ew jî nirxên gelemperî ne. Çi ne ew nirxên gelemperî? Ew nirxên polîtîk, hiqûqî, exlaqî û çandî, yên ku li Londonê çêdibin, ên li Washintonê çêdibin, yên li Amsterdamê çêdibin in. Ew nirx ne tenê ji bo wan deran e, ji bo her derê cîhanê ne. Lewra mirovekî Çînî, Kurd û Ereb jî divê wan nirxan qebûl bike. Eger qebûl neke, wê demê krîzê dijî. Heke di roja me ya îro de li Kurdistanê krîz heye, heke li Îraqê krîz heye, li Afganîstanê krîz heye, li

Hindistanê krîz heye, dibêjin ji bo çi krîz heye? Zû zû ev nirxên kapîtalîst ên ku li Ewrûpa Rojava û Bakurê Emerîkayê hatine pêkanîn, di hundirê xwe de nedane rûniştandin, lewra krîzê dijîn. Lewra kapîtalîzm dibêje: "Eger hûn bibin parçeyek ji vê sîstemê pirsgirêkên we jî wê nemînin."

Da ku ev pêk bê jî çi pêwîst e? Pêwîst e ku ev gel ji rastiya xwe dûr bikevin. Ji rastiya xwe ya civakî, çandî, exlaqî dûr bikevin. Lewra emperyalîzm li ser gelan dixwaze bêhêziyê ferz bike. Bê îdeolojîbûnê dixwaze ferz bike. Ji ber çi, ji bo rehet fikrê xwe bide rûniştandin û belav bike.

Eger fikrê me hebe, em ê pirsgirêkê di kapîtalîzmê de bibînin. Ger fikrê me tune be em ê pirsgirêkê di kapîtalîzmê de nebînin. Bala xwe bidinê mînak, em bi rexnegirî li kapîtalîzmê temaşe dikin. Em kapîtalîzmê rexne dikin, gelo em ji ber çi, ew qas rexne dikin? Ji ber ku Rêbertiyek me heye û ji bo me fikir pêşkêş dike. Li ser fikrê Rêbertiyê em perwerdê dibînin. Amûrên me yên îdeolojîk hene. Ragihandin, xebatên çandê hene, her çiqas lewaz bin jî, lê di encamê de em xwe di zemînekî fikrî de dixwazin pêk bînin. Yan jî em dixwazin di zemînekî fikrî yê diyar de xwe pêk bînin. Em ê ji kê aciz bibin, em ê kê qebûl bikin, em ê çi red bikin û çi bawer bikin? Lewra li hemberî emperyalîzmê em çi ne? Em şiyar in, em rexne dikin, lê li kêleka me mirov temaşe dike, gelek kes Kurd in yan jî Ereb û Tirk dibin, lê tu hêza wan a redkirinê tune ye. Tenê qebûl dikin, teqlîd dikin. Ji ber vê jî em bala xwe bidinê ev kes ji bo nirxên xwe yê

neteweyî, civakî têkoşîneke baş nikarin bidin meşandin. Xwe wer birêxistin bikin, rêxistina xwe ava bikin, têkoşînekê bidin meşandin, lê nikarin vê bikin. Sedem çi ye, ji ber ku fikrê wan ê cuda tune ye. Teqlîdê esas digirin, lêpirsînê nakin, lewra emperyalîzm dixwaze vê bide rûniştandin.

Şerê li hemberî îdeolojiyê, dûrxistina însanan ji têkoşîna îdeolojiyê ye, armanca wê ya bingehîn ev e. Da ku însan bigihîjin astekî ku nikaribin tiştekî red bikin û bêjin na. Ji bo ji her tiştî re bêjin erê, bi vî rengî mafê xwe yê redkirinê wenda dikin. Yanî wan ji hêza redkirinê mehrûm dikin. Ev xaleke gelekî girîng e.

Heta ku hêza îdeolojîk di nav gelekî de hebe, ew gel radest nabe. Lewra emperyalîzm vê baş dizane. Hemû serkeftinên siyasî, leşkerî û ekonomî, lewaz in û kêm dimînin. Heger bi serkeftineke îdeolojîk temam nebin, hemû serkeftinên siyasî, leşkerî û ekonomî wê kêm bimînin. Kengê serkeftin dibin serkeftin, dema ku bi serkeftina îdeolojîk temam bû dibin serkeftin. Wê çaxê hêzek dikare bêje ez serkeftî me. Eger ew nebe nikare bêje ez serkeftî me.

Em bala xwe bidinê: Emerîka derbasî Îraqê bû, di navbera çend rojan de derbas bû, ji 20’ê adara 2003’yan dest bi tevgerê kirin, 10’ê nîsanê Bexdayê girtin. Yanî di navbera bîst rojan de kete paytexta Îraqê. Ji milyonekê zêdetir leşkerên Îraqê hebûn; tang, top, hemû rengên sîlahê

wê hebûn. Bi hezaran serbazên wan hebûn, ev hemû jî hebûn. Lê beramberî hêza Emerîka ya leşkerî nikaribû li ber xwe bide. Ji bo vê di bîst rojan de Emerîka kete Îraqê. Di aliyê siyasî de Emerîka rêveberiyek derxistin û ew rêveberî li gorî xwe rengekî rêvebirinê di Îraqê de peyda kir. Heta roja îro jî bi rengekî ji rengan tê revebirin û meşandin.

Di aliyê ekonomî de jî pazara talanê pêş xist. Lê em bala xwe bidinê Emerîka lewaz e, piştî hilweşandina Sedam, em temaşe dikin hejmara leşkerên wê yên kuştî ber bi pênc hezaran ve diçe. Her rojê hejmar zêdetir dibe.

Di aliyê madî de li şûna ku peran qezenc bike, em temaşe dikin ku bi trîlyonan perên wan tên xerckirin, Îraq ji Emerîkayê re weke lîtavekê ye (bataklik). Lê li vir çi ye ku li ber xwe dide û nahêle Emerîka rûne? Emerîka di aliyê siyasî û leşkerî de jî bi ser ket, lê di aliyê îdeolojî de hîna bi ser neketiye. Heta di aliyê îdeolojî de bi ser nekeve, ew serkeftina wê ya siyasî û leşkerî hinekî bi sînor dimîne. Yanî hetanî gel di Îraqê de bi temamî dest ji rastiya xwe ya civakî, çand û exlaqê bernede û hemû tiştên ji derve tên teqlît neke, sîstema siyasî û leşkerî ya ku Emerîka di vî welatî de daye avakirin wê lewaz bimîne.

## 2- TAYBETMENDIYÊN ÎDEOLOJÎK ÇI NE

Tabetmendiyên îdolojiyê ev in;  tevî hemû hêza leşkerî, îdeolojî û di şertên herî dijwar de divê tu karibî ji dijminê xwe re bêjî na! Di şertên herî dijwar de tu karibî bi ser bikevî, îdeolojî ev e. Mînaka berbiçav di dîroka rêxistina me de; sekin û helwesta hevalê zindana Amedê îdeolojîk e. Di heman demê de çalakiya ku Hevala Zîlan pêk aniye îdeolojîk e. Ji ber çi ev sekin û çalakî îdeolojîk in? Ji ber ku tiştên dibûn nedihatin aqilê mirov, aqilê mirov ew rewş qebûl nedikirin. Çalakiya Hevala Zîlan, tiştên dibin, aqilê ji rêzê nikare teswîr bike û qebûl jî nake. Ji ber ku dijmin di wir de ji bo te tune bike her tişt pêk aniye. Dema ku Hevala Zîlan çalakî kir konsepteke Tirkan hebû, yê dewletê bû, wiha digot: “Ne tenê însan, divê zindî li çiyayê Kurdistanê nemînin.” Ji bo vê jî gelek operasyon derdixistin bi kobra û teyaran bombe dibarandin, ne tenê ji bo însanan, ji bo lawiran jî bikujin ew bombebaran dikirin. Li gorî wan plan kirî diviyabû ku di çiyayên Kurdistanê de zindî nemînin.

Di van şert û mercan de tu yê çi bikî? Te fedekarî kir, êş û azar hemû tehemul kir, tevî van jî te dide rawestandin û tu nema dikarî çalakiyê bikî. Dev jê berde tu çalakiyî bikî, tu nema dikarî pariyekî nan peyda bikî. Wê çaxê divê tu vê bêjî; “Tiştê ku pêwîst bû min kir, lê tiştekî din ji destê min nehat, ji bo vê jî ez li hemberî gelê xwe, wan însanên ku bi navê wan ez ketim nav vê dozê, beramberî wan serê min ne nizm e û tiştên ji min hatiye xwestin min kir. Di encamê de min nema dikarî tiştekî cuda bikim. Tiştê ji min hat ev bû.”

Lê belê dema ku te bi sîlaheke îdeolojîk xwe biçek kiribe, tu yê tevî her tiştî dîsa jî bêjî; “Tiştên em dikarin bikin hene.” Îdeolojî ev e, asteng çi dibin bila bibin, tiştê ku tu bikaribî bikî muheqeq heye. Lewra dema mirov bixwaze li şûna Hevala Zîlan bifikire, mirovê bigihîje vê encamê. Ya rastî hemû rê hatine astengkirin. Dijmin hemû rê asteng kirine. Li hemberî wan astengî û êrîşên dijmin, em bi wî şêwaz û uslubê jiyanê yê ku em fêrî wê bûne, em nikarin gavekî bavêjin û tiştekî din bikin. Lê van qebûl nake û vê dibêje: “Tevî van tiştan hemûyan jî, tiştê em bikin heye.”

Dema mirov gihîşt vê qenaetê bi awayekî xwezayî piratîk-kirina wê hêsan dibe. Piratîkbûna wê; dibe ku tu çalakiyeke fedaî pêk bînî bombeyan bi xwe ve biteqînî, yan jî bikevî rojiya mirinê hwd… Di encamê de tu rêka derketin û çareseriyê dibînî. Wê demê mirov tiştên ku divê bên kirin di warê îdeolojîk de pêk bîne, beramberî êrîşên dijmin astengan nas nake. Di gelek cihên cîhanê de mirov rastî van hilhatinan tên.

Em gelek caran behsa serpêhatî û têkoşîna gelê Vîêtnamê dikin, têkoşîna wan têkoşîneke îdeolojîk e. Dijminê me mezin e, di roja îroyîn de xwe di cîhanê de serwer kiriye. Dijminê me Emerîka ye, lê li vir em jî neçar in bi ser bikevin. Ew bi vê bawer in.

Şerê Hizbulahê li dijî Îsraîlê yê di sala 2006’an, di meha temûzê de, şerekî îdeolojîk bû. Îsraîl di dema xwe de di şeş rojan de, hemû welatên Ereban şikand. Axa wan dagir kir.

Axa Urdun, Suriyê û ya Misrê dagir kir. Hemû di şeş rojan de kir. Îsraîl çiqas e, li beramberî Ereban ji dehan ne yek e jî, ji bîstan yek e. Lê di şeş rojan de di sala 1967'an de hemû Ereb şikand. Lê belê dev jê berde şeş rojan, di meha temûza 2006'an de sî û du rojan di Libnanê de şer kir nekarî xwe li hemberî Hizbulah bigire, tenê rêxistina Hizbulahê bû li hemberî wî. Ew jî şerekî îdeolojîk dane meşandin. Îsraîl bihêz e, lê Hizbulah vê ji xwe re dibêje: "Îsraîl bihêz e, lê em jî neçar in bijîn, tevî wê divê em bijîn." Îdeolojî wisa çêdibin û pêş dikevin.

## Kûrbûna Îdeolojîk Xwe Bi Serkeftinê Ve Kilîtkirin E

Em bala xwe bidinê di aliyê madî û mercan de, herwiha di aliyê fizîkî de tiştekî ji bo ku sedemên berxwedana zindana Amedê ji sala 1980 û 1982'yan bibîne tune bû. Eger mirov di aliyê fizîkî û madî de bigire dest tiştek wê demê nînbû. Lê hevalên wir vê dibêje; "Kilîtbûna bi serkeftinê, baweriya bi serkeftinê dihêle bibe sersedema ku li wir şêwazê têkoşînê pêş bikeve. Eger baweriya te bi serkeftinê tune be tu yê radest bibî, heta astekî tu yê li ber xwe bidî, lê paşê tu yê teslîm bibî. Lê dema girêdana te hebe, tu yê çi bikî? Tu yê şêwazê têkoşînê ji nû ve di ber çavan re derbas bikî, tu yê bêjî di rastiyê de ez dikarim li hemberî dijmin li ber xwe bidim, lê heta niha şêwazên min li hemberî dijmin bi kar anîne çi ne? Tu yê şêwazê xwe lêpirsîn bikî, yan jî şêwaz ne çewt bûn, lê dema wan derbas bûye. Wê demê tu

yê şêwazên nû peyda bikî. Çalakiya hevala Zîlan ev bû. Şêwazên din peyda dike. Rast e me têkoşîneke baş kir, lê êdî ew têkoşîn têrê nake. Kî vê dibêje, yê ku bi serkeftinê ve kilît bûyî vê dibêje. Lê yê bi serkeftinê ve kilît nebûye wê bibêje: ya ji min hat min kir û ji vê û şûnde hêza min tune ye. Wê demê ev doz bi ser nakeve, wê radest bibe.

## Îdeolojî Hêza Însan A Berxwedanê Ye

Radestiya di nav PKK'ê de jî çavkaniya xwe ev e. Dema ku însan ji pêşengtî û têkoşîna îdolojîk dûr dimîne, em lê dinihêrin beramberî dijmin jî teslîm dibe û diçe îxanetê, îxaneta ku heta niha di nav PKK'ê de pêş ketiye sedem ev e. Di asta yekemîn de sedemên wê îdolojîk in. Çavkaniya vê nêzikbûnê çi ye? Di esas de bê îdeolojîbûyîn e.

Wê demê îdeolojî hêza însan a berxwedanê ye. Însan dibe yê/a xwe. Yanî ji xwe tawîzan nade, ji xwe nabihure û nabe yekî/e din. Dema bû yekî/e din, wê demê dijmin bi ser dikeve.

Em bala xwe bidinê di mijara Kurdan de jî bindestiya Kurdan îdeolojîk e. Bindestiyeke îdeolojîk e. Çima wiha ye? Ji ber ku em niha behsa çi dikin, em behsa oto-asîmîlasyonê dikin. Oto-asîmîlasyon; yanî însan bi xwe, xwe tune dike. Taybetmendiyên xwe înkar dike. Xwebûyîna wî namîne. Me gotibû îdeolojî hûrûkûrbûna fikir a ku xwebûyînê çêdike. Yanî tu bi xwe yî, tu nabî yekî din, kesê dixwaze te bike

weke xwe, tu li beramberî wî/ê li ber xwe didî. Dema ku ew hêza te ya berxwedanê namîne, wê demê dijminê te bi ser dikeve. Em bala xwe bidinê di roja me ya îro de li Kurdistanê ev astengî li pêşberî me ye. Mixabin di Kurdistanê de serkeftina dijmin ne leşkerî û siyasî ye. Ne serkeftineke ekonomîk e, dagirkirina leşkerî tu qîmeta wê tune ye. Xerabî,  kuştin, talan, bombebaran, gund û bajaran xerab dike, komkujiyan pêk tîne, van hemûyan dike, ev xirab in. Lê her tişt ne talana ekonomî ye, ev ne pirsgirêkeke cidî ye. Dijmin wê talan bike, sererd û binerd talan dike, keda însan talan dike. Heta beramberî vê talanê nerazîbûna gel carna pêş dikeve.

Di aliyê siyasî de desthilatiya xwe ava dike. Bala xwe bidinê ev hemû jî xerab in. Lê ji bo îmha û tunekirina gelekî bes nîne. Ji ber çi ev bes nînin? Ji ber ku eniya ku her dem li ber xwe dide heye. Ew eniya ruhî ye. Mînak Kurdayetî, rast e erda me didizin, me dikujin, welatê me jî dagir kirine, lê em Kurd in. Yanî em cuda ne. Heta em vê peyvê jî bêjin wê dijmin tu carî bi ser nekeve. Kengê dijmin bi ser dikeve? Dema em bibêjin; “Em ne Kurd in.” Mînak em bala xwe bidinê nifûseke Kurd a zêde li Kurdistanê ji Kurditiya xwe bêbawer e. Ji Kurdayetiya xwe fedî dike. Bi nirxê Kurdayetiya xwe serbilind nîne! Di bingeh de dagirkirina mezin di vir de ye, wendakirin di vir de ye.

Ji bo vê jî divê tu carî tu gel, tu netewe firsenda vê nedin. Eger ev bû, wê çaxê hêza tu li ber xwe bidî namîne. Tiştekî

tu li ber xwe bidî namîne. Tiştekî ku tu pê li ber xwe bidî namîne. Divê em vê baş bizanin, ji ber ku pir girîng e.

### Di Rojhilata Navîn De Cihê Kurdan

Em di roja îro de li Rojhilata Navîn li rewşa Kurdan binêrin. Kurd bi rastî di Rojhilata Navîn de xwedî cihekî cuda ne. Di roja me ya îroyîn de gelek arguman vê rastiyê destek dikin.  Kurd di vir de xwedî cihekî cuda ne. Yanî xwedî taybetmendiyên şoreşgerî ne. Navê Kurdan û erdnîgariya Kurdistanê bi serdemên dîrokî yên girîng ve girêdayî ne. Em behsa şoreşa neolîtîk, çandiniyê, avakirina gundan, xwedîkirina heywanan dikin, bi dirêjiya dîrokê re em van digirin dest û şîrove dikin.

Bi vê ve girêdayî di aliyê fikrî de guhertinên ku di navbera însanan de çêbûne, civakîbûna însanan, di asta herî bilind de guhertineke herî bilind e. Ev hemû nirxên gel ên çandî û madî ne. Lê em bala xwe bidinê îro însanê herî zêde jixwe bêbawer, ji dîroka xwe qut ji asîmîlasyonê re vekirî Kurd in. Însanên Kurd di vê rewşê de ne.

Sedemên pêşketina vê derûniyê gelo çi ye? Sedem ew e ku di vê xalê de têkoşîneke îdeolojîk li ser gelê Kurd tê meşandin. Ev ji nêz ve bi rewşa dagirkirina Kurdistanê ve girêdayî ye. Niha dijmin Kurdistanê dagir kir, temam em bêjin rojekê Kurd bêdeng bûn, hêza wan a leşkerî têrê nekir ku li ber xwe bidin. Lê di encamê de Kurd, Kurd e. Rojekê ji

rojan wê helbet hêza xwe ya leşkerî deh qat xurt bike, wê li hemberî vê dagirkirinê şer bike û xwe xelas bike. Ji bo ku ew roj neyê, dijmin di her rexî re tevdîran digire.

Çi ne ev tevdîrên dijmin digire? Di aliyê hizrî de Kurd lewaz in. Mînak gotinên xerab li ser Kurdan tên kirin. Dibêjin; "Kurd nafikirin, Kurd bêhiş in, Kurd bidûvik in." Rengereng li ser Kurdan tiştan dibêjin. Mînak vê jî dibêjin: "Hirç fêm dike, lê Kurd fêm nakin. Kurdê bidûvik." Heta hinek teoriyên din jî hene, eslê Kurdan ji tiştên xirab didin nîşandan. Teoriyeke Ereban heye, jixwe dagirker in, vê teoriyê bi nivîskî jî li ser Kurdan dibêjin: "Di zemanê xwe de pêxember Silêman hebûye, ew jî ji dînê Îbrahîmî ye, hem qralê Yahûdiyan bûye, hem jî pêxember bûye. Pêxember Silêman çil pevjinên wî hebûne. Ji van jinan sî û neh ji wan bi şeytan re ketine têkiliyan. Ji qewla Êzîdiyan ve bi mêrik re ketine têkiliyan. Di encamê de zarokên wan çêbûne, ji Silêman re gotine em çi bikin ji van zarokan, Silêman gotiye: Wan berdin bila biçin çiya. Ji wan jî Kurd derketine.

Jixwe li gorî Tirkan tiştek bi navê Kurd tune ye. Miletekî heta tu bixwazî paşve mayî ye. Ji bo navên Kurdan jî wiha dibêjin; 'Li ser berfê meşiyane û dengek wiha ji bin lingên wan hatiye, qart kurt filan, lewra navê wan bûne Kurd.' Li ser vî bingehî gelek hikum û nêrîn li ser Kurdan tên gotin û hene. Dema ev serweriya li ser Kurdan dimeşe û bi salan tê dubarekirin, ev dihêle ku bi Kurdan re li hemberî kesayeta xwe bêbawerî çêbibe. Bi vî rengî li hemberî xwe bêbaweriyê bijîn. Ev jî digihîje asteke wisa ku Kurd bixwe,

xwe bi nezaniyê, hovitiyê mehkûm bikin. Heta bandora van nêrînan bi dirêjiya dîrokê re li ser derûniya kesayeta Kurd bibandor bû. Di nav tevgera me de jî tiştekî wiha derdikete holê; mînak dema kesek karekî xerab bike, yan jî teoriyeke nebaş deyne rastê, yan jî fikrekî ne baş bêje, em jê re dibêjin; “Kurd wiha ne.” Wê demê fikir û karên xerab em bi Kurdan ve girê didin. Dibe ku ev bi îradeya me be yan jî bê îradeya me be, lê di encamê de em di derbarê xwe de gihîştine qenaeteke wiha. Gelo çima mirov di derbarê xwe de digihîje nêrîneke wiha? Dema ku însanek ji hebûna xwe bêbawer be, ji rastiya xwe bireve, ji kesayeta xwe bireve, xwe bi van nêrînan mehkûm bike, wê çaxê dijmin bi ser dikeve.

Eger îro dijmin di Kurdistanê de bihêz e, yek ji sedemên bingehîn ê vê serkeftinê ev e. Sedema wê serkeftinê ne ku hêza dijmin heye, lê sedema wê ya bingehîn ew e ku hêza jiyanê di Kurdistanê de tune ye, ji holê rakiriye, lewaz kiriye. Bi navê Kurdayetiyê însan naxwazin rabin ser piyan. Di Kurdistanê de bi vî rengî têkoşîna îdeolojîk tê meşandin.

## Dijmin Serkeftinên Xwe Yên Îdeolojîk Di Pûçkirina Jiyanê De Pêk Tîne

Di roja me ya îro de emperyalîzm bîst û çar demjimêran li ser sosyalîzmê her tiştan dibêje, ji bo vê her rengê xerabiyê bi sosyalîzmê îzah dike. Diktatorî, faşîzm, şovenîzm, îşkence, lêdan, kuştin, wendakirin, burokrasî,

emperyalîzm, van hemûyan dike malê sosyalîzmê. A niha di nav me de jî ev mijar gihaye asteke wiha ku em nikarin behsa sosyalîzmê bikin! Ji ber ku sosyalîzm bi çi re hemwate bûye; bi xerabî, kuştin, talan, burokrasî, newekhevî, bi rejîma totolîter re hemwate bûye.

Divê mirov vê baş bizane ku serdest vê teoriyê bi kar tînin. Serdest ji bo ku hukmê xwe kûr bikin û serkeftinên xwe mayînde bikin, ji ber ku di rastiyê de tu serkeftinên siyasî û leşkerî mayînde nînin, lê ji bo ku dijmin ji xwe re mayînde bikin dixwazin bi van şêwazên îdeolojiyê temam bikin.

Ew îdeolojiya pêk tînin çi ye û çawa ye? Muhatabê însanê bindest dihêle ku kesên bindest li hemberî hebûna xwe bêbawer bibin. Wiha dike ku însan li hemberî xwe bêbawer bibe. Ev dihêle ku însan ji cewherê xwe derbikeve û însan derveyî rastiya xwe bixwaze her tişt be. Lewra em vê dibînin ku di Kurdistanê de mirovên Kurd yek dibêje ez Ereb im, yek dibêje ez Fars im, nizanim ez Emerîkî me, yanî her kes dixwaze bibe kesek din. Ji ber çi, ji ber ku di aliyê îdeolojîk de Kurdayetî hatiye mehkûmkirin. Mixabin bi Kurdan jî ev dane qebûlkirin. Ew xerabiya herî mezin e. Di bingeh de divê têkoşîn li hemberî vê pêş bikeve.

## Terîfên Berê Yên Ku Ji Îdeolojiyê Re Hatine Pêşxistin

Eger mirov îdeolojiyê li ser vî esasî terîf bike, mirov dikare bi reng û şêwazên demên derbasbûyî hatine ziman bigire dest. Li gorî wê mirov êdî bigihîje terîfeke rast ji îdeolojiyê re. Niha ji ber ku wiha fikrên civakî pêş neketibûn, ji ber ku kêm û kurtiyên civakê yên teoriyê hebûn, bi dirêjahiya dîrokê re vê bandora xwe li ser terîfkirina îdeolojiyê jî kir. Yanî civak çawa dihate naskirin, nakokiyên civakê çawa dihatin fêmkirin, li ser wî esasî îdeolojî jî xelet dihatin terîfkirin.

Heke em di çarçoveya teoriya civakê ya Marksîzmê de bigirin dest, mirovê vê bibîne; îdeolojî rêkûpêk-kirina fikrê ye, sîstema fikrê ya ku berjewendiyên çînekê temsîl dike ye. Marksîzm bi vî rengî îdeolojiyê tîne ziman û terîf dike. Lê belê bi demê re dema ku mirov hîna zêdetir li ser rastiya civakê kûr dibe, mirov temaşe dike ku ev teoriya civakê ya ku hatiye pêkanîn lewaz dimîne. Ev teorî li ku lewaz dimîne? Civak rengên wê hene, pêkhateyên wê hene, civak hem bi hev re ye, yanî yek e, hem jî di hundirê xwe de rengên wê hene. Mînak civak ji jin, mêr, biçûk, mezin, ji komên pîşesazî yên cuda cuda pêk tên, ji gelek kesan, ji gund û bajaran pêk tên. Ev tiştên ne wekhev in, bi bihevrebûna van hemûyan ve civak pêk tê.

Lê destwerdan li ser vê civakê hatiye pêkanîn. Destwerdan bi çi rengî li ser hatiye çêkirin? Ji aliyê çîna serdest, desthilatparêz, hiyarerşîk û dewletê ve hatiye kirin.

Bi vî rengî civak ji ahenga wê derxistine. Li şûna wê têgîna desthilatdariyê, şîdetê, zorê, çîna serdest û ya bindest, ev tişt derketine pêş. Ev hemû jî ne rastiyên civakê ne. Fikrê civakê yan jî teoriyên civakê yên ku hatine li ser vî esasî dane rûniştandin. Bi taybetî jî teoriya civakî ya kapîtalîst ev dane meşandin. Teoriya civakî ya Marksîst li ser van esasan dane rûniştandin.

Niha em lê temaşe dikin ku Marksîzm, bi giranî nakokiyên heyî bi çînan rave dike. Dibêje di civakê de karker û birjuwazî hene. Di civakê de ev herdu çîn sereke ne. Nakokî di navbera van de heye. Ji derveyî van dibêje, xwandevan, birjuwaziyên biçûk, gundî, esnaf hene. Lê belê ev ne rewa ne, yanî gundî jî neçar e ku bibe karker, xwandevan jî bi wî rengî ye. Ji bo vê tiştê derveyî proleterya, yan jî hêzên derveyî proleterya hêzeke civakê yên din nabîne. Tu hêzên din rewa nabînin. Wek kêm û biçûk lê temaşe dikin, wan di civakê de bêbandor dibînin. Ev teoriya wan tenê temsîla karkeran dike.

## Marksîzm Têkoşîna Îdeolojîk Tenê Bi Serkêşiya Karkeran Dinirxîne

Wê demê têkoşîna îdeolojîk çi ye? Têkoşîna îdeolojîk formulasyona fikir, rêkûpêkbûna hizir, exlaq, çand, bawerî ya ku tenê çîna karker temsîl dike ye. Ew îdeolojiya ku tenê proleteryayê temsîl dike. Ji bo vê em lê temaşe dikin, teoriya Marksîzmê gelek hêzan ji nedîtî ve tê. Mînak cotkar,

gundî, dîndar, ciwan, jin û xwandevan hene, mirov nikare van hemûyan bi rêka çînekê rave bike! Lewra em lê temaşe dikin îdeolojiyeke civakî ye û li ser esasê çînan civakê rave dike; ne ku çînan bi civakê rave dike. Çînîbûyîna civakê esas digirin, da ku civakê hemû bikin proleter. Eger civak bû proleter wê demê pirsgirêk çareser dibe û civak hemû dibe yek.

Çawa di roja me ya îro de îdeolojîsyenê weke Fukuyama û yên din dibêjin: "Dawiya dîrokê." Bi vê gotina dawiya dîrokê çi qesd dikin gelo? Wateya vê gotinê ew e ku bi biserketina kapîtalîzmê re, civak hemû dibe kapîtalîst. Civak hemû prensîbên kapîtalîzmê qebûl dikin. Herwiha dawiya dîrokê ye û nakokî namînin. Teoriya Marksîst jî tiştekî wiha dibêje; "Dema ku civak hemû bibe proleter, fikir, exlaq û baweriya proleterya esas bigirin, wê demê pirsgirêk namînin." Lewra dibêjin tiştek navekî wê yê dîn nîne. Gundî tune ne, yan jî heye, lê diyarker nîne. Ji bo vê jî divê zû ji gundîbûna xwe derbikeve. Lewra ji bo vê sedemê mirovekî/e gundî weke partiyî nayê qebûlkirin. Çima dibêjin ev gundî ye, hîna nebûye proleter û fikrê wî/ê cuda ye. Ji bo vê nikare bibe endamê partiyê.

Bi rengekî wiha mekanîk li ser esasê çînîkirina civakê nêzikbûnek pêş ketiye. Di esas de rengê civakê yê din ji nedîtî ve tên. Lê ew reng hene û civak bi wan rengan civak e.

Li ser vî bingehî em ê lê binêrin ku terîfkirina Marksîzmê ji îdeolojiyê re seqet û kêm e. Tenê çînekê esas digire. Wan hêzên din ên civakê ji nedîtî ve tê yan jî esas nagire. Lewma divê em bigihîjin terîfeke rast ji îdeolojiyê re. Divê terîfa me ji terîfên çînî dûr be, ji yên desthilatiyê jî dûr be. Divê em bigihên terîfên wiha ku tu amûreke desthilatiyê, fikrekî desthilatdariyê di nav de nebe û bi temamî jê dûr be, heta bê xwestin divê mirov bi şêwazê desthilatiyê negire dest. Weke fikrekî çînî, rêkûpêkirina fikir a çînî jî divê mirov negire dest. Ji ber çi divê em li van şiyar bin û weke wan nêzik nebin? Ji ber ku em îro gihane wê baweriya civakî.

**Wê Terîfa Me Ya Îdeolojîk Ji Civakê Re Çawa Be?**

Ev civaka pênc hezar sal in ji rastiya xwe dûr e. Destwerdan li ser çêbûne û desthilatdarî, hiyerarşî û dewlet li ser saziyên xwe sazkirine û çêbûne. Ev civak ne bi dînamîka xwe, bi şêwazên şîdetê û zorê hatiye beralîkirin. Ji xeta xwe derketiye û jirêderxistinek hatiye jiyîn û ev jî berdewam dike.

Niha em dixwazin wê jirêderketinê sererast bikin. Wê demê wê terîfa me ji îdeolojiyê re çawa be? Îdeolojî wê demê ew sîstema fikrê ye, ya exlaq e, ya çandê ye, ya baweriyê ye, sîstemeke wiha gelek qadên jiyanê di nav xwe de bi cih dike. Ev çi dikin, temsîla berjewendiyên civakê dikin. Yanî civaka ku karibûye xwe bide nîşandan. Bibe ya xwe, li dijî desthilatdariyê, newekheviyê, perçebûnê,

desthilatdariya zilam li ser jinê, ya çînekê li ser çîneke din, miletekî li ser yê din, yan jî ya însan li ser xwezayê, li dijî van desthilatdariyan hemûyan divê civaka mirovahiyê bibe ya xwe. Xwe îfade bike, di milê ruhî û madî de, sîstemeke wê ya exlaqî hebe. Lê ew sîstema exlaqî wê li ser çi esasî be? Divê ne li ser esasên kar û qezencê, ezezîtiyê hwd. be. Li ser esasekî cuda, li beramberî nasnameya însan, weke însan nêzik bibe. Lewra pêwîst e tiştên ku mezin li beramberî biçûkan bike, tiştê ku biçûk li beramberî mezinan bike, tiştê ku jin li beramberî zilam bike, yê mêr li hemberî jinê bike, yê ku însan li beramberî xwezayê bike, divê hemû ji nû ve bên destgirtin. Ev hemû bi çarçoveya qeyd û rêzikan, bi zorê û şîdetê na, lê bi bawerî û qebûlkirinê hatibin dayîn, li ser esasê berdewamkirina xwezayê û civaka însanan bin. Ev pîvanên exlaqî divê derbikevin pêş.

Çand, komîserhevkirin, rêûresm, ziman, danûstandin, ev hemû ne weke cudatiyê divê bên dayîn, weke tiştekî di rengê xwezayê de bin. Wek çawa di xwezayê de darûberên cuda hene, rengên cuda cuda hene û ew bixwe vê ahengê çêdike, di nav mirovan de jî ev heye. Lewra zimanek ji zimanê din baştir tune ye. Di encamê de her ziman di civakê de navgînekî danûstandinê ye, di nav wê civakê de danûstandina di navbera însanan de hildide bin ewlekariyê.

Rengê însanan ji yên hev baştir tune ye. Ev nijadperestiya biyolojîk, etnîkî, sersebebên vê hemû jî desthilatdarî ye. Desthilatdarî wiha dike û her dem weke amûrekî reklamê van di nav însanan de pêş dixe. Lewra yên

çavşîn û porzer wiha ne, yên reş wiha ne, yên zer wiha ne, yên filan zimanî xeber didin wiha ne, yên bêvan zimanî xeber didin wiha ne… Ev hemû çîrok in û ji bo miletekî li ser ê din, zimanekî li ser ê din bike desthilatdar, didin meşandin.

Lewra em gihane asteke wiha ku êdî însan biyolojiya xwe diguherînin. Mînak, hinek kes perekî pir zêde xerc dikin da ku çavên xwe şîn bikin. Çima wiha dikin, çima pêdiviya vê dibînin? Ji ber ku nijadperestiya biyolojîk a ku navenda wê Ewrûpa ye, di roja me ya îro de xwe li ser hemû cîhanê ferz dike. Ji bo vê însan dixwazin çavên xwe û rengê porê xwe weke yên wan bikin. Hetanî rûyê xwe jî weke yê wan bikin. Bi Îngilîzî xeber bidin. Yekî Îngilîz bi Kurdî nizanibe pir xwezayî tê dîtin, lê ji bo yekî Kurd bi Îngilîzî nizanibe şerm tê dîtin! Ev tiştên çêkirî ne! Tu şerm û neşerm di vir de nîne, yek bi zimanê Îngilîzî nizanibe, cîhan di vir de xerab nebûye. Lê yê Kurd dizane Kurdî, yê Îngilîz jî dizane Îngilîzî. Bi nezanîna zimanekî biyanî cîhana mirovan xerab nabe. Ew jî ji bo mirovan ne kêmasiyek e ku însan jê şerm bike, lê mixabin di roja me ya îro de ev weke kêmasî tê dîtin.

Ji ber ku rengê min wek Emerîkan ne spî ye, zimanê min ne weke wan e, bejna min ne wiha ye; ev hemû weke kêmasî tên dîtin. Rast e, ev hemû êrîş in û derveyî çand û rastiya jiyana însanan e. Ji bo vê jî di aliyê îdeolojî de ev jî divê bê sererastkirin.

Wê demê îdeolojî wer fikrekî tenê û çînekê li dijî çînekê temsîl nake. Netewekê li dij neteweke din temsîl nake. Îdeolojiya ku em pê bawerin ew sîstema fikrê ya ku tê de exlaqê civakê li ser piyan e, tê de çanda civakê li ser piyan e, di nav de çarçoveya ahenga civakê hemû rengan di nav xwe de qebûl dike. Tê de bawerî hene. Ev hemû di encamê de însan dikin xwediyê kesayeta xwe. Mirovan ji asîmîlasyonê re, ji xwe tunekirinê re, xwe înkarkirinê û ji înkarê re vekirî nahêle û rê nade van tiştan. Tam berovajiyê vê, însanek ku karibe di hemû qadên jiyanê de xwe îfade bike, derdixe pêş.

## Însan Bi Îdeolojiyê Serbixwe Dibe

Liv û tevgera îdeolojîk, sîstemê li ser esasî wê hebe û bi çi re elaqeder bibe diyar dike. Divê mirov li ser van xalan bisekine. Dema ku em dersa îdeolojiyê dibînin, dema em nîqaşên îdeolojîk dikin, divê beriya her tiştî em bi vê bawer bin: Divê em di serxwebûna însan de ji rola îdeolojiyê bawer bin. Ji bo vê însan bi îdeolojiyê serbixwe ye. Bê îdeolojî kole ye û ji koletiyê re vekiriye, divê em bi vê bawer bin. Heke em bi vê nebawer bin, dersa îdeolojiyê ji bo me şiklî dibe. Wê demê mijar tenê bi gotinê têrê nake û wiha jî nîne. Divê baweriya me hebe. Lewra divê ev jî bê diyarkirin ka ew bawerî wê hebe, yan tune be? Divê em di vê de zelal bin.

## Îdeolojî Hêza Baweriya Mirovan e

Di vê babetê de divê em zelal bin, heke tu çiqas dibî xwedî derfetên madî bibe, heke di aliyê îdeolojî de te vîna xwe diyar nekiribe, te îradeya xwe pêk neanîbe, ew derfetên te yên madî nikarin te biparêzin. Em ê bi vê bawer bin yan na? Em ê dersan ji dîrokê derxînin an na? Dersên dîrok dide me çi ne? Misilman beramberî dewletên desthilatdar di herêmê de bi xwe li hemberî Sasanî û cahiliyeta Ereban çend însan bûn. Di dema xwe de hejmarek wiha kêm bûn, lê baweriya wan bihêz bû.

Piştî demekê Sasanî jî şikandin, Bîzans û cahiliyeta Ereban jî şikandin. Gelo ev bi hêza xwe ya madî kirin? Na, ne wiha bû, eger hêza madî bûya dewlet bihêztir bû. Lê em bala xwe bidinê beramberî îdeolojiyê hêza madî nikare li ber xwe bide.

Herwiha şoreşa Fransî vê dersê dide me, çek, pere, derfet hemû di destê qiralan de bûn. Lê di sala 1789'an de kî bi serket? Gel bi ser ket. Gel feqîr bû, çek di destê wî de nebû, top, tiving û şûrê wan tune bû! Di vir de jî sedema serkeftinê ew bû ku îdeolojî hebû û bi ser ketin. Lewra dema ku îdeolojî û bawerî lewaz bin, di exlaqê de dejenerebûn hebe, hêza madî tenê nikare sîstemê biparêze. Dema ku tu rastiyê bişopînî û milîtanê rastiyê bî û bi argumanên rast li pey rastiyê bimeşî, dijminê te çiqas di aliyê madî de bihêz dibe bila bibe, tu carî nikare te asteng bike.

Ji bo vê em bala xwe bidinê milîtanê rastiyê yên ku di aliyê îdeolojîk de karibûne kesayeta xwe ava bikin û van kesên ku ew îdeolojî û ew fikir pejirandibin di hundirê xwe de bi cih kiribin û pê bawer bin, ew kesayetên wiha jî peyda kiribin; mirov dikare bêje tu rê û hêz nikare pêşiya wan bigire. Tu hêz nikare meşa wan a ber bi azadiyê ve asteng bike.

Çiqas lewaz dibin bila bibin, mînak têkoşîna azadiya Kurdistanê ya îro di bin pêşengiya Rêber APO de tê meşandin li ber çavan e. Ev têkoşîn di asta macareyan de van tiştan dike. Ev têkoşîna pêkhatî weke mucîzeyekê ye, ev wiha bi awayekî xwezayî pêk nehatiye, jixwe ve pêk jî nayê. Ew qas dijminên li hemberî şoreşa me hene; Emerîka, Îsraîl, Yekîtiya Ewrûpa, Kurdên hevkar û hêzên herêmî, ev hemû li dij PKK'ê dixebitin. Tevî vê yekê jî hebûna PKK'ê li ser piyan weke mucîzeyekê ye. Lê eger endamên PKK'ê bi rastî jî wiha jidil û can milîtantiya vê fikrê bikin, tenê wiha bi vî rengî mayîn na, pir rehet me dikarî serkeftinên mayînde bidest bixista. Lê di nêzikbûnên me yên îdeolojîk de, lewaziyên me yên hene dibin sersedemên ku li gelek cihan, gelek caran tiştê pêwîst e em bikin di demên wê de pêk bînin, em nikarin di demê wê de pêk bînin. Ev jî rastî ne, dîrok van dersan dide me. Di roja me ya îro de em dikarin van dersan ji tecrûbeyên xwe yên derbasbûyî derbixînin. Têkoşîna PKK'ê van dersan bi awayekî sûdwer dide me.

Ji bo vê têkoşîna îdeolojîk girîngtirîn têkoşîn e di nav gel de, keleha herî dawiyê ye ku li ber xwe dide. Divê gelek tu

carî wê kelhê bernede. Heger te ew keleh berda, wê demê tu radestî dijmin bûyî. Ji bo vê jî divê mirov wê kelhê bernede, tu carî nehêle ku lewaz bibe. Mirov di binê zindanan de be, yan jî birçî be, di bin îşkencê de be û li ku dibe bila bibe, divê mirov ji dijminê xwe re nebêje erê! Mirov bêje rast e, tu Emerîka yî û derfetên te yên madî hene, leşker û çekên te hene, tu dewleta Tirkiye yî, ya Ereban î, derfet û îşkencexaneyên we hene… Lê hêza min a ku ez di wê astê de bi wan re şer bikim tune ye, ev jî rastiyek e. Lê ez ji we re nabêjim erê. Ez bi ya we nakim, tiştê hûn dixwazin li ser min ferz bikin ez qebûl nakim! Dema mirov wiha kir wê çaxê dijmin bi ser nakeve û serkeftinên dijmin ne mayînde dibin. Tu demî ne bingehîn in, lewra bi sînor in, tenê siyasî û leşkerî ne.

Divê mirov vê her dem biparêze, ne tenê di îşkencê de, li ku dibe bila bibe divê mirov li hemberî dijmin be. Li ser çiyan divê mirov biparêze. Mînak îro jî em temaşe bikin, mekanîzma sisiyan, ya çaran, Emerîka, Têkiliyên Tirkiyê û Îsraîl… hemû li dijî me ne. Tayîb Erdogan ji kê re dibêje merheba, hema dibêje PKK. Berê Demirel û Ecevit jî wiha bûn. Özal jî wisa bû, hemû rêvebirên dewleta Tirkiyê wiha bûn. Hemû têkiliyên wan ên derve û hundir li ser esasê li dijî PKK'ê ne. Cîhana serdest jî ev şert qebûl kiriye. Dema em lê temaşe bikin em ê bêjin Emerîka, Ewrûpa, Îsraîl… hemû li dijî me ne. Wê demê em çi bikin, firsendên me yên serkeftinê wê demê tune ne? Bala xwe bidinê li serê çiyan jî têkoşîna îdeolojîk pêwîst e, ji ber yê ku vê baweriyê bi te re bihêle, ev têkoşîn e. Yan jî tu yê bi çi li dijî dijmin şer bikî?

Divê mirov vê peyamê bide dijmin: rast e derfetên te hene, lê ez wek însan di zemînê tu hazir dikî de nikarim xwe îfade bikim. Ji bo vê ez nakevim wî zemînî. Wê demê wê dijmin bêje: Tu yê birçî bî, bersiva te wê ev be, tiştek nabe! Tu yê bêyî kuştin... tişt nabe. Ya girîng zemînê ku ez hilnebijêrim ez ê tê de nejîm e! Ya girîng ew e ku ji bo jiyanê zemînê mirov hilbijêre ye, ev ji her tiştî girîngtir e.

## Hemû Derfetên Emperyalîzmê Di Bin Xizmeta Mayîndekirina Sîstema Kapîtal De Ne

Derfetên Emerîka yên madî zehf in, ev rastiyek e, lê bi wan derfetên madî re paralel exlaq tune ye. Serdestiyê, dejenerebûnê esas digirin, hemû rengên xerabiyê esas digirin. Rast e di aliyê madî, pir tişt hene, ev tiştên heyî yên pir balkêş in. Ji amûrên teknîkî, elektronîk, maşîne, firoke, ev hemû jî rast in, lê ev weke ku tê îdîakirin ji bo peydakirina pêşerojeke ronahî, xweş û geş ji mirovan re nade avakirin û qet çênabe jî. Ev derfet hemû ji bo hîn zêdetir desthilatdarî û mayîndekirina sîstema kapîtalîst tên çêkirin. Di vî zemînî de Kurd weke xwe, yan jî Ereb weke xwe, civak weke civakê nikarin bijîn! Hemû jî neçar in xwe biguherin, ji tabetmendiyên xwe tawîzan bidin. Xwe înkar bikin, bi vî rengî bibin dûvik. Ji bo vê pêwîst e însan vê sîstemê qebûl nekin! Di esas de qebûlkirin tiştek nebaş e. Tiştê herî xerab ew e ku mirov van şertan û daxwazên

emperyalîzmê qebûl bike, lê yên qebûl jî dikin bi wê xerabiyê nahesin.

Bala xwe bidinê em çawa dizanin xerabî heye, yan jî çawa em pê dihesin? Dema ku başî hebe em dizanin xerabî heye! Dema ku başî tune be, em nizanin xerabî çi ye. Ji me ye ku xerabî tiştekî xwezayî ye. Em ê wer bizanin wiha ye. Lê dema ku tiştên berztirîn û baştirîn hebin, nirxên însanî hebin, wê demê mirov xerabiyê baş dibîne û dibêje, ev tiştek xerab e. Dema ku hemû têkiliya te bi başiyê, anor, hisiyet û mûcîzeyê re be, wê demê îxanet ji bo te nayê tu maneyê. Ji bo yekî weke Ebdulqadir Aksoy îxanet çi ye, nizane! Ji bo Kamûran Înan îxanet çi ye, ji bo Hikmet Çetîn îxanet çi ye! Ev kesayetên wiha nizanin îxanet çi ye. Ji ber ku tu têkiliya wan bi Kurdayetiyê re tune ye. Bi kerametê, anorê, hisiyetê û şerefê re têkiliya wan tune ye. Lewra bêşerefî çi ye, nizanin. Ji bo wan di rêka xerab de meşandin şêwazê jiyanê ye.

Lê ji ber girêdanên me yên mirovane hene, em dizanin ka ew tiştê ew kes dikin, bêkesayetbûn û îxanet bi xwe ye. Ji bo vê bala xwe bidinê, tevgera îxanetê di nav me de çi kir? Yên weke Ferhad, Botan û wan dixwestin PKK'ê bi temamî ji holê rabikin. Ji ber ku dema PKK tune be, wê kes ji wan re nebêje hûn xayîn in. Wê bêjin PKK nîn e û xelas bû, di encamê de her yek çû mala xwe. Lê dema PKK hebe wê her kes ji bo wan bêje; "hûn xiyanetkar in." Ev ji bo wan ne baş e. Lewra dixwestin pêşiyê PKK'ê ji holê rabikin. Ger PKK'ê ji holê rakiribûna wê îxaneta wan rewa bibûya. Lewra dijmin

her dem ji bo ku gelan, civakê û rêxistinan bê îdeolojî bikin, di nav hewldanan de ye.

Desthilatdar çima di nav vê hewldanê de ye, ji ber ku dema îdeolojî tune be, mirov sînorê xwe nas nake. Emperyalîzm wê bê û bikeve hundir mejiyê te, wê bikeve hundirê te û tu pê nahesî. Wê şêwazê jiyana te biguhere û tu pê nahesî. Çima wiha dibe? Ji ber ku parametreya(pîvanga) tu xwe pê bipîvî û bi xwe bihesî tune ye. Ne ji aliyê exlaqî, çandî, bawerî, fikir û zanistî ve, tiştê aydê te tune ye. Ji ber vê tu dibî weke erdekî xam û alem çi yê xwe tê de biçinin wê wiha şîn bibe. Lewma bi israr emperyalîzm li ser vê xalê radiweste. Ji ber ku ji vê baş bawer dike ku hêzek, gelek, yan jî rêxistinek ji hêza îdeolojîk bêpar be, zêdetir ji mêtingeriyê, bindestkirinê re vekirî û amade ye.

Ji ber vê wiha propagandayê dikin û dibêjin: dema îdolojiyan çû, di esas de bê îdolojîbûn dawiya dîrokê ye. Ev hemû jî armanca wan ew e bikin ku bêjin hemû sîstema zanistî ya aqilane ku di encama têkoşîna mirovatiyê de derketiye, sîstema emperyalîzm û kapîtalîzmê ye. Bi taybetmendiyên xwe yên lîberal û ezezî van tiştan didin meşandin. Hewldanên însan ên bi hezarê salan ku têkoşîn kirine, fikirîn bo bigihêjin vê astê, lê emperyalîzm weke ku mirovahî gihîştibe vê astê dide nîşandan. Lewra divê kes li hemberî vê astê têkoşînê neke, tam berovajiyê vê her kes vê astê ji bo xwe qebûl bike, teqlîd bike û dev ji xwe berde û bê

ser vê rêkê. Di esas de dersa ku emperyalîzm dixwaze bide me ev e.

Lê divê em heta asta herî dawî vê dersê tu carî qebûl nekin. Da ku em vê dersa emperyalîzmê qebûl nekin, divê em li ser kêm û kurtiyên emperyalîzmê hûr û kûr bibin. Ya ji me tê xwestin ew e ku em çawa sîstema wê ya heyî qebûl nekin û li hemberî wê serî hildin. Em pirsgirêkên wê di ku de ne bibînin, baş derxin zanebûnê û qebûl nekin.

Mijara duyemîn jî ew e ku em bizanin di esas de em dixwazin bigihîjin kîjan pêşeroje û çi ne armancên em bigihîjinê? Armanca ku însan bi hisiyat, rûmet, mûcîza xwe di nav de mezin bibe kîjan e? Pêwîst e, em wê baş destnîşan bikin! Divê em baş lê bigerin, ango divê em çawa bijîn baş tespît bikin. Em ê bi çi awayî kar bikin, bersivê bidin kîjan pirsê. Li ser van xalan divê em rawestin.

## Têkoşîna Îdeolojîk Bi Kedê Pêk Tê

Xalên ku mirov di têkoşîna îdeolojîk de esas bigire hene. Xalên ku mirov esas bigire divê çi bin? Dema em dibêjin têkoşîna îdeolojîk divê em çi esas bigirin? Berî her tiştî weke rêzikek yekemîn, weke taybetmendiyeke yekemîn, di danûstandinên xwe yên bi îdeolojiyê re, di serî de divê em nêzikbûnên xwe ji îdeolojiyê re sererast bikin. Yanî îdeolojiyê tenê weke formulekî negirin dest, yanê fêmkirina

me ya îdeolojiyê bila tiştekî jiberkirî nebe. Divê em xwe ji vê terîfê xelas bikin.

Heta roja me ya îro jî em dibêjin, filan kes îdeolojîk e. Çi ye ev îdeolojîkbûna wî/wê? Yanî dizane xeber bide, pirtûkan dixwîne, hinek hevok jiber kirine, ji bo vê îdeolojîk e! Lê ji pratîkê dûr e, ji kar dûr e. Lewra îdeolojî pir tişt anîna ziman, peydakirina hevokan, avakirina hevokan nîne. Herwiha formulasyoneke zimandirêjiyê jî nîne, yanî tenê anîna ziman nîne.

Îdeolojî ji wê bêtir di însanan de xwebûyînê û îradeya serbixwe peyda dike. Îdeolojî di însanan de hêza berxwedanê û têkoşînê peyda dike, însan di îdeolojiyê de kûr dibe. Ji bo vê mînak însanek di aliyê îdeolojîk de, di aliyê anîna ziman de, fêmkirina mijaran de çi dibe bila bibe, amûrên me yên îdeolojîk çiqas hebin bila hebin, deh kovarên me hebin, bîst weşanên me yên radyo û TV'yê hebin, çiqas tiştên me hebin bila hebin, lê eger vê hêza berxwedanê di nav gel de bilind nekir, hemû jî bêmane ne.

Eger tu yê bêjî em di aliyê îdeolojîk de bihêz in, em gelek tiştan tînin ziman, lê belê gel li ber xwe nade, civak bindest e, şerê li dijî dijmin tune ye, wê demê çi maneya vê îdeolojiyê heye? Ji ber vê yekê îdeolojî ew xebata însanan a beramberî dijminê wan seferber dike ye. Wê demê em dikarin bêjin îdeolojî bi wate dibe.

Gelek kes hene bi navê xebata îdeolojîk gelek tiştan tînin ziman. Di esas de modernîteya kapîtalîst tînin ziman,

stranekê dibêjin, çîrokekê dinivîsin, romanê dinivîsin, teoriyê pêş dixin, bi dehan pirtûkan derdixin û weşanan çêdikin, lê belê ev di nav gel de serhildanê çênake, gel ranake ser piyan. Ciwanan, jinan ranakin ser piyan. Dema van pêk neyne û çêneke, divê bê lêpirsînkirin. Ji ber wê dema em dibêjin îdeolojîk e, divê em rast bi kar bînin. Divê hemû gotin, peyvên tên kirin ji bo me ne îdeolojîk bin!

Gelek caran wiha tê ziman, dibêjin; "Filan kes di aliyê îdeolojîk de gelek xurt e." Temam di aliyê îdeolojîk de bihêz e, lê em di aliyê jiyanî de lê binêrin, gelo çi temsîl dike; ferdiyet û ezeziyê. Di aliyê berxwedana li hemberî dijmin de em lê temaşe bikin, çi temsîl dike: Ji her aliyê ve oportunîzmê. Di aliyê nêzikbûna ji nirxan re em binêrin çawa nêzik dibe: Xerckariyê temsîl dike.

Em temaşe bikin, ku dera vê/vî kesayetê/î îdeolojîk e!? Ji ber vê em dema dersa îdeolojiyê dibînin beriya her tiştî, pêwîst e em zanîna xwe di derbarê îdeolojiyê de sererast bikin! Divê em êdî van mijaran sererast bikin. Îdeolojî tiştekî madî nîne. Hinek dibêjin em di aliyê îdeolojîk de bihêz bûne; çi kirine, deh rojname derxistine, du kovaran derdixin û sê radyoyên wan ên weşanên hene. Ji ber vê dibêjin ji aliyê îdeolojîk ve bihêz in û hezar şikur dikin ku ew qas derfetên wan hene.

Lê gelo ev derfetên wan gel radike ser piyan? Di nav gel de hêza berxwedanê bihêz dike? Kîn û nefreta gel li hemberî dijminê wî mezin dike? Ciwanan derdixe serê

çiyan? Jinan beramberî hemû çanda destavêtinê, xesp, êrîş û înkarê radike ser piyan? Dema ku van hemûyan ranake ser piyan wê demê ne îdeolojîk e.

Wê demê îdeolojî çi ye? Hinek formulasyonan mirov dikare pêş bixe. Di esas de îdeolojî hezkirin e, xurtkirina nerazîbûna gel e, bi gelemperî ya civakê ye. Li beramberî hemû tiştên ne rast, rakirina civakê ye. Lewma divê beriya her tiştî em wiha îdeolojiyê fêm bikin û baş derbixînin zanebûnê. Lê ev jî heye, dibe ku yek derkeve û wiha bêje: “Têkiliya îdeolojiyê bi xwendin û pirtûkan re nîne?” Têkiliya wê pê re heye û pir jî heye, bi kûranî pê re heye. Ya divê em bizanin çi ye? Gelo ev têkilî ji bo çi ye, çawa pê re heye? Ev pirseke girîng e, lewra pêwîst e mirov wê baş fêm bike.

Di serî de zanistiya ku nakeve xizmeta çareserkirina pirsgirêkên gel, ne îdeolojîk e. Ew ne îdeolojî ye, ew dûvik e. Tu dibî dûvika/ê hinekên din.

Mînak di roja me ya îro de TV’ya me heye. Lê dema naveroka weşana wê ji ya sîstemê cudatir nebe, ew weşan xizmeta gelê me nake. Rast e îdeolojîk e, lê ya serdestan e. Ne îdeolojiya aydê civakê ye. Ji ber ku guhertinê çênake, însanan nade fikirandin. Li ser êş û elemên wan, wan nake lêhûrbûnê. Li şûna bala mirovan bide ser van tiştan, wan ber bi milekî din ve dibe.

Bala xwe bidinê, Papayê Jean Poul ê duyemîn ê ku mir, hemû cîhana Katolîk, ji aliyê wî ve, ji aliyê ruhî ve dihat

birêvebirin. Ew Papa dijminê komunîzmê bû. Weke çawa Fetulahî di roja îroyîn de dikin, li dijî komunîzmê di nava misilmanan de kemera kesk pêş xistin. Di aliyê Xiristaniyê de jî Papa û Katolîkan li dijî komunîzmê wiha pêş xistin. Çi dikirin? Navendeke pembe, mexmelî, bi awayekî sanal formule peyda dikirin, bi vî rengî eleqeya însanan a ji rastiyê re dûr dixistin.

Mînak Emerîkaya Latîn; birçîbûn, cinayet, fihûş, xerabî û bindestî, her tişt tê de hebû, Papa diçû wir û bajar bi bajar digeriya. Diçû Şîlî, Arjantîn, Brezîlya û Kostarîkayê, li van welatan hemûyan digeriya. Dema digeriya ji gel re çi digot: "Em hemû birayên hev in, em dewlemend bin, yan jî feqîr bin, em hemû birayên hev in. Ya girîng em ji dêrê (kilîse) dûr nekevin, ji ruhê pîroz dûr nekevin. Weke din ev jiyan demokratîk e." Her dem Papa van wezan dikir, di esas de da ku gel êşên xwe yên bingehîn nebînin.

Carekî li welatekî Emerîkaya Latîn li Kostarîkayê papazekî ji Papa re wiha dibêje: "Tiştê tu dibêjî baş e, lê li vir nan nîne ku miletê me bixwe." Piştî demeke kin ew papaz hate kuştin. Ji ber çi papaz hate kuştin? Ji ber ku ew ji tiştê razber (soyut) dûr bû, dixwest Papa bikişîne rastiyê, ji ber ku milet birçî bû. Lê ew naxwaze ber bi rastiyê ve biçe. Ji ber ku dema te mirov ber bi rastiyê ve kişand, wê demê nerazîbûna Papa jî pêş dikeve, têkoşîn mezin dibe. Wê demê bi mezinbûna têkoşînê re sîstema desthilatdar dikeve aloziyê û Papa vê naxwaze.

Lewra divê îdeolojî çawa be? Divê nakokiyan eşkere bike, derxîne holê û bide jiyîn û li ber çavên mirovan raxe. Mirovê nabîne, pê nahese divê pê bide dîtin da ku nerazîbûna wan çêbibe. Îdeolojî ev e, ne weke demogojiyê ye.

Îdeolojî ne peydakirina rojeveke sunî ye, yan jî însan bi êşên xwe nehese. Îdeolojî şênber e,  wer formuleke ji bo jiberkirinê nîne. Rastiya jiyanê bi rengekî di asta herî jor de temsîl dike, îdealîze dike û digihîne mirovên cur bi cur. Li ser wî esasî bi zimanekî guncaw, nerazîbûna însanan li hemberî bêmafiyê pêş dixîne. Li hemberî bêmafiyê nerazîbûna însanan çêdike.

Lewra beriya her tiştê girîng, şertê yekemîn ew e ku em naskirina xwe ji îdoelojiyê re biguherin. Yanî wiha îdeolojî tiştekî bi zimandirêjiyê re hemwate nîne. Îdeolojî tam berovajiyê vê ye. Îdeolojî bilindkirina asta nerazîbûna însan li hemberî bêmafî, desthilatdarî, asîmîlasyon û înkarkirinê ye. Lêgera li heq, edalet, zanist û azadiyê ye. Divê ev beriya her tiştî bê fêmkirin.

## Îdeolojî Xebateke Her Demî ye

Îdeolojî mijareke wisa demkurt nîne. Bi taybet jî têkoşîna îdeolojîk li her derê divê bê navber bê meşandin. Tu carê navber nekevê. Dema ku navber bikeviyê, pirsgirêk derdikevin. Pirsgirêkên derdikevin çi ne? Em bala xwe

bidinê îro dijminê me çi herêmî dibe, çi jî cîhanî dibe, dijminê gelan hêzên di cîhanê de serdest, bê navber gelan di bin bombebaraneke fikrê de dihêlin. Armanca wan ji vê bombebaranê ev e ku bikaribin şêwazê jiyana xwe, ya ku ew dixwazin li her derê serwer bikin e. Herwiha da ku karibin serweriya xwe hîn zêdetir qayîm bikin. Lewra dema ku tu têkoşîna îdeolojîk îhmal bikî, wê demê tu fersendê didî dijmin da ku mewziyê bi dest bixe. Di civak, welat û rêxistina te de dijmin karibe mewziyê qezenc bike.

Îdeolojî, bi taybet di têkoşînê de, ji bo peydakirina şêwazên çareseriyê xwedî roleke esasî ye. Heke em îro bi azadiyê bawer bin, ji bo azadiyê têdikoşin, gelo sedema vê çi ye? Sedem ew e ku me ji doza xwe bawer kiriye. Em êdî dizanin dagirkerî mêtingerî, kedxwarî, desthilatdarî tiştekî çewt e, me bi vê bawer kiriye. Dibe ku ev çewtî bê mehkûmkirin û alternatîfên wê derkevin. Li şûna wê sîstema azadî, wekhevî, edalet û demokrasî serwer bibe. Têkiliyên di navbera gelan de, yên di navbera însanan de serwer bibe. Em van tiştan bi rengekî utopîk û xeyalî naynin ziman. Em kîngê tînin ziman, dema em dibînin ku bi rastî jî sîstema kevn, desthilatdarî êdî bersivê nade pêdiviyên mirovan, em wê demê tînin ziman. Wexta civak lawaz dibe, krîzê dijî, xerabiyê çêdike, em bi vê pêdiviyê dihesin. Em bi vê çiqasî bihesin, lêgerînên me yên peydakirina alternatîfê jî ew qas çêdibin. Em dikevin nav lêgerînan ka em çawa tiştekî nû çêbikin. Tê de ev krîz û xerabî tune be, bi dawî bibe û bê derbaskirin.

Ji bo vê em li zemînekî nû digerin. Têkoşîna wê didin meşandin. Niha ev têkoşîn di zemînê em tenê dixwazin de bêguman nameşe. Dijberê wê hene, yên li dijî me hene. Dema em dibêjin yên dijî me, wiha ne ji rêzê ne. Hêzên mezin in, cîhanî û herêmî ne. Ev hêzên dijber wê her demê bixwazin planê me bi ser nekevin. Her dem wê vê bixwazin. Baş e, em ê çawa têkoşînê bidin berdewamkirin? Em ê çawa astengiyan ji pêşiya xwe rakin? Em ê çawa karibin bê dudilî ber bi armancên xwe, bê sekin ber bi armancên xwe ve bimeşin? Ev hemû dema em xwe nû bikin, wê pêk werin! Bi xuliqkarî, hêz, îdîa, israr astengiyên ku dijmin nikaribin li pêşberî me rêka me bigirin, em ê wan peyda bikin.

## Têkoşîna Îdeolojîk Çareseriyê Peyda Dike

Ev têkoşîna îdeolojîk e. Têkoşîna îdeolojîk çareseriyê peyda dike. Beramberî hemû rengên xitimandinan, hemû rengên seknandinan me dike xwediyê wan şêwazên ku em karibin pirsgirêkên xwe pê çareser bikin. Lewma divê têkoşîna me ya îdeolojîk her demê bê meşandin.

Niha pirsgirêka em dijîn çi ye? Mînak, em têkoşînê dikin, em dev ji aliyê wê yê îdeolojî berdidin, rojek, du roj, heyvek, salek, em temaşe dikin pirsgirêkên me derdikevin. Çi ne ew pirsgirêkên me? Çalakiyên me bi ser nakevin, wendahiyên ne di cih de em didin. Jiyana me xerab dike. Bêuslubî, çetegerî, hizibgerî, komikparêzî, rev, jihevketin, ev hemû çêdibin. Em vê carê pê diêşin, em dibêjin: "Ka çima ev bi

serê me de hat!” Em dest pê dikin li çavkaniya wê digerin. Kî bû sersebebê ku ev tişt hemû hatin serê me û çalakiya me bi ser neket, me wendahiyên ne di cih de dan?

Gelek pirsgirêk derdikevin û em lê temaşe dikin ka çavkaniya wan çi ye. Em dibînin ku me têkoşîna xwe ya îdeolojîk rawestandiye. Her tişt di navenga(ortam) me de tevlîhev bûye. Ji ber ku têkoşîn tune ye. Çi fikrên dijberî hene hemû xwe îfade dikin: lîberalîzm, ligorîxwebûyîn û hwd. Ev dibe sersedema ku ew qas xerabî çêbibin. Eger em pîvanên îdeolojîk û yên gerîlatiyê careke din bigirin dest, wê demê wê çalakiya me bi ser bikeve. Ji şêwazê jiyana gerîla heta rengê wê, şêwazê tevgerê yê bicîkirinê, yê êrîşê, yê paşdekişandinê, ev tişt hemû pîvan in. Lê em temaşe dikin, dev ji van berdidin.

Dîsa tişta ku dihêle em li beramberî dijmin bihêz bibin çi ye? Rastiya me ya rêxistinî ye. Rastiya ku li ser esasê azadiyê pêkhatî ye. Lewra hevaltî, wekhevî, bi her awayî ew zelalbûna rêxistinî ne. Lê mirov lê temaşe dike, ew nemaye, hinek tiştên din pêyda dibin. Ev nahêle tu hemfikir bî, nahêle tu yek bî. Ji bo vê perçebûn çêdibe. Ji bo vê nêzikbûnên çetegeriyê û pirsgirêk derdikevin û hwd.

Ev pirsgirêk rêxistinê li beramberî dijmin lewaz dihêlin. Rêxistinê li beramberî dijminê wî lewaz dihêlin, bi xwe re xitimandinê pêş dixin. Niha mirov li vê xitimandinê temaşe dike, dema mirov li çavkaniyê vê xitimandinê bigere, mirov dibîne ku di çavkaniya wê de îhmalkirina têkoşîna îdeolojîk

heye. Yanî wê têkoşînê îhmal dikin. Dema mirov ew têkoşîn îhmal kir, wê demê exlaqê me tê çi wateyê em nema dizanin. Pîvanên me yên têkoşînê, jiyanê, çanda me çi ye, em nema dizanin. Em van hemûyan nizanin, ji ber ku têkoşîneke îdeolojîk di rastê de tune ye. Wê demê em ê li beramberî çi xwe bipîvin?

Em lê hayîl dibin û dibêjin wê demê rewş îhmalkirina têkoşîna îdeolojîk bûye. Wê demê em çi bikin? Em ê têkoşîna îdeolojîk di nav rêxistinê de bihêz bikin. Em perwerdeyan dest pê dikin, em platformên rexne û rexnedanê çêdikin… Hinekî em bi ser xwe ve tên, em xwe komî ser hev dikin, lê ji ber ku her dem têkoşîna me ya îdeolojîk tune ye, careke din em vedigerin rewşa xwe ya berê.

Lewra em lê dinêrin hinek krîz di nav me de kronîk bûne. Ji ber çi kronîk bûne, ji ber ku tu bi şêwazekî bingehîn ji bo ji wan krîzan derbas bikî nêzik nabî, tu demî nêzik dibî. Dibêje: “Me filan-filan milên xwe îhmal kir, ew baş nebû.” Divê em carek din li xwe vegerin. Em carek din li kesayeta xwe vedigerin, hinekî em bi ser xwe ve tên. Em hinekî xwe komî ser hev dikin, em hinekî bi xwe dihesin, hinek bawerî pêş dikeve, lê carek din em îhmal dikin. Carek din krîzên me weke berê vedigerin.

Ji bo ku em ji vê xelas bibin têkoşîna îdeolojîk heye, têkoşîneke mayînde ye. Her dem pêwîst e. Wisa bi pêvajoyekê ve girêdayî nîn e. Dema ku wisa bi nêzikbûneke

demî, demane tu bigirî dest, tu nikarî çareseriyên mayînde ji pirsgirêkan re peyda bikî. Demekê tu yê çareser bikî, lê piştî demekê wê cardin vegere, weke berê bibe.

Di nav rêxistinê de îdeolojî hêza parastina bingehîn e. Îdeolojî her tim rêka rast nîşanî mirov dike, her dem şaşitî û rastiyan ji hev cuda dike. Ji bo vê dema ku perspektîfên navgîna rêxistinî, yên îdeolojîk hebin, ew navgîn saxlem dibe. Lê dema perspektîfên îdeolojîk nebin ew navgîn ne bi tendurûstî ne. Ji ber çi? Ji ber ku bê pîvan e û pîvanên wê cuda ne. Mînak, têkoşîna îdeolojîk di nav tevgera me de demekî sekinî. Çi bû? Renge reng şêwazê jiyanê, yê rêxistinê di nav me de derketin. Me nekaribû mehkûm jî bikin, ji ber ku pîvanên em pê mehkûm bikin me nehiştibûn. Îdeolojî tune bû, xebata wê hatibû rawestandin. Ji bo vê dema te ji yekî re bigotiba: “Ev çewt e.” digot na ev li gorî min rast e. Ev li gorî min rast e, ev li gorî min rast e… Bi vî rengî çênabe, rêxistin parçe dibe.

Weke din îdeolojî moral û ruh peyda dike. Hêza çareseriyê peyda dike. Mirovê ku xwe ji aliyê îdeolojî ve her dem terbiye bike, xitimandinê najî. Baweriya xwe wenda nake. Yanî her dem li çareseriyê digere. Di wan aliyan de her dem girîngî heye ku mirov bibe xwedî îdeolojî. Wiha bi dewreyekê perwerdê, derxistina rojnameyekê, bi rengê henekwarî û henekî îdeolojî çênabe. Her dem divê navendên xebatên îdeolojîk yên weke dibistanên perwerdê hebin. Materyalên perwerdê divê hebin, her tim pêşketin bên şopandin, li gorî wê bersiv bên dayîn. Lewra divê

xitimandin tê de çênebe, rê ji xitimandinê re jî neyê hiştin. Lewra pêwîstiya hebûna îdeolojiyê divê her dem hebe.

Divê bi taybet xebata îdeolojîk ji ruhê demê ne dûr be, timî bi ruhê demê re be. Wer ne dogmatîk be, ne di nav qaliban de be, şênber, berbiçav û diyar be.

Bala xwe bidinê felsefe zagonên gelemperî pêk tîne. Mînak felsefe têkiliya di navbera made û ruh de tîne ziman. Felsefe têkiliya navbera însan bi zanistê tîne ziman. Felsefe van ferq û cudatiyan yanî qanûnên gelemperî esas digire.

Felsefeyek heye li ser esasê dogmatîzmê ye, ev felsefe di nav kîjan welatî de serwer be, di wî welatî de pêşketinên zanistî çênabin. Felsefeyek heye li ser esasê zanyarî, lêkolîn, hûrûkûrbûn û diyalektîkê ye. Ev felsefe li ku serwer be di wir de hemû qadên jiyanê pêş dikevin. Felsefe qanûnên bingehîn diyar dike. Lê îdeolojî ne wiha ye, îdeolojî tenê bi diyarkirina qanûnên bingehîn re namîne. Tenê bi diyarkirina wan qanûnan ve namîne. Hîn zêdetir berbiçav dike. Hîn zêdetir bi dem û cih ve têkildar e. Bi êş û azarên mirovan re têkildar e, bi şêwazê jiyana însanan ve têkildar e. Berbiçav e, parçeyek ji jiyanê ye. Îdeolojî tiştekî wiha ye, bi vî rengî li ber çav e, şênber e.

## Îdeolojî Li Gorî Tevgera Demê Xwe Nû Dike

Divê her dem têkiliya îdeolojiyê bi tevgera demê re hebe, bi ruhê wê re be. Dem ne tevgerek tenê ye, ne tê rawestandin, ne jî paş de dizivire. Tevgerek wiha ye ku nayê rawestandin. Hêzeke ku wê rawestîne jî tune ye, lewra dînamîk û zindî ye. Têkiliya vê bi tevgera civakê re jî heye, jixwe civak jî bi wî rengî ye. Civak jî bi tevger û zindî ye, dînamîk e. Ji bo vê, tespîtên me yên îro derbarê mijarekê de ji bo sibê ne derbasdar e. Ji bo îro dibe ku rast be, lê ji bo sibê dibe ku ne rast be. Ji ber wê sibê wê çi bi xwe re bîne nediyar e. Çiqas zanebûn, tişên nû,  îro dema ku em li ser tiştekî hikum dikin ka rast e, yan jî çewt e. Li gorî daneyên heyî yên di dest me de, li gorî nêrîna ku em tê de dibînin em hikum dikin. Mînak nêrîneke me heye, em di wir de dibînin filan tişt rast e, filan tişt şaş e. Lê sibê dibe ku asoya me ya nerînê firehtir bibe. Lewra tiştê îro em nabînin dibe ku sibê em bibînin. Ev dibe sedema ku em di hinek xalan de israr nekin. Bi taybetî jî tiştên bi zanistê ve girêdayî divê em li ser israr nekin. Em van ji tevgera demê re bihêlin. Lewra divê îdeolojî bi tevgera demê ve girêdayî be. Ji derveyî tevgera demê nemîne.

Mînak bala xwe bidin îdeolojiya dînê misilmantiyê yê beriya 1400 salî, 2000 sal berê jî Xiristiyantî, 3000 sal berê Yahûdîtî, ji aliyê hin kesan ve tê xwestin di roja me ya îro de bê pêkanîn. Îdeolojiyek bi ruhê demê re nemeşe, ew îdeolojî bi rastiya civakê re jî berevajî ye. Herwiha krîzên cidî bi

xwe re tîne. Civaka ku mezin dibe, ew her demê dixwaze bi pîvanan wê civakê heps bike. Ev nêzikbûneke dogmatîk e.

Di mîtolojiyê de jî gelek tiştên ku wiha tên gotin hene. Yekî zalim hebûye, textekî wî bi pîvan bûye. Ew pîvana textê wî standart bûye. Însan girtine û li gorî textê xwe pîvane. Dema ew mirov dirêj bûya, li gorî textê wî ew mirovên dirêj jê dikir. Eger kurt bibûya ew dikişand. Lê qet textê xwe di ber çavan re derbas nedikir. Weke çawa em bêjin nimra lingê wî çil nimre be, yan jî çil û pênc be, pêlaveke çil nimre bistîne. Lê nabêje ez ê pêlaveke çil û pênc nimre bistînim ji bo lingê xwe. Lê dibêje, ez ê lingê xwe jê bikim da ku pêlava çil nimre li lingê min bê.

Lewma dogmatîzm tevgera demê di ber çavan re derbas nake. Ji bo vê agahiyên xwe, teşedana xwe ya zîhnî li ser esasên guhertinên ku di demê de çêdibin nagire dest. Bi rengekî çors, jiberkirî li ser esasê veguhestinê her tiştê xwe çêdike. Ji nifşekî heta nifşê bi veguhestinê, lêpirsîn, rexne, di ber çavan re derbas kirin li gel tune ye. Tenê di nav de veguhestin heye. Weke çawa em bêjin bav û dayîk ji zarok re wiha gotiye, zarok jî wê ji zarokên xwe re wiha bêjin. Ev hemû jî tenê veguhestinên dogmatîk in.

Lê dema ev tiştên bi rêka veguhestinê bi rastiyê re berovajî dibin, wê çaxê dixwaze bi şêwazên çors xwe ferz bike. Em îro bala xwe bidinê selefî, yan jî îrtîcayînê îslamê çi dikin? Dema weke wan nebe dibêjin ev rewşek cuda ye. Di navberê de 1400 sal derbas bûne, şêwazê jiyanê û fikir

hatiye guhertin, rastiyên ku em nû dibînin hene. Ji bo vê em dixwazin wiha bijîn, lê ew fikrê kevn ê ku demê qet di ber çavan re derbas nakin, dibêjin ev tiştên hûn dibêjin nabe û divê hûn wek me bijîn.

Însan dema van nêrînên çors qebûl nakin, li hemberî wan çi dikin? Şîdetê bi kar tînin. Ev nêzikbûneke pir xerab e. Ji bo vê divê îdeolojî vekirî be, weke çawa tiştekî devê wê vekirî be û ne girtî be. Dibêjin, di dîn de lewh-î mehfûz heye. Lewh-î mehfûz çi ye? Lewhaya jiberkirî ye, weke berê çawa digotin, kî di jiyana xwe de çi bibîne li ser eniya wî, di çêbûnê de hatiye nivîsandin. Yanî dîmeneke û tiştên tê de qet nayên guhertin, ji guhertinê re jî nevekirî ye. Îradeya xwedê ye, îradeyeke mûtleq e, nayê guhertin.

Nêzikbûnên din ên weke di Îslamiyetê de weke yê Îmamê Xezalî heye, di zanist û felsefeya kevn de Arîsto heye, ev çi ne? Ev ji bo fikir û zîhniyeta însanan vê tiştê tînin ziman û dibêjin, zîhniyet ew qas e. Dema temam bû, tê girtin û mafê wan tune ye tiştekî din bigirin. Lê ya rastî divê îdeolojî tiştekî vekirî be. Yanî divê pûsûlaya wê berjewendiyên civakî bin û ji wê dûr nekeve. Azadî, parastin, zanistî û rêxistinkirina civakê be, pêwîst e pûsûlaya wê ev be.

Lê ev bi tevgera demê re li ser esasên peydabûna tiştên nû, bikaribe her dem xwe nû bike. Dogmatîzm her dem têk diçe. Mînak dema mirov fikreke dogmatîk bigire dest, ku ji rexneyan re nevekirî be, ji xwenûkirinê re nevekirî be, ew

fikir alozî û krîzê dijî. Ji ber çi wiha dibe, ji ber ku dem tê guhertin, fikir û şêwazê jiyana mirovan tê jiyîn, lê ew wek xwe dimîne! Ji bo vê êdî însan nema rastiyan di wî fikrî de dibîne.

Da ku baştir bê fêmkirin em bi mînakan bînin ziman: Marksîzm û Lenînîzmê gotin; Proleterya û birjûwazî tenê hene. Ev di nav nakokiyê de ne û li ser esasê nakokiyên wan proleterya çêdibe, bi vî rengî ber bi komunîzmê ve çûyîn çêdibe. Ev tespîtek e, lê hemû pêşketinên ku piştî wê çêbûn şaşîtiya vê tespîtê eşkere kir. Şaşîtiya wê ev bû ku tenê mijar birjuwazî û proleterya nîn in. Gundî, xwendevan û çînên cur bi cur hene. Di civakê de rengên cuda hene. Her kes nikare tenê di berçavka proleterya de temaşe bike yan jî bibîne. Her kes nikare tenê bi perspektîfên proleterya xwe îfade bike. Mînak jin, rast e ku kedkar e, lê di heman demê de jin e. Tenê bi felsefeya proleteryayê nikare xwe rave bike. Herwiha gundî, rast e kedkar e lê di encamê de gundî ye, dîndar e. Hemû nikarin xwe di wê çarçoveyê de îfade bikin.

Lewra eşkere bû ku helandina civakekê di nava çînekê de ne rast bû. Lê Marksîzmê di şexsê sosyalîzma pêkhatî de tu carî ew keys (firset) neda ku xwe di ber çav re derbas bike. Ev dogmatîzm e, tenê veguhestinê esas digire. Dibêje, Marks û Lenîn ev gotine û ev rast e. Di vir de qet lêpirsînê qebûl nake.

Lê belê agahiyên nû derdikevin û dibêjin heval ev tiştên hûn dibêjin di şênberbûna civakê de rastiya xwe îfade nake, yanî razber e. Gotineke wiha tu maneya wê tune ye. Wê demê ma tu yê bêjî bila civak xwe li gorî min biguhere? Di wir de endezyariya civakê derdikeve pêş. Gelek caran mirov dibîne gel ne bi razîbûna xwe hinek tiştan qebûl dikin, bi zorê qebûl dikin. Lê em temaşe bikin mirov bi razîbûna xwe diçin camiyê û nimêj dikin, dua dikin. Dema milet bi razîbûna xwe biçin camiyê, wê li wir dêr bi xwe bê girtin. Milet zûzûka dest ji şêwazê xwe yê hilberînê bernade. Mînak gundî ye û sê, çar pezên wî hene, dixwaze xwedî bike û bi vî rengî xwe xwedî bike. Lê tu dibêjî na divê tu bikevî nav sosyalîzmê. Wê demê teqez tu nikarî wî razî bikî.

Dema wiha dibe vê carê serlêdan li şêwazên şîdetê tên dan. Bi zorê li ser însanan tişt pêk anîn. Yanî zor jî bi xwe re pêkhatinên tendurûstî çênake. Zor çi çêdike; dejenerebûnê çêdike, diziyê, xerabiyê, bêbaweriyê, fitne û fesadiyê çêdike! Ji bo tu karibî van kontrol bikî, vê carê tu neçar î polîsan, îstixbaratê çêbikî, bi vî rengî birokrasiyê bilind dikî. Wiha tu çi li civakê dikî? Tu zept û reptê didiyê.

Ev hemû şêwazên çewt in, ji bo vê îdeolojî divê ji xwenûkirinê re vekirî be. Her demê însan bizanibe ku agahiyên wî bisînor in. Siberoj wê tiştên nû bi xwe re bîne, ji bo vê divê mirov jê re amade be. Li gorî wê xwe nû bike.

Em bala xwe bidinê, serdest dema ku dinêrin bi reng û şêwazê berê nikarin li civakê hikm bikin, xwe diguherin.

Lîberalîzmê pêş dixin, rengereng şêwazan tînin û pê guhertinan çêdikin. Çîna serdest her dem wiha dike.

Li vir gelek caran çîna bindest nikare xwe nû bike. Ji ber vê sedemê têkoşîna wan çi dibe, têkoşîna wan dişikê. Lewaz dimîne û li dijî serdestan nikare serkeftinê bi cih bînin. Ji bo vê divê îdeolojî wer ji dogmatîzmê heta dawiyê xwe dûr bixîne. Qaliban, jiberkirinê, veguhezandinê pêk neyne. Ji bo xwe lêpirsîn, rexne, hînbûn û nûbûnê esas bigire.

Yanî îdeolojî divê şênber be, tiştê ku got divê tiştên şênber îfade bike. Ne wek Sovyetê, bi zimanekî wiha neyê fêmkirin. Di îdeolojiyê de zimanê zelal û tiştên şênber gotin mijareke gelek girîng e.

## Îdeolojî Bê Wijdan Û Zanyarî Nabe

Xala din a ku di îdeolojiyê de esas bê girtin çi ye? Gelekî girîng e ku mirov li ser milê îdeolojiyê yê wijdanî û zanyariyê bisekine. Yanî îdeolojî divê du tiştên esasî bigire nav xwe. Wijdanê mirovan dewlemend bike û aqilê wan hişyar bike. Dema îdeolojî van karan neke, ew îdeolojî wê demê baş nameşe. Eger xebat û têkoşîna îdeolojîk di welatekî de nebe sersebeba yekem a dewlemendkirina wijdanê mirovan, firekirina aqilê mirovan jî nabe. Wê demê xebatên tên meşandin, xebatên lewaz in. Tu çiqasî pirtûk bixwazî biweşînî jî biweşîne, bila ragihandin jî bên kirin, rojname, form, çiqas propaganda, ajîtasyon hebin bila

hebin, eger neket xizmeta van tiştê me gotî, wê çaxê tê wê maneyê ku xebat lewaz e.

## Di Îdeolojiyê De Rola Aqil Û Wijdan Çi Ye?

Ev xal divê esas bên girtin. Niha mijara wijdan û aqil çi ye? Beriya her tiştî aqil çêkereke qayîşokî û nerm e. Bawer dike, tê guhertin, ji nerînan re vekirî ye. Lê belê di roja me ya îro de nerîn bi şêwazên cuda cuda derdikevin pêşberî mirov. Mînak, ragihandin ewqasî pêşketiye ku her însanek her roj mehkûm e ku gelek agahiyan bigire. Di vir de gelek agahî berjewendiyên te beralî dikin. Hemû jî aqilê însanan hedef dikin. Di cîhanê de hêza ragihandinê ya mezintirîn ya ku aqil hedef dike ye. Niha divê ev aqil bê parastin. Aqilê mirovan divê li hemberî beralîkirinên emperyalîzm û desthilatdariyê bê parastin. Dixwazin li ser mêjiyê însan serwer bibin û wan li gorî berjewendiyên xwe beralî bikin. Bi vî rengî mirovan bikin nav tevgerê, pêwîst e li hemberî van êrîşan mêjiyê însan bê parastin!

Bi çi awayî wê bê parastin? Bi dîwaran nayê parastin, Sovyetê dîwar çêkirin, lê nekarî mêjiyê însanan biparêze. Wê demê bi dîwaran nayê parastin. Bi zorê û îşkencê jî nayê parastin. Mînak, demekî li Çînê gotin em şoreşa çandê çêdikin û wiha gotin: “Yên stranên popê guhdar dikin em ê wan bikin girtîgehê.” Xistin girtîgehê jî. Gotin ên cilekî nizanim çawa li xwe bikin em ê bikin hepsê. Lê gelo encam

girtin? Na qet jî encam negirtin. Wê demê aqil bi van têgihîştinên çors nayê parastin.

Aqil bi çi tê parastin; bi peydakirina agahiyên rast tê parastin. Yanî li hemberî êrîşên çewt, dejenere, jirêderketinê, beralîkirinê yên berjewendiyên emperyalîzmê, dagirkeran û desthilatdaran tên meşandin, divê tu aqilê civak û neteweya xwe bi agahiyên nû yên rast tije bikî. Aqilê wê civakê bi agahiyên nû dagirî, bi awayekî tendurûstî tu tije bikî. Çewtitiya wî fikrê xerab tu nîşanî wan bidî. Ew tiştên xerab çiqas li dijî civaka te ye, divê tu wan baş eşkere bikî.

Îdeolojî peydakirina modela jiyanê ya nû ye. Bi zîhniyeteke vekirî, ne bi redkirinên çors tevbigerî; redkirina çors bi ser nakeve. Sovyet û Çînê red kir, lê mixabin bi ser neketin.

Îro jî eger em ji mirovan re bêjin heval vê muzîka xerab guhdar neke, wê bêje: Temam ez guhdar nakim. Lê wê biçe û guhdar bike. Li gel radyo heye, wê guhdar bike. Wê demê bi vî rengî çênabe. Ya girîng peydakirina alternatîfê ye. Dema ku tu fikrekî ji însan re bidî diyarkirin û baweriya wan pê bê û rastiya xwe tê de bibînin, xeleka xwe ya wendayî tê de bibînin, wê çaxê tu bi ser dikevî.

Ew jî divê tu di veguhestinê de ji xwe bawer bî. Tu zane bî, tu ji aliyê zanistî ve têr bî. Mînak li gelek cihan hevalên me propaganda dikin, lê bi xwe ji axaftinên xwe ne bawer in. Ji bo vê propaganda wan ji mirovan re bawerker nayê. Ji

ber vê yekê însan qebûl jî nakin. Yan jî dixwazin tiştên nû ji însan re bêjin, lê nizane, xwe perwerde nekiriye, xwe amade nekiriye. Ji bo vê di veguheztinê de lewazî derdikevin. Bi xumam e, nepenî ye û mirov tiştekî jê fêm nakin, nizanin ka çi ji wan re dibêje. Ji bo vê pêwîst e îdeolojî amûrên xwe yên karibe xwe bigihîne mêjiyê mirovan peyda bike. Ev di rexê mêjî de ye.

Milekî girîngtir heye ku ew jî milê wijdan e. Divê wijdan dewlemend bibe. Xebata me ya îdeolojîk pêwîst e bikeve xizmeta dewlemendkirina wijdan. Dewlemendkirina wijdan çi ye? Dewlemendkirina wijdan bilindkirina asta hesasiyeta li hemberî nirxan e. Bilindkirina asta hesasiyetê, şiyariyê li beramberî nirxan e. Dema ku li hemberî nirxan hesasiyeta mirov zêde be, wê demê mirov bi wijdan e. Dema ku hesasiyeta mirov lewaz be, wê demê ne bi wijdan e.

Îdeolojî çi dike? Têkoşîna îdeolojîk hesasiyeta mirov li hemberî nirxên wan bilind dike. Mînak, Kurdistan heye û dîroka wê heye, miletê Kurd çi dike? Miletê Kurd seferber bûye li polekî rast bê, li hestiyekî rast bê, li kevirekî nexişkirî rast bê, peykerekî rast bê, wiha bihizire û ji xwe re bêje: Ka gelo ez çawa biparêzim, na. Li şûna ku weke nirxekî netewî biparêze, lê mixabin ji bo bifiroşe wekî bazirganê (tucarê) berheman dixebite.

Ev bêhesasiyeta li hemberî nirxan e. Ne di wê zanebûnê de ye ku nirxên xwe difiroşe. Mînak, rojnameyeke Danîmarkayê carekê karîkatorê Muhemed çêkirin û

weşandin. Misilmanan dema ev dîtin li seranserê cîhanê çi kirin? Malên Danîmarka baykot kirin, êrîşî saziyên wan kirin, meş li dar xistin, kuştî çêbûn. Ev tişt hemû çêbûn. Lê yê me her roj ragihandina dijmin bi nirxên Kurdayetiyê henekên xwe dikin. Carna rojnameyên dijmin derdikevin, li sernivîsa wê dinivîse “Ker Kurd”. Rojnameya Starê li Tirkiyeyê ev manşêt avêtibû. Yan jî hin tiştên ji vê xerabtir jî hene. Lê Kurd ranabin û îsyan nakin! Ji ber ku hesasiyeta wan li hemberî nirxên wan lewaz e. Dibêjin: “Gotiye ker ma çi bûye.” Lê yek heye ku li ser gotineke wiha cîhanê dirûxîne!

Neteweyeke ku li ser nirxên xwe hakim, nirxên xwe derxistiye zanebûnê, dema ku êrîş li ser nirxên wan çêbûn dikarin xwe biparêzin. Xwe wiha fêr kirine. Ew cîhanê dirûxînin. Lê yên me xwezayî dibînin. Êrîş li ser nirxan çêdibe, lê li dijî wê têkoşîn nayê kirin. Ev tiştekî pir girîng e û divê em li ser van meseleyan rawestin.

Divê mirov li ser têkiliya îdeolojiyê ya bi aqil û wijdan re baş bisekine. Qadên îdeolojiyê hene, tu bi çi îdeolojiyê belav dikî û ji civakê re dikî mal? Bi ragihandinê, weşan, pirtûk, propaganda û bi van tiştan mirov dike malê civakê. Niha wê ev tişt li ser çi bisekinin? Wê bi çi awayî vê ji civakê re ragihînin û bi çi awayî civakê li dijî dijminê wan bi îrade bikin? Dema ku her tiştê me gotî bikeve xizmeta dewlemendkirina aqil û wijdanê, ev civak, aqilê wê bi agahiyên rast, bi zanistê bê perwerdekirin, karibe çewtî û başiyan ji hev derbixe, wê demê ew aqil ê civakê ye.

Lê di milê din de jî dewlemendkirina wijdan pêwîst e. Niha ev aliyê wijdanî ji bo me pir girîng e. Weke gelê Kurd, şoreşger, endamên tevgera têkoşîna azadiyê ji bo me pir girîng e. Gelek tişt hene ku bi me xwezayî tên. Lê divê tu carî ji me re xwezayî neyên. Sedema nexwezayîbûna van tiştan çi ye? Sedemên wê; di aliyê wijdanî de em ziwabûn an jî kêmbûnekê dijîn. Dewlemendiya wijdanê tune ye. Dewlemendiya wijdanê tê wateya ku zêdegaviyek biçûk be jî, li ser kîjan nirxên te yên neteweyî dibe bila bibe, divê mirov bersiva wê bi raeksiyoneke cidî bide.

Mînak, nirxên çandî, ziman, erdnîgarî, dîrokî, arkeolojîk, ekolojîk û çi dibe bila bibe, dema ku talan li ser çêbûn, êrîş li ser çêbûn, divê hingê ji aliyê însanên vê neteweyê û civakê ve bi reaksiyon û nerazîbûnên cidî bersiva xwe bibînin.

Wê demê îdeolojî çi dike, îdeolojî mirovan bi nirxên wan mezin dike. Nirxan di zîhniyeta mirovan de bi cih dike. Mînak, ez Kurd im, piştî vê jî dîrok, çand, ziman, erdnîgariyeke me heye. Ji derveyî van ji ber ku ev tiştên hevbeş in, di nav hemû Kurdan de xalên hevbeşiyê ne. Ji Kurdayetiyê wêdetir divê mirov ji xwe bipirse, gelo ez kî me? Gundî bim, karker bim, xwendevan bim, ciwan bim, mezin bim, jin bim, mêr bim, ger kî dibim bila bibim, ev taybetmendî li gel min hene. Ev jî hesasiyetan pêş dixe. Mînak, jinekê hesasiyetên wê ji yên mêrekî cudatir in. Mêrek hesasiyetên wî cudatir in, ciwan hesasiyetên wan ji yên mezinan cudatir in.

Lê eger civakek jin û mêrên wê weke hev bijîn, eger ciwan û mezinên wê wek hev bijîn, wê demê hesasiyeta wê civakê miriye.

Ciwan bê lêgerîn be, ciwan astengan ji pêşiya xwe raneke, qeydan neşkîne, jin lêgerînên xwe yên azadiyê tune bin, civak li hemberî nirxên xwe yên madî û manewî ne hesas be, wê demê ew civak miriye!

Ji bo vê divê em van tiştan biçînin. Ji ber ku civaka me hatiye talankirin. Lê pêwîst e em ji nû ve van hesasiyetên li hemberî nirxên netewî biçînin. Em di nav gelê xwe de şiyariyê pêş bixin. Gelek tişt hene şiyariyê pêş naxin û tam berovajiyê wê bêxemiyê pêş dixin. Mînak, em bala xwe bidinê di cihanê de hunermend, nivîskar, şêwazê qezencê ji bo xwe esas girtine. Yanî çiqasî pere qezenc dike, lê ne ku mirovan li hemberî nirxên wan şiyar û hesas dihêle. Ne jî hêza têkoşînê di însan de kûr dikin. Ruhê berxwedanê di mirovan de kûr nakin. Van qet esas nagirin, lewma ev kar ne karekî îdeolojîk e. Karê îdeolojîk ê ku wijdanê mirovan dewlemend neke, ne karekî îdeolojîk e.

Mînak, heke mirov di navgînekê de be û di wir de cinsiyetparêziya civakî hebe, mirov wê pir xwezayî bibîne, wê demê nirxên civakê bi mirov re gelekî lewaz in. Ji ber wê cinsiyetparêziyê xwezayî dibîne. Mirov dema vê nêzikbûna li dijî jinê weke zilm, înkar, avêtina derveyî civakê nebîne, wiha xwezayî dîtin, weke ku xwedê jin wiha dabe û wê bi vî

rengî bijî, mirov tu nerazîbûnê nîşan nede, ev nîşaneya lewaziya mirov a ji nirxên civakî û bêwijdaniyê re ye.

Dîsa eger di civakekê de ciwan bê aso bin, ne çalak bin, wisa di cihê xwe de sekinî bin, înzîwa ji xwe re esas girtibin, teqlîdkirinê esas girtibin, wiha mirov li hemberî van wisa tenê temaşevan bimîne, ev hemû îfadeya bêwijdaniyê ne.

Erdnîgariya mirov bê talankirin, lê tu nerazîbûnek li hemberî wê talanê tune be, ev bêwijdanî ye. Însan li ser însan desthilatdariyê bike, ziman bê înkarkirin, teşhîrên bi rêka rojname, radyo, TV'yê tên kirin, li hemberî wan bêdeng mayîn bêwicdanî ye. Mînak di roja me ya îro de hemû rêzefilmên Tirkan, ji yên îslamiyan bigirin ta yên dewletê, li ser esasên teşhîrkirin, înkarkirin û lînçkirina Kurdan çêdibin. Lê herî zêde ew rêzefilm li Kurdistanê tên temaşekirin. Ev bêwijdanî ye. Bêwijdanî ew e ku dema tu ji wê rewşa xwe ya xerab êdî zewqê bigirî. Nerazîbûna xwe nîşan nedî. Herî zêde rêzefilmên ku li Kurdistanê ji bo Kurdan biçûk bixin, lînç bikin, di heman demê de herî zêde li Kurdistanê tên temaşekirin. Ger miletekî din bûya, wê her roj meş bikira û gotibûya: Em vî şêwazê we yê weşana TV'yê boykot dikin û êrîşî buroyên wan bikira. Ev tiştên ha sedemên çalakiyan in, yên berxwedan û mafxwestinê ne, yên serhildanê ne. Lê li gel me nabin sedemên serhildanê.

Hîs dimire, mînak tu diçî û ji gundiyekî Kurdistanê re dibêjî: Tu bindest î, dijmin heye. Dibêje, na dijmin tune ye. Çima tune ye? Dibêje, ez mezin bûm kes dengê xwe nekir,

zarokên min çêbûn, diçin dibistanê û tên, diçim nav erdê xwe çandiniya xwe dikim, genimê xwe difiroşim, pemboyê xwe difiroşim, kes tiştekî ji min nake. Ka dijminê min? Mirov dikare ji vê re çi bêje, çima wiha nêzik dibin? Dijmin ew qas sînorê jiyana însanî daxistiye ku însan tiştê din nema dixwaze. Temam dibe ku weke jiyaneke biyolojîk tu dizewicî, zarokên te çêdibin, tu diçî nav erd, tu têyî, dixwî û vedixwî kes ji te re dengê xwe nake, lê ew tenê jiyaneke biyolojîk e. Yanî bi awayekî xwezayî weke jiyana lawiran e.

Lê derveyî vê ez Kurd im, welat heye, navê vî welatî Kurdistan e, gelek heye navê wî gelî Kurd e. Divê bi nirxên xwe yên neteweyî bijî, cil û bergên xwe yên neteweyî li xwe bike, xwe birêve bibe û hwd. Ev hemû tune ne, tunebûna van hemûyan jî weke egerên dijmintiyê nas nake. Nizane, ji ber çi van nizane? Ji ber ku li hemberî nirxên Kurdayetiyê hîs, şiyarî tune ye û gelekî lewaz e.

Lewra di gelek cihan de çewtiyên mezin hene. Li Hekarî li zarokekî didin û destên wî dişkînin, polîs wiha dikin, lê li Amedê û Meletiyê kes ranabe ser xwe! Li Dersimê tiştek wiha dibe, lê li Mêrdînê ji bo wê bersivê nadin. Ev ji bêxemiya li hemberî nirxan e.

Tecawiz çêdibin em pê nahesin. Sêrt bajarek ji bajarên kurdistanê ye û gelê wê ne dûrî me ye jî, lê bûyerên tecawizê li wir çêdibin. Kî wan bûyeran diweşîne? Rojnama Huriyetê diweşîne. Ne em diweşînin. Ji ber ku hesasiyeta zêde li hemberî tecawizê li gel Kurdan miriye. Dema ew

hesasiyet tune be wê demê wê çawa bibe, yanî tecawiz e, ma tecawiz çi ye.

Ji ber ku wiha fêr bûye, ji wan e ku ew tiştên tên kirin xwezayî ne. Dijmin tê û keçên Kurdan yanzdeh salî, dozdeh salî tecawiz dike, li gel Kurdan wer heçku tiştek nebûye. Pêta nerazîbûnê gur û geş nabe. Lê diviyabû ev bibûya sersedema ku hemû Kurdistan rabûya ser piyan, pêwîst bû jiyan bisekiniya. Lê ev çênabe.

Ji lewra têkoşîna îdeolojîk çi ye? Têkoşîna îdeolojîk bi însanan maf, jiyan, nirxên wan çi ne, divê van bi wan bidin naskirin. Nirxên jiyana însanî çi ne: Erdnîgarî, beden, mêjî, ziman, jiyaneke ekolojîk a rast, ev hemû nirx in. Ev hemû bi hev re nebin, însan bi awayekî tendurûstî nikaribe bijî. Zêdegaviyên li ser van, divê bibe sedema nerazîbûn, serhildan û berxwedanê. Têkoşîn îdeolojîk di vir de însanan bi xwe ve dide girêdan.

Lê em temaşe dikin tecawiz çêdibin kes nerazîbûnê nişan nade. Em dibêjin, li wir rojnameyên me hene, rojnameya heftane heye. Qanalên me yên weşanên TV hene. Kovarên me hene, meclîsên belediyê hene. Tu nabêjî ev hemû çîrok in, ji ber ku nerazîbûn tune ye, wijdan tune ye, ger ev nebin wê çi bikin? Wijdaneke hesas, şiyar, dewlemend li hemberî van zêdegaviyan karibe li ber xwe bide û pê bihese, şiyar bike, dema ev tune bin, her tişt xwezayî tê dîtin û kes nabêje, ev çi ye!

Gelek kes weke Tirkan difikirin, wek sîstemê difikirin. Mînak li Mêrdînê bûyera jinekê hebû, Rêbertî tim navê mexdûrbûnê lê dike. Ji aliyê çiqas însanên polîs mamûr, hatiye tecawizkirin, dema ev bûyer kete rojevê dijmin digot: “Wê bi kêfa xwe qebûl kiriye.” Çi têkiliya vê bi kêfê re heye? Ma temenê wê çend e ku karibe biryara xwe bide? Tu yê birçî bihêlî, biçûk bikî, lînç bikî, bi xwe ve girêbidî, dawiyê tu yê bêjî bi xwe û xwe qebûl kir, ma ez çi bikim. Çima hûn me dad dikin. Ev bêwijdanî ye. Ji bo vê îdeolojî nirxan bi mirovan dide naskirin. Her tişt daxistina ber çav e, hesasiyeta mirovan li hemberî wan nirxan bilindkirin e. Herwiha dema zêdegavî li ser van nirxan çêbibe da ku karibe bersiva xwe bide divê ev mijar esas bê destgirtin.

## Pêwîst e Îdeolojî Bi Rastiya Cih Û Demê Ve Girêdayî Be

Pêwîst e îdeolojî xîtaba hêzên zindî yên di civakê de bike. Yek ji peywirên îdeolojiyê ev e. Xîtab bike, divê îdeolojî şênber be. Bi rastiya demê û cih ve girêdayî be. Bi wî ruhî ve girêdayî be, eşkere be. Îdeolojî di gelek mijaran de bi taybetî di mijarên hesas de divê weke zarokan be. Çima divê weke zarokan be? Ji ber ku zarok rastgo ye, tiştan rast dibêje. Mînak dibêjin: Hinekan qral xapandine, gotine, cilên li te cilên pir rengereng in. Lê tenê yên biaqil wan cilan dibînin. Heke qral bêje ez cilên li xwe nabînim, wê demê qral bêaqil e. Lewra qral jî gotiye ez dibînim. Lê ya rastî cil li

qral tune ne, tenê destên xwe wiha lê dixîne û dibêjinê va me cil li te kir. Cilên li te hemû bi zêr û zîv hatine neqişandin. Lê tenê yên biaqil dikarin van cilan bibînin. Yên ne aqil bin nabînin. Pozbilindiya qral nahêle ku bêje ez nabînim û bêaqil bê dîtin, lewra gotiye ez dibînim. Gotiye divê hemû alem jî min bi van cilan bibîne. Milet jî ditirse ku bêje em cilan nabînin, ji ber ku dema bêjin em nabînin, wê bêaqil û dîn bên dîtin. Dema qral derdikeve her kes dibêje cilên qral pir xweşik in. Lê zarokek dibêje; 'qral tazî ye, bêcil e'.

Divê îdeolojî jî weke zarokan bê endîşe be.  Bê hesab li ber çavan û şênber be, eşkere be û bi dengê bilind tiştan bîne ziman. Ji bo vê bi bingeh e û tewîz tê de nayên dayîn. Di îdeolojiyê de bihêzbûn her dem pêwîst e. Di hinek xalên din de dibe ku nerm be, lê di hinek xalan de jî qet nerm nabe. Ji ber ku îdeolojî zelal e. Bi awayekî şênber xîtab dike.

Îdeolojî xwe di ser derdê gelan re nagire û ne tiştekî nediyar e. Mînak, gel birçî be birçîbûnê tîne ziman, sedemên wê tîne ziman. Gel bêrêxistinî be rêxistinê tîne ziman, ev rêxistin rêka çareseriyê tîne ziman. Gel nezan be nezaniyê tîne ziman. Derdên bingehîn ên di dereceya yekemîn de tîne ziman. Derdê wî gelî çi ye, wê tîne ziman. Divê îdeolojî bizanibe di asta yekemîn de xîtabê kê dike. Pêwîst e xîtabê hêzên zindî yên di civakê de bike. Di civakê de hêzên zindî hene, hêzên zindî yanî dînamîkên civakê yên bingehîn in. Yên ku civakê bi xwe re pêş dixin, bi xwe re dimeşînin. Yên

ku gavên yekemîn davêjin, pêşketî ne û bihêz in, mezin û çalak in. Îdeolojî wan hêzan esas digire.

Hêzên zindî di civakê de çi ne? Ev hêz dem bi dem tên guhertin, lê di roja me ya îro de di civakê de em jin û ciwanan esas digirin. Em bi vê bawer in ku dema pirsgirêkên jin û ciwanan hatin çareserkirin heta asteke bilind pirsgirêkên hemû civakê jî tên çareserkirin. Em bi vê bawer in ku dema jin û ciwan di meşa ber bi azadiyê de mesafeyeke pir cidî girtin, tê vê wateyê ku ew navgîn jî ji wan qeydên xwe xelas dikin. Ji pirsgirêkên xwe rizgar dibin.

Bi çi ev dibe? Bi teqlîdkirinê nabe, di aliyê fizîkî de li xwe nêrînê jî nabe. Çanda populîst jiyandin na, ev ne pîvanên azadiyê ne. Bi pîvanên azadiya rasteqînî heta kîjan astê dibe yê/a xwe, fêrker e, yanî berhemê dide? Em hem di aliyê fikir de, hem jî di aliyê madî de derdixin pêş.

## Pêşengên Îdeolojiya Azadiyê Jin Û Ciwan in

Jin û ciwan di têkoşîna çareserkirina pirsgirêkên civakê, yên neteweyî, siyasî, çandî û civakî de rol dileyîzin. Pîvan ev in, ne teqlîdkirin e. Gelek kes dibêjin; pîvanên civakan jin û ciwan in. Lê dest pê dikin jinê dikin meta û tazî dikin. Ciwanan jî dikin ucûbe. Pelik melikan bi xwe ve dikin, tiştên balkêş li xwe dikin. Bi vî rengî dibêjin pirsgirêkên me xelas û çareser bûn. Li Tirkiyeyê wiha pirsgirêkan şeklî digirin dest.

Îdeolojî, hîna zêdetir şênber e. Ji bo vê di welatekî de eger ciwan xemsar bin, beramberî pirsgirêkên civakê yên neteweyî, însanî, ekolojîk û bi gelemperî xemsar bin, wê demê di wî welatî de têkoşîneke îdeolojîk nîne. Divê têkoşîna îdeolojîk xîtabî ciwanan bike. Dema xîtabî ciwanan bike wê ciwanan biguhere. Di aliyê baş de wê biguherin. Heke guhertin tune be, dev ji xwe berdan û teqlîdgerî hebe, wê demê xebatên îdeolojîk tune ne.

Dîsa heke bi jinê re zanistiya cins çênebû, nakokî nejiya, nebû xwedî perspektîfên azadiyê, wê demê di wir de xebateke îdeolojîk tune ye. Ji ber ku me gotiye parametre yan jî pîvana pêşketina civakê, rewşa jin û ciwanan a di nava civakê de ye.

Eger jin û ciwan di asteke lewaz de bin, wê demê xebatên îdeolojîk tune ne. Yan jî xebata îdeolojîk bi rengekî çewt tê meşandin. Mînak, em îro dibînin em weşanê TV'yê dikin, ger beramberî weşana me jin û ciwan xemsar bin, bêelaqe bin wê demê ev weşana me ne di çarçoveyeke îdeolojîk de dimeşe.

Eger em rojnameyê derdixin û em weşana wê dikin, heke xwendevan û kekdarê vê rojnameyê bi giranî ne jin û ciwan bin, jin û ciwan heke di vî welatî de li hemberî vê rojnameyê xemsar bin, wê demê ew rojname rola xwe naleyîze. Ji ber çi? Ji ber ku extiyar xerab in, na! Ji ber ku zarok jî xerab in na, ne ji bo vê ye. Bêguman rola wan jî heye. Lê belê di têkoşîna civakî de di her dem û demekê de hinek derdor û

dînamîk derdikevin pêş. Bi taybetî jî ew qismê ku azadiya xwe di ya civakê de dibînin derdikevin pêş.

Eger bi giranî nerehetî heye, ciwan zêdetir bi wan nerehetiyan dihesin, çima? Ciwan bi temenê xwe nû ye, yanî gavekî nû ye. Lê belê civaka kevneşop a destpot dîsa bi taybetî jî sîstema dagirker nahêle ciwan wê dema xwe bijîn. Wan hinekî paşdatir dide jiyîn. Sîstema desthilatdar nahêle ku bi wan lêgerînên xwe re kilît bibin. Wan paş ve dikişînin. Ev nerehetiyekê çêdike, lê çima? Ciwan jî zû bi vê nerehetiyê dihesin. Çima zû pê dihesin? Ji ber ku di encamê de ciwan ji nifşeke nû ye, çalak e û zêdetir bitevger e. Zêdetir dînamîk e, xwe neçar nabîne ku weke bav û dayîkên xwe bijîn.

Çavkaniya ciwanan a agahiyan cuda ye û naxwaze weke bav û kalên xwe bijî. Lê dinêrin ku nikarin ji qonaxekî çipî qonaxekî din bibin. Ji bo vê her dem ciwan rêberê îsyanê ne. Divê mirov vê taybetmendiya wan ji bîr neke. Rêberên îsyanên civakî her dem ciwan in. Welatê ku nifûsa ciwanan tê de bihêz be, ew welat zêdetir dikarin îsyanê bikin. Di roja me ya îro de jî hîna ev nêzikbûn nehatiye guhertin.

Li hemberî hemû rengên bêexlaqiya emperyalîzmê em îro dîsa temaşe dikin, hêza herî zêde radîkal a li ber xwe dide ciwan in. Li Yewnanistan, Ingilîstan, Îspanya û Tirkiyeyê, dîsa li gelek cihan ciwan têkoşîna civakê kirine û hêza dînamîk a wê civakê ne.

Ji ber vê dijmin dixwaze di zemînê sîstema xwe de ciwanan rehabîlîte bike. Li gorî xwe xwedî bike, mêjiyê wan li gorî xwe ayar bike. Niha bi taybet dixwazin wan bi ferdiyetparêziyê, ezeziyê, perwerde bikin ku ew li beramberî pirsgirêkên civakê xemsar bin.

Niha em jî li ser esasê rizgarkirina civakê derketine holê. Dema ku ev fikrê me cihê xwe di mêjiyê ciwanan de nebîne, çi feydeya vî fikrî heye! Ev fikir ger nikare xwe bigihîne dînamîka esasî yê têkoşînê, çi feydeya wî fikrî heye? Tu feydeya wî fikrî tune ye. Lewra em metodê girîngtirîn, herî balkêş û serkeftî yê ku em fikrê xwe pê bigihînin ciwanan esas digirin.

Jin îro di aliyê agahî û zanistê de şexsiyeta xwe derdixe zanebûnê. Dinihêre ku tiştê li ser hatiye gotin kêm e, biçûk e, bêaqil e… nîne. Jin wiha nîne, zanist jî vê îspat dike. Ji bo vê dixwaze hevpeymaneke nû deyne. Heke pir bi rengekî çors vê bibêje, ji sîstema desthilatiya zilam re vê dibêje: Rast e te ev qas sal ew qas tişt gotin, te hukmê çewt li ser min kir, li ser vî esasî te ji navenda jiyana siyasî û polîtîk ez dûr xistim. Lê niha eşkere bû ku ew argumanên te çewt in. Ew egerên te çewt in, di aliyê zanistê de nikarin xwe îspat bikin. Wê demê pêdivî bi hevpeymaneke civakî ya nû heye.

Ev daxwaz û xwestekên jinê li ser esasên wekheviyê ne. Wê demê wekheviyê dixwaze. Lê temaşe dike ku bi sîstema siyasî ya kevn ev nabe, ji bo vê li dijî sîstemê hêzeke berxwedanê ye. Yanî pirsgirêkên civakê bi yên jin û

ciwanan re bûne yek. Îro ji her kesî zêdetir jin û ciwan bi sîstemê re di nav nakokiyê de ne. Bi sîstema desthilatdar re di nav nakokiyê de ne.

Ji bo vê, îdeolojiya azadiyê, ew îdeolojiya ku karibe di dereceya yekemîn de di dilê jin û ciwanan de bi cih bibe ye. Karibe xîtabê wan bike. Ev pirsgirêkeke esasî ye. Ji ber vê divê em li ser bisekinin. Mînak, hinek xebatên me hene, li hinek cihan ciwan qet pê re eleqeder nabin. Li Rojavayê Kurdistanê xebata me bi çend dayîkên ku temenê wan şêstî û jor ve ne, çend bavê şehîdan û gerîlayan ve maye. Helbet ev mirov ne xerab in, dilsoz in girêdayî ne. Lê belê dînamîkbûna wan qels e. Nikarin rêxistinê çêbikin. Dikarin ji te re dua bikin,  derkevin û tevî çalakiyekî bibin. Dikare di aliyê madî de jî bi te re alîkariyê bike, dikare li te guhdar bike, lê eger tu bixwazî civakê biguherî, bixwazî li dijî sîtemê îsyanê bikî, wê demê divê tu jin û ciwanan bigirî nav xwe.

Di wir de divê tu rêxistinê bikî. Heval dibêjin em diçin malan, ciwanên wan hene lê em wan nas nakin. Nêzikî me nabin, xwe di nav şoreşê de nabînin. Çima wiha dibêjin? Tolaz û beredayî ye, ev ne eger e da ku tu wan birêxistin nekî. Mijar ne mijara lumpeniya wî ye. Pirsgirêk ew e ku ew xebatkar bi xwe ji metodên gihandinê kêm agahdar e. Dewlemendiya te ya şêwazan nîne. Xwe bê perwerde hiştiye û statukoparêz e. Tu fêrî şêwazekî bûyî û naguherî, têkoşînê nakî, di şêwaz de dewlemendiyê çênakî. Ji ber wê tu çors î, bêruh î, ziwa yî û ji ber wê ciwan nêzikî te nabin.

## Divê Têkoşîna Îdeolojîk Xîtabî Hêzên Zindî Yên Civakê Bike

Mixabin ku gelek xebatkarên me xwe lêpirsîn nakin, lê civakê lêpirsîn dikin. Ew jî tiştekî çewt e. Têkoşîna îdeolojîk ew têkoşîna ku tu bizanibî xîtabî hêzên zindî di civakê de bikî. Pêwîst e, ew esas bê girtin. Dema te ew bi rêxistin kir, wê hingê pêşeroj bi te re ye û tu natirsî.

Lê niha li Bakurê Kurdistanê li Gever, Hekarî û Şîrnaxê em çiqasî dengan digirin, ev hemû ne pîvanên esasî ne. Tenê tiştek pîvan e, heger te jin û ciwan di asta herî jor de hildabin bin ewlekariyê. Wekî din tu rabî di nav gel de ew qas girseya te hebe, lê yê jin û ciwanan bi dest dixe Fethulahî bin nabe. Ev mezheb in, di Kurdistanê de dibistanan vedikin, kursê quranê vedikin, atolyeyan vedikin, weqfan çêdikin, jin û ciwanan ji bin bandora fikrê azadiyê derdixin. Di zemînê xwe de bi cih dikin û fikrên xwe enjekteyî mêjiyê wan dikin. Siberojê tu yê binihêrî ku tu û ciwan ji hev cuda ne û tu wan nas nakî, ew jî te nas nakin. Tê binihêrî ku êdî ji te fêm nakin, ji ber ku fêrî xîtabeke din bûne. Ji bo vê divê teqez ev serarerast bibe!

## Me Li Gorî Tevgera Zeman Îdeolojiya Xwe Nû Kir

Têkoşîna îdeolojîk têkoşîneke ji dogmatîzmê dûr e. Gelek rewşên wiha jî hene. Dema em dibêjin çand, exlaq, bawerî, ev tişt hemû yên nîqaşê ne. Demekê di nav me de nîqaşek

hebû. Ew nîqaş jî ew bû; ka di nav me de di aliyê îdeolojîk de guhertin hene, yan tune ne? Di rexê îdeolojiyê de, mirov qala nirxandin û perspektîfên me yên desthilatiyê, dewlet û milîtantiyê bike, em hatine guhertin. Na heke tu behsa perspektîfên me yên exlaq, lêgerîna azadiyê, çand û civakbûyînê bikî, em nehatine guhertin. Babeta bingehîn jî ew e. Ji bo vê di wan mijaran de guhertin çawa tê fêmkirin. Yanî guhertinên li ser esasê înkarkirina berê, ne înkarkirina pratîka derbasbûyî. Di aliyê civakî de, di aliyê nirxên civakî de, di aliyê pîvanên exlaqî de em di aliyê îdeolojîk de di heman astê de ne. Lê îdeolojiya me pir dewlemend e, bi agahiyên nû me tije kiriye. Me xwestiye di aliyê îdeolojîk de bi tevgera zeman re gavan bavêjin. Lewra em rexnegerî, guhertin û nûbûnê esas digirin.

Lê paradîgma me hatiye guhertin, tenê ne ku guhertiye, me berovajî kiriye. Paradîgmaya me ya kevn îflas kir. Çi bû paradîgma? Paradîgma; yanî di aliyê siyasî, sosyolojîk de nêrîna te ya di derbarê dewlet û îqtîdarê de, nêrîna te ya derbarê dewlet û civakê de û li ser esasê vê nêrînê tu tercîha xwe dikî. Tu ji çi hez dikî, ji çi aciz î, çi qebûl dikî yan jî red dikî, ev paradîgmaya nû ye.

Paradîgmaya me ya berê li ser esasê dewleta netewe, çîn û şîdetê bû. Wê paradîgmayê îflas kir, lewra me dev jê berda, me paradîgmayeke nû esas girtiye. Ew paradîgmaya nû tê çi maneyê? Nêrîna me ya li ser dewlet, şîdet û çînan hatiye guhertin û tercîhên me cuda bûne. Tercîhên me yên têkoşînê û avakirina alternatîfan êdî cuda bûne.

Lê îdeolojiya azadiyê her dem weke xwe ye û berdewam dike. Dema em dibêjin îdeolojî li dijî dogmatîzmê, di heman demê de li dijî xwe înkarkirinê ye jî. Li dijî asîmîlasyon û teqlîtgeriyê ye. Lewra di aliyê îdeolojîk de li ser esasên perspektîfên nû, em zêdetir di felsefeya azadiyê de kûr bûne. Hîna baştir em dost û dijminên xwe ji hev diyar dikin. Em hîna pirtir di zanebûna nirxên xwe yên exlaqî, civakî û çandî de ne. Li hemberî van nirxên xwe em şiyartir bûn. Em ji bo têkoşîna azadkirina wan nirxan amadetir bûne. Perspektîfên me yên îdeolojîk ev in.

Di encamê de îdeolojî zemînek e ku însan xwe tê de çêdike, xwe tê de ava dike û pêk tîne. Naskirina xwe ya ji cîhanê re, xwezayê re, civakê re, çînan re ji her tiştî re amade dike. Kesayeta xwe çêdike. Ev kesayet ji çi hez dike, ji çi aciz e diyar e. Ev rojane nîne, demkurt jî nîne, mayînde ye. Bi hinek nirxan ve heta mirina xwe girêdayî ye. Tewîzan nade, israr dike.

Lewra îdeolojî ji bo her kesî pewîst e, lê belê ji bo şoreşgeran hîna zêdetir pêwîst e. Îdeolojî ji bo mirovên şoreşger hêza rêvebir a hundirîn e. Yanî liv û tevgera wan a rojane diyar dike. Liv û tevgera wan a hundirîn di jiyanê de diyar dike. Dema ku di aliyê îdeolojîk de mirov xwe têr kiribe, li gorî wê liv û tevgera mirov a jiyanê dê hebe.

Lê bala xwe bidinê hevalek rojek bêuslubiyê dike, roja din tiştekî din dike. Gelo ji ber çi wiha dike? Sedem ew e ku di hundir de ji îdeolojiyê mehrûm e. Xwe têr nekiriye û pêk

neaniye. Ji bo vê dema ku bi tena xwe dimîne, mirov temaşe dike di nobedariyê de radizê, dema heval şiyar dikin, nema radizê. Ev ne nêzikbûneke îdeolojîk e. Nêzikbûna îdeolojîk ji bo ku filankes te dibîne, yan nabîne û ji bo wê tu xerabiyê dikî yan nakî nayê kirin. Lê dema mirov xerabiyan neke ji ber ku tu bi xwe naxwazî, lewma tu xerabiyê nakî. Çima, ji ber ku te xwe di zemîneke îdeolojîk de pêk aniye. Di heman demê de ew zemîn pîvanên xerabî û rastiyê ji te re diyar kirine, te jî bawerî bi wê îdeolojiyê aniye.

Wê demê ew îdeolojî dibe perçeyek ji jiyana te, dibe disîplîna te ya hundirîn. Îdeolojî ew e, bi derfetan ve girêdayî nîne. Bi îradeyê ve girêdayî ye. Tu werî û bêjî; "Derfetên min hebûn min kir, derfetên min tune bûn min nekir." Nêzikbûneke wisa di îdolojiyê de tune ye.

## Îdeolojî Her Tişt Bi Îradeyê Ravekirin e

Îdeolojî îrade ye, her tiştî bi îradê rave dike. Mirovên xwe di warê îdeolojîk de ava kiribin her tiştî bi îradê rave dikin, ne bi derfetan. Nabêjin: "Heval ez çûm filan derê û rêxistinê destek neda min, ji ber wê min kar nekir." Ev ne nêzikbûneke îdeolojîk e. Mirovên îdeolojîk ji derfetan zêdetir îradeya xwe lêpirsîn dikin. Serkeftin û binkeftinê bi hêza îradê ya ku nîşan daye rave dikin. Heger binkeftî bin wê demê îradeyeke ku têrê bike nîşan nedaye. Ji ber ku bi vî rengî ravekirin, tê wateya ravekirina rastiyan. Bi derfetên

madî, mercan îdeolojî nayê ravekirin, bi îradê diyar dike. Bi gelemperî weke terîfê îdeolojî tê çi wateyê?

Mirov divê vê têkoşîne bi çi şeklî bimeşîne? Dema ku mirov têkoşîna îdeolojîk dimeşîne mirovê çi esas bigire. Jixwe me bi xetên stûr be jî nîşan dabû.

## 3- NASNAMEYA ÎDEOLOJÎK

Di cîhanê de kesimên cuda cuda ji bo desthilatdariya xwe mayînde bikin çi argumanên îdeolojîk yên zîhnî dimeşînin? Nasnameya îdeolojîk girêdayî nêzikbûna her çîn yan jî her hêzekê ye. Di hinek qadên civakê yên siyasetê de, bi exlaq û çandê ve girêdayî çêdibe. Yanî pîvanên hêzekî yên exlaqî, baweriya wan a çandê ku esas digirin, bi gelemperî wisa nêzikbûna ji mijarên bingehîn ên girêdayî civakê re ne. Mijarên azadî û rizgariyê, ew nasnameya îdeolojîk a wê hêzê diyar dike.

Ji bo vê em bala xwe bidinê her serdemê di dîrokê de rola îdeolojiyê derdikeve pêş. Ji ber vê nasnameyên îdeolojîk mirov dikare wiha di navbera wan de ferq û cudatiyê jî deyîne. Niha dema em behsa serdema feodal dikin, mirov di wir de jixwe rastî nasnameya wê ya îdeolojîk tê û dibîne ka çawa diyar dike. Nasnameya îdeolojîk a feodalîzmê, nasnameya xwe ji xwe re bi dînên yekxwedayî rave kirine. Yanî dîn bû nasnameya îdeolojîk a serdema feodalîzmê. Mînak dema Misilmantî û Xiristiyantiyê. Ev jî dema ku Ewrûpa di çaxa navîn de bû wiha nasnameya xwe rave dikirin.

Di serdema Misilmantiyê de mirov lê temaşe dike nasnameya îdeolojîk dêr e yan jî mizgeft e (camî), yanî ji dîn e. Yanî dînê Îslam û Xiristiyantiyê bûye. Jixwe dîn ji bo çaxa feodalîzmê çênebûye. Divê mirov vê jî baş bizane. Mînak Muhemed dema behsa Misilmantiyê kir ma got bila

feodalîzm serwer bibe! Tiştê wiha qet negotiye, serweriya feodalîzmê ne ji ber vê ye. Îsa dema behsa Xiristiyantiyê kir, behsa dînekî nû, wekhevî û biratiyê kir. Ev tişt hemû anîn ziman. Ne ji bo ku feodalîzm serwer bibe Xiristiyantî hilhat.

Lê belê çîna serdest di dîrokê de ji bo ku hukmên xwe berdewam bikin, berfireh bikin timî ji xwe re li sedem û fikran digeriyan. Li çêkerekî zîhnî digerin. Lêkolîna hinek tespîtan dikirin, da ku çi bikin, wiha lêkolîn û lêgerînên xwe dimeşandin? Ev hemû ji bo egeran ji serweriya xwe re peyda bikin, dikirin. Bihaneya serweriya serdema feodalîzmê di wê demê de dînê yekxwedayî bû. Îslamiyet û Xiristiyantî bû. Lewra dîn kirin nasnameya xwe ya îdeolojîk.

## Fermîbûna Îdeolojiya Çaxa Navîn

Kengê dîn weke îdeolojiyekî resmî hate qebûlkirin, yan jî qebûl kirin? Dema ku hêzên serwer dîn di nava tewazinekê de bi berjewendiyên xwe re çêkirin, dîn fermî qebûl dikin. Îslamiyetê li gorî berjewendiyên xwe eyar dikin û herwiha Xiristiyantiyê jî li gorî berjewendiyên xwe eyar dikin. Ne ku dîn weke çawa heye, lê li gorî berjewendiyên xwe dîn qebûl kirin. Ji ber ku Îslamiyet û Xiristiyantî jî, gelek nirxên baş di nav de hene.

Berî her tiştî li dijî xerabiyê, paşverûtiyê bang in. Mantiqekî nû ye, zîhniyeteke nû esas digirin. Li gorî wê meseleyan şîrove dikin û ev jî li gorî wê çaxê ji mirovan re

tiştekî nû û baş e. Ya rastî lêgerîneke heqîqetê ye, di heman demê de ligerîneke azadiyê ye. Beramberî krîzan û xerabiyê di nav civakan de derdikeve. Bangawazî û helwesteke nû ye, lewra tiştekî baş û nû ye.

Lê belê feodalîzm wek dewlet û desthilatî, dema ku Xiristiyantî yan jî Misilmantiyê dike nasnameya xwe ya îdeolojîk, berî her tiştî Xiristiyantî û Misilmantiyê jî, ji cewherê wan ê wekheviyê, li dijî sîstmbûnê û însanî serad dike. Teşeyekî nû didiyê, li gorî berjewendiyên xwe teşeyekî didiyê, dejenere dike. Di moxila berjewendiyên xwe re derbas dike.

Mînak Xiristiyantî û Misilmantî jî weke di roja me ya îroyîn de nebûn. Lê Xiristiyantî çawa bû? Xiristiyantî di dema Îsa û hawariyên wî de dest pê dike. Wan ev doz belav dikirin. Behsa xwedayekî dikirin, wekhevî, edalet û biratiyê dikirin. Behsa van tiştan hemûyan dikirin.

Ya rastî jî di gelek aliyan de ev tiştên nû bûn. Bi taybetî jî ji bo însanên kole, bindest, jin, çîna feqîr. Ev hemû li vî dînî xwedî derdikevin. Yanî qebûl dikin. Lê belê îqtîdar li dijî wî dînî ye. Îqtîdara siyasî li dijî wê ye. Bi taybetî jî wê demê çaxa serdema Împaratoriya Romayê bû. Roma li gelek cihî hikm dikir. Li Afrîka, Asya û Ewrûpayê hikm dikir. Navenda wê împaratoriyê Roma bû, Îtalyaya niha bû. Weke împaratoriyeke mezin a cîhanî li gelek cihan hikm dikir. Rast e ne tena xwe bû, weke din jî dewlet û împaratorî hebûn, lê Roma împratoriyeke mezintirîn bû. Roma

demxeya xwe li ser wê serdemê da. Di aliyê endezyarî, leşkerî, fikir, di her aliyê de demxeya xwe li ser çaxekî sax hişt. Dem dirêj kir, gelek qadên cîhanê kirin bin destê xwe. Bi vî rengî bi nav û deng bû.

Xiristiyantî bi rengekî rasterast em bêjin, li dijî Romayê derneket. Lê Romayê di hilhatina Xiristiyantiyê de ziyana xwe dît. Çima ziyan dît? Ji ber ku Xiristiyantiyê behsa wekheviyê dikir. Dema behsa wekheviyê bike, wê demê çi dike? Dewleta li ser esasên mijokdarî, kedxwarî û koledariyê di aliyê fikrî de tê teşhîrkirin. Egerên wê ji dest wê tên girtin. Fikrên nû ji bo kesên bindest dibin wek çavkaniyeke ku pê li dijî koledariyê û zilmê serî hildin.

Ev hilhatin Romayê diêşand, lewra jî li dijî Xiristiyantiyê bû xwedî helwest. Xiristiyan digirtin, dikuştin, îşkence dikirin û hemû rengê xerabiyê bi wan dikirin. Ev hetanî sala 312'yan wiha bû. Ger em piştî mirina Îsa û bi demekî heta hewariyên wî xwe birêxistin kirin û fikir belav dikirin esas bigirin, sê sed sal Xiristiyantî qedexe bû. Heta wê çaxê li Romayê Xiristiyantî qedexe bû. Dihatin girtin, îşkence li wan dikirin. Ew dikuştin û davêtin ber heywanên dirinde. Sîstema desthilatdar kesên Xiristiyan wiha dikirin.

Lê PZ'ê di salên 325'an de Romayê Xiristiyantî weke dînê xwe yê fermî qebûl kir. Împratorê Romayê yê bi navê Constantîn, civînekê li dar dixe. Civîn bi navê Konseya Karê Dinî tê lidarxistin û di vê civînê de Constantîn, dibe serokê konseyê. Dewlet bi vî awayî dest davêje Xiristiyantiyê. Ji

nîmetên dewletê tiştan didin rêveberên rahîban, bi vî awayî wan jî dikişînin gel xwe.  Wan kom dikin û di wir de dest pê dikin û Xiristiyantiyê di ber çav re derbas dikin. Weke dewlet Xiristiyantiyê qebûl dikin, dibêjin; "Em ê dînê Xiristaniyê bikin dînê dewletê yê fermî." Li gorî wê zagonan jê re datînin. Li ser vî esasî divê Xiristiyantî ji nû ve di ber çav re bê derbaskirin. Ji nû ve li ber çavan re tê derbas kirin. Taybetmendiyên wê yên mirovhezî yên li dijî zulmê, taybetmendiyên wê yên şoreşgerî îhmal dikin. Heta çavên xwe ji wan taybetmendiyan re digirin û li şûna wê tiştên wiha bi rastiya dewletê re ne berovajî bin, dewletê bihêz bikin û rewa bikin esas digirin.

Gelek tişt wê demê di Xiristiyantiyê de tên rûniştin. Ji bo nimûne ew nerîna ku dibêje, Îsa xwedê ye, yan jî kurê xwedê ye, nêzikbûna ji jinê re, herwiha nêzikbûna ji gelek tiştan re wê demê di dînê xiristiyantiyê de tên tespîtkirin. Beriya ku dînê Xiristiyantiyê bibe dînê fermî cuda bû, lê piştî dibe dînê fermî cudatir dibe. Beriya fermî bibe her kes bi taybet jî yên Xiristiyan li Îsa weke însanekî dinihêrin.

Ev guhertin tê çi wateyê? Dewletê Xiristiyantî qebûl kir, lê gelo ji ber çi qebûl kir? Dewlet êdî nedikarî weke berê bimeşe, nerazîbûnên li dijî dewletê zêde dibûn. Ev dewlet hem di aliyê fikrî de, hem jî di aliyê ruhî de diviyabû xwe nû bike. Lê dev ji sîstema xwe jî bernedida. Wê sîstema desthilat dixwest weke dewlet hebe. Lê ji bo ku hebûna xwe berdewam bike, hêzeke nû jê re pêwîst bû. Ew hêza nû çi bû? Ew hêz fikrê Xiristiyantiyê bû.  Di vir de eger tam weke

prensîbên Xiristiyantiya resen qebûl bikin, wan taybetmendiyên wê yên li dijî zulmê, ji bo wekheviyê jî wê qebûl bikirina. Heke dewletê ev tiştên Xiristiyantiyê esas bigirta wê çaxê dewlet bi xwe dê nebûna. Lewra ji bo vê çi kir? Xiristiyantî ji taybetmendiyên wê yên baş û cewherî dûr xistin, li gorî berjewendiyên dewletê teşe danê.

Dînê Xiristiyantiyê bi vî rengî bû fikra dewletê. Dewleta feodal a li Ewrûpaya Rojava di serî de li Roma, Bîzans, heta dewletên Ewrûpî yên din jî di Çaxa Navîn de hemû bi fikrê Xiristiyantiyê, bi dêrê xwe dida meşandin û bi rê ve dibirin.

Misilmantî jî bi heman awayî ye. Misilmantî bi xwe weke prensîb dema derdikeve, ji bo çi derdikeve? Da ku tiştên xerab sererast bike. Xerabiya ku di nava sîstemê de heye, zilm û zordariya ku heye ji holê rabike. Bi xwe weke mizginiyekî ye ji bo însanan. Di demeke kurt de her kes wî fikrî dibihîze û tevlî dibe. Mirov ji wî fikrî bawer dikin û qebûl dikin. Ji ber çi hinde mirov bawer dikin û qebûl dikin? Ji ber krîzên civakê yên heyî, bê exlaqiya ku di civakê de heye, însan bêzar kiribûn. Însan jî jixwe li xelasiyekê digeriyan. Ji ber ku di asteke bilind de tengezariyek dijiyan, însanan nema dikarîn tehemul bikin û li xelasiyê digeriyan.

Ji nişkê ve dinihêrin ku fikrek derdikeve û behsa edaletê, wekheviyê û zanistê dike! Tiştê nû tîne ziman. Jixwe mirov di rewşeke lêgerînê de bûn, ji nişkê ve ji bo pirsên wan bersiv tên. Bersivên madî yên di jiyana mirov a rojane de tên dayîn û pirsgirêk tên çareserkirin. Mînak dibêjin filan

kes li ser filan kesî/ê zulmê dike, ev heram û ne baş tê dîtin. Divê her kes weke hev bin. Dînê Îslamê di bin dirûşmeya “hemû mirov birayên hev in” de bi pêş ket.

Yek jî pirsên ku xweda çareser dike hene. Yanî kê em çêkirine û ji bo çi em çêbûne. Ev hemû tiştên bi xweda tên ravekirin in.

Dewleta desthilatdar vê rewşê dibîne. Nikare li pêşiya wê raweste. Astengan datîne, kuştinê dike û îşkencê dike, lê nikare li pêşberî wî fikrî raweste. Çima, ji ber ku di civakê de krîz heye û yek tê û rêka çareseriyê nîşan dide, ji ber vê yekê mirov weke pêl bi pêl, lehî bi lehî tevlî vî fikrê nû dibin. Jixwe desthilatdar nikare pêşî li vî fikrî bigire. Lê dikare çi bike? Dikare wî fikrî ji rêka wê derbixe.

Ji bo vê Îslamiyet jî ji cewherê xwe derxistin. Rêbertî jî vê dibêje, bi vî rengî jixwe tiştên madî jî vê îspat dikin. Piştî mirina Muhemed tu Îslamiyet li holê nemaye. Li şûna wê desthilatdarên Ereban dest datînin ser desthilatiyê û Îslamiyetê jî ji bo desthilatiya xwe pê rewa bikin dimeşînin. Mînak, Emewî, Ebasî hemû bi vî rengî ne. Heta roja me ya îro jî Îslama siyasî, desthilatdarên ku pala xwe didin Îslamiyetê bi vî rengî berdewam dikin.

Lewra piştî wê bûye înkarkirin, zilm, dogmatîzm û xerabî. Niha ev bû weke nasnameya îdeolojiya feodalîzmê. Feodalîzm pêvajoyeke sekinî ye û piştî wê rê ji pêşketinê re nahêle, disekinîne. Jixwe dîn jî dogma ne, mutleq in, rê ji nîqaşan re venakin. Di dîn de zêde nîqaş çênabin. Ji ber çi

wiha ye? Ji ber ku her tiştî bi xwedê rave dikin. Her tiştê tê gotin dibêjin, xwedê çêkiriye. Ji ber ku xwedê wiha xwestiye wiha ye. Lewra mafê kes ê nîqaşê nahêle. Têkiliya di navbera mirovan de jî bi xwedê rave dikin. Dibêjin, filan kes xwedê ew feqîr çêkiriye, bêvan kes xwedê ew dewlemend çêkiriye.

Eger yek zilmê dibîne, dibêjin wê demê ev çarenûs e, xwedê wiha daye û li wê cîhana din dê rehet bijî. Feodalîzm jî sîstemeke bi vî rengî ye, sîstemeke ku nîqaş tê de lewaz e, mutleq e, qraliyet in, monarşî ne, axa ne û beg in…

Ev kesayetên wiha textbilind, ji bo ku baş in, zane ne, xizmet kirine bûne xwedî meqam? Na, ne ji ber vê bûne desthilatdar. Ji bo ku bavên wan desthilatdar in ew jî dibin desthilatdar. Yanî li ser esasên werîstê (mîratxuriyê) ye. Tiştekî baş ji bo civakê nekirine.

Dema ku mirov sosyolojîk civakê nîqaş bike, alemê bêje ka bi çi mafî ev bûye qral yan jî rêveber. Lê fikrê dînî rê li ber vê nîqaşê digire û dibêje, mafê te yê tu vê nîqaşê bikî tune ye. Xwedê wiha kiriye û di wir de mutleqiyet heye.

Ji ber vê Serdema Feodalî wek nasnameya îdeolojîk dînê yekxwedayî ji bo xwe esas girt. Di Rojhilata Navîn de Îslamiyet û li Ewrûpa jî Xiristiyantî û bi vî rengî bû nasnameya îdeolojîk a feodalîzmê. Di wir de di aliyê zanistî de pêşketin çênabin. Mizgeft û dêr tên avakirin. Heman tiştên jiberkirî tên dubarekirin, kes nikare ji jiberkirinê derbas bike yan jî derbikeve. Yê derbikeve, bi hikmê dêrê tê

darizandin, yan jî bi hikmê dewleta Îslamê tê darizandin. Li Ewrûpayê Engîzîsyon hebûn, yanî dadgerên çavdêriyê. Ger kî hinekî jî lêgerînên wan ên cuda çêbibûna, ew digirtin û dikuştin. Agir bi canê wan dixistin û ew dişewitandin.

Mînak, di wê serdemê de gelek însanên zanyar, jin, gelek kes wiha kuştin. Ewrûpa di Çaxa Navîn de bi sedhezaran jin kuştin. Çima wiha dikirin? Digotin efsûnger in. Çawa bûne efsûnger? Pirtûkek derxistine, papazekî hinek nîşan dane, gotiye: Ger jinek wiha be, yan jî wiha be efsûnger e, hemû xerabiya li ser rûyê cîhanê ji wan çêbûye. Ev di qilifê jinan de xwe diveşêrin. Lê di bingeh de efsûnger in û bi şev difirin diçin cihekî din û xerabiyan çêdikin. Planan datînin û li ser rûyê cîhanê planên wan tên meşandin. Herwiha xerabiya ku çêdibe hemû bi destên wan pêk tê. Papaz hinek nîşane jî dane diyarkirin. Bejin, reng, nêzikbûna wan û liv û tevgera wan daye nîşandan. Lewra ji her kesî re gotiye dema we yeke wiha dît, ew efsûnger e.

Jixwe jin weke qismekî civakê tê teşhîrkirin. Li hemberî jinê pêşdarezîn û nêzikbûnên biçûkxistinê hene. Di encamê fikrê dînî de her kes li hemberî jinê bi guman e. Ji ber vê yekê dema yek li derdora xwe binêre û jinekê li gorî wan wesfên ku papaz di pirtûka xwe de, di derbarê efsûngeran de daye nîşandan û nivîsandiye dibîne tavilê dişopîne û îxbar dike. Dêr jî wan digire. Dema wan jinan digire, îşkence dike, wan dikuje. Hinek ji ber ku îşkencê tehemul nakin, lewra qebûl dikin ku efsûnger in.

Ne tenê li ser xwe qebûl dikin, dibêjin: Tenê ez nîn im hinekên din jî weke min hene. Girtina wan jinan êdî weke xelekê dibe. Bi sedhezaran jin li welatên Ewrûpa, li Elmanya, Fransa, Îngîltere, Emerîka… her dera ku Xiristiyan lê hene bi sedhezaran jin wisa tên kuştin.

Dîsa zanyarên (alim) di zanista astronomiyê de gotin 'cîhan gurover e, li dora rojê digere, ne roj li dora cîhanê digere' hebûn. Ev tespîtên zanistî wê demê kirin û li gorî mantiqê dêrê çewt bûn. Lewma dêrê bi rengekî cîhan nas dikir û ji ber vê gotin ev li dijî dêrê derdikevin û ew jî kuştin. Di sala 1600'î de Brûno wek alimekî mezin ji bo van îdîayên xwe hate kuştin. Hate şewitandin. Wek wî bi sedan wiha bûn. Ji ber çi ew qas şîdet hatiye meşandin? Sedem ew e ku hinek qalib nîşan dane û gotine her tişt ev e. Yên derveyî vê bifikire wê çaxê derveyî sîstemê derdikeve. Çima li hemberî van fikrên xwe hinde şiyar in? Eger di ilim de tiştên nû derkevin, di civakê de tiştên nû derbikevin, tiştên heyî çewt bên nîşandan, wê demê sîstema siyasî jî dikare bê guhertin! Wê demê desthilatdarî jî dikare bê guhertin. Desthilatdarî ji bo ku xwe mayînde bike her tiştî dide rawestandin. Fikir, zanist, her tiştî dide rawestandin û dibêje yê li dijî van derbikevin sûc dikin û li dijî îradeya xwedayî derdikevin.

Mislimantiyê jî di Rojhilat de ev tişt kir. Ji bo alim û felsefeger di dewleta Îslamî de dijîn, rû bi rûyê îşkence, lêdan û kuştinê dihatin û ew davêtin sirgunê. Mirov di wê

demê de lê temaşe dike gelek alim û zana çawa dikin, zanebûna xwe vedişêrin da ku dewleta serdest razî bikin.

Wê çaxê nasnameya feodalîzmê ya îdeolojîk dîn e. Dîn li ser esasê dogmatîzmê tevdigere. Li ser esasên mutleqiyetê, ew mutleqiyeta di dîn de. Li beramberî wê mutleqiyeta hikmê monarşî, qraliyeta di van dewletên him di Rojhilat de, him jî di Rojava de yên destpot e, hemberî wê ev e. Yanî dewleta desthilatdar sedemên hebûna xwe ji ku digirin, ji fikrê dogmatîk digirin. Lewra di wê serdemê de bêguman hinek tiştên wiha civakî jî hene. Desthilatdarî bêguman her tiştî ji bo berjewendiyên xwe dike.

Lê belê, însanên ku dîn ji bo rêxistinkirina jiyana xwe esas digirin jî hene. Lewra em bala xwe bidinê ruh û exlaq di wê serdemê de zêdetir li pêş e. Ji roja me ya îro bihêztir e, bi taybet jî exlaq. Nêzikbûnên ruhî li pêş in. Ev jî heta astekê têkiliyên di navbera însanan de li ser esasekî rast pêk dianî. Lewra dînên yekxwedayî milê wan ê dogmatîk ê xizmeta sîstemê kirine hene. Lê milên wan ên exlaqî, qismî be jî karîbûye têkiliya di navbera însan de heta astekê li ser esasên rêzgirtin, alîkarî û hevdu qebûlkirinê çêbike.

Mînak hinek tişt hene ku di dînê Îslamê de heta roja me ya îro jî tên meşandin. Hinek elimandinên xerab, reşkujî, kuştin tên redkirin. Mînak dizî, tecawiz hwd, tiştên wiha rengereng tên redkirin. Dîsa alîkarî û hevşêwirandin qismî be jî tê de heye. Lewma bi navê zekatê, gelek tiştên din jî alîkarî tê kirin. Lê di bingeh de ev hemû jî krîza heyî asteng

nake. Di esas de wek nasnameya sîstema desthilatdar mirov dikare behs bike.

## Nasnameya Kapîtalîzmê Ya Îdeolojîk Çi Ye?

Ji bo feodalîzmê nasnameya wê ya îdeolojîk ev bû. Lê di esas de yê ku em dixwazin berfireh li ser rawestin kapîtalizm e. Nasnameya îdeolojîk a kapîtalîzmê çi ye?

Nasnameya kapîtalîzmê ya îdeolojîk mirov hîna bi kûranî li ser bisekine wê baş bibe. Ji ber çi? Ji ber ku di kapîtalîzmê de pir alî hene, yên bi taybetî di têkoşîna îdeolojîk de rewşê tarî dikin, mirov nikare zêde rastî û çewtiyê ji hev derbixe.

Kapîtalîzm bi vî rengî îdîa dike ku ew serdemek e ku mirovahiyê qeydên xwe şikandine, hevsarê xwe qetandine û ber bi nûbûn, zanebûn, başî û pêşketinê ve dimeşin. Kapîtalîzm wiha xwe dide diyarkirin. Heta wiha îdîa dike ku beriya kapîtalîzmê her tişt paşverûtî bû, kevneperestî bû hovîtî û nezanî bû. Her tişt bi kapîtalîzmê re serûbinî hev bûye, însan ketiye rêka rast û zanistyê. Jiyana madî pêş ket, jiyana ruhî pêş ketiye ya fikrî pêş ketiye. Kapîtalîzm weke sîstemeke çareseriyê xwe dide nîşandan. Sîstema xwe ji bo çareserkirina hemû pirsgirêkên mirovahiyê dide nasîn.

Vê yekê jî bi gelek rê û rêbazan dide nîşandan. Yanî ji her sîstemên din zêdetir di destê kapîtalîzmê de amûr û rêbazên ku karibe rastiyê veşêre hene û tiştên nerast weke

çawa rast in diyar bike. Ev derfet di destên wê de hene. Ji ber van taybetimendiyên kapîtalîzmê, girîng e mirov li ser rastiya wê bisekine, da ku mirov fêm bike.

Nasnameya kapîtalîzmê ya îdeolojîk bi rengekî bingehîn xwe dide ser sê xalên bingehîn. Ev Rêbertiyê di paraznameya Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê (DMME) de li ser esasên sê beşan daye nîşandan. Gav bi gav li ser kapîtalîzm û modernîteya kapîtalîst kûrbûna xwe çêkiriye.

**Nasnameya Bingehîn A Îdeolojiya Kapîtalîzmê**

Yek jê fikrê zanistî ye, duyemîn ferdiyet e, ya sêyemîn jî humanîzm e. Ev her sê jî xalên bingehîn ên nasnameya îdeolojîk yên kapîtalîzmê ne.

Beşa Yekemîn, Fikrê Zanistî;

Ji yekê em ê dest pê bikin; fikrê zanistî. Kapîtalîzm li Ewrûpayê di kîjan serdemê de derket? Dema ku fikrê zanistî li Ewrûpayê pêş diket kapîtalîzm derket. Yanî êdî dêr, îlahiyatê, dîn nema dikarî bersiva hinek tiştan bidin. Lewra fikrê zanistî pêş diket.

Fikrê zanistî çi ye? Ji bo ku tu agahiyekî rast bigirî tu li Încîl û Quranê nanihêrî. Tiştê xwedê ji te re gotî na, yê bav û kalan ji te re gotî na, tu bi xwe tecrûbe dikî, di laboratûarê de, di lêkolîn û lêgerînê de, bi lêpirsîna aqil tu digihîjiyê. Bi

lêpirsîna aqil tu digihîjiyê. Fikrê zanistî ev e. Yanî ne ew fikrê ku hatiye veguhezandin, ne ku hinekan ji te re gotiye, ne di Quran û Încîlê de hebûye, yan jî xwedê gotiye û fermana xwedê ye. Fikrê zanistî, yê ku li ser esasê lêkolîn û lêgerînê ye. Li ser esasê lêhûrbûn û bi tecrûbê çêbûye. Êdî fikir wê li ser vî esasî bê destgirtin.

Lewra weke destpêk di vî aliyê de di dawiya sedsala 16. de, di sala 1580, 1590 hetanî 1600'î, di wê serdemê de yên pêşengî ji vê tevgerê re kirin kî ne? Ji wan Francis Bacon, Descartes bûn. Bacon dibêje: "Tiştê ku ceribandin îspat nekin, divê em weke rastiyê lê temaşe nekin." Yanî heger em bi filan tiştî bawer in, wê demê ceribandin çi dibêje. Mirov dikare bêje tecrûbe esas tê girtin.

Ev peyva tecrûbeyê weke gotineke ji rêzê ji mirov re tê, ji ber ku em rojane tiştan tecrûbe dikin. Lê em bala xwe bidinê dema em di bin serweriya dogmatîzm û qaliban de mezin dibin, ew wêrekiya ku em tiştan tecrûbe bikin li gel me namîne. Lewra di wê demê de li Ewrûpa kes cesaret nedikir ku tecrûbeyan bike. Ji ber ku fikrê jiberkirî hebû. Tiştên ku xweda û Încîlê gotî hebûn. Ma di encamê de tu ji xweda bêtir dizanî! Ji ber vê wêrekiya tecrûbê tune bû.

Wî çi kir, got; em ê bi rêka tecrûbê bigihîjin rastiyê. Mînak, eger bixwazin bigihîjin filan tiştî û di derbarê wê de bigihîjin qenaetekê, divê em tecrûbe bikin. Mînak av dibe hilm bi çi rengî, bi agir ev pêk tê. Wê demê em tecrûbe bikin. Yan jî tiştên ku di nav qeşayê de bin xerab nabin. Wê

demê em tecrûbe bikin. Ev tişt bi tecrûbê çêdibin û jixwe bixwe tecrûbe jî dikir. Francis Bacon bi xwe jî di encamê tecrûbekirinê de mir. Çawa kir; goşt di şertê sar de tecrûbe kir da ku xerab nebe, li ser vê tecrûbe kir. Mînak mirîşkeke serjêkirî wê di nav berfê de tecrûbe bike, wek niha jî qeşemxane (buzdolabı) û tiştên wiha tune bûn, diviyabû bi xwe di zivistanê de bibe ber sermayê. Lewra diviyabû bi xwe jî biçûba û kontrola wê bikiriba. Bi vî rengî gelek serma xwar û lê bû nexweşiyeke giran û mir. Lê dema mir jî gotina wî ya dawiyê ev bû: “Tecrûbe bi ser ket.” Di oxira tecrûbê de ruhê xwe jî li ser da û mir. Lê tecrûbe bi ser ket. Bi vî rengî Francis Bacon mantiqê xwe serwer kir.

Dema em dibêjin Francis Bacon, wê demê ew ne şoreşger bû, ne feqîr bû, ne kedkar, ne jî li dijî desthilatdariyê bû. Lê belê metodên zanistî derdixe. Bi xwe jî mirovekî xwedî nav û deng e, li Îngîltereyê nêzikî desthilatdariyê ye. Bav û kalên wî jî wiha nêzik in, ji malbateke wiha burokrat ên nêzikî desthilatdariyê ne. Her dem wiha bû, dibe ku cih bi cih ji bo hinek pirsgirêkan hatibin dadgerkirin û hatibin avêtin jî, lê dîsan jî hatine destgirtin. Weke malbat bi giştî ji çîna jorîn a arîstokrat in. Lê bi fikrê xwe çi kir? Rê ji tecrûbê re vekir. Êdî zanyar ji wê xalê û şûnda nema bi jiberkirinê razî dibûn.

Ji ber ku êdî tecrûbeyan dikin, digihîjin encamên nû. Her ku tiştekî nû tecrûbe dikin digihîjin encamên nûtir. Dema tu wan encaman di jiyanê de pêk tînî, asta jiyanê bilind dibe.

Însan rehet dibin, amûr û gelek tiştên nû bi destên wan dikevin.

Dîsa nêzikbûnên Descartes ên aqil û gumanê hene. Bi guman li her tiştî dinêre. Lewra dibêje: "Ez filan tiştî wiha bi dest bigirim, ne ku ji min re hatiye gotin. Divê ez wê tiştê di ezmûna aqil re derbas bikim ka aqil qebûl dike yan qebûl nake." Li ser vî esasî nêzikbûneke wiha hişmendîparêz di naskirina rastiyan de derdikeve pêş.

Ev serdem li Ewrûpayê bû serdemeke nû. Serdema tecrûbê, ya aqil, hişmendîparêzî û zanistperestiyê. Ev serdema zanistî, di her qada jiyanê de dest pê kir; di matematîkê de, fizîk û biyolojiyê de, di hemû qadên jiyanê de hate destpêkirin. Tiştên nû derketin. Her ku lêkolîn kûr dibûn, tiştên nû derdiketin pêş.

Her tiştên nû derdiketin, eşkere dibû ka heta kîjan astê dogmatîzm, dêr, fikrê xwedayî çewt e, heta kîjan astê gel di nezaniyê de hiştiye. Êdî li dijî wan nerazîbûn çêdibûn, ew fikrên kevn dihatin redkirin.

Ji bo vê tevgera fikra zanistî ya di serdema 16. û şûn de dest pê kir, tevgereke ji îradeya xwedayî serbixwe bû. Lêgerîn û lêkolînên însan ên serbixwe esas dihatin girtin.

Ev di gelek aliyan de baş e. Lê kîngê xerab dibe? Dema ku dibe nasnameya îdeolojîk a kapîtalîzmê xerab dibe. Ew zanyar li Ewrûpayê bi peran nedixebitîn, ji bo zanistê dixebitîn. Mînak ew kesayetên hazir bûn serê xwe jî didan û

dihatin kuştin. Di vê astê de fedakarî hebû, ne ji bo peran dixebitîn, lê ji bo pêşketina mirovahiyê û destkeftiyên wan dixebitîn.

Dema kapîtalîzm bû desthilatdar çi kir? Got, xwedê, dêr, Încîl û Tewrat hemû vala ne. Îlim bingehîn û her tişt e. Lewra zanistê dixin bin berjewendiyên xwe. Kîmya, biyolojî, fizîk, matematîk, hemû berhemên wan weke çawa ku karxane çêbike, çawa sinaî çêbike û berhema xwe pêş bixe. Bi vî rengî desthilatdariya xwe weke çawa kûr bike, çawa bike bin yekdestiya xwe. Da ku wiha kapîtalîzm hikmê xwe li ser civakê serwer bike.

Ji bo vê em bala xwe bidinê em ji vê zanistê re fikrê zanistî dibêjin, lê em jê re dibêjin, ne zanist e, zanistperestî ye. Ev zanistperestî çi ye? Yanî zanista ku ji azadiyê dûr e. Yanî zanista ne ji bo zanistê kar dike, ne di nava lêgerîna azadiyê de ye. Ew zanista ku sînorên lêgerîna xwe di çarçoveya berjewendiyên çîna serdest de digire dest e. Yanî sînorên lêgerîn û lêkolîna xwe di çarçoveya berjewendiyên çîna serdest de hebs dike. Zanistperestî têgihîştineke bi vî awayî ye.

Em bala xwe bidinê Rêbertî dibêje: Ez ne li dijî zanistê me, ez li dijî zanistperestiyê me. Ne li dijî dîn im, li dijî dîngeriyê me. Ne li dijî maşîn û amûrên navgîniyê me, li dijî maşîngeriyê me. Her tiştê dikeve bin yekdestiya berjewendiyên çîna serdest û xerabiyê bi xwe re pêş dixe.

Mînak maşîn tiştekî baş e, bê maşîn mirov nikare ji mesafeyeke dûr biçe ya din. Em tu demê ne li dijî tiştên dikevin xizmeta mirovan bûne. Lê tiştê xerab maşîngerî ye, maşîngerî çi ye? Maşîngerî sektoreke li ser esasên kar û qezencê ye. Pêdiviya te hebe, yan jî tune be, mirov temaşe dike mirov dikevin pey modelên vê salê, yan sala din. Wiha diyar dikin ku ev ji bo ciwanan e, ev ji bo jinan e, ev ji bo mirovên serkar in, ev ji bo yextiyaran e û ev ji bo biçûkan e… Yanî ji bo xercdariya di hundirê civakê de pêş bixe û qezenc bike, van nêzikbûnan pêş dixin. Wisa kar dikin, weke çawa civakê bişêlînin. Rengereng maşîne, teşeyên wan pêş dixin bê ku pêdiviyeke civakê yê cidî jê re hebe. Ev berhemê maşîna ye, lê mixabin ku dikeve xizmeta sîstema desthilatdar.

Lewra zanist bixwe pêdiviyeke însanî ye. Însan bê zanist nikarin bijîn. Însan bîr dibe, ji beriya hezaran salan hewldanên însan yên zanistî hene. Heger mirovan kevirek ji bo xwe tûj kiribe, ew ji bo wan zanist e. Mîtolojî zanist e, dîn zanist e, ev hemû fikir in û lêgerînên ji bo rastiyê bibînin in. Ji bo vê bê zanist însan nikare bijî. Zanist pêdiviyeke însanî ye. Lê zanista ku bikeve yekdestiya desthilatdariyê, zanista ku kadro ji bo sîstemê çêbike, ew ne zanist e, ew zanistperestî ye.

Di bingeh de zanista rast, divê li dijî sîstemê be, ji ber ku zanist li tiştên nû digere. Sîstem statûko ye. Sîstem çi ye? Sîstem xwe ava dike û xwe diparêze. Yanî muhafezekar e. Lê zanist ne muhafezekar e. Zanist digihîje astekê û dinêre

ku ew ast ne bes e, ji wê astê xwe çipî astekî din dike. Tu carî dawiya wê nayê, her demê tiştên nû dizane, timî li pey tiştên nû ye. Li pey azadiyê ye. Ji bo vê, însanên ku bi zanistê re mijûl dibin divê her demê bi sîstema desthilatdar re nakokiyên wan hebin.

Lê di roja me ya îro de em lê temaşe dikin ku bi rengê artêşan însan û zanyar di bin xizmeta sîstema desthilatdar de ne. Em dikarin ji vê re çi bêjin? Em dikarin bêjin ku ev zanistperestî ye.

Kapîtalîzm li gorî feodalîzmê zanist esas girt, lê ji bo aramiya civakê esas negirt. Ji bo tundkirina desthilatdariya xwe, hikmê xwe, zanebûna civakê kir bin yekdestiya xwe. Berhemên zanistê ji bo kar û qezencan ji xwe re esas girt.

Ji bo vê dema ku nasnameya îdeolojîk a kapîtalîzmê tê nîqaşkirin û mirov dibêje yek ji bingehê nasnameya îdeolojîk a kapîtalîzmê fikrê zanistî ye, ya rastî bi mirovan fikrê zanistî rast tê. Fikrê zanistî tiştekî li xweşiya mirov pê tê. Lê nêzikbûna kapîtalîzmê ya ku ji zanist re diyar dike, ka heta kîjan astê nêzikbûneke ne zanistî ye, nêzikbûneke zanistperestiyê ye û li ser esasê ku li gel xwe bihêle, bi kar bîne.

Ji bo vê hişmendîparêzî (aqilcîtî-rasyonalîzm) û zanistperestî (îlmcîtî) weke gotin yan jî têgîn dema em hişmendî, hişmendîparêzî, zanistî û zanistparêztî digirin dest divê mirov wan ji hev cuda bike. Dema em weke têgîn digirin dest çi tê bîra me? Tişta tê bîra me ev e, zanistî û

xebata aqil a ku navenda wê Ewrûpa û Rojava ye, zilamê bi rengê xwe spî derxistiye, tavilê ev tê bîra me. Yanî hişmendîparêzî û zanistperestiya ku navenda wê Ewrûpa ye, Rojava ye, Bakurê Emerîka ye, li ser esasê xwe navend esas digirin. Ew agahiyên ku gihanê weke rastiyeke mutleq esas digirin. Ev jî encama lêkolîneke wiha bi gelemperî ya mirovahiyê na, encama hewldaneke ji aliyê zilamê spî ve hatiye kirin e. Yanî ne encamên lêkolînên hemû civak gihîştiyê ye. Tenê çînek cihê xwe tê de digire û ne civak. Lewra di wê zanistê de desthiltdarî heye, serwerî heye, nijatperestiyeke biyolojîk heye. Desthilatiya zilam heye, ji bo vê ne zanista azad e, lê zanistperestî ye. Ji bo vê ne aqilê azad e, hişmendîparêzî ye. Weke têgihîştin mirov wiha bigire dest wê rastir be.

Ji ber vê tiştê ku îro em nîqaş dikin û li dijî wê derdikevin di esas de ev e! Ne ku em li dijî zanistê ne, mînak carna dema em dibêjin ev nêzikbûneke ne zanistî ye, zanistperestî ye, hişmendîparêzî ye, hinek kes dibêjin PKK li dijî zanist û aqil derdikeve. PKK heta asta dawiyê bi aqil û zanistê re ye. Ji bo xwe metodên zanistî esas digire. Lê PKK zanistê tenê di çarçoveya agahî û zanistiya zilamê spî yê ku di Rojavayê Ewrûpa, Bakurê Emerîka dijîn de nagire dest! Ew ji zanistê re nêzikbûneke yekdestî ye, lewra em wê red dikin.

Bingehê Din Ê Nasnameya Kapîtalîzmê Teşkîl Dike Ferdparêzî ye;

Esas cewherê nasnameya îdeolojîk a kapîtalîzmê ferdparêzî ye. Ferdparêzî esasê wê ye. Lewra kapîtalîzm heta dawiyê ezeziyê derdixe pêş. Ji bo ferd, weke maf, kesayet, qada tevgera wê ye. Ji ber ku bi taybet di dema kevn de, di serdema feodalîzmê de, di serdema ku dogmatîzm dînê yekxwedatî tê de serwer bû, ferd heta asta dawiyê dihate înkarkirin. Civaka kevneperest, desthilatdarî li ser ferd heta dawiyê serwer e. Tevgera ferd, çûn û hatina wî/ê, teşegirtina ferd, şêwazê jiyana wî/ê hemûyî ji aliyê xwe ve diyar dike. Ji ber vê mirov nikare rastî hebûn û îradeya ferd bê. Ferd wek kopya ye. Qadeke ku ferd bi awayekî azad xwe tê de îfade bike tune ye. Yanî mafê civaka kevneşop serwer e. Mafê civaka serwer jî çi ye? Mafê desthilatdariyê ye. Yanî mafê civakî yê xwezayî nîne, mafê desthilatdariyê tenê heye. Desthilatdarî serweriyê, îqtîdarê di bin tekela xwe de dihêle. Ji bo vê jî maf di sînorê hinek însanan de dimîne.

Însanê wiha azad, jêhatî karibin tiştekî derbixin û maceraperest bin, desthilatdarî van tiştan hemûyan asteng dike. Di serdema feodalîzmê de desthilatdarî, bi taybetî jî tîpekî mirovan ê bê îrade derdixe. Tîpekî ji însanên bê îrade, bê hewldan, tenê li ser esasê kopyakirinê çêdike.

Bingehîn e û divê mirov ji wê xetê û çarçoveyê dernekevin. Ev çi ne, ev tu demê rê ji pêşketinê re venakin. Mînak, çawa mirov çavên xwe li jiyanê vedikin, bav û dayîkên xwe çawa dibînin weke wan dikin. Ji rêka wan derketin weke mezintirîn guneh tê dîtin. Lewra ji bo ferd

pîvanên malbata xwe, desthilatiya ku di bin serweriya wê de esas girtin pîvaneke exlaqî ye. Wê çaxê di serdema feodaliyê de însanên baş çawa tên nirxandin; dibêjin filan kes di hedê xwe de ye, gavên pêş de ji xwe zêdetir navêje, çep û rastê xwe temaşe nake, dayîk û bavê wî/ê çawa dikin ew jî wiha dike. Desthilatdar yan jî serwer çi dibêjin ew wiha pêk tîne. Îtaetê esas digire. Yanî qebûlkirinê ji bo xwe bingehîn digire. Şêwaz û lêgerînên wî/ê bi xwe tune ne. Çalak nîne, înzîwayê esas digire, di çarçoveya sînorên xwe de ye.

Di jiyanê de jêhatiyên xwe dernaxîne pêş. Jixwe dibêje ev cîhan ne hêja ye ku mirov jêhatiyan derbixe pêş. Yên ku derdixin jî wek çawa gunehekî bikin, ji aliyê desthilatdariya heyî ve tê astengkirin.

Di demekê de li Ewrûpayê Ronesans derket, ji nû de şiyarbûn çêbû. Ev di şev û rojekê de çênebû. Ev bi salan dirêj kir. Bi salan di encama rabûn û ketinan, têkoşînên cur be cur, danaserhevan, tecrûbe û mînakên serkeftî de Ronesans hilhat. Bi vî rengî şêwazek hate rûniştandin.

Çi bû ew şêwaz, mirovan êdî çi digotin: Êdî ev nêzikbûnên wiha bi navê exlaq û bêdengiyê, wiha di hedê xwe de be, bê tevger be ne afirînêr bin, ne çalak bin, weke pîvanên exlaqî em red dikin. Bi rastî jî ev ne şêwaz û exlaqek e. Li şûna wê kî ye yê mirov qedir û qîmetê bidiyê? Ew kesên ku nesekinin, tebatî bi wan nekeve, tim di nav lêgerîn û lêkolînê de bin, tim û tim di nava xebatê de bin û

afirînêr bin, xulikar bin… Mirovên wiha baş in, di heman demê de bi pêş jî dikevin. Em dikarin bêjin heta vir ev tişt baş in. Bêguman ew dogmatîzm, di cihê xwe de seknandina civakê, destpotîzm, desthilatdariya feodalîzmê ya tund û çewt, monarşî, astengkirina fikir diviyabû bihata derbaskirin. Diviyabû mirov ji wan sînorên ji wan re hatî dayîn derketibûna û di encamê de mirov derdiketin. Bi çi derdiketin? Bi fikrên însanî derdiketin pêş. Wê çaxê felsefe pêş diket, zanist pêş diket, zanistên civakî pêş diketin. Ev bû sersebebê ku tevgerek peyda bibe.

Lê belê ev tevger kapîtalîzmê ji bo xwe bikar anî. Mirov qeydên xwe diqetînin, kapîtalîzm jî ew ji bo xwe firsend dît. Çima, ji ber ku birjuwazî jî wek çîneke nû derdiket. Lewra dewlemend dibe û dixwaze bibe desthilat. Lê çi li pêşiya wê heye, astengiyên li pêşberî wê hene. Çi ne ew astengî? Yek ji astengiyên li hemberî kapîtalîzmê hikmê mutleq e! Yanî îqtîdara mutleq û monarşî ye.

Mînak kesên ku bavê wan qral bûna, di heman demê de dibûn qiral, dibûn desthilatdar. Bavê wan wezîr bûna ew jî dibûn wezîr. Arîstokrat û xwedî şênî bûna dibûn heman tişt. Çima ew peywir rasterast digirtin dest? Digotin, di xwîna wan de ev hebûye. Lê bele birjuwaziyan ji vê re digotin na. Ji ber ku filan kes bavê wî qral bûye, ne şert e ew jî bibe qral. Kî bixebite divê ew bibe desthilat, di heman demê de dewlemend bibe. Kesayetên ku tiştên nû bînin divê ew bibin desthilatdar. Birjuwazî bi vî rengî rê ji çi re vedikin? Rê ji desthilatdariya xwe re vedikin. Lê di heman demê de çi

dikin? Gotinên gel jî ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin. Di heman demê de daxwaziyên gel jî didin diyarkirin.

Di encamê de çîna birjuwaziyê çi kir? Bi vî awayî kapîtalîzmê çi kir? Ew rizgariya ferd ji qeydên civaka kevneşop xist xizmeta berjewendiyên xwe. Bi vî rengî guhertineke bi çi awayî çêbû? Kapîtalîzmê got: Ferd heta niha ji aliyê civakê ve hatiye mehkûmkirin, wê demê dijminê mirov ê bingehîn civak bi xwe ye. Herwiha mafê ferd ê li hemberî civakê li berxwe bide heye. Mafê takekes ê ku li dijî vê civakê têbikoşe heye.

Dema ku takekes li dijî civakê li ber xwe dide û li gorî xwe kar dike, wê demê tenê ji bo xwe dike. Wê çaxê ne neçar e bi qeyd û bendên exlaqî ve girêdayî bimîne. Lewra mirov dikare bêje ferdiyet ev têgihîştin bi xwe ye.

Dema ku mirov li xwe digerin, da ku xwe peyda bikin û xwe ava bikin, qet xwe neçarî girêdana bi pîvanên civakê re nabînin. Ji bo vê têgihîştina ferd a ji peydakirina îradeya xwe ya serbixwe, birjuwaziyê çi kir? Têkoşîna ferd ji taybetmendiyên wê yên exlaqî dûr xist. Kir weke têkoşîneke li dijî civakê, ne li dijî desthilatdariyê.

Lewma birjuwaziyê ji bo ferd çi got? Ferd neçar nîne ku xizmeta civak û malbata xwe jî bike. Neçar nîne ku xwedî li feqîran jî derkeve. Ji ber ku ferd di lêgerîna kesayet û berjewendiyên xwe de ye, lewra divê tu qeyd û bendên wî/ê tune bin. Yanî bi serê xwe be, eger hinek qanûnên civakê yên ferd asteng bike hebin jî, divê wan rêzikan

biguhere. Pêwîst e ji bo civakê qanûnên nû derbixîne. Ev qanûnên nû hemû, rê ji ferdperestiyê re vekirin.

Di bingehê van hemûyan de çi esas e? Kapîtalîzm bi xwe jî dibêje. Dema kapîtalîzm pereyan qezenc dike û dibe desthilatdar, ji prensîbên exlaqî dûr dikeve. Ji tiştên ruhî dûr e, ya girîng ew e ku bigihîje armancên xwe. Bi çi uslûbî dibe bila bibe, çav jê re naniqîne û pêk tîne. Çi şêwaz pêwîst be, wê bi kar tîne. Yanî ya ku armanc dike ew e ku berpirsiyartiya ferd li beramberî civakê ji holê rabike, di pratîka xwe de vê berpirsiyartiya ferd ji holê radike.

Kapîtalîzm niha van xerabiyên mezin çêdike. Rast e kapîtalîzm di aliyê madî de pêşketinan çêdike. Tiştên mezin derdixe pêş, lê belê di warê exlaqî de jirêderketin û xerabiyê pêk tîne û çêdike. Lê di rastiya dîrokî de tu demê jiyana madî nebûye alternatîfa jiyana exlaqî. Eger jiyana madî û exlaqî bi hev re bin, dikarin bi awayekî bi aheng bimeşin. Eger li dijî hev bin xerabiyên mezin çêdikin. Em bala xwe bidinê di roja me ya îro de derfetên modernîteya kapîtalîst ên madî pir li pêş in, lê hêza wê ya ruhî û exlaqî miriye. Ji bo vê krîzê dijî. Lewra krîzên civakî di kaptalîzmê de her diçe bi awayekî dijwar kûr dibe. Yek ji sedemên wê ew e ku ferd heta asta dawiyê ezez e, xweparêz e, li gorî xwe ye, bê kontrol e û hevsarê xwe qetandiye. Xwe ji hemû berpirsiyariya xwe ya li beramberî civakê safî û qut kiriye, xwe dûr xistiye. Li  beramberî tu pirsgirêkên civakê xwe berpirsiyar nabîne.

Civak dergûşa ferd e, ferd bê civak nikare bijî. Lê civak bê ferd dikare bijî. Civak bi zagonên xwe, bi pîvanên xwe yên exlaqî xwe berdewam dike. Bi awayekî baş be, yan jî xerab be, xwe berdewam dike. Lê ferd nikare hebûna xwe bi tena xwe bê civak berdewam bike. Lewma di van sêsed salên ku di bin serweriya serdestiya kapîtalîzmê de dimeşin krîzên mezin çêkirin. Xerabiyên mezin çêkirin û birînên mezin di civakan de derxistin, sedema van hemûyan çi ye? Çavkaniya van pirsgirêkan hemûyan jî ferdperestiya çors û bê kontrol e. Ji hemû pîvanên exlaqî dûr e, heta dawiyê ezez e, xweparêz e, di oxira berjewendiyên xwe de hemû nirxên civakê binpê dike. Mirov dikare bêje ev sîstema ku pêş ketiye û derketiye holê, kapîtalîzm bi xwe ye.

Kapîtalîzm di oxira berjewendiyên xwe de pêl her tiştî dike. Her tiştê xerab dike, ji bo ku tenê ziyan negihîje berjewendiyên wê, çi bixwaze dike. Ji ber vê yekê ferdperestî girîngtirîn mijar e ku pêwîst e mirov gelekî li ser raweste.

Bêguman bûna ferd tiştekî baş e. Yanî însan bi îrade be, xwedî kesayet be, kûrahiya ferd hebe, bi rol û îrade be. Di civakê de xwedî rol û tevlîker be, ev hemû baş in. Lê ev di çarçoveya hevsengiyeke optîmal de be. Bi civakê re di nav tewazineke baş de be, ne li dijî civakê be.

Divê mirov tevî civakê jî tu carî ferdperestiyê esas negire. Tenê xwe xelas bike, xwe bijî  ev tiştên pir xerab in. Bala xwe bidinê di roja îroyîn de kapîtalîzm krîzeke jiyanî

dijî. Di hemû milên jiyanê de krîzê dijî, sedema wê krîzê jî ev ferdperestiya çors e.

Hinek deman em jî dikevin xetayên wiha û li pey vê ferdperestiyê dimeşin. Li şûna ku em bi civaka xwe bihizirin, em tenê bi xwe difikirin. Li şûna em hemû civakê û berjewendiyên wê esas bigirin, em xwe esas digirin. Li şûna tevlîkirinê, ser zêdekirinê em li gorî xwebûyînê esas digirin. Ferdperestî xwe bi gelek awayan dide der. Bi têgihîştinên biçûk, mezin, tewş yan jî nerm, gelek taybetmendiyên ferdperestiyê hene. Xwe li gelek cihên cuda nîşan dide.

Ev tiştekî pir xerab e, ji ber vê yekê niha li Ewrûpayê jî êdî fêm kir ku ev ferdiyet dibe sersedemê ku tiştek di holê de nemîne. Niha wan fêm kiriye. Lewra ketine nav lêgerîneke ka çawa hinekî nirxên civakê bihêz bikin. Mînakê vê jî; çêkirina malbatan destek dikin, komeleyan vedikin, perwerdê didin û hwd. Ji bo hinekî wan birînên vebûne hindik be jî rehet bikin. Niha tenê hewldaneke wan a wiha heye.

Emerîkayê hîna bi awayekî cidî hewldaneke wiha nekiriye, ji bo vê asta krîza civakî di wir de hîna bihêztir e ji Ewrûpayê. Ferdperestî taybetmendiyeke kapîtalîzmê ye. Yanî çîna kapîtalîst e, cewherê çîna kapîtalîst bi xwe ye. Xweparêziya wê, xwe esasgirtina wê hemû jî di bingeh de cewherê mordernîteya kapîtalîst e.

Weke çawa ku di nasnameya însanekî/ê de dema ku derdixîne di serî de wêneyê wî/ê însan bala mirov dikişîne, di nasnameya îdeolojîk a kapîtalîzmê de jî ferdperestî wêneyê wê nasnameyê ye. Ji bo vê yekê dema mirovek di heman demê de hem ferdî be, hem jî komînal be, nabe. Hem wê ferdî be, hem jî li dijî kapîtalîzmê têkoşînê bike! Ev ne rast e û xwe xapandin e. Di têkoşîna me ya partîbûnê de jî tiştê herî zêde ku em li dijî wê têkoşînê bikin ezezîtî ye.

Di jiyana leşkerî de jî û di xebatên din de jî, bûna xwedî kesayeta partîyî, di serî de divê kesayet li dijî ferdiyetê be. Komînalîzma me li dijî ezezîtiyê pêş dikeve. Avakirina civaka exlaqî û polîtîk jî di serî de li dijî ezezîtiyê ye. Lewma divê mirov ezezîtiyê weke taybetmendiyeke bingehîn a kapîtalîzmê bigire dest. Heke di cih cihan de taybetmendiyên ferdî di navgînên cuda de jî derket holê, ew teqlîdkirina kapîtalîzmê ye, teqez mayîna di bin bandora kapîtalîzmê de ye.

Xala Sêyemîn A Ku Kapîtalîzmê Girt Dest Humanîzm E;

Humanîzm bi xwe tiştekî baş e. Di heman demê de em jî tevgereke însanî ne. Lê mirovheziya me û ya kapîtalîzmê ne weke hev e. Kapîtalîzm ne humanîst e, lê gelo çima humanîzmê esas digire? Ji ber ku kapîtalîzmê xwest desthilat be, lê nikarî desthilat be, ji ber ku li pêşberî wê feodalîzm û monarşî hebûn. Monarşî bi çi hikm dike; bi werasetê hikm dike.

Pergala kapîtalîzmê baş nebû, lê wê çawa û bi çi dirûşmeyan xwe nîşan bida? Got: Ferq û cudatî di navbera însanan de nîne, tu însanên ji hev baştir nînin. Hemû însan weke hev in. Pêwîst e her kes li hemberî zagonan weke hev bin, karibin serî hildin. Mafê her kesî yê hilbijartinê heye. Mafê her kesî heye ku xwe berendam nîşan bide. Divê qanûn ji bo her kesî derbasdar be. Kapîtalîzmê xwest bi van sloganên însanî çi bike? Xwest desthilatiyê ji bin yekdestiya feodalan derbixe û bike bin yekdestiya xwe.

Ew însaniyeta ku behs dikin jî wiha têkûz nîne. Mînak, yekemîn Danezana Mafên Mirovan dewletên kapîtalîst derxist. Emerîka û Fransayê derxistin. Lê li Emerîkayê heta salên dereng koletî hebû, yanî heta 1865'an jî koletî hebû, însan dihatin kirîn û firotin. Heta sala 1968'an jî nijadperestî hebû. Yanî ferqa nijadperestiyê hebû. Çawa bû, li Emerîkayê însanekî rengê xwe reş bûya li her otobûsê nedikarî siwar be, li her dibistanê nedikarî bixwîne… ji aliyê kesên reng spî ve dihatin redkirin. Rast bû bi navê humanîzmê bang kirin, tenê ji bo bibe desthilatdar ew bangawazî bihêz dane pêş. Lê tiştek pêk neanî, ev gava wê ya yekemîn bû.

Pêngav û gava wê ya duyemîn di gelek welatê Ewrûpa de mînak sed sal, du sed sal tevî ku birjuwazî û kapîtalîzm tê de bûbû desthilat jî, lê mafê hilbijartin û xwe dana hilbijartina jinan tune bû.

Birjuwazî li Emerîkayê di sala 1783'yan de bû desthilatdar. Kengê mafê jinê yê hilbijartinê hate qezençkirin? Di sala 1920'an û şûn de. Heta sala 1920'an jî li Emerîkayê jin nediçû ser sindoqên hilbijartinê, yanî wek însanekê nedihate dîtin. Di gelek welatên Ewrûpa de hetanî salên 1925 û 30'yan ev mafê hilbijartinê tune bû.

Dîsa mafê mirovan li gorî kapîtalîzmê mafekî gerdûnî nîne. Li Holanda, Îngîltere li Emerîka heger hinek tişt di çarçoveya mafê mirovan de tên nirxandin jî, ji bo gelên din wiha nakin. Mînak Emerîka ji bo xwe behsa azadî, wekhevî, edaletê dike, lê em ji bo azadiya xwe li Tirkiyeyê gulekî diteqînin, me wek terorîst nîşan didin. Îngîltere behsa wekheviyê dike, lê tenê ji bo wekheviya ku li Îngîltereyê. Lê ji bo mêtingeriyên xwe vê nabêjin.

Lewra ev bikaranîna kapîtalîzmê ya humanîzmê îdîayeke derew e, lê mixabin ku gelek kesan pê bawer kiriye. Însan li beramberî qanûnê divê weke hev bin, da ku karibin yekdestiya feodalan, arîstokratan li ser hikm rabikin û kapîtalîzm bikeve şûnê. Dema kapîtalîzm dikeve şûna wê di esas de tu taybetmendiyên wê yên însanî dernakevin pêş. Ji xwe miletên din, mînak Ewrûpa Asya û Efrîqayê weke însan nabîne û li ser wan nafikire. Mirov dikare bêje ku tenê xwe însan dibînin. Bi taybet jî Emerîka wisa ye. Mafê mirovan ji bo xwe hewcedar dibîne, rasteqînî dibîne. Lê ji bo gelên din vê nabîne, pê razî ne ku însanên din di nav sefalet, birçîbûn, nexweşî û îşkenceyê de bijîn. Lewma qet deng dernaxin.

Kengê deng derdixin, dema berjewendiyên wan bixwaze, deng derdixin. Wê demê humanîzma wan derdikeve pêş.

Sedam bi salan bû ku Kurd qir dikir, qet kesî dengê xwe nedikir. Lê dema berjewendiyên wan bi Sedam re ket nav nakokiyan, gotin, em dostê Kurdan in. Ji bo gelek rêjîmên din jî wiha nêzik dibin.

Lewra divê em fikrê zanistî, humanîzm û ferdperestî bizanibin ev weke hikmê mutleq, ji bo hemû mirovatiyê jî nîne û kapîtalê bi kar aniye. Çîna birjuwazî ev têgihîştin di çarçoveya berjewendiyên xwe de nirxand û wisa qebûl kirine û kirine parçeyek ji nasnameya xwe ya îdeolojîk. Bi vî rengî birjuwaziyê karibûye ferq û cudatiya xwe ji feodalîzmê diyar bike û bide nîşandan. Kapîtalîzmê bi vî rengî ferq û cudatiya xwe daye nîşandan

## Şêwazên Dagirkeriya Kapîtalîzmê

Ev mijarên giştî ne, pêwîstî heye hîna jî mirov van mijaran bigire dest, bi taybet jî li ser nasnameya kapîtalîzmê hûr raweste. Da ku mirov ziraviyên wê bi awayekî nazenînî bizane. Kapîtalîzm di roja me ya îro de dema êrîş dike û dikeve nav hewldaneke dagirkeriyê, nabêje va ez kapîtalîzm im, ez ê serweriya xwe bikim. Nabêje va ez kapîtalîzm im, ez têm hikm bimeşînim. Bi vî rengî nabêje, kapîtalîzm bi amûr û metodên cuda nêzik dibe. Kapîtalîzm berî her tiştî fikrê xwe, şêwazê jiyana xwe

ya ku ew dixwaze li ser gelan ferz dike. Gelan ji gelbûna wan derdixe, çanda wan diguhere, çalakiya wan a civakî diguhere. Nexweşiyên cuda di nav de diçîne û xerckirinê di nav de pêş dixe. Desthilatdariyê di nav de pêş dixe. Van hemûyan dike û miletan dike parçeyek ji sîstema xwe. Ji bo vê sîstem bi awayekî rihet dikare destê xwe deyne ser wan gelan.

Dema wisa dike çi dibe; her dem taybetmendiyeke kapîtalîzmê heye, ew jî di destpêkê de êrîş dike, pişt re jî dixe bin destê xwe. Mînak di şeran de di şerên kozikan de, di cebhan de bî vî rengî ye. Topa giran heye û mewziyên xwe li gorî wê çêdike. Destpêkê bombeyan diavêje, bombebarandineke giran dike. Ziyaneke mezin dide dijminê xwe. Derbên mezin lê dixe û pergala wî xerab dike. Piştre êdî yekîneyên xwe dixe nav tevgerê, û êrîş dike.

Topbarana kapîtalîzmê ya giran çi ye? Îdeolojiya wê ye, fikrê wê ye, şêwazê jiyana wê ye. Di serî de êrîşî gelan dike, wan dike bin kontrola xwe, fikir û aqilê wan digire bin radestiya xwe, jê û şûnda êdî ji bo wê dagirkirin rihet dibe. Ne hewce ye bi artêşên leşkerî êrîş bike da ku dagirker bike. Bi awayekî wan gelan bi xwe ve dide girêdan. Bi awayekî rihet hemû rengên talana ekonomî, îstismara siyasî li ser wan gelan dimeşîne.

## Kapîtalîzm Lîberalîzmê Ji Bo Xwe Esas Digire

Ji bo vê gelek metodên wê hene. Metodê sereke yê ku îro kapîtalîzm esas digire, lîberalîzm e. Niha lîberalîzm Rêbertî jî dibêje: Bi lîberalîzmê kapîtalîzmê karîbû hemû dijberên xwe tesfiye bike. Yên herî zêde li hemberî wê şer dikirin bi lîberalîzmê hemû ji holê rakirin.

Lîberalîzm ji bo ku kapîtalîzm desthilatdariya xwe berdewam bike, weke metodeke bingehîn tê bikaranîn. Lê eger mirov wek peyv lîberalîzmê bigire dest, tê wateya 'azadî'yê. Însanê lîberal 'însanê azadiyê dixwaze' ye. Wiha lîberalîzm tê terîfkirin. Lê ev têgîna lîberalîzmê tiştekî cuda ye, wek têgîn di nasnameya îdeolojîk a kapîtalîzmê de weke metodeke ji bo tunekirina dijberê xwe bi awayekî tund bi kar aniye. Bi vî rengî karibûne her kesî di nav modernîteya kapîtalîst de bihelînin û helandin jî. Ji bo kapîtalîzmê ya esas jî ev e. Lewra Rêbertî dibêje: "Ji lîberalîzmê re na, lê ji azadiyê re erê." Yanî em ji bo azadiyê dibêjin erê, em azadiyê dixwazin, ne lîberalîzmê.

Lîberalîzm gotineke biyanî ye, weke taybetmendiyeke sîstema nû ye, ya kapîtalîzmê xwe nîşan dide. Li ser esasê tesfiyekirina dijberê xwe pêş dikeve. Kapîtalîzm dibîne ku di cewher de nikare dijberên xwe tesfiye bike, di cewher de hewldana tesfiyekirina dijberên xwe dibe sedema reaksiyonan û nerazîbûna dijminê kapîtalîzmê kûr dibe. Kapîtalîzm vê yekê nikare bike, her demê nikare bi ser jî bikeve. Ji bo vê çi dike? Dijminê xwe dikişîne hundirê xwe.

Kapîtalîzm li dijminê xwe naxe û nakuje, lê wî dadiqurtîne. Çawa dadiqurtîne, mecalê jiyanê jê re vedike. Dibêje: Were tu jî bijî, tu dijminê me yî û li dijî me propaganda dikî, lê tu dikarî bijî. Bi demê re çi dike? Bi demê re dijminê xwe diguhere. Dike parçeyek ji xwe. Di serî de dijber û paşê tu dinêrî yên li dijî wê bûne parçeyek ji wê sîstemê û parazvanê wê yên herî pêş. Em dikarin bêjin lîberalîzm ev e.

Însanê zêde di aliyê îdeolojî de ne kûr be û ne girêdayî armanca xwe be, bi rengekî radîkal ne xwedî sekin be, vê sîstema kapîtalîzmê weke nûbûnekê dibîne. Dibêje ev baş e, dijmin duh em dikuştin, lê îro dibêje hûn serbest in, hûn dikarin fikrê xwe bînin ziman. Werin bi me re kar bikin. Kapîtalîzm dikare vê bike, ji ber çi dikare bike? Bi rastî jî derfetên kapîtalîzmê yên madî zehf in. Sîstema kapîtalîst derfetên wê yên madî pir zêde ne.

Em bala xwe bidinê hinek kes krîzan dijîn, li Yewnanîstan, Îspanya, Îrlanda krîz hene, lê em bala xwe bidinê tevî van krîzan jî derfetên madî pir in. Mînak di vê dema dawiyê de li Elmanyayê tê gotin bi deyn sed milyon dolar ji bo filan derê daye. Wê demê pereyên wê yên ku deyn bide derve bi trîlyonan heye! Hemû welatên cîhanê deyndar in, lê yê wan dikarin pereyan deyn bidin. Emerîka bi vî rengî, Japonya bi vî rengî… wê demê talana ku ji civakê kirine û heta roja îro bê navber berdewam dike, komkirineke mezin di aliyê madî de çêkirine.

Ewqas komîserhev kirine ku dikarin hinekan jî xwedî bikin. Dikarin hinekan, ên ne ji gelê xwe jî xwedî bikin û wan kedî bikin, wan bikin bin kontrola xwe. Vê jî dikin, ev derfetên wan hene. Yanî derfetên wan ên madî zêde wê firsendê dide wan ku karibin dijberê xwe ne bi şer, lê bê şer daqurtînin û wiha bikin hundirê xwe û bihelînin. Bi vî rengî nêzik dibin. Lîberalîzm ev e.

Yê ku sekna wan a îdeolojîk ne xurt be dibêjin temam, em ê fikrên xwe jî bêjin, em ê bi wan re jî bixebitin. Nêzikbûn yan jî fikirandina bi vî rengî çênabe. Ev rêka xwe radestkirinê ye. Kapîtalîzm ji bo xwe ye, ji bo kesên din nîne. Kapîtalîzm tima ye, xêran nake. Pîvanên wê yên exlaqî tune ne û tenê ji bo xwe dijî. Talan û sermayeyê zêde dike. Wê çima destekê bide te? Tenê ji bo tiştekî wê destekê bide te, ji bo te bike bin kontrolê. Lê gelek vê sîstema wê fêm nakin û dibêjin: Ev sîstemeke xwezayî ye, cîhan hatiye guhertin ji bo vê jî dibe. Demek derbas dibe tu lê temaşe dikî ku va kapîtalîzm bûye dijmin. Mînak em li Turkiyê temaşe bikin, bi sedan derdikevin TV'yê, diaxivin, serok-komar in, serokwezîr in her kes di dema xwe de di nava tevgerên çep de bûne û têkoşîn kirine... Dibe ku di îşkenceyê de li ber xwe dabin û radest nebûbin. Lê ya em behs dikin çi radestbûn e, di ketina nav sîstemê de radest bûne. Ketina nava sîstemê ev e.

Li gorî xwe dibêje ez ê biçim û bikevim nav sîstemê û ez ê bikaribim weke xwe bimînim û xwe radest nekim. Lê ev xwe xapandineke mezin e. Pêwîst e, nekeve nava sîstemê,

divê derveyî sîstemê bikaribe têkoşîna li dijî sîstemê bide meşandin! Tu bibî parçeyek jê, tu yê nikaribî li hemberî wê şer bikî. Tu wiha paçeyek jê yî, tu yê çawa li hemberî wê şer bikî! Wê demê tu parçeyek jê yî.

Ji bo vê lîberalîzm hem di milekî de van derfetan vedike û hem jî çi dike? Êrîşeke îdeolojîk dike da ku însan bê bingeh bihêle û însan beramberî fikrên xwe bêbawer bin û zûka karibin tevlî kapîtalîzmê bibin. Hêza sereke ya çalak, kesayetên zane, wiha dixe nav xwe. Yên mayî jî çiqas nezan bin ew qas baş dibe da ku karibe li ser wan kontrolê bike.

Lîberalîzm rast e azadî ye, lê gelo azadiya çi? Lîberalîzm azadiyeke însanî nîne. Azadiyeke ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakê nîne. Heke bi vî rengî bûya û bi rastî lîberalîzm azadî bûya, wê hemû pirsgirêk li cîhanê bihatina çareserkirin. Ji ber ku ev sêsed, çarsed sal in kapîtalîzm li her derê serwer e, eger lîberalîzm azadî bûya wê pirsgirêka Kurd nebûya û pirsgirêkên welatên Efrîkayê wê tune bûna. Wê pirsgirêkên welatê Emerîkaya Latînî tune bûna. Ji ber çi? Ji ber ku ew welat hemû di bin destê kapîtalîzmê de ne, hîna jî di bin destê kapîtalîzmê de ne. Dibe ku ev bi awayekî rasterast be yan jî neyekser be, lê rastî bi vî rengî ye.

Lîberalîzm ne azadî ye, lîberalîzm çi ye? Lîberalîzm serbestkirina tevgera sermaye û serbestkirina fikrên mirovên kapîtalîst e. Lîberalîzm azadkirina van e. Dibêjin em naxwazin sînor hebin, ji bo çi wiha dibêjin? Ji bo însanê kapîtalîst, sermayeya kapîtalîst û berhemên kapîtalîzmê ye.

Da ku fikrê kapîtalîzmê bê asteng li hemû cîhanê belav bibe. Lê berovajiyê wê na. Mînak Rêbertiya me jî xwest li cîhanê bigere, xwest biçe Ewrûpayê, çima nehiştin? Wê demê serbestkirina tevgera mirovan qet qebûl nake, di vir de tenê serbestkirina tevgera mirovên kapîtalîst qebûl dike. Ev di bin kontrola Emerîkayê de çêdibe. Ji ber ku Emerîka hêza herî xurt û serwer e di nava sîstema kapîtalîst de. Lîberalîzm ev bi xwe ye.

Ji ber vê pêwîst e mirov lîberalîzmê baş binirxîne. Dema ku di nava me de lîberalîzm pêş dikeve, rêxistin ji xeta xwe derdikeve û ber bi radestbûnê ve diçe. Ji ber ku em nikarin lîberalîzmê qebûl bikin. Em rêxistineke xwedî îdeolojî û xetê ne. Xeta rêxistinê ji yên lîberal cudatir e. Rêxistinên xwedî xet, wiha her tiştî di nava xwe de qebûl nakin! Hedefên ku dane pêşberî xwe yên ku hene, li ser esasên gihandina wan hedefan pîvanên însanan diyar dikin.

Pîvanên exlaqî, nêzikbûna ji têkoşînê re, nêzikbûnên ji erkê re, zanistîbûn… ev hemû tên diyarkirin. Dema rêxistinê kêliyek be jî di van de tewîz dan, wê demê rêxistin çi dike? Rêxistin di xeta xwe de tewîzan dide. Wê çaxê wê kî bi ser bikeve? Jixwe bi awayekî xwezayî wê xeta dijber bi ser keve. Ya em dibêjin xeta dijber, çi xet e: Xeta dijber sîstema desthilatdariyê, dagirkeriyê, kapîtalîzmê ye. Ji ber vê divê lîberalîzm baş were fêmkirin. Heta ev neyê fêmkirin, wê xeteriya wê jî neyê dîtin. Ji ber ku kapîtalîzm di rêka lîberalîzmê de dixwaze hemû dijberên xwe ji holê

rabike. Vê dike jî, yên ku ber bi sîstema wê ve çûn, çawa kuna reş her tiştî dadiqurtîne, hatin daqurtandin.

Xwestin zemîneke wiha di Îraqê de ji bo me peyda bikin. Bi vî rengî ziyaneke mezin jî dane me. Bi sedan însanî xwe avêtin hemêz û bextê wê sîstemê. Lê rêxistina me li xwe hayil bû, zanebûn çêkir. Heger îro rêxistin heye û têkoşînê dimeşîne rojevê diyar dike,  sedemê wê ev e. Ev sedem çi bûn? Di nav xwe de xwe ji lîberalîzmê xelas kir, careke din bû rêxistina xetê. Rêxistina xetê tê wê wateya ku xwedî pîvan e, heta dawiyê di nav xeta wê de milîtantî heye.

### Kapîtalîzm Xwe Bi Miliyetperestiyê Rave Dike

Jixwe lîberalîzm ji taybetmendiyên kapîtalîzmê ya sereke ye. Ev taybetmendiyên wê tenê nîne. Taybetmendiyên kapîtalîzmê, nasnameya wê ya îdeolojîk tenê bi lîberalîzmê xwe rave nake. Bi miliyetperestiyê jî xwe rave dike. Miliyetperestî teybetmendiyeke kapîtalîzmê ye. Rast e di dema xwe de însanan li dijî hev şer dikirin. Komên civakî li dijî hev şer dikirin. Dema feodalîzmê, koledariyê heta hinek cihan da hev qir kirine. Lê belê weke di serdema kapîtalîzmê de çand hatine wendakirin, di tu serdemên din de nehatine wendakirin. Heta hinek netew ji holê rabûne, nijad ji holê rabûne û çand hatine tunekirin. Tu caran bi qasî ku ev şerên nijadperestiyê di serdema kapîtalîzmê de çêbûye, nehatiye kirin.

Ev miliyetperesiya kapîtalîzmê ye. Di jiyanê de li ser esasê înkarkirina mafê gelên din e. Xwe esas digire, şovenîzm û nijadperestiyê pêş dixe, her diçe gur dike. Nijadperestiya ziman, fikir, ya biyolojîk van hemûyan jî pêş dixe.

Kapîtalîzm navend dibîne. Nirxê nade çand, yan jî çandên civakên din. Di roja me ya îro de dema ku Emerîka êrîşan dike, welatê Ewrûpa dema êrîşî cîhanê dikin, welatan mêtinger dikin, heta kîjan astê nirxê didin çanda wan gelên ku wan mêtinger dikin? Sîstema xwe esas digirin. Rojane bi vî rengî xwe nîşan didin.

Mînak di partiyên Emerîkayê de taybetmendiyên îdeolojîk ên serwer çi ne? Liv û tevgera wan hemû li ser esasên pesindayîna Emerîkayê ne. Mînak, partiyeke wê ya Cumhuriyetê ye, ya din jî ya Demokratîk e. Her du jî Emerîkayê welatê herî hêja yê di cîhanê de dibînin. Ji bo parastina Emerîkayê her tiştên pêwîst dibînin dikin. Lewra şerê xwe li Efxanîstan, di Îraqê… di her derê cîhanê de di bin sêwana parastina Emerîkayê de didin meşandin, bi vî rengî didin nîşandan jî. Gelê wir jî li ser wî esasî dixin tevgerê. Eskerên Emerîkayê li Efxanîstanê ne û tu jê dipirsî; tu çima hatî vir? Dibêje, “Ez ji bo welatê xwe hatime vir.” Welatê wî li serê cîhanê ye, ew qas dûr e, lê dîsa jî dibêje “ez ji bo welatê xwe hatime vir”.

Yanî berjewendiyên bên parastin tenê yên welatê serdest in, ne yê welatên bindest in. Mafê gelên bindest

nîne ku xwe li hemberî vê dagirkeriyê biparêze jî. Ev miliyetperestî ye, rast e weke berê behsa miliyetperestinê nakin, lê miliyetperestiya niha dikin ji ya berê xerabtir e. Ya berê vekirî bû, eşkere bû, lê îro bi navê demokrasî û azadiyê dikin. Ev dihêle ku mirov zêde ne di zanebûna wê de be û li ber çav diyar nake.

Ev miliyetperestî teybetmendiyeke kapîtalîzmê ye. Lê miliyetperestî ne gengaz e bibe taybetmendiya tevgerên civakê. Miliyetperestî ne gengaz e bibe taybetmendiya kesên kedkar û çîna jêrîn. Miliyetperestî di esas de tune ye, têgihiştineke ji aliyê kapîtalîzmê ve hatiye çêkirin e. Ji bo desthilatdariya xwe pê mayînde bikin, şerên talanê li dijî gelên din bidin meşandin pêş xistine, hemû armancê kapîtalîzmê ji bo vê dagirkirinê ye. Lewma timî desthilatdarî vê têgihîştinê pêş dixe, vê di piratîkê de pêk tîne.

Nimuneyên vê yekê jî gelekî zêde ne. Di roja îroyîn de tu diçî bajarekî weke bajarê Kerkukê mirov dibîne ku hemû gelên wir ên Ereb, Kurd û Tirkmen bi hev re dijîn. Zêde pirsgirêkên wan bi hev re tune ye. Beriya vê bi demdirêjî bi hev re tevgeriyane û jiyane. Lê dema mirov li radyo yan jî TV'yê guhdar dike, mirov dibêje qey Kerkuk pêtek ji barûdê ye. Wisa ji mirov re tê ku ha teqiya, ha wê biteqe! Hêzên ku vê nakokiyê gur dikin gelo kî ne? Di serî de desthilatdariya Emerîka û Tirk vê bi vî rengî bi kar tînin. Lewra em têdigihîjin ku di wir de tavilê dixwazin şerekî pêk bînin, li ser wî esasî reforman çêdikin.

Di encama guhdarkirina van danezan û formulasyonan de, di bin hişê her însanekî Kurd de beramberî yê Tirkmenan çi pêş dikeve, yan jî însanekî Ereb li hemberî yê din çi difikire? Bi vî awayî dijminayetiyek çêbibe. Ew bajar wiha ji bo teqandinê amade dibe, kengê hêzên desthilatdar, dijmin bixwaze wê wî bajarî biteqîne. Bi van propagandayan her tiştî li gorî berjewendiyên xwe amade dikin.

Ji bo vê miliyetperestî ne taybetmendiya bindestan e. Tu bihaneya pêşketina miliyetperestiyê di nava gelan de tune ye. Weke tevger tu têkiliya me bi vê têgihîştinê re ji binî ve tune ye. Miliyetperestî cuda ye, niştimanperwerî, welatparêzî û têkoşîna ji bo welatparêziyê cuda ye. Miliyetperestî kûrkirina nakokiya di navbera gelan de ye, ev nakokî hemû jî ji bo berjewendiyê çîna serdest e.

Pêwîst e, em baş bizanin ku têkoşîna ji bo azadiya welat têkoşîneke rewa ye. Felsefeya wê ya bingehîn xelasbûna ji qeydên dagirkeriyê ye. Mirov dikare bêje ew têkoşîn heta asta dawiyê rewa ye. Miliyetperestî heta dawiyê ne rewa ye. Lewra jî miliyetperestî taybetmendiyeke çîna birjuwaziyê ye, yek jî taybetmendiyeke kapîtalîzmê ya esasîn e.

## Kapîtalîzm Bazara Serbest Esas Digire

Kapîtalîzm di bin navê pêşbaziyê de, afirîneriyê de bazara serbest esas digire. Ev bazara serbest jî qadeke ji qadên herî zêde talan tê de tê kirin, yanî qadeke talanê ye. Ji bo vê mirov lê temaşe dike di nava civakê de gelek kes dewlemend dibin. Gelek kes jî feqîr dibin û kesên dewlemend dibin di rêkeke rewa de dewlemend nabin. Li ser esasê talanê, xesbê dewlemend dibin. Dewlet wan diparêze, ya rastî dewlet hêza wan temsîl dike û berjewendiyên wan diparêze.

Li şûna ku ev dewlet ji bo gel sîstemekî alîkariya civakê yên tendirustî, xwendin hwd pêş bixe, mirov dibîne ku vê pêş naxe. Van tiştên ku dike jî di bin navê azadiyê de dike. Di bin navê têgihîştina însan ji bo xwe serbest be, kî çi karî qezenc bike, ew mafê wan yê rewa ye. Dema ev têgihîştin pêş ket, hemû rêkên exlaqî ji holê radibin, qezenc dibe esasê her tiştî. Lewma nêzikbûnên weke derew, kedxwarî, zimandirêjî, jixwerazî pêş dikevin. Sîstema kapîtalê di vir de însanan li gorî çarçoveya berjewendiyên xwe dike nav tevgerê.

Derewan weke rastiyê nîşan didin û li ser vî esasî pirsgirêkên ekonomîk her diçe pêş dikevin. Lewra mirov lê temaşe dike hinek bê ku dilopekî tenê jî xwêdan birijînin, bi milyonan pere qezenc dikin. Ev hemû jî li ser bingehê derew, xapandinê ne û ji exlaqê dûr dibin.

## Pêwîst E Îdeolojî Ji Dogmatîzmê Dûr Be

Rast e, ev tiştên me anîn ziman hemû jî weke nasnameyên kapîtalîzmê yên îdeolojîk in. Kapîtalîzm bi van derbasî nava civakan dibe, lê her tiştî cuda dide nîşandan. Di esas de jî xwe weke sîstemeke mayînde nîşan dide. Bêguman pêwîst e mirov gelekî li ser van kûr bibe, lêkolînê bike. Divê mirov rûyê wê yê rast bibîne.

Em di serî de li ser hinek tespîtên îdeolojîk sekinîn. Kar û xebata îdeolojîk çawa wê bê kirin, bi gelemperî li ser esasên tiştên baş jî me nêrîna xwe diyar kir. Ya rast her tişt wiha nîne, ew tiştên em dixwazin bêjin, em ê hîna bi awayekî berfireh li ser rawestin. Mînak em dibêjin divê îdeolojî ji dogmatîkbûnê dûr be. Tevlîbûna wê ya wijdan û aqil di neteweyekê de pêwîst e hebe. Divê hêza berxwedanê ya di wî welatî de bihêz be. Pêşketinên ku çêbibin wê xîtabî kîjan hêzê bike, van xalan em esas digirin. Tiştên ku tevgerek ji bo azadkirina gelekî bindest û civakeke têdikoşe pêwîstî ne û girîng in.

Lê dema em van tînin ziman, nayê wê wateyê ku wiha ye û timî jî xwestekên gelan û tevgeran pêk nayên. Ji ber ku îdeolojîyên li dijî têkoşînên gelan jî hene. Di bingeh de jî li dij in. Sîstem her tim îdeolojiyên ku serwer bin jî dide. Di gelek pêvajoyan de jî ev pirsgirêk derdikeve. Mînak, em tespîtekê di aliyê îdeolojîk de dikin û li ser vê nirxandinên me pêş dikevin. Tespîtên me di derbarê civak, netewe, jin, mêr û xwezayê de çi ne?

Gelek tespît di her demê de ne rast in. Di roja me ya îro de gengaz e em bi rastiya wê dihesin, lê piştî demekê mirov lê temaşe dike ku ew tespît ne rast e. Ji ber ku zanist pêş dikeve, dema mirov li tespîtên xwe vedigere û temaşe dike, dibîne ku tespîtên di wê demê de kiriye ne rast in. Me duh tiştek dizanî, lê îro em tiştekî din dizanin. Ji bo vê me got divê îdeolojî bi ruhê çaxê re be, bi ruhê zeman ve girêdayî be. Ji bo ku berovajî nebe. Ji bo ku ev tespît li pêşiya pêşketinan nebe asteng. Nêzikbûna rast ev e. Lê belê her îdeolojî li gorî vê tevnagere yan jî van nêzikbûnan pêk nayne.

Hinek kes hene ku ji bo tespîtên xwe yên îdeolojîk liv û tevgera dîrokê disekinînin. Dixwazin wê zagona gerdûnê ya xwezayî di cîhana me de diqewîme rawestînin. Ev hemû, ji bo tespît û xwestekên wan rast derkevin in. Rastiyan ji nedîtî ve tên. Dibêjin ev tişt ne rast e, xwe lê hayîl nakin. Ji ber çi wiha dikin? Ji ber ku heke wan rastiyên heyî qebûl bikin, divê tespîtên xwe yên îdeolojîk di ber çavan re derbas bikin. Lê mixabin, li xwe danaynin û vê nakin.

Ev nêzikbûn êşeke mezin bi serê civakan de tîne. Dibe ku îdeolojî berovajî bin, bêguman îdeolojiyên berovajî jî hene. Weke nijadperestî, miliyetperestî hwd, gelek xalên ku em rexne dikin hene. Ev hemû dibin sedem ku ziyanê bigihînin civak û mirovan. Mêjiyê hinek însanan tevlîhev dikin, kêm dihêlin û biçûk dihêlin, nakokiyan kûr dikin. Hema bêje ziyana mezin ew digihînin civakê û mirovan. Mirov dîsa dikare ziyana wan qebûl bike, bi awayekî xwezayî

îdeolojiyeke wiha hebûye îdîayên wan wisa ne. Em dibêjin ev gav bi gav, bi rêka îqnayê û bi têkoşînê gengaz e bê guhertin. Lê di vir de pirsgirêk kengê derdikevin û cidî dibin? Dema ku ew îdeolojiya çewt dibe îqtîdar wê demê pirsgirêk derdikevin. Her diçe kûr dibin. Ji ber ku ew îdeolojî di esasê xwe de bi vî rengî ye. Ji xwe re dibêje; “min heqîqet keşîf kir û ez bûm xwediyê heqîqetê.”

Tu dibêjî tiştek nabe, te bi rengê xwe heqîqetek keşif kiriye, min jî bi rengê xwe keşif kiriye. Lê nerîna min li ser heqîqetê ev e, ya te jî ev e! Ev mijareke têkoşînê ye, yan em ê hev îqna bikin, yan jî em ê hev îqna nekin. Di encamê de wê wiha bibe. Lê pişt re dibe desthilatî û dibêje min heqîqet girt û di destê min de ye, heqîqet ez bi xwe me, ev fikrê ez dibêjim ew e. Niha ez desthilat im û êdî xala îqna û neîqnakirinê nema ye. Pêwîst e tu jî bibî weke min. Eger tu weke wî nebî, te dikuje, darizîne, te teşhîr û tecrîd dike û derveyî her tiştî dihêle. Hemû rengên şîdetê yên fizîkî, fikrî li ser te dide meşandin. Ev şêwazê nêzikbûnê ziyaneke mezin dide civakê. Ji lewra divê em şiyar bin û bizanin ku îdeolojî di her demê de baş nînin.

Niha me tim pesin da, me got bê îdeolojî jiyan nabe, bê îdeolojî têkoşîn nabe, serkeftin çênabe hwd. Ev rast e, lê ev serkeftin û têkoşîn di encamê de li dijî hinek îdeolojiyên din in. Lewra şerê tê meşandin, şerê îdeolojiyan e. Şer beriya ku di qada leşkerî de dest pê bike, berî di meydana şer de dest pê bike di mêjî de dest pê dike. Di aliyê îdeolojîk de dest pê dike.

Di aliyê îdeolojîk de çiqasî argumanên te nêzikî rastî û heqîqetê bin, tu çiqasî bikarî biparêzî, bi qasî tu bikaribî xîtabî gel bikî. Ev, encamên qada şer jî bilind dike. Yan tu yê bi ser kevî yan jî bin kevî. Encamên vê têkoşînê jî meydana şer diyar dike. Lewra serkeftina bingehîn di îdeolojiyê de ye.

Dema îdeolojiyek negihabe rastiyê tiştek ji vê xerabtir nîne. Lê wer bide diyarkirin ku rast e, mûtleq e û di heman demê de bibe desthilat; ev pir xerab e. Ev yek civakê ji hal dixe. Civaka ku lêgerîna wê ya heqîqetê cuda be, civaka ku li gorî xwe heqîqetê cudatir dizane, ji nişkê ve xwe di bin hukmekî de dibîne, hikmê ku xwe bi zorê li ser ferz dike, civakê neçar dike ku weke xwe bide fikirandin. Di esas de ev nerast e. Ji vê encamên xerab derdikevin.

Lewra em ji vê re dibêjin îdeolojiyên fermî yên serdest, yên serwer. Îdeolojiya ku navê wê derbasî fermiyetê bû, têkiliya wê îdeolojiyê bi rastiyê re namîne. Rastî ew be, ne ew be, di encamê de ew fermî ye û divê tu wê qebûl bikî, ji xwe re esas bigirî. Vê nêzikbûnê di dirêjiya dîrokê de xerabiyeke mezin bi serê gelan de aniye.

Mînak welatên Hinda Çînî hebûn; Vîetnam, Laos, Kamboçya, ev welatên ha yên Hinda Çînê bûn. Beramberî mêtingeriyê şer dikirin. Şerê Vîetnamê meşhûr e, welatên din jî li gel wê dimeşiyan. Di sala 1975'an de dema ku Vîetnam rizgar bû, ya rastî ew her du welatên din jî yên Hinda Çînê jî rizgar bûn. Laos û Kamboçya jî rizgar bûn.

Di Kamboçyayê de rêxistinek bû desthilatdar. Navê wê rêxistinê Qimer Roj, Qimer navê wî gelî ye, 'Roj' bi Fransî 'Sor' e, yanî Qimerê Sor. Ew rêxistinek bû, wê jî xwe çep û komunîst didît. Navê serokê wê jî Pol Pot bû. Heta derengî jî sax bû û paşê mir.

Pol Pot xwendina xwe li Fransayê kiribû, teza xwe ya xwendinê li ser komunîzmê dabû. Li gorî wî komunîzm qalib in, metod in, hinek tiştên amade ne û divê civak li gorî wê bê çêkirin. Yanî ne ku komunîzm bi rengekî dînamîk di nav civakê de xwe bi rêxistin bike; lê civakê li gorî wê çêbike. Yanî komunîzm wekhevî ye û divê her kes di ziraetê de bixebite û kes ji kes cewaztir nebe. Bi vî rengî hinek formul pêş xistibûn. Bala xwe bidinê tiştên wî serokî kirî di pirtûkekê de digire dest. Di naveroka wê pirtûkê de propoganda dike, wiha nêzik dibe. Ger ziyanek wê hebe jî li ser wî û gelê wî heye. Mirov nikare bêje li ser tu kesên din hebe jî.

Di sala 1975'an de ew rêxistin bû desthilatdar. Dema ew serwer bûn xerabiyê di wê çaxê de dest pê kir. Vê carê Pol Pot çi kir, ew tiştê ku pê bawer bû, bi zorê li ser civaka xwe pêk anî. Bangewaziyeke herî xerab dest pê kir û got: "Di komunîzmê de pere tune ye." Xwendevan ji dibistanan derxistin û berê wan dan zeviyan, memûr jî wisa kirin hwd. Qaşo ve civaka xwe kir civakek komunîst. Civak li gorî mantiqê xwe birêxistin kir.

Lê mirov lê temaşe dike pêwîstiyên civakê ji gelek tiştan re hene. Ji bo kar û xebata wê bimeşe divê memurên wê hebin, xwendevanên wê hebin hwd, gelek tiştên din jî hene. Pere heta astekê di nav civakekê de divê hebin, heta astekê divê xwe pê bidin meşandin. Ev hemû rakirin û nehiştin. Yên ku ev sîstem qebûl nekirin û li dijî wê rawestiyan yan jî serî hildan, bi kuştinê encam dibûn. Gelek kes di wargehan de ji birçîna terkî mirinê kirin. Yên birçî hatin hiştin û mirin, gelek kes jî hatin kuştin.

Pol Pot sê salan hikm kir, ji 1975'an heta 1978'an pişt re rewş pir xerab bû û Vîetnam neçar ma ku destwerdanê li ser wan bike. Ew ji desthilatiyê avêtin û yekî din anîn şûna wî. Pol Pot jî bi vî rengî piştî ketina wî ya ji hikm, di daristanan de ma heta çend salan piştre mir.

Di hundirê van sê salên ku wî hikm kir, li gorî hejmarên ne fermî sê milyon kes, li gorî hejmarên fermî jî zêdetirî miliyonekê însan hatin tesfiyekirin. Wê demê mirov dibîne dema îdeolojiyekw çewt bi îdîaya ku heqîqet dîtiye û kiriye milkê xwe, li gorî wê tevdigere, ziyaneke bêhempa dide, civakan ji hal dixîne û hildiweşîne û xirab dike.

Dîsa di tecrûbeya sosyalîzmê de jî ev tiştên wiha çêbûne. Marks û Engels kapîtalîzmê rexne kiribûn û nirxandibûn. Hem lêkolîn li ser kiribûn, hem jî baş rexne kiribûn, ev rastiyeke ji rastiyên wan bû. Li dijî kapîtalîzmê têkoşîneke cidî meşandibûn, ev jî rastî bû. Di encamê de ew fikra bi serokatî yan jî rêbertiya Lenîn li Rûsyayê bû desthilatdar.

Di sala 1917'an de şoreşa Oktoberê pêk hat. Lê ev di encamê de fikirek e, fikir jî li ser esasê çareserkirina pirsgirêkên civakê pêş dikevin. Teoriya civakî ji bo nirxandina civakê ye. Ne tenê israrkirina li ser ya xwe ye. Divê civakê bibîne û li gorî wê diyar bike.

Ev dema derket di serî de pir serkeftî bû. Yan jî sedemên wan serkeftinan çi bû? Ji ber ku sosyalîzm ji kapîtalîzmê pêşdatir bû, daxwazên gel pêk dianî. Lê sosyalîzmê bi demê re xwe nû nekir û xwe zêde nekirin û şaşitiyên xwe derbas nekirin, gav bi gav nakokiyên wan bi civakê re çêbûn. Pêşî gotin ev kesên ku nakokiyan derdixin li dijî şoreşê ne, ji bo vê divê em wan tesfiye bikin, lewra tesfiye jî kirin. Yên li dijî şoreşê tesfiye kirin, lê dîsa jî civak ji vê nêzikbûna wan razî nebû. Vê carê çi kirin? Ji bo ku ev civak ji aliyê sînorên wan xîz kiriye ve ji rexê fikir û kar derbas nekin hewldan tevdîr bigirin, tevdîr jî li gorî planên xwe girtin. Tevdîrên wan çi bûn? Tevdîrên wan jî; polês, îstixbarat, îşkence, mişextvanî, kampên kar bûn.

Bala xwe bidinê rêxistinek bi îdîaya azadiya însanan derketiye ser dikê, bi ser jî dikeve, lê piştre êdî ew bi xwe dibe asteng li pêşberî însanan. Ew bi xwe êdî vê carê dibe amûrekî zor, zordariyê, îşkence, kuştin û tesfiyekirinê. Sedemên vê çi ne? Sedem ew îdeolojiya ku ji xwe nabuhire û bi xwe re nîqaş nake ye. Rexnelixwegirtinê esas negirtin, xwe nû nekirin, ketina nav qaliban û dogmabûn sedemên esasî ne. Li xwe tenê dinêre li derdora xwe nanêre, lewra rastiyan red dike. Ji nedîtî ve nêzik dibe. Ji diyardeyên heyî

re dema bêje tune ye, lê ya rastî jî tiştek wiha tune be, ev dibe krîz û nema ji nav lîtava wê derdikevin. Lê ya rastî jî tiştên ew dibêjin tune ye bi xwe heye. Mînak gundî, dîndar, rewşenbîr û ev beşên civakê hemû jî hene û tu wan nabînî.

Dema ev diyardeyên di nav civakê de dixwazin xwe îfade bikin, li nav serê wan dixe, yan wan dikuje, yan jî dişîne wargehên kar û îşkencê li wan dike. Salek du, sê, gihîşte astekê ku civakê hew tehemul kir, lewra sîstema sosyalîzmê di carekê de hilweşiya.

Wê demê îdeolojî di aliyê pirsgirêkan, nêzikbûnan de jî beramberî van pratîkên wiha jî tê. Lewma dema em têkoşînekî dimeşînin divê beriya her tiştî em îdeolojîk bimeşînin. Çima pêdiviya vê yekê heye? Ji ber ku pirsgirêka me çi nîşanî Tirkiyê dide? Bi awayekî fermî îdeolojiya me heye, heta ew dewlet îdeolojiya xwe neguhere, tu demê pirsgirêka Kurd çareser nabe. Bila destûrên bingehîn biguhere, bila filan kes, serokê ku dibe bila bibe, rabe û bêje; "em û Kurd bira ne". Lê dewletek e ku tê de rêveberî li ser esasên îdeolojiya fermî hatiye avakirin.

Di wê îdeolojiya fermî de çi heye? Di nav îdeolojiya wê de nijadperestî, miletperestî, dîngerî û înkarkirin heye. Mînak dibêje: "kesên li ser vê axê dijîn hemû Tirk in." Tenê vê dibêje. Lê tu jê re dibêjî; "Ev Kurd e," dibêje; "nabe Kurd hebin, di îdeolojiya fermî de Kurd nînin." Yanî yên li ser vê axê dijîn hemû jî Tirk in, hew ew qas. Çênabe ku Kurd hebin, lê tu dibêjî; "Ez Kurd im û zimanê min cuda ye." Lê

ew dibêje; “çênabe ku zimanê te cuda be.” Wê demê divê Kurd nebin.

Îdeolojiya fermî tê vê maneyê. Îdeolojiya fermî di Tirkiyeyê de çi ye? Îdeolojiya fermî di Tirkiyeyê de du bingehên wê yên esasîn hene. Yek nijadperestî ye, yanî neteweya Tirk di ser her neteweyê re dibîne. Ya duyemîn jî dîngerî ye û ew dîngerî jî Sunî ye, Sunî jî Henifî ne, ev mezheb di ser hemû mezheban û dînan re ye. Ji bo vê li Tirkiyeyê sîstema siyasî em bala xwe bidinê, di nav nijadperestî, faşizm û dîngeriyê de dem demê çûye û hatiye. Ji ber ku îdeolojiya fermî ev e.

Ji bo vê Elewî, Şîa, Kurd, Azerî, Laz ev hemû tune ne. Ango derveyî Tirkan kesên din tune ne, çênabe hebin jî. Ji ber ku dema ev hemû hebin wê demê divê îdeolojiya fermî ji holê rabe. Ew jî nayê nîqaşkirin, carekê sînorek ava kirine û gotine di nav vê axê de unsûrên li ser vê axê hene, ew jî Tirk in. Weke din tu kesên din tune ne, yên heyî jî Îslam û Sunî ne. Lewra heta ku ev hilneweşe pirsgirêk çareser nabin. Vê jî dikin bihaneyeke cidî. Mînak, sondeke wan heye, zarok her sibe, dibêjin: “Tirk im, rast im, jêhatî me…”

Wiha bûye dema ku zarokên Almanan jî diçin dibistanên wan bi wan jî vê sondê didin xwendin. Erbakan carekê wiha got: “Hûn bi zarokan vê didin xwendin û dibêjin: ‘Tirk im jêhatî me…’ Wê demê zarokên Kurdan jî wê bêjin: ‘ez jî Kurd im û jêhatîtir im.” Du, sê roj bi vê gotina wî re neçû û

derbe lê xistin û ji ser hikm danîn. Çima wiha ji ser desthilatdariyê danîn? Ji ber ku îdeolojiya fermî nîqaş kir?

Ji bo vê têkoşîna me pir binirx e. Me çi kir, me di îdeolojiya fermî de qelîştekên pir mezin vekirin. Me hinekî ew îdeolojiya wan perçe kiriye. Hîna jî li ser a xwe israr dikin, lê êdî kes nikare li ser gelê me înkarê bide meşandin. Êdî me gav bi gav ew sondên di dibistanan de tên xwendin ji holê rakirine. Lewra weke berê êdî ne derbasdar e û kes naxwîne. Heta sibê bila bêjin, mînak panêl çêdibin, kesekî Kurd dibêje; “Ez Kurd im û bi salan we ev bi me da xwendin, ev da xwendin, lê ez ne ew im, ez Kurd im. Zimanê min jî cuda ye, ji bo vê divê ez bi vî zimanê xwe perwerdê bibînim.” Ew dibêje; “temam tiştê tu dibêjî rast e, lê ev dewleta me ne ew dewlet e. Dewleta me yek netew tenê di nav de heye. Yek milet tenê dikare perwerdê bibîne.” Ji bo vê heta asta dawiyê rewşeke ehmeqane ye. Wek dînan, rewşek ji derveyî aqilan derdikeve holê. Lê di heman demê de desthilatdar e. Bala xwe bidinê bêwijdaniya wê di ku de ye? Zarokekî Kurd e, dê û bavê wî bi Kurdî pê re xeber didin, lê dema diçe dibistanê bi dengê bilind bang dike û dibêje; “ez Tirk im…” Eger nebêje lêdanê dixwe. Ev mînakên rojane ku em rastî wan tên, bi çavên xwe dibînin û dijîn.

Mînak, îdeolojiya Ereban a fermî heye, herî zêde di rêka partiya Baas de xwe zêdetir diyar dikin. Ew jî dibêjin: “Ji okyanusa Atlantîk, Fars, Mexrib, Tunis, Libya wan deran heta bi Kendava Fars, heta başûrê Îraqê, hemû Ereb in.” Lê di vê erdnîgariyê de bi sedan milet dijîn, ew milet hemû

înkar kirine, da ku ew gel xwe komîserhev nekin, xwe rêxistin nekin, şer çênebe û lêdan û kuştin çênebe her tiştî dikin. Sedemek jê jî ew e ku mirov pê nahese ku ew gel jî hene.

Mînak kê berê zanîbû ku li başûrê Sudanê miletekî cuda heye. Kê berê dizanî ku di Cezaîrê de miletekî cuda heye? Kê berê dizanibû li ku miletên cuda cuda hene. Ev dişibine mînaka gelê Kurd.

Weke din jî ew qas dîn û mezheb hene, pir reng û çand hene, lê mixabin rojane dimirin. Çima wiha dibe? Ji ber ku îdeolojiya fermî tenê tiştekî qebûl dike û dibêje: “Li vir miletek heye Ereb e û dînek heye ew jî misliman in. Weke din tu dîn, reng û mezheb nînin.”

Ji ber vê yekê ew qas asîmîlasyon çêdibe. Lewra desthilatiya îdeolojîk a çewt pir xerab e. Ew desthilatî însanan digihîne asteke ku însan bi xwe, ji rastiya xwe, çand û rengê xwe direvin. Mînak bala xwe bidinê, zarokên Kurdan li dijî rastiya xwe dixwînin û xwe înkar dikin. Lê bi awayekî serbilind xwe înkar dikin, bi dirûşman xwe înkar dikin. Ya rastî diviyabû ku li ser vê rewşa xwe bigiriyana, lê ji bo vê rewşa xwe nagirîn. Ev, dagirkirina îdeolojîk e.

Mînak Kurd li xwe xwedî dernakevin û asîmîle bûne. Tu lê temaşe dikî Kurd e, lê dibêje; “Ez Tirk im.” Bi zimanê biyanî xeber didin, sedemên van hemûyan çi ne? Ev dagirkirina îdeolojîk di mejiyê wan de pêk hatiye. Ji ber çi desthilatdarî pir xerabiyê dimeşîne, îşkencê dike, dikuje û

piştî wê êrîşî çandê dike. Dijmin van hemûyan pêk tîne da ku di her warî de bi ser keve.

## Dagirkeriya Li Ser Jinê Ne Fizîkî Ye Îdeolojîk E

Însanan ji nirxên wan ên netewî dûr dixin. Ji nirxên wan ên çandî dûr dixin. Bi vî rengî însan digihêje astekî ku ji înkarkirinê û dagirkirinê re amade dikin. Êdî wisa dibe ku ji xwe înkarkirinê re hazir dibin.

Mînak jin jî wiha ye, dagirkirina jinê dagirkirineke îdeolojîk e. Ev mînaka îdeolojîk di ku de diyar dibe? Dema mirov li dîrokê vedigere mirov dibîne ku jin di serî de xwedawend in, pîroz in. Di navenda çalakiya civakê de ne. Zarok bi dayîkê tên nasîn. Malbat bi jinê tê avakirin, çandin û gund li derdora jinê çêdibe. Lê belê piştre dikeve asta duyemîn û paş dikeve. Lê ev serdestiya li ser jinê di encamê de demî ye. Ji ber çi demî ye? Eger li cihekî bindestî çêbû, li cihên din bindestî çênabe. Wê li cihên din berovajiyê vê rewşek hebe. Bi demê re wê gav bi gav bandora xwe li ser wî cihê ku bindestî û dagirkerî tê de heye bike û dîsa sererast bibe.

## Jin Bi Îdeolojiya Desthilatiyê Hatiye Reşkirin

Me gotibû bi demê re rewşên bindestiyê tên guhertin, bindestî mayînde nînin. Lê ji bo ku sererast nebe û ew

bindestî mayînde bibe çi dibe? Gav bi gav êdî ew bindestî bi bindestiyeke îdeolojîk tê temamkirin. Ew jina ku di mîtolojî û wêjeyê de ku cihekî pîroz digirt, lê di heman lîteratur û mîtolojiyê de cihekî çawa digire, cihekî xerab digire. Bi rengekî xerab û reşkirî tê nasîn.

Dema em digihîjin serdema dînên yekxwedayî, rewşa jinê hîna xerabtir dibe. Mînak hemû pirtûkên dînî Tewrat, Quran û Încîl jî li dijî jinê tiştên neyînî digotin. Niha di roja me ya îro de îslama siyasî ji bo ku xwe bi jinan bide qebûlkirin dibêjin: “Îslamê wiha gotiye û wiha negotiye.” Lê ya rastî ev hemû jî ji gotinan wêdetir tiştek din nînin. Mirov dikare bêje dagirkirina li ser jinê temam bûye. Rêbertî dibêje: “şikandina duyemîn di serdema dînên yekxwedayî de çêbûye.” Di dînên yekxwedayî de digotin; “jin xerab in, sedemê hemû rengê xerabiyê ne…” Gelek tişt li ser jinê hatine gotin. Bi vî rengî jin derveyî hemû karên civakî dihatin hiştin. Ger ev ji aliyê zilaman tenê ve hatibûya gotin dîsa baş bû, heke wiha be wê jin zêde ziyanê nebînin. Lê dema bigihîje wê asta ku jin bi xwe li ser xwe van gotinan bêje, ew dagirkirineke îdeolojîk e.

Di serdema me ya îroyîn de ne tenê zilam jinê mehkûmê bindestiyê dike, jin bi xwe jinê mehkûmê bindestiyê dike. Ew hikmê civakî yê ku bi salan e li ser hatiye pêkanîn, êdî gihîştiye astekê wê bi xwe ev nêrînên sîstema desthilatdar li ser xwe qebûl kiriye.

Lewra em bala xwe bidinê dema ku dijmin bêje Kurd bêhiş in, nezan in, ziyana van gotinên dijmin zêde tune ye. Lê kengê dikeve rewşeke xerab? Dema ku Kurd bi xwe ji hev re bêjin Kurd bêhiş in. Di roja me ya îro de em rastî van gotinan jî tên, ev êrîş di hundirê civaka me de jî pêş ketiye. Ji bo vê dagirkirina îdeolojîk a herî xerab e.

Îdeolojiya çewt dema bibe serdest ziyanê dide civakê. Bêhempa xerabiyê bi xwe re tîne. Mînak mirov dikare vê di rewşa Kurdan de bibîne, gelekên din jî heman rewşê dijîn. Di sosyalîstên kevn de mirov vê dibîne, herwiha di rewşa jinê de jî mirov dikare bibîne. Lê belê çima ev pêş dikevin? Ji ber ku teşekirina civakê li ser esasekî çewt e, ev dihêle ku rewşên wiha pêş bikevin. Ev xerabiyeke mezin dide civakê. Ji bo vê divê em girîngiyeke mezin bidin têkoşîna îdeolojîk. Divê em xerabiyan sererast bikin, em giringiyeke mezin bidin têkoşîna îdeolojîk!

Em bi giranî li ser qadên ku divê xebata îdeolojîk lê bên kirin rawestiyan. Dîsa em li ser taybetmendiyên ku derdikevin pêş sekinîn. Bi taybet jî kapîtalîzm û nasnameya serdestiyê ya îdeolojîk çi ye. Îdeolojî û desthilatdarîbûna wê, li ser van babetan hate rawestandin.

## 4- NASNAMEYA ÎDEOLOJÎK A TEVGERA AZADIYÊ

Em ê di vê beşê de li ser qada çand û hunerê, ragihandin û zanistê bisekinin. Têkoşîna îdeolojîk di nav tevgera PKK'ê de çawa tê meşandin? Nasnameya îdeolojîk a tevgera azadiyê û metodên têkoşîna me esas digire çi ne? Tevgera PKK'ê bi xwe tevgereke îdeolojîk e. Di destpêka hilhatina xwe de mijara îdeolojîk ji xwe re esas girtiye, niha jî dema em dibêjin, sî û du sal di ser damezirandina PKK'ê re derbas bûye, tevgera me derbasî sala sî û sisêyan bûye. Weke hejmar zêde rast nayê destgirtin. Ji ber ev reqemên em behsa wan dikin, ji kîjan salê tên destpêkirin? Ji sala 1978'an ve tê destgirtin, lê di bingeh de têkoşîn beriya vê dest pê kiriye. Lewra dema em dibêjin sî û heft sal an jî sî heşt sal di ser damezrandina tevgera me re derbas bûye wê rastir be. Ji ber çi em dibêjin wê rastir be? Di bingeh de ya ku hişt PKK li ser piyan raweste, bê navber têkoşînê bide meşandin û li beramberî hemû zor û zehmetiyan bisekine, xwedî seknek be, timî serkeftinê bijî, di esas de ew hazirî û xebata îdeolojîk a ku beriya 1978'an çêbûye bû.

Roleke wê serdemê ya girîng di çêbûna tevgerê û tespîtkirina nasnameya wê ya îdeolojîk de hebû. Wê pêvajoyê hişt ku PKK cuda be. Yanî di qada Kurdistan û Tirkiyê de wek qonaxekî wesfî ye, xwe nîşan da. Ji rewşa heyî, ji rêxistin û şêwazên xebatên heyî cudatir bû. Heta ji fikrê heyî jî cudatir bû. Yanî bi tiştên heyî nerazîbûneke tevgerê hebû. Bi formulên rêxistinî û tespîtên îdeolojîk ên

di rastê de ku li Kurdistan û Tirkiyeyê hebûn, ji wan nerazîbûna rêxistinê hebû.

Ji aliyê pêşengtiya Rêber Apo û hevalên pêşeng ên tevgerê ve, rewşa heyî nehate qebûlkirin. Da ku ev tevger nasnameya xwe diyar bike û bigihîje nasnameyeke nû ket nava hewldan û xebateke mezin û berfireh. Di esas de ew têkoşîna di hundirê wan salan de çêbûbû, wê, PKK'ê ji kesên din cudatir kir. Wê demê ew cudabûna PKK'ê ji rêxistinên din, di esas de cudabûneke îdeolojîk bû.

Pêwîst e mirov taybetmendiyên îdeolojîk di nava PKK'ê de bi vî rengî nas bike! Bi awayekî gelemperî di Rojhilata Navîn de, bi taybetî jî yên di welatê Kurdistanê de dagirkeriyê dikin, divê van taybetmendiyên PKK'ê bizanin. Beriya PKK'ê tu tevgerên şoreşgerî li ser esasên berjewendiyên gel, ji bo maf û azadiyê bixebite, bi ser neketiye.

Di nav welatên Ereban de gelek hewldan çêbûn, lê ev hewldan bi şêwazên herî faşîst, hatin rawestandin û derbe xwarin. Di encamê de wehşiyeta di zindanên Suriye, Îraq û gorên komî de, hemû rengên îşkencan, kuştin û mişextvan kirin. Tiştê ku hatine jiyîn, ev bûn sedem ku hewldanên şoreşgerî yên ciwanan encameke baş bi dest nexin.

Cardin li Tirkiye û Îranê gelek hewldanên wisa çêbûn. Di Tirkiyeyê de mirov dikare bêje hema bê navber têkoşînek hebû. Li Kurdistanê heta salên çilî hewldan hebûn. Li Tirkiyeyê jî ji aliyê tevgerên çep û demokratîk ve li dijî

rejîm û sîstemê têkoşînek didan meşandin. Lê belê em lê temaşe dikin ku rejîma serdest di Tirkiyeyê de bikaranîna hêzeke leşkerî ya mezin, dîsa bi rêbazên faşist, karibûye wan tevgerên siyasî yên ji bo guhertinê pêş ketine tesfiye bike.

Ev nêzikbûnên sîstemê yên her dem bû sedem ku binkeftin, li pêşberî gel bibe weke çarenûsekê. Yanî kesên baweriya wan bi têkoşînê jî dihat, baweriya wan bi serkeftinê nedihat. Gel wiha dihizirî, rast e rejîmeke xerab heye, girîng e em li dijî wê têkoşînê bikin, lê serkeftin bi dest nakeve. Ji bo vê em lê temaşe dikin ku kesên wiha li hemberî rêjîmê serî hildane, kes wiha heta dawiyê rêka xwe ya têkoşînê neşopandine. Heta serkeftinê rêka xwe bi dawî nekirine.

## Ji Bo Azadiyê Têkoşîna Gelên Rojhilata Navîn

Hinek ji wan kesayetên ku têkoşîn dikirin piştî ku derbe xwarin di nîvê rê de, bi şûn de zîvirîn. Yan jî mirov dikare bêje bêbawer bûn. Lewra cih, rewş û sekna wan bandoreke mezin li ser moralê gel, şoreşgeran û ciwanan di aliyê neyînî de çêkir. Lewma êdî ji ser êslê xwe vegeriyane, dîroka xwe ya şoreşgeriyê înkar kirine, ketine xizmeta rejîmê. Bi rengekî ji rengan çi di warê ragihandinê de be, çi jî di warê burokrasiyê de be, çi di warê qada ekonomî de, ew kesayet bûne parçeyek ji sîstemê.

Dema em li vê dîmenê temaşe bikin em ê çi jê fêm bikin? Bi rastî di Rojhilata Navîn de kêm têkoşîn nehatine meşandin! Ji ber ku dîroka Rojhilata Navîn, bênavber dîroka îşkencê ye. Dîrokeke zindanan e, lêdanê ye, kuştin û qirkirinê ye. Ev hemû jixweber nebûne. Ev hemû sedemên wê hene û sedemên wê jî têkoşînek hebûye û milet jixweber ev sîstema dagirker a desthilatdar li ser xwe qebûl nekiriye. Lê di Rojhilata Navîn de ev jî heye, tiştek xwe dubare dike heye. Çi ye ev tiştê xwe dubare dike? Hemû hewldanên ji bo rûxandina sîstema desthilatdar, ew hewldanên ji bo hilweşandina sîstema desthilatdar hema bêje bi binkeftinê encam bûne.

Ev bi xwe re şûnpêyekê dihêle, di heman demê de qenaetekê pêş dixe. Ev qenaet çi ye? Têkoşîn di Rojhilata Navîn de bi ser nakeve. Ev ji aliyê gelek kesan ve, bi giranî kesên hinekî temenê xwe mezin ve tê gotin. Hinek kesan di civakê de ev tişt digotin: "Her kes hewldan kir, lê kes bi ser neket û lewra hemû hewldanên li dijî sîstemê hewldanên bê encam in.

PKK'ê wek tevger neçar bû yan bibe rengekî ji dubarebûnan, yan jî hilhatineke nû pêk bîne. Wê çaxê divê mirov bersiva vê bide? Gelo sedemê binkeftina têkoşînê xwedî maf, hêz û mezinbûna sîstema desthilatdar bû? Yan jî sedemên binkeftinê performansa kêm a tevgerên şoreşgerî bûn? Gelo sedem ji van herduyan kîjan e?

Îsyanên bi şoreşê ve girêdayî ne, divê bersivekê rast bidin daxwazên gel. Lê di gelek cihan de mirov dibîne ku nikarin bikin. Lewra dibêjin, "me hewldan kir, tiştên hebûn û me karibû bikin me kir, lê serkeftin çênebû, teqez ev jî ne sûcê me ye. Dijmin hêza wî giran e, guneh û sûcê me tune ye. Ji vê û şûnde hêza dijmin heye û dostên wî yên derve hene û hwd." Bi vî rengî nêzik dibin û îfade dikin.

**Nêzikbûna Tevgerên Kurd Ên Berê Ji Azadiyê Re**

Lewra pêwîst e ev pirs bê bersivandin, gelo PKK'ê jî weke van hêzan bersiv da? Jixwe sîstema desthilatdar sîstemeke xerab e, faşist e û ev rast in. Dostên wî yên derve jî hene ev jî rast e, ev hemû jî rast in. Di van aliyan de tiştekî ku mirov red bike tune ye. Lê belê sedemên ku hemû tevgerên şoreşger di vê herêmê de bi binkeftinê encam bûne çi ne? Pêwîst e mirov bizane ku sedemên wê, ne tenê xurtbûna sîstemê ye! Di heman demê de sedemên wê performansa nêzikbûnên ne bingehîn, sekna ne li gorî milîtantiyê ye. Bi gelemperî pirsgirêk di sekna tevgerên şoreşgerî bi xwe de ye. Wê demê pir girîng bû ku tevgera şoreşgerî di ber çavan re derbas bibûya. Ka gelo tevgera şoreşgerî çawa nêzikî xebatê û sîstemê dibe? Ev tevger heta kîjan astê têkiliya xwe bi sîstemê re qut kiriye, yan jî qut nekiriye! Ev hemû mijarên pir girîng in.

Mînak em li tevgerên Kurd temaşe bikin. Tevgerên Kurd dema ku neçar mane serhildan kirine. Tu carî serhildaneke

bi perspektîfên azadiyê pêş nexistine. Ji neçariyê serî hildane. Yanî bi xwe li ser esasên rêxistineke hundirîn û hedefeke diyar rabin û li gorî wê her kesî bikin nava tevgerê, di çarçoveya planekî siyasî û leşkerî yê diyar de tevbigerin… ev tişt tune ye. Rewşeke wiha di Kurdistanê de nehatiye jiyîn.

Xala din a xirab di Kurdistanê de çi bûye? Tevgerên siyasî yên li dijî dewleta dagirker şer kirine gelek caran ew şer weke şerekî li ser esasê çareserkirina pirsgirêka Kurd negirtine dest. Ne ji bo peydakirina maf û azadiya gelê Kurd bûye. Lê ji bo pêkanîna plansaziyên hinek dewletên herêmî, yan jî navnetewî çêbûne.

Mînak tevgera Kurd ya li başûr di navbera salên 1961’ê heta 1975’an de, têkoşîna wê di esas de xizmeta daxwaziyên Emerîka, Îran û Îsraîlê di herêmê de kir. Kurdan têkoşîn kir, Kurd hatin kuştin, gundê wan hatin xerabkirin, gelek êş û elemên mezin hatin kişandin! Lê di encamê de çi bû? Kurdan maf û azadî bidest nexistin. Lê Îranê qezencên siyasî, stratejîk jê girtin. Emerîkayê jî qezenc kir, ne ku em van dibêjin, jixwe hemû nivîskî ne.

Tevgerek bi vî rengî wer nêzik bibe, wê meşa wê lewaz be û wê zêde nikaribe bigihîje armancên xwe. Wê demê sedemên binkeftina tevgerên Kurd ên li dijî dewletên dagirker di têgihîştinên wê yên hundirîn bi xwe de ne. Dijmin jixwe diyar e, dijmin înkar dike, li ser esasê tunebûna tevgerê tevdigere. Ya girîng sekna te çiqasî ji bo

serkeftinê amade ye! Têkoşîna te çiqasî ji bo serkeftinê heye, te ji bo serkeftin ewle bibe çiqas tişt peyda kirine? Yanî her tiştê ku serkeftinê bike bin ewlekariyê, te çiqasî pêk aniye?

Di heman demê de di tevgera Çepê Tirk de jî ev tişt hene. Ji ber ku vê tevgerê xwe ji sîstemê qut nekiriye. Yanî xwe ji wê sîstema dagirker a desthilatdar qut nekiriye. Parçeyek ji dîroka xwe dibîne û lê xwedî jî derdikeve!

Dîsa li beramberî mesela Kurd xwedî sekneke milîtantî, li ser esasê edalet û qebûlkirina rastiyan nêzik nabe. Ev hemû bûn sersebebê ku têkoşîna wan a li dijî rejîmê têkoşîneke bisînor be. Vê têgihîştinê hişt ku têkoşîna wan bi tevahî û bingehîn nebe. Lewra em temaşe dikin li beramberî hemû rengên astengan binkeftin û alozî jiyan.

## Tekoşîna PKK'ê Di Rojhilata Navîn De Hêviya Serkeftinê Pêk Anî

PKK'ê ev rewş baş dîtin. Ji bo vê diviyabû PKK metodekî têkoşînê peyda kiriba ku êdî ew dîroka neyînî ya her dem xwe di Rojhilata Navîn de dubare kiriye, vê carê xwe dubare neke. Vê carê têkoşîn bi binkeftinê na, bi serkeftinê bi encam bibûya. Diviyabû ev trajedî bihatiba sererastkirin. Ji ber ku her carê tevgerek radibû, lê mixabin ku hildiweşiya. Vê bi xwe re xeteriyeke wiha jî dianî ku roj bê û derfetên rabûna tevgerekê jî nemîne.

Di esas de tevgera rejîma 12'ê îlonê bi vê erkê hate ser desthilatdariyê. Ji bo ku careke din kes ranebe, ew pêvajo ji bo vê yekê bû. Bi wî rengî êdî tevgerên şoreşgerî di kevn de bimînin. Yanî dema gel behs bikin jî bêjin; "hinekan li hemberî dewletê hewldan, lê zêde bi encam nebû."

PKK di serî de li ser vê sekinî da ku dubare nebe. Lewra ruhê îdeolojiyê ev e. Îdeolojî û sekna îdeolojîk çi ye? Bi taybet jî ji bo însanekî bindest û gelekî bindest çi ye? Yanî serkeftinê ewle dike. Di zanebûna van tiştan hemûyan de ye. Di zanebûna xurtbûn, dijwarî, faşîzm, kedxwarî û înkarê de ye. Van hemûyan baş dizane. Tevî van hemûyan jî di serkeftinê de bi israr e.

Gelo çima em ji vê seknê re dibejin sekna îdeolojîk e? Beriya her tiştî çavkaniya wê di fikir de ye. Niha di vir de sîstemek heye, ev sîstem li ser esasên kedxwarî û înkarê, tunekirinê dimeşe. Mirov dikare bêje ev tiştên exlaqî ne? Teqez ne exlaqî ne! Tiştên exlaqî çi ne? Edalet û azadî ye. Neteweyek li ser neteweyeke din nebe, çînek li ser çînekê re nebe, cinsek li ser yê din re nebe û bi vî rengî mirov dikare pîvanên exlaqî bigire dest. Lê ew xalên din ne exlaqî ne. Lewra divê mirov li hemberî wê bêdeng nemîne.

Taybetmendiyên weke bindestî, serdestî yanî hiyerarşî û kedxwarî qerekterê mirovan nîne, ev jirêderketin û xerabiyek e. Tu carî mirov pê razî jî nebûne. Yanî jirêderketinek çêbûye, teqez divê mirov bi van teybetmendiyan nejî. Ji ber tu demî nehatine qebûlkirin. Li

ser vî esasî jirêderketin timî mehkûmê sererastkirinê ye. Tiştên ji rê derketibin neçarî sererastkirinê ne û nabe ku mirov pê re bijî. Wê çaxê mehkûmê hilweşandinê û ketinê ye. Di vir de, di esas de tevgera şoreşgerî ya ku serî hildide, têkoşînê dike mehkûmê binekftinê ye? Tu demî têkoşînên şoreşgerî neçarî binkeftinê nînin. Lê yên bêmafiyê dikin, ji rê derketinekê dijîn, wisa derveyî qerekterê însanî dijîn, ew mehkûmê binkeftinê ne.

Gelek mijarên din jî hene, mesela dîrokek heye, divê ew bê jiyîn, gelek heye divê bi nasnameya xwe, xwe îfade bike hwd. Gelek babetên din jî hene ku pêwîst e mirov li beramberî wê berpirsiyariyê bijî. Heke ev tespît bûn û şûnde, em bala xwe bidinê qerekterê rejîmê tê nirxandin. Neyînîbûnên heyî hemû tên nirxandin. Ev hemû jî ji bo ku tiştên rast li şûna yên xelet bên rûniştin in. Di serî de di mêjiyê mirovan de tên çareserkirin. Di mêjî û îradê de tên çareserkirin. Wê demê mêjiyê ku bi mêtîngeriyê re, bi dagirkeriyê re, bi bindestiyê re bijî, êdî tune ye! Mêjiyek wisa çêdibe ku êdî bi dagirkeriyê re najî, nikare bijî. Wê demê divê dagirkerî hilweşe, bi çi hilweşe? Dema biryar û hedefên te bilind bin, hedefên te tund û radîkal bin, tu yê wê çaxê di peydakirina şêwazên têkoşînê yên serkeftî de tu carî bêçare nemînî. Heger tu bi hedefên giranbiha kilît bûbî, wê çaxê di peydakirina rêbaz û şêwazê serkeftî de tu neçar namînî û tu yê wan jî peyda bikî.

Lewra PKK tenê bi nirxandina rejîma dagirker û rewşa gel, gihandina tespîtên rast ji bo çareserkirina pirsgirêkê

bes nema. Ji wê bêtir PKK'ê çi kir? Da ku ev fikrê hanê firsenda jiyanê bibîne, bi şêwazên serkeftî yên têkoşînê temam kir. Ji ber vê her tiştê PKK'ê balkêş bû. Fikrê wê, behskirina wê ji bindestiya Kurdistanê re, şêwazê wê yê têkoşînê jî balkêş bû. Şêwazê tevgerê, jiyanê, fedakarî, qehremanî, çûna bi ser hedefê ve, rûxandina dîwarê tirsê, ev hemû jî li Kurdistanê tiştên nû bûn, nûjen bûn. Ev hilhatin li ser xaka Kurdistanê pêş ket.

Lewra wê demê PKK'ê dizanibû ku bi dubarekirina şêwazê têkoşînê yê derbasbûyî, wê tu carî çareserî çênebe, tevgerê ev baş dizanî. PKK'ê ev jî dizanî ku bi kopyakirina şêwazê têkoşînê yên li cihên din çêbûne, bi wê jî nikare çareseriyê pêk bîne. Bêguman ders ji dîrokê tên girtin, ji têkoşîna gelên bindest gelek tecrûbe û dersan mirov digire. PKK'ê jî ji van tevgeran qasî pêwîst bû girt. Lê PKK'ê ev jî zanîbû; rastiya Kurdistanê, rastiyeke serbixwe ye! Rastiyek û heqîqeteke Kurd heye. Heqîqet jî şert û mercên wê cuda ne. Ev heqîqet di çarçoveya şertên xwe de, yên madî yên ku pêwîst e di çarçoveya wê de xwe îfade bike. Dema xwe îfade dike divê ji hinek tiştan dûr bikeve? Tevgereke Kurd heye, li her derê Kurdistanê jî têkoşîn kiriye, lê mixabin bi ser nektiye. Divê tevgera PKK'ê teqlîda wê tevgera Kurd an jî yên din neke. Yanî xwe jê dûr bixe. Ji ber ku teqlîd bike wê ew jî heman çarenûsa binkeftinê bijî. Lewra divê xwe jê cuda bike û taybetmendiyên cudatiyê bijî.

PKK divê li gorî tevgera Çepê Tirk kar kirî kar neke. Ji ber çi? Ji ber ku nexweşiyeke wê tevgerê ya kronîk heye, ew jî

hin caran germ dibe û paşê hildiweşe. Her deh salan gavek davêt, dema dewlet bi ser de diçû, vê carê jî nedikarî zêde li ber xwe bide, yan jî têkoşîneke mayînde bide meşandin. Li ser vî bingehî hilweşiya.

PKK'ê wê ev çarenûs parve nekiriba. Ji bo xwe ji vê xelas bike divê PKK li tiştên nû bigere. Lewra di destpêkê de PKK'ê baweriya serkeftinê bi xwe re da rûniştin. Çima wiha kir? Ji ber ku ew xalên lewaz ên bûne sedemê hilweşandin û binkeftina tevgerên Kurd û çep di herêmê de, PKK'ê ew xal baş derxistin zanebûnê. Ji bo wan xalan dubare neke û nekeve nav wan kêmûkurtiyan, tevdîr girt. Lewra têkoşîna îdeolojîk û zelalkirina xetê, milîtanê xetê ev bi xwe ne. Tevdîr ew e ku tu nehêlî ev lewazî peş bikevin. Li beramberî wan tevdîran deynî.

## Sermayeya Navnetewî Di Rojhilata Navîn De Ji Xwe Re Hevkaran Çêdike

Di vê çarçoveyê de naskirina PKK'ê û fêmkirina wê pir girîng e. Ger bala we kişandibe dema dawî hinek guhertin çêbûn. Ev guhertin çi ne? Nakokiyên emperyalîzm, Emerîka welatên Yekîtiya Ewrûpa yanî bi gelemperî sermayeya navnetewî û hêzên herêmê çêbûn. Bi miliyetparêziyê re, dîngeriya Ereban re çêbû. Bi Îranê re jî ev nakokî heye. Ew nakokî bi hêzên herêmê yên statûkoparêz re çêbû. Berê ew û hêzên herêmî dostên hev bûn, di bîst salên dawiyê de

hêdî hêdî ew nakokî gur bûn. Li şûna dostaniyê, nakokî pêş ket.

Da ku sermaya navnetewî hêzên statûkoparêz di herêmê de lewaz bike, pêdivî bi hêzeke ku wê destek bike dît. Yek ji wan hêzên ku sermayeya navnetewî destek bike tevgera miliyetparêz a Kurd bû. Tevgera miliyetparêz a Kurd û hevkarên Kurd dît. Ev tevger her demê li ser esasê desteka emperyalîzmê û sîstema kapîtalîst li ser piyan sekinî. Berê jî Emerîka Şahê Îranê destek dikir, di roja me ya îro de Emerîka û Îngiltere wan destek dikin.

Wê demê di vir de çi heye, van hêzên hevkar wisa bi hêza xwe, bi rêbazên xwe yên siyasî yên rast, bi xeteke îdeolojîk a rast û bi şêwazên têkoşînê yên serkeftî tu serkeftin qezenc nekirine. PDK'ê, YNK'ê ev serkeftin qezenc nekirine. PDK'ê û YNK'ê bi tank û firokên Emerîkayê tişt qezenc kirine. Yanî li ser esasê xeteke siyasî ya rast, rêxistineke wisa bihêz, yan jî şêwazên têkoşînê yên cidî, bi xeteke îdeolojîk a zelal tevnegeriyane. Li ser van bingehan têkoşîn kiribûna û qezenc kiribûna, wê demê me yê ji wan re li çepikan bida. Lê mixabin tiştek wiha nîne! Berovajiyê vê ew qezencên ji biçûk heta mezin, her tiştên ku qezenc kirine bi temamî girêdayî Dewletên Yekbûyî yên Emerîka û Îngiltereyê ye.

Kes nikare vê yekê bêje: "Van têkoşîn kirin û bi ser ketin." Wan di bingeh de dev ji têkoşînê berdabûn û binkeftî bûn, li derveyî welat bûn. Emerîkayê ew komî ser hev kirin,

ji wan re qadeke bi ewle peyda kir. Bi rêka hêza ku ji derve ve mudaxele kir ew kirin desthilatdar.

Ev desteka wan hêzên mêtinger kengê bi pêş ket? Dema ku tevgera PKK'ê şaxên xwe li her deverekî Kurdistanê vedida, wan jî ev tevgerên din dane pêş. Bi taybetî jî ji ber ku bi navê gel, maf, azadî û tevgera azadiya gelê Kurd, di pêşengiya PKK'ê de li Bakurê Kurdistanê mezin dibû, vê dihişt ku bandora xwe li ser her sê parçeyên Kurdistanê yên din jî bike. Da ku emperyalîzm tevgera PKK'ê bisînor bike, astengan li peşberî wê çêbike û nehêle mezin bibe, nehêlin di hemû Kurdistanê de serwer bibe. Lewra hinek hêzên herêmê weke alternatîf dane pêş û nîşan dan. Bi taybet jî Dewleta Tirkiyeyê û hêzên navnetewî Emerîka û Îngiltere ji nû ve tevgera miliyetparêziya Kurd birêxistin kirin, destek kirin û ew kirin desthilatdar. Ji bo çi wiha kirin? Ji bo çalakiya Kurd ji xeta azadiyê dûr bixînin û ber bi xeta hevkariyê ve bajon.

Niha hinek kes derdikevin, heta ji nav me diçin, bi awayekî rihet dikarin vê bêjin: "Wê demê mirov weke PDK'ê be jî mirov dikare qezenc bike, weke YNK'ê be jî mirov dikare qezenc bike." Ev xwe xapandinek e, meztirîn çewtî ye! Yanî gelek hevalên me jî dikevin nav van nêrînên xelet û dikarin wiha bibêjin: "Ma di nava PDK'ê de rexnedayîn heye, ma pîvanên azadî û exlaqî hene, lê va dîsa bûne desthilatdar". Ev nêrîn tê vê wateyê, mirov dikare van mijaran esas negire û dîsa jî kar bike. Dema mirovek wiha fikirî wê demê meztirîn xerabiyê di hizrê xwe de pêk tîne.

Ev xerabiyeke mezin e, tê çi wateyê? Ev vegera li lîtavê û tarîtiyê ye.

Pirtûkeke Lenîn bi navê “Em Çi Bikin?” heye, di pirtûkê de derbarê pirsgirêkên rêxistinî, bi taybet jî li hemberî tevgerên cidî di nav tevgerê de em çi bikin de gotineke wî ya wiha heye: “Em ketin rê, em ji lîtavekê derketin û em ketin rê. Ji ber ku em ji wê lîtavê (bataklik) derketin li her derê êrîş li ser me çêdibû, lê tevî van êrîşan jî em ji wê lîtavê derketin.” Niha dibêje, hinek di nav me de hene dibêjin ka em vegerin lîtavê. Yanî wê lîtava ku em jê derketine em vegerin wir. Dema em ji wan kesên dixwazin em vegerin lîtavê re dibêjin, şerm e, vegera li lîtavê ji me nexwazin! Dibêjin: “Hûn azadiya me qebûl nakin, hûn li dijî azadiyê ne.” Lê rastî ne wiha ye, tevgera me ne li dijî azadiyê ye, em jî azad in hûn jî azad in. Lê heke bi israr hûn dixwazin vegerin lîtavê biçin, heta em dikarin dehfekî jî li we bidin. Lê em tika dikin ku hûn me berdin, ji ber ku em azad in û em ê rêka xwe berdewam bikin. Dema hûn çûn lîtavê me jî li pey xwe nekişînin.

Lewma tevgera PKK’ê jî ev e, tevgera PKK’ê ji lîtavê derket! Em dikarin bêjin ji kîjan lîtav ji ya binkeftinê derket. Yanî bawer kir, da bawerkirin jî ku şopandina şêwazên têkoşînê yên ku tevgera miliyetparêziya Kurd û tevgera çepê Tirk ji bo xwe esas girtine, ber bi serkeftinê ve naçin. Li ser vî esasî PKK’yîbûn çêbû. PKK’yîbûyîn di çarçoveya li dijî miliyetparêziyê û şovenîzma sosyal de çêbû.

PKK'yîbûn di vê têkoşînê de çêbû. PKK'yîbûn tenê di şerê li dijî dagirkeran de çênebû. Esas PKK'yîbûn, zelalbûna xeta PKK'ê di têkoşîna li dijî şovenîstên sosyal ên dewletên serdest, partiyên komunîst ên klasîk li Tirkiye, Îraq, Suriyê û li dijî xeta miliyetperestiya Kurd bû. Ev her du xetên ku rêbaz û şêwazên wan ên têkoşînê têra serkeftinê nedikir, heman weke lîtavekê bû. PKK ji wê rewşê derket, ferq û cudatiya xwe wiha da nîşandan. Niha em lê temaşe dikin, bi rastî jî hinek ji me dixwazin em careke din vegerin lîtavê. Em ê çawa vegerin wê lîtavê? Wê çaxê em ji PKK'yîbûnê derdikevin. Yanî PKK ji PKK'yîbûnê derdikeve. Ji bo vê têkoşîna îdeolojîk di vê demê de bi awayekî pir dijwar tê meşandin.

Ji ber çi têkoşîn dijwar tê meşandin? Ji ber ku dijmin û gelek kesayetên din jî dixwazin beramberî wan qezencên PKK'ê pêk anîne ji nedîtî ve nêzik bibin! Em bala xwe bidinê dijmin bi israr vê dibêje: "Berê siyaseteke me ya çewt hebû, me Kurd înkar dikirin û me navê wan qedexe dikir, me zimanê wan qedexe dikir, niha em bi dîroka xwe re rû bi rû dimînin. Em dîroka xwe bi rengekî rexnegir di ber çavan re derbas dikin. Êdî Kurd birayên me ne û zimanê wan jî em serbest dikin". Yek dibêje ma ne Kurd têkoşînê dikin, dijmin dibêje: Na tu têkoşîn di holê de nîne. Ji bo vê me mafê wan nas nekiriye û ev yek nekiriye. Hinek dewletên derve hene destek dikin hinekan û terorê didin meşandin. Yanî ew çalakiyên pêk tên, hinek çalakiyên terorîstî ne. Van tu qezenc nekirine, ji bo Kurdan tiştek nekirine û heta dibêjin: "Eger ev tevger tunebûya wê mijara Kurd zûtir çareser

bibûya.” Ji aliyê Kurdan ve çawa li vê mijarê temaşe dikin? Dibêjin, tevgera Kurdî heye û ev tevgera Kurdî bi salan e şer dike, di encamê vê de li Başûrê Kurdistanê statuyekê bi dest xwe xistin. Di wir de jî PKK tune ye.

Em bala xwe bidinê di esas de şer çawa tê meşandin, mebest ji van nirxandinên wiha çi ye? Bi van fikrên han bîst û çar demjimêran mêjiyê însanê Kurd tê bombebarandin. Lê tu têkiliya van hemûyan jî bi rastiyê re tune ye! Tiştê rast ev e; hemû pêşketinên ku di roja me ya îro de li Kurdistanê çêdibin, Başûrê Kurdistanê jî di nav de, heta beriya her tiştî Başûrê Kurdistanê, hemû pêşketinên bi navê Kurdayetiyê çêdibin, encama têkoşîna PKK’ê ya bi salan e.

Ji ber çi hemû encama têkoşîna PKK’ê ye? Dewleta Tirk Kurd înkar dikir, lê belê ew înkar bi ser neket, bi temamî bi ser neket. Ji bo vê di sala 1970’yan de tevgera PKK’ê rabû û hinek rêxistinên din jî rabûn, careke din mijara Kurd kete rojevê. Dewleta Tirk dît ku ew şêwazên dide meşandin; komkujî, kuştin, asîmîlasyon hwd, têra tunekirina Kurdan nekiriye. Da ku Kurdîtiya Kurdan bi wan bide jibîrkirin çi kir? Lewra piştî derbeya 12’ê îlonê tunekirina Kurdan bi şêwazên nûtir xiste rojevê. Vê carê her tişt qedexe kir. Mînak ne tenê di cihên fermî de, di cihên ne fermî de jî, di malan de jî, xeberdana bi zimanê Kurdî qedexe kir. Ev biryar DEM (Desteya Ewlekariya Milî) ê piştî 12’ê îlonê hatibû girtin.

Her tiştê bi navê Kurdayetiyê hatin qedexekirin. Çi tiştê Kurdayetiyê bi bîr bîne hebin hatin qedexekirin. Heta îşaretên trafîkê yên kesk, sor û zer jî hatin qedexekirin. Yanî pêwîst bû tu îşaret Kurdayetiyê bi bîr neynin. Lê ev tenê bes nebû, bi vê re weke ku pêngaveke dagirkirinê ya nû li ser Kurdistanê dane meşandin. Gund bi gund, bajar bi bajar, kes bi kes dagir kirin. Kesên di îşkenceyan re derbas nekirin nebû.

Niha beramberî rewşeke wiha kê li ber xwe da? Lewra PKK'ê li ber xwe da. 15'ê tebaxê çêbû û wê têkoşîna çekdarî berdewam kir. Di qadên şer de vê dijwar berdewam kir, şertên ku tehemula însanan zordar dikirin jî, tevî van hemûyan jî vê pêngavê bê rawestan berdewam kir. Di nav şertên ku di nava tu welatên cîhanê de wiha bê tewazinî tunebû, hêza me ya leşkerî berdewam kir.  Di asteke jorîn di nav hêzê de bê tewazinî, tevgerek wiha ye ku tu derfetên wê tune ne û li hemberî dewleteke ku bi hemû derfetên xwe yên heyî êrîşan dike, tenê ev ne bes e, destekê ji cîhanê jî girtiye. Di van şertan de PKK'ê şer kir û rastiya Kurd bi dost û dijminan da qebûlkirin. Yanî heger îro desthilatdar mijara Kurd li Tirkiyeyê tînin ziman, sedema wê tevgera PKK'ê ye.

## Îdeolojiya PKK'ê Lîstikên Ku Li Ser Kurdistanê Pêk Tên Xera Kir

Pêşketinên li Başûrê Kurdistanê çêbûn, sedemê wan pêşketinan jî PKK bû. Gelek kes îro vê eşkere dibêjin jî. Ew

statûya ku li Başûrê Kurdistanê ji bo Kurdan hatiye peydakirin, dewleta Tirk çêkir. Ji ber çi ji Kurdan re ev pêk anî? Da ku li hemberî PKK'ê hevsengiyekê çêbike.

Ev ne ji ber ku PDK û YNK bihêz bûn, şerê rizgariyê dane meşandin, pêk hat. Her du partiyan jî tiştekî wiha nekirine, tu hêzek wan jî tune bû. Bi taybetî di van bîst salên dawiyê de PDK û YNK'ê li dijî dagirkeran yek fîşek jî neteqandin! Şerê kirine jî yan li dijî hev in, yan jî qet li hemberî dijmin nekirine. Di salên 1992, 1995, 1997'an û 2000'î de, li dijî me şer kirin. Di 1994, 95 û 96'an de jî li hemberî hev şer kirin. Yanî li hemberî dijmin fîşekek neteqandin. Çawa rizgar bûn? Rast e însan li beramberî dijminê xwe rizgar dibe! Lê heke te fîşekek neteqandibe, tu rizgar bûbî, wê demê alemê tu kirî desthilatdar. Wan ji bo berjewendiyên xwe desthilatiyek û statuyek ji bo te peyda kirine.

Lewra niha têkoşîneke bi vî rengî tê meşandin. Dema ku tevgera Kurd tê gotin, emperyalîzm û dewletên dagirker dixwazin PDK û YNK'ê nîşan bidin. Tirkiye jî ji vê razî ye, Îran jî razî ye û Surye jî razî ye. Gelo ji ber çi di her çar parçeyan de jî dijmin razî ye? Tirs û xofa dijmin ji vê yekê ye ku Kurdan têkoşîn kiriye û vê carê wê mafê xwe qezenc bikin. Naxwazin Kurd bigihîjin vê astê. Di sekna li dijî PKK'ê de, nêzikbûneke tolhildanê ya cidî heye. Ev tolhildan çi ye? Ji ber ku berê Kurdistan hatibû perçekirin, siyaseteke wisa hate meşandin, Kurdistan perçe bû û înkar bû. Ev siyaset ji aliyê Emerîka û Îngîltereyê ve hate meşandin. Ji aliyê dewletên dagirker; Suriye, Tirkiye, Îran û Îraqê ve hate

meşandin. Ev siyaseta ku li ser Kurdistanê hatiye meşandin, ji aliyê Kurdên hevkar ve hate qebûlkirin! Ev her sê hez di înkarkirin û parçekirina Kurdistanê de hemfikir bûn. Lê belê PKK'ê ev lîstik û pergal xerab kir.

Hêzên desthilatdar dixwestin vê sîstemê di herêmê de li ser esasên înkarkirina Kurd ava bikin. PKK'ê bi îdeolojiya xwe ya azadiyê ev lîstik xera kir. Ji ber vê hindê ev hêzên dagirker hemû jî li hemberî PKK'ê bi kîn in. Sedemê vê kînê ji ber çi ye? Ji ber ku PKK'ê planê her kesî xerab kir. Ji bo vê beramberî wê bi kîn in. Kîna Emerîkayê jî, ya Îngîltereyê jî û ya dewletên dagirker jî, ya hevkarên Kurd jî li dijî PKK'ê hemû ji bo vê ye.

Ji bo vê divê mirov van xetan nas bike. Di roja me ya îro de, di zemînê Kurdistanê de du xetên zelal hene! Ev her du xet jî di nava têkoşînê de ne. Dibe ku di roja me ya îro de di navbera wan de şer nabe, lê karekî ji şer girantir tê meşandin, divê neyê jibîrkirin ku dosya şer jî nehatiye girtin. Pêwîst e mirov xwe bi vî awayî nexapîne û nebêje êdî PDK û YNK nema li dijî me şer dikin, niha şer nekirin ne şert e! Wisa gotinan dibêjin, lê dema Emerîka, Tirkiye û hinek welatên din ji wan dijbertiya me û şer bixwazin, wê şer jî bikin!

Me gotibû du xetên îdeolojîk hene û timî bi hev re di nava têkoşînê de ne. Xetek ji wan a azadiyê ye û pala xwe dide civakê. Hêza xwe ji civaka Kurd û hêzên bindest digire. Li ser esasê çareserkirina pirsgirêka Kurd û ji bo

peydakirina maf û azadiya gel tevdigere. Ev doz hemû beşên civaka Kurd digire nava xwe. Nasnameya Kurdan esas digire, li ser erdnîgariya xwe jiyînê esas digire, da ku gelê me karibe xwe bê asteng îfade bike. Li ser vî esasî têkoşînê dike. Hêza xwe ya madî û manewî ji gel digire. Pirsgirêkan di çarçoveya biratiya gelên Rojhilata Navîn de çareser dike. Ji bo van armancan têdikoşe.

Lê xeta duyemîn a heyî li ser esasê desthilatdariyê ye. Ne li ser esasê ku civaka Kurd ji binî ve azad bibe, li ser esasê ku hêzek di hundirê vê civakê de serweriyê bi dest xwe bixe ye. Yanî çîna serdest û bindest hebe. Ne li ser esasê bawerî û girêdana bi gel re ye, li ser esasê destek û têkiliyên bi hêzên derve re dijîn. Ji ber vê yekê ev xeta hevkar, civaka Kurd temsîl nake. Dagirkeriyê û desthilatiyê ji bo xwe esas digire. Têkiliya wan jî bi hêzên desthilatdar ên cîhanê re heye, têkiliya wan bi sermayeya navnetewî re jî heye.

Ji yekitî û biratiya di nava gelan de zêdetir, kûrkirina nakokî, miliyetparêziyê pêş dixin. Ev nêzikbûn jî di cewherê xwe de perçeyek ji siyaseta emperyalîstan a ku li beramberî herêmê tê meşandin e. Li ser esasê parçekirinê tevdigerin da ku karibin serweriyê bikin. Niha ev her du xet hene. Ev xet di nava têkoşînekê de ne, lewra pêwîst e, ev her du xet baş ji hev bên cudakirin û diyarkirin.

Lewra ferq û cudatiyên me ji PDK’ê hene, ew PDK û em jî PKK ne! Eger em wiha bikin em ê wenda bikin. Jixwe niha gelek kes wisa dibêjin: PDK jî rêxistineke Kurdan e, PKK jî

rêxistineke Kurdan e, jixwe Kurd hemû birayên hevdu ne. Weke çawa modela cilan be, yekê cilekî wiha li xwe kiriye, yê din jî cilekî wiha li xwe kiriye. Ango ferqeke wiha zêde mezin nîne. Rast e dibe ku ferqeke cidî di navbera PDK û YNK'ê de nebe. Lê ferq di navbera PKK û van her du rêxistinan de heye. Divê mirov wê ferqê derxe zanebûnê.

Ew ferqa em behsê dikin çi ye? Ew ferq nêzikbûna me ji wan a ji miliyetparêzî, cinsiyetparêzî, demokrasî, civakbûyîn, desthilatdarî, dewlet, şîdet û têkiliyên navnetewî re ye. Ev hemû cuda ne, divê mirov ferq û cudatiyên wiha baş nas bike. Eger em û PDK'ê ne yek bin, sedem ew ferq û cudatiya me ye. Me rêxistineke jixweber li Bakûrê Kurdistanê ava kir, wan jî li Başûrê Kurdistanê ava kir, lewra em ne yek in. Ev nêrîneke şaş e! Tu têkiliya vê bi Başûr û Bakûr re nîne. Tu têkiliya wê bi şexsan re jî nîne. Lê ferqa di navbera wan de îdeolojîk e. Mînak di derbarê miliyetparêziyê de; ew miliyetparêziyê ji bo xwe bingeh digirin, lê em neteweya demokratîk ji bo xwe esas digirin.

Hêzên desthilatdar timî nasnameya netewî ji bo berjewendî û desthilatdariya xwe didin xebitandin, li ser vî esasî sorkirina nakokiyên bi gelên din re pêş dixin. Lê neteweya demokratîk li ser esasê wekhevî, biratî, bi gelên din re li ser esasê rakirina nakokiyan, di hundirê neteweyekê de bi hev re jiyînê esas digire.

Di mijara cinsiyetparêziyê de jî em ji hevdu cuda ne. Em tevgerek li dijî sîstema desthilatdariya zilam in. Lê derdekî

PDK û YNK'ê yê welê nîne, derdekî Emerîkayê jî yê wiha nîne. Heke carna behsa jinê jî dikin hemû derew in. Şiklî ye û hemû makyaj e. Tu têkiliya wê bi rastiyê re tune ye, bûyerên diqewimin jî vê îspat dikin.

Di mijara demokrasiyê de jî em qet ne yek in. Di mijara desthilatdariyê de jî em ne yek in. Di gelek mijarên bingehîn de em ne yek in. Ferq û cudatiya me di warê îdeolojîk de ev e. Lewra ger di nava PKK'ê de jî ev tiştên me nav li wan kirî bên kirin, wê demê tu ferq û cudatiya me û PDK û YNK'ê namîne. Em bibin weke PDK'ê, tu pirsgirêk çareser nabin. Berovajî em ji binî ve wenda dikin. Ji ber çi em ê wenda bikin? Di vir de sermayeya navneteweyî ji bo çareserkirina pirsgirêka hemû Kurdan kar nake. Lê ji bo ku Kurdan bike hêzeke hevkar, bike bin kontrola xwe dixebite. Bi awayekî xwezayî dema ku Kurd girtin bin venêrîna xwe, wê li hemberî dijminê xwe yê herêmê bi kar bîne. Wê demê em ê bibin hêzeke di destê emperyalîzmê de? Em tu carî nabin ew hêza ku emperyalîzm me bi kar bîne!

## Dijmintiya Li Dijî PKK'ê Ji Ber Nasnameya Wê Ya Îdeolojîk E

Di roja îro de xala bingehîn a ku dijmin li ser disekine ev e; PKK'ê weke çêkereke(bileşenekî) û pêşengekî bingehîn dibîne. Perspektîfên azadiyê yê bingehîn ên ji bo gelê Kurd na û nebe, lê bibe weke pêkhatinekê derveyî rastiya gelê Kurd bigire dest. Dixwaze vê nêzikbûna xwe bi Kurdan jî

bide bawerkirin. Lewma dibêjin: PKK di encama dagirkeriyê de pêş ketiye. Em tu carî tevlî vê gotinê nabin, ji ber ku hebûna PKK'ê tenê ne di encama dagirkeriyê de ye. PKK formulasyoneke rêxistinî ye, li ser esasê birêxistinkirin û avakirina civaka exlaqî û polîtîk a nû di Kurdistanê de ye. Dagirkerî tune be jî wê PKK hebe. PKK parçeyek ji vê civakê ye û ruhê civakê ye. Lewma ew qezencên esasî yên PKK'ê û dijmintiya ku li dijî PKK'ê tê kirin, sedemên wê nasnameya vê tevgerê ya îdeolojîk e. Sedem hemû jî ev e. Nêzikbûna PKK'ê ji miliyetparêzî, demokrasî, neteweya demokratîk, welatparêzî, çînîbûn, cinsiyetparêzî, ji ekolojî re û hwd, ji gelek xalên bingehîn yên jiyanî re, dibe sersedemê qezenca wê jî û dibe sersedema ew qas dijmintî jî li beramberî wê hebe.

## Endam Û Pêşengên Îdeolojiya PKK'ê Şehîdên Wê Ne

Pêvajoya destpêkê, xebata tevgerê ya îdeolojîk bi giranî xebata Rêbertiyê bû. Li ser pirsgirêkên sosyalîzmê, mafê gelan, mijara netewî û dîroka Kurdistanê bi rengekî danaserhev nîqaş pêş diketin. Lewra em nikarin ji pêvajoyeke wiha re bêjin ku bêasteng meşiya! Yanî rewşeke wiha jî nebû.

Mînak em bêjin: Rêxistin haziriyan dike, xebatan dide meşandin û nîqaşan dike, pirtûkan dixwîne û birêxistin dike û dijmin jî dengê xwe nake?! Di wê pêvajoyê de rewşeke wisa tune bû. Rast e ev xebatên me gotî dihatin kirin, lê di

wê demê de êrîşên cidî jî li ser tevgerê hebûn. Di wê demê de heta şehadet jî çêbûn, yanî ev pêvajo di esas de pêvajoyeke fikrî ye. Di aliyê fikir de lêhûrbûn çêdibe. Lê belê tevî vê jî şer, êrîş û şehadet jî derketin pêş.

Weke me got ev pêvajo di kûrbûna li ser van mijarên me gotî de pêş ket. Yanî ew xalên di Kurdistanê de, di mijara netew, sosyalîzm, Marksîzm û Lenînîzmê de, bi partîbûnê bi encam dibe. Yanî lêhûrbûneke îdeolojîk li gorî xwe çi kir. Li gorî xwe formulasyoneke rêxistinî peyda kir. Navê wê jî bû PKK.

Ji bo vê PKK di rastiyê de rêxistin an jî ew formula rêxistinî, sîstema têkiliyê di navbera însan û kadro de ya ku wê îdeolojiyê temsîl dike pêk anî. Yanî wê demê sosyalîzmê, welatparêziyê, exlaqê şoreşgerî temsîl dikin û bi şoreşgeriyê bawer in. Di xebatê de têkoşînê esas digirin. Bi her awayî xwe feda kirine, mirov dikare bêje xwe ji bo têkoşîna azadiyê pêşkêş kirine.

Ji ber vê di esas de em bala xwe bidinê, di endamtiya PKK’ê de hinek pirsgirêk hene. Mînak heta niha em nikarin bêjin filankes endamê PKK’ê ye, yan jî ne endamê PKK’ê ye! Heta dibêjin ku Rêbertiyê bi xwe jî gotiye: “Ez bi xwe re nîqaş dikim ka ez PKK’yî me yan na.”

Di kongreya me ya nehemîn ya ji nû ve avakirinê de, di 2005’an de di mijara endamtiyê de, gelek nîqaş hatin pêşxistin. Ka kî/ê endama/ê PKK’ê ye! Wer hate nîşandan ku di bingeh de kes ne endam e, lê berendamtî heye. Yanî

her kes di nava hewldanekê de ye ku bibe PKK'yî, lê kes ne PKK'yî ye. Ji bo vê ji endamtiyê zêdetir, hewldanên ji bo endamtiyê hene!

Bêguman PKK weke rêxistineke klasîk nîne. Rêxistinên klasîk bi vî rengî ne, demek bi rêxistinê re têkildar dibin, çendekî di bin çavan de dimînin, piştî çend heyvên din biryar digirin û wan dikin endam. Bi vî rengî xebitînek heye. Di rêxistinên sîstemê û rêxistinên klasîk de jî wisa ye. Lê di nava PKK'ê de tiştekî wiha nîne, yanî rewşeke wiha nîne. PKK bi rêziknameyeke hundirîn a nivîskî, bi hinek prensîbên kevneşop ên klasîk ên rêxistinên din ji bo xwe esas girtine, nabe rêxistin. Rêxistinbûn û endamtiya PKK'ê jî bi vê çênabe. Wê demê endamtiya PKK'ê çi ye? Endamtiya PKK'ê girêdayî îdeolojiya PKK'ê ye. Îdeolojî, bawerî, îrade û armancên bilind ên PKK'ê formule dike. Baweriya wê, îradeya wê, armanca wê ya bilind formule dike. Ev armanc çi ne? Ev armanc peydakirina civakeke azad e. Da ku hemû endamên vê civakê, karibin serbest bijîn. Hemû çêkerên wê karibin serbest xwe îfade bikin. Bi awayekî azad karibin xwe îfade bikin. Têkiliya di navbera hêzên civakê de li ser esasê hevdu temamkirinê be. Wisa ew nexweşiya desthilatdariyê, dewletê, şîdetê, cinsiyetparêziyê û zanistperestiyê, her wiha hemû nexweşiyên ku di roja me ya îro de, di însanan de peyda bûne, lê ne weke xwezaya însanan e, weke taybetmendiyên serdestî, hiyerarşî û dewletbûyînê ketine hundirê însên, însan ji wan nexweşiyan hemûyan veqete, rizgar bibe.

Gihandina wê kesayeta ku pê re desthilatdarî, ezezîtî û ferdiyetparezî tune be. Çalakiya şîdetê pê re tune be. Dewletgerî, miliyetgerî û hwd, ew gemara ku çîna serdest di însan de çandiye, pê re tune be. Ji van tiştan hemûyan hatibe şûştin, wê demê ew însan dibe PKK'yî.

Baş e, em di roja xwe ya îro de dikarin wisa rehet bêjin, ma gelo me xwe ji van tiştên hatî gotin safî kiriye? Me xwe pak kiriye û me xwe ji wan taybetmendiyên sîstemê veqetandiye? Bi me re miliyetparêzî, cinsiyetparêzî, çîngerî, desthilatî, çalakiya şîdetê tune ye!? Em vê nikarin bêjin û îdîa bikin. Yanî wek kes ez nikarim vê îdîa bikim, ez bawer im gelek hevalên din jî nikarin wiha îdîa bikin!

Ev tê vê manyê ku kesên îdîa wan di vî aliyî de hebin qet tune ne! Em nikarin îdîayeke wiha bikin. Em bawer in ku hemû kesên di nava vê tevgera azadiyê de hewldanên wan ji bo xwe ji van kêmûkurtiyan xelas bikin hene. Biryar heye, bawerî heye, lê belê asta têkoşînê lewaz e, asta zanebûnê lewaz e, hêz kêm e, performans kêm e. Ev hemû dibin sersebebên ku di vî aliyî de meşeke me ya zêde serkeftî tune be. Lewra di mijara endamtiyê û ne endamtiyê de bêguman dudiliya me hebe em nikarin bêjin ku em endamên PKK'ê ne. Ji ber ku PKK; formulekirina hinek îdîayan e û baştirîn sekn e, bilindkirina hinek nirxên di asteke herî baş de ye. Rêkupêkirina nirxan e. Bilindkirina nirxan, bilinkirina van hemûyan li ser esasê avakirina civakeke nû ye. Ev civaka ku bi desthilatî, hiyerarşî, şîdet û bi çînîbûyînê hatiye tunekirin, tesfiyekirin û li ser tehekum

hatiye kirin. Ew civak ji bin wê desthilatdariyê bê rizgarkirin û bi nirxê xwe yê xwezayî bijî.

Însanê di oxira peydakirina civakeke exlaqî û polîtîk de, bi vî rengî têkoşînê bike, ew însan bêguman divê xwe ji hemû bermahiyên sîstema çînî ya desthilatdariyê pak kiribe û zelal kiribe.

Ji ber vê yekê em bala xwe bidinê di mijara endamtiya PKK'ê de dudilî hene. Kî endam e, kî ne endam e?! Em hemû neferên tevgera azadiyê ne, lê PKK'yîbûn asteke bilind e. Lewra divê her demê gihandina PKK'yîbûnê weke hewldanekê be, têkoşînek be. Eger te bi rengekî burokratîk got: "Min sê mehên xwe temam kirin û niha ez bûm PKK'yî, yan jî bêjî min şeş mehên xwe yên berendamtiyê temam kir û niha ez bûm PKK'yî." Wê çaxê tu temam dibî, tu nema pêdiviya rexnedayînê dibînî. Pêdiviya têkoşînê, xwe nûkirinê nema dibînî.

Ev jî bi mirov re çi çêdike? Ziyanê dide têkoşînê, di nava têkoşînê de ziyanê çêdike. Lewra divê nêzikbûna me ya ji endamtiya PKK'ê re bi vî rengî be. Gelek ji me li pey hinek tiştan dikevin. Mînak, ez sala çûyî wiha bûm, ez niha wiha me! Du sal berê min wiha dikir û îsal ez wiha dikim". Ev nêzikbûnên bi hinek kesayetan re pêş dikeve ne çanda PKK'ê ye. Di çanda PKK'ê de tiştên wiha nîne. Ew nêzikbûna partiyên kevn e. Erk, meqam, cih, van ji xwe re esas digirin. Ji bo vê em bala xwe bidinê esasê dînamîkbûna PKK'ê çi ye? PKK wiha van tiştên burokratîk esas nagire. Hevalek nû

tevlî bibe, ger çalakiya wî ji bo pêkanîna xetê zêde be, ew zêdetir qedir û qîmetê di nav rêxistinê de digire.

Lê dibe ku di ser tevlîbûna hevalekî/ê re sal jî derbas bibe, lê hewldanên wan di temsîlkirina nirx û îdîayên rêxistinê re lewaz bin, wê demê nikare nirxê bigire. Qîmetdayîn, erkdayîn, bierk-kirin, pîvana wê asta serkeftina pratîka wê/wî ye. Tu çiqasî di pêkanîna erkan de serkeftî bî, ew qas cihê te wê hebe, ew qas wê qîmet, qedir û nêzikbûn ji te re baş be.

Ji ber vê pêwîst e, ev taybetmendî bên zanîn. Wê demê PKK weke ew zemînê ku têkoşîna îdeolojîk a Rêbertiyê û hevalên destpêkê didan meşandin, zemînê ku xwe di nav de formule bike ye. Yanî tevger êdî tenê di warê fikrî de nîne, tiştekî razber jî nîne, tenê îdealên îdeolojîk jî nînin. Êdî însanên wê temsîl bike hene. Ji bo vê însan derdikevin; Mazlûm, Xeyrî, Besê, Kemal, Egîd û Zîlan derdikevin û kesayetên wiha tevlî vê rêxistinê dibin.

Ev tevlîbûn di esas de mayîndekirina wan nirxan e. Ji bo vê em bala xwe bidinê sekna van hevalan a îdeolojîk çawa ye? Wisa di çûna wan a bi ser kar de, tu carî hêza dijmin naynin ber çavên xwe. Tu carî ked û fedekariyan jî naynin ber çavan û bi hesab nêzik nabin. Yanî dijmin çiqasî bihêz be bila bihêz be, ew nabe egerek ji bo kêmkirina têkoşînê. Ji bo van hevalan nabe sedema kêmkirina têkoşînê. Dijmin çiqasî bihêz dibe bila bibe, mînaka wê ya berbiçav zindana Amedê ye.

Weke em hemû jî baş dizanin dijmin wê demê pir bihêz e, lê hevalên me jî di bingeh de pir bêhêz in. Lê vê nakin eger ku têkoşîn û berxwedana xwe kêm bikin. Tam berovajiyê vê têkoşîna herî mezin a ku serkeftinê di bingeh de digire dest, di nav de teqez serkeftin heye, di bingeh de li zindana Amedê tê meşandin.

Fedekariyan nahesibînin. Mînak, nabêjin; 'ez ê bimirim, ez ê sax bimînim, ez ê birîndar bibim, birîndar nebim' yek ji van jî nayê hesibandin. Tenê tiştek tê hesibandin ew jî 'azadî' ye. Di oxira azadiyê de ji her tiştî re hazir in. Ji ber ku însanên ku di oxira azadiyê de bihesab bin, bihesab nêzik bibin, her tiştî wenda dikin. Tevlîbûna ji têkoşîna azadiyê re tam berovajiyê bihesab nêzikbûnê, hesab dayîn di nav de heye. Mînak gotina herî balkêş a Mehmed Xeyrî Durmûş çi ye: "Eger ez mirim li ser kêla tirba min deynin: ev deyndarê welatê xwe ye". Yanî deyndariyê esas digire, hesaban nake, berde nêzikbûneke bihesab, hesab dide. Her tiştî dike, lê tevî vê jî hesab dide.

Lewra ev taybetmendiyên PKK'ê ne. Ev li her qadê hatine jiyîn. Li çiyayan, zindanan… Li her derê hatine jiyîn. Ji bo vê em dibêjin şehîd, temsîlgerê PKK'ê yên bingehîn in, PKK partiya şehîdan e. Ji ber çi em vê esas digirin? Di esas de bi şehadetê re ew bi awayekî baştirîn dibin rastî. Yanî ew tiştê ku pê bang dike bi xwîna xwe jî îspat dike. Mînak dema însan gihîşte şehadetê û şûn da, gavê paş de navêje û ji rêka xwe venagere, dudilî pê re namîne.

Mînak, mirovekî saf be, dibe ku hinek jibermayên civaka kevn, kevneşop, desthilatdar di xalekî de wî/ê bi şûnda bikişîne. Heta wî ber bi îxanetê ve jî bibe. Lê di şehîdan de tiştekî wiha nîne, şehadet xala dawiyê datîne. Lewra bi rûmetdayîneke mezin, şehîd PKK'yîbûnê heq dikin.

Di oxira wan nirxên PKK'ê yên hatine avakirin, wan nirxên îdeal de, xwîna xwe didin. Yanî vê nîşan didin, jiyaneke ku tê de perspektîfên PKK'ê bi ser nekevin ez li wir jiyanê qebûl nakim! Tenê jiyanek heye dikare bê jiyîn, ew jî jiyana ku tê de baştirîn nirxên PKK'ê pêk tên e. Ew jiyana ku di naveroka wê de nirxên PKK'ê tên parastin û pêkanîn e. Ew jiyana ku tê de civaka exlaqî û polîtîk a ku PKK ji bo wê têdikoşê, da ku ava bibe ye. Wê demê em dikarin bijîn, wekî din hemû rengên jiyanê weke ku li xwe heram dikin.

Şehadet ev e, lewra şehîd dikarin bibin endamên PKK'ê. Ji ber ku derveyî PKK'yîbûnê tu jiyaneke din qebûl nakin û qebûl jî nekirine.

## Pêvajoya Destpêka Têkoşîna PKK'ê Ya Lêhûrbûn Û Lêkolînê Bû

Têkoşîna îdeolojîk a di wê pêvajoya destpêkê de taybetmendiyên wê ev in. Yek; xwendine, zêde xwendine. Ango Rêbertî dixwîne, hevalên din dixwînin, Mazlûm Dogan, Kemal Pîr, Hakî Karer, hevalên ku niha di nav têkoşînê de sax in, hemû dixwînin. Çi dixwînin? Marksîzmê,

dîroka Kurdistanê, metodên ku bi dest wan dikevin dixwînin. Derbarê şerê rizgariya netewî, mijara rizgariya netewî, mijara sosyalîzmê û kedê, çi bi dest wan dikeve wê demê bi xwendinê dinirxînin.

Cardin di wê demê de çi çêdibe, encama wê xwendinê siyaseta rizgariya netewî di Kurdistanê de zelal dibe. Yanî taybetmendiyên şoreşa Kurdistanê zelal dibin. Şoreşeke çawa ye? Dînamîkên bingehîn di vê şoreşê de wê kî bin? Wê karker, gundî, xwendevan û şoreşger bin? Şêwazên têkoşînê wê çi bin, şerê çekdarî, ji ku wê dest pê bikin, ji filan cihî heta filan cihî? Taybetmendiyên endamên vê şoreşê wê çi bin? Wê xwendekar be, zane be, wêrek be, milîtan be, dirust be? Wê xwedî van taybetmendiyan be, exlaqî be, nirxan biparêze? Ev hatin diyarkirin. Wê demê encamê wê komîserhevkirinê, wê kûrbûnê, taybetmendiyên şoreş û şoreşgerên Kurdistanê derketin pêş.

Ev pêvajo Rêbertiyê bi xwe bi rê ve dibir. Berhemên wê yên madî çi bûn? Berhemên wê yê madî damezirandina PKK'ê bû. Têkoşîna çekdarî li gelek cihên Kurdistanê li dijî feodalîzmê û dewletê meşiya. Li Hîlwan û Sîwerekê, Batman, Mardîn, Dersim û li gelek cihên din jî bi vî awayî çêbû.

Pêvajoya din a têkoşîna îdeolojîk kîjan bû? Pêvajoya ku li qada Rojhilata Navîn dest pê kir. Ya ku li Lubnanê dest pê kir, ew pêvajoyeke girîng e. Divê li ser vê pêvajoyê bê

seknandin, ji ber ku pêvajoya duyemîn a têkoşîna îdeolojîk e. Ew jî di qada Lubnanê de ye.

## Erdnîgariya Rojhilata Navîn Ji Bo Berjewendiyên Hêzên Desthilatdar Giring E

Rêbertî dibêje: Dema min berê xwe da Rojhilata Navîn û çûm Lubnanê, bi sê îdîayan re em rû bi rû diman. Yanî em bi sê astengan re rû bi rû diman. Yek jê parastina îradeya serbixwe bû, duyemîn peydakirina îdeolojiya azadiyê, ya sêyemîn jî li ser esasê îdeolojiya azadiyê peydakirina rêxistina azadiyê bû. Jixwe asteng pir bûn, asteng di Rojhilata Navîn de pir in, ên ewlekariyê hene, madî, jiyanî û gelek astengên din hene. Rêbertî ji wan astengan gelekan jî zêde wek asteng nahesibîne. Lê sê tiştên bingehîn digire dest, yek îradeya serbixwe, parastina wê, duyemîn îdeolojiya azadiyê, sêyemîn jî li ser esasê îdeolojiya azadiyê û rêxistina azadiyê bû. Ev tişt bi ser kevin, wê demê pirsgirêk tên çareserkirin.

Em bala xwe bidinê ev her sê tiştên me gotin bi îdeolojiyê ve têkildar in. Parastina îradeya serbixwe girîng e. Di Rojhilata Navîn de nakokî hene. Rojhilata Navîn qadeke wiha serbixwe nîne. Erdnîgariya Rojhilata Navîn girîng e, bi taybet jî ji bo berjewendiyên hêzên cîhanî. Her hêza cîhanî ya ku bixwaze desthilatdariya xwe bide rûniştandin, beriya her tiştî dixwaze di Rohilata Navîn de otorîteya xwe bide rûniştandin. Yanî serweriya li ser

Rojhilata Navîn tê manaya serweriya li ser cîhanê. Bi dîroka xwe, bi niştecihên xwe, bi çavkaniyên xwe yên enerjiyê, bi cih û erdnîgariya xwe, bi gelek tiştan Rojhilata Navîn roleke girîng temsîl dike.

Ji ber ku roleke wiha heye her kes dixwaze destwerdanê li ser Rojhilata Navîn bike. Ji bo vê serxwebûn di Rojhilata Navîn de lewaz e. Emerîka hêza wê heye, Sovyet hêza wê hebû, Çîn bi rengekî destwerdanê bû. Miliyetparêziya Ereb heye. Her kes li gorî xwe dixwaze serweriyekê bidest bixe. Ji bo wê hêzên bi xwe ve girêdayî çêdikin. Niha gelek hêzên herêmê girêdayî ne. Hinek bi Rûsyayê ve, hinek bi Emerîkayê ve, hinek bi Fransayê ve girêdayîne, hinek bi Îranê ve, hinek bi Îsraîlê ve girêdayîne. Hemû li ku li hev dixin, di Rojhilata Navîn de, di Lubnanê de li hev dixin. Lubnan, ew welatê biçûk, bûye meydana şerê hemû cîhanê.

PKK derbasî wê qadê bû. PKK rêxistineke Kurdan e û Kurd jî miletekî nayê nasîn, nayê qebûlkirin û tu dixwazî bi navê wî gelî şoreşgeriyê bikî û serbixwe bibî. Weke çawa tu li ser sifreya guran bî. Yanî li wir destkeftiyeke biçûk jî bigirî, weke tu ji devê şêr derbixî. Ewqasî dijwar û zor e. Lê belê tiştekî din jî heye, dema te dev ji serxwebûna xwe berda, tu nikarî têkoşînê bidomînî. Mînak, tu çûyî Lubnanê, pêdiviyên te yên madî hene, bi stargehan heye, bi pereyan heye, bi perwerdê û bi van hemûyan heye. Rêka herî rehet tu bi hêzekî re dostaniyê deynî û bi wan re bibî yek. Tu yê xwe bispêrî hêzekî, yanî xwe bispêrî Suriyê, Îran yan jî derekî din, gelek hêz hene. Ji bo te hêz pêwîst e, çek pêwîst

e, lê tu yê wê demê ji bo xwe nexebitî. Tu yê ji bo çi bixebitî? Tu yê ji bo pêkanîna daxwaziyên wê dewleta ku peran dide te, bixebitî. Dema ew bixwaze tu yê şer bikî, dema ew bixwaze tu yê rawestî.

Bala xwe bidinê rêxistin bi gelemperî bi vî rengî ne. Rêxistinek heye dibîne rewşa welatê wê aloz e! Şertên navnetewî guncaw in, na teqez ne guncaw in. Şertên nav herêmî guncaw in, na ne guncaw in. Derfetên madî hene tune ne, qet bi van nafikire. Tenê vê dibêje: “Rewşa welatê min aloz e û divê ez vê aloziyê çareser bikim.” Wê demê dikeve rêka têkoşînê. Rêxistinek heye dibêje rast e alozî heye, lê ji bo ku ez karibim çareser bikim destekek ji bo min pêwîst e! Destek li ku heye, li gel filan kesî heye. Ez ê biçim û ji wî destekê bixwazim. Dixwaze û didê, vê carê tam di demjimêra ku hêza xwe seferber bike de ji bo pirsgirêka welatê xwe çareser bike, lê mixabin nikare. Çima nikare? Ji ber ku yên derfet danê nahêlin ew tevbigere. Yên derfetan didin te di demjimêra ew bixwazin de te dikin dewrê, ne dema tu dixwazî.

PKK ji vana kîjan rêxistin e? PKK ew rêxistina ku aloziyên welatê xwe dibîne, ji bo çareseriya wan seferber dibe ye. Da ku wan pirsgirêkan çareser bike dikeve nav liv û tevgerê. Lê bi vê nafikire, ka gelo şertên navnetewî û herêmî guncaw in. Desteka divê, heye yan jî tune ye. PKK tu carî bi vî rengî nefikiriye.

PKK dema ku dest bi têkoşînê kir dema ku şertên navnetewî ne guncaw bûn dest pê kir. Tu aloziyên dewleta Tirkiyeyê tune bûn. Bi kesî re di nav şerekî de nebûn. Hêzên navnetewî jî li ser mesela Kurd israr nedikirin. Tam berovajiyê vê, mijara Kurd girtibûn. Lewra em bala xwe bidinê taybetmendiyên PKK'ê wiha ne.

Mînak, PDK wiha nîne. PDK dema kar dike dibêje: "Emerîka amade ye me destek bike! Îsraîl hazir e me destek bike, Îran hazir e me destek bike hwd." Bi vî rengî egerên têkoşînê ji bo xwe peyda kirin. Lê PKK'ê wiha nekir!

Lewma PKK di mijara îradeya serbixwe de pir zelal e. PKK tu carî destê xwe nade kesî, yanî destê xwe bê tevdîr nade kesî. Ji ber ku dema te destê xwe da, wê demê wê şertên xwe li ser te ferz bikin. Bi taybet jî pêwîst e mirov destê xwe yê birîn nede kesî. Ji ber ku destê xwe yê birîn dema te da, wê ew kes bixwaze destê te yê birîn babide û tu yê şertên wî qebûl bikî. Lewra çiqasî destê te birîn be jî, nede kesî!

Birîn çi bû? Birîn ew dema ku PKK lewaz bû, hejmareke mezin ji kadroyên PKK'ê yên pêşeng di zindanê de bûn, hejmareke mezin ji kadro şehîd ketibûn, derfetên madî tune bûn, derbeyeke mezin hatibû xwarin. Ev hemû birîn in, lê tevî van jî, PKK'ê ev ji bo xwe nekirin derd û li ser vî esasî xwe di rewşeke lewaz de nîşan neda. Tam berovajiyê vê jixwe bawer bû û îradeya xwe radestî kesî nekir.

**Prensîbeke Bingehîn A Îdeolojiya PKK'ê Îradeya Serbixwe Ye**

PKK'ê îradeya xwe teslîmî kesî nekir! Ka em hê jî vê mijarê berfireh bikin, gelo weke gotin îradeya xwe serbixwe hiştin wiha rehet e? Berdêla wê bi hêza xwe, bi zor û zehmetiyeke mezin, bi neynûk û diranan weke ku bi derziyê bîrê bikolin dan. Ya PKK'ê kir ev bû, tu destê xwe nedî kesî, wê demê tu yê pêdiviyên xwe hemûyan peyda bikî. Peydakirin jî wiha rehet nîne. Tu di navengekê de yî, sifre sifreya guran e, nakokiyên tê de li bin guhê hev dikevin. Têkilî heta asta dawiyê dijwar in, berjewendîparêz in û bêrehm in. Her kes ji bo berjewendiyên xwe hazir û amade ye ku bê dudilî û çavên xwe biniqînin pêl gelan bikin, komkujiyan çêbikin. Lewra sebir û înad pêwîst dike. PKK'ê meydan xwendineke bêhempa pêşkêş kir, da ku bi ser bikeve. Di heman demê de îradeya xwe teslîm nekir. Bi xwîn, xwêdan, sebir, tehemul û înadê ev tişt kir.

Ji ber vê bala xwe bidinê PKK timî biryarên xwe bi xwe distîne. Her demê jî suprîz in, lê gelo çima? Ji ber ku tiştên PKK pêk tîne kes texmîn nake. Bi awayekî xwezayî dema rêxistinek biryara şer distîne çi dike? Destegirên xwe dibîne. PKK'ê di kongreya xwe de ew biryar stend, bi xwe stend. Bi xwe veguhest. Bi xwe roj diyar kir û bi xwe dest bi çalakiyan kir, bi xwe jî ew şer domand. Dema ku şer seknand jî PKK'ê bi xwe ew biryar da.

Ev kesên ku li ser şerê me yê li Bakur rant dikirin gotin: "Ev çi ye, hûn dileyîzin, ma karê henekan e hûn çawa şer disekinînin!? Ger hûn şer bisekinînin em ê êrîşî we bikin." Piştî me şer seknand Ewrûpayê em bi gelemperî terorîze kirin. Piştî me şer seknand Îranê êrîşî me kir. Rûsyayê ji me re asteng derxist. Piştî me şer seknand Suriyê ew qas asteng derxist. Gotin: "Ma hûn bi kêfa xwe ne, divê hûn şer berdewam bikin."

Lê me biryara xwe dabû û me di wê de israr kir. Ev çi ye? Şîfreya meşa PKK'ê, cih û bergê wê, çalakiya wê, berjewendiyên dewletan diyar nake. Berjewendiyên gelê Kurd diyar dike. PKK berjewendiyên gel esas digire, Rêbertî berpirsiyarê gel e. Biryarê xwe li ser esasê berjewendiyên gel distîne. Rêbertiyê dît piştî sala 1999'an berdewamkirina şer wê komkujiya Kurdan bi xwe re bîne, şer sekinand.

Rêbertiyê dît piştî sala 1982'yan gurnekirina şerê azadiyê wê bi xwe re tesfiyeyê bîne, lewra şer îlan kir. Kî Rêbertiyê dide meşandin, ne dewlet! Ya ku Rêbertiyê dide meşandin, xeta wî diyar dike, çalakiya Rêbertiyê diyar dike û bergê meşa wî diyar dike; berjewendiyên gelê Kurd e, hêviyên gelê Kurd e. Rêbertî tenê li hemberî wan hêviyan berpirsiyar e, beramberî tiştekî din ne berpirsiyar e. Ji bo vê jî ev jî taybetmendiyeke PKK'ê bû, PKK di şer û têkoşîna azadiyê de bi îradeya xwe ya serbixwe bi ser ket.

Di qada Rojhilata Navîn de bi ser ket. Ev weke mucizeyekê bû. Heta niha tu rêxistinan xwe ji koletiyê di wê

qadê de xelas nekirine. Tu rêxistinan nekariye serbixwe bin. PKK ne tenê serbixwe ma, bi salan ew qad ji bo bilindkirina asta şoreşa Kurdistanê xebitand. Ji vê xebatê re zanebûn û îradeyeke mezin tê xwestin. Ev hemû jî bi hêza Rêbertiyê pêk hat û hêza Rêbertiyê bû.

## 5- RÊBERTIYÊ BI HÊZA XWE YA ÎDEOLOJÎK DERFETÊN TÊKOŞÎNÊ AFIRAND

Her kes niha behitî (şaş) dimîne, Rêbertiyê wiha di nava wan tewazinan de, di nava wan nakokiyan de çawa karîbû derfetên jiyanê peyda bike! Ev hêza Rêbertiyê her kesî matmayî dihêle.

Gelek kes, hêz hene naxwazin rastiya Rêbertiyê bibînin. Naxwazin qebûl bikin, lê mikur tên. Lewra çi dibêjin; "filan dewletê ew destek dikir, bêvan dewletê destek dikir." Ev hemû derew in. Suriyê jî em bi awayekî cidî destek nedikir. Têkiliyên me yên bi Suriyeyê re çi bûn? Dijminê me yên hevpar hebûn. Siyonîzm û Emperyalîzmê ew tengav dikirin, yê me jî dijminê me hebûn di wir de em dibûn yek. Têkiliyeke rasterast nebû, dibe ku car caran hevdîtin hebûn, lê ji wê jî derbas nedibû.

Alîkarî tune bû, mînak, Sûriyeyê sîlah nedaye me. Suriyeyê di mijara çûn û hatinê de jî destek nedaye me. Israr dikirin ku dema komên me derbasî qada leşkerî bibin alîkariya wan hebe, yan jî hayê wan jê hebe, lê rêxistinê qet qebûl nedikir. Me xeterî jî dida ber çavan, dema komên me dihatin girtin, gelek hevalên me di bin îşkencê de seqet diman. Lê tu carî wiha me di aliyê çûn û hatinê de xwe nekir bin kontrola Sûriyeyê. Nasnameyeke hevalên me nebû da ku pê tevbigerin. Carinan bi yê Filîstîniyan, Ermeniyan… nizanim bi çi rengî wê demê heval tevdigeriyan, lê hemû jî girêdayî îradeya azad bû. Lê mirov

temaşe dike niha wiha dibêjin, bi têkiliya madî, manewî, ev tişt di Sûriyeyê de tune bûn. Rêbertiyê hinek tişt bi uslubê xwe dida meşandin. Heta Hevalê Cûma digot: berpirsiyarekî Sûriyeyê ji Rêbertiyê re gotiye: “Bijî ji te re, te em jî ji bo xwe dane xebitandin. Lê me tu feyde ji te negirt.”

Yanî di xeta serbixwe de bûn, ji bo me prensîbeke jiyanî ye. Divê mirov tu carî îradeya xwe ya şexsî teslîm neke. Îradeya xwe te teslîmî kîjan hêzê kir, dostê te yê herî nêzik be jî, rojekê ji rojan wê bê ku berjewendiyên te û dostê te nebin yek, wê demê wê çi bike; wê şertê xwe li ser te ferz bike û tu yê nikaribî red bikî. Çima, ji ber ku te carekî îradeya xwe teslîm kiriye. Lê PKK tu carî îradeya xwe teslîm nake. Ji bo vê dijberên me hemû jî ji PKK’ê nerehet in. Ji ber ku têkiliyên navnetewî li ser esasê berjewendiyan e, dema ku destên xwe didin me dixwazin me ji bo xwe bikar bînin. Dema dibînin em serbixwe ne, li dijî me helwestan datînin. Ji serxwebûna me wiha aciz dibin. Îradeya serbixwe wiha hate parastin. Bi kedê hate parastin.

Yanî heger PKK’ê ji bo xwe rehetî esas bigirta, derfetên madî, rehetî, ewlekarî… ev esas girtibûya, wê di îradeyê de tewîz bida. Lê na, PKK’ê ne di rehetiyê de tewîz da, ne jî di ewlekariyê de tewîz da, di îradeyê de tewîz neda! Rast e, girtin çêdibe, îşkence çêdibe, bêperetî, birçîbûn… ev hemû jî bila hebin, lê îradeya serbixwe tu carî nehate xistin. Tu kesî jî nikarî vê bixîne. Em bala xwe bidinê cîhan jî xerab bibe dîsa wê PKK’ê hebe, lê em bêjin qet bandorê li PKK’ê nake, belê bandorê dike. Mînak em bêjin: Şerê Îraq û Îranê jî

bandor li ser xebata me kir, şerê Emerîka û Îraqê jî bandor li xebata me kir. Lê belê hemû rewşên ku derdikevin pêşberî PKK'ê, PKK'ê nakuje û nade jiyîn jî. Çavkaniya jiyan û mirina PKK'ê; PKK bi xwe ye. Lê dema em li kêlekekê bin helbet em jî bandor dibin. Mînak, bûyerek li kêleka me çêdibe em pê bandor dibin. Şerek di nava dewletan de çêbibe em pê bandor dibin. Di aliyê erênî de jî û neyînî de jî em pê bandor dibin. Lê belê hebûn û tunebûna me, bi me ve girêdayî ye! Em dikarin hebin û em dikarin tunebin jî. Dema me dev ji xeta xwe ya îdeolojîk, dev ji îradeya xwe ya serbixwe berda, wê demê me bi xwe hikmê mirinê li ser xwe biriye. Dema me dev jê berneda em ê her dem karibin firsendên jiyanê ji bo xwe peyda bikin. Jixwe meşa PKK'ê di nava astengan de çêbûye.

## Îdeolojiya Azadiyê

Ev îdeolojiya azadiyê ne li Rojhilata Navîn ne jî li Lubnanê pêk hat. Îdeolojiya azadiyê beriya wê dest pê kiribû, di salên 1970, 73'yan û şûn de, lêhûrbûn, lêkûrbûn û xebata Rêbertiyê îdeolojiya azadiyê bû. Lê ji bo hinek sedeman ew xebata îdeolojîk têrê nekir. Asteng û şerên derketin Derbeya 12'ê îlonê û gelek pêkanînên din, ev hemû bûn sersebebê ku di zemîneke guncaw de peydakirina îdeolojiya azadiyê zor be.

Mirov dikare bêje ku zemîneke guncaw ji bo wê peyda nekirin. Lewra diviyabû temam bibe, yanî ev şert bû. Dema

Rêbertî derbasî Rojhilata Navîn dibe, vê îdeolojiyê weke îdîayeke mezin li pêşberî xwe dibîne. Ji ber çi? Niha mînak armanca me çi ye, li beramberî sîstema desthilatdar kesek şer bike û têkoşînê bike. Ev kes, divê jixwe di hundirê xwe de şoreş çêkiribe. Yanî şoreşeke zîhnî û baweriyê çêkiribe, şoreşeke wijdanî çêkiribe ku karibe li hemberî dijmin têbikoşe. Yanî însanên ku di bin bandora sîstema desthilatdar de bin, şêwazên jiyana wan, sîstema fikrê wan, ji aliyê sîstemê ve hatibe honandin, li hemberî sîstemê nikare şer bike. Eger şer jî bike wê şerekî lewaz be û ne şerê serkeftinê be. Ji bo vê sekna îdeolojîk girîng e. Beriya her tiştî û karî divê di aliyê îdeolojiyê de zelalbûn hebe.

Yanî nakokiyên me bi sîstemê re ne nakokiyên wiha ji rêzê ne. Nakokiyên me şoreşgerî ne, radîkal in, bingehîn in, serûbinhevkirinên esasî ne. Li ser însanên me bi dehan salan e siyaseteke înkar û îmhayê tê meşandin. Tepisandineke cidî heye, beramberî vê guhertineke bingehîn pêwîst e.

Yanî nakokiyên bi dijmin re nakokiyên ji rêzê, biçûk, bi çalakiyekê bên çareserkirin, bi hewldanekê bên çareserkirin, bi meşek û serhildanekê bên çareserkirin nînin! Ji ber ku koletiyeke demdirêj li ser gelê me hatiye meşandin.

Ji bo vê girîng e li ser însan bandora sîstema dijmin nemîne. Pirsgirêkên kesayetê yê însanê Kurd cidî ne. Însanên me nizanin ka çiqasî ew bandor cidî ne. Pir ji xwe

razî ne, ji xwe bawer in, lê pir pirsgirêkên wan ên kesayetê hene. Ji ber çi ev kesayet bi xwe nahese? Ev însan, însanê Kurd bi gelemperî radest bûn, tirs, bêîradebûna wan di aqilê wan ên hundirîn de yan jî di bin hişê wan de hatiye rûniştin. Ji ber ku însanên me ne bi awayekî tenduristî tên mezinkirin. Kî wan terbiye dike, malbat. Malbat kî ye? Malbat ew saziya ku radest bûye ye. Ew civaka kevneşop a radestî sîstemê bûye ye.

Di welatekî de ew qas înkar hebe, lê îsyan tê de tune be! Înkar û tecawiz tê de heye, lê îsyan tê de tune ye. Tam berovajiyê vê her kes yê din şiyar dike û dibêje: “Eman tiştekî neke!” Bala xwe bidinê rewşa Kurdan çawa ye? Weke çawa mirovek hatibe tecawizkirin, lê dema radibe ser piyan û îsyan bike, yê dî dibêjiyê: “ teqez tu îsyan nekî!” Dibêje: “Tecawiz li ser min tê meşandin, çawa ez ê dengê xwe nekim, çawa ez ê nekim qîr û hewar.” Yê din dibêjê: “Divê tu dengê xwe nekî.” Rewşa Kurdistanê wiha bû.

Bala xwe bidinê şîretên dê û bavan çi ne? Bêdeng be, deng dernexîne, hêmin be, li dibistanê tu tevgerê neke ya tu yê tune bibî û wê te ji dibistanê bavêjin, te ji kar bavêjin hwd. Yan di oxira pêdiviya jiyana rojane de nasname, netew, erdnîgarî hemû tên paşxistin, yan jî bêxem nêzik dibin. Niha carinan mirov dibêje, dema me biryar da û em ketin nava şoreşê weke ku me her tişt çareser kiribe. Lê eşkere dibe ku wiha nîne. Çima em nikarin şoreşgertiyeke baş bikin? Ji ber ku em li ser tirsê hatine mezinkirin. Bi şiyariyan em hatine xwedîkirin. Çalakbûn, macera,

şoreşgertî û bikokbûn di me de lewaz e. Dijmin ji milekî ve, malbat ji milekî ve em terbiye kirine, kevneşopiyên civakê ji milekî ve em di bin tepeseriyê de hiştine. Ev hemû dibin sedem ku kesayeteke lewaz derkeve holê. Ev kesayet, dibe ku zana be derba yekê lê bixe, mînak çalakiyekê bike, lê dawiya wê nayîne.

Ji ber çi ev wiha ye? Vê kesayetê, bi dijmin re nakokiyên kûr nejiyaye. Dijmin weke dijmin nabîne, dewletê dibîne, ji ber ku dibistana wî xwendiye û êdî taybetmendiyên dagirkeriyê hatine jibîrkirin. Yanî bavê te şiyar bûye û dîtiye ku polîsên Tirkan e, dibistana wan e, her tişt bi Ereb, Fars û Tirkan re tê meşandin tu jî bi heman awayî mezin dibî û bi dagirkeriyê nahesî. Tu nizanî tu di bin siya dagirkeriyê de dijî. Ji bo te her tişt xwezayî tê.

Herwiha hewldanên te yên li dijî dagirkeriyê weke sûc tên hesibandin. Jixwe dijmin hemû hebûna te sûc dihesibîne, lê tu jî sûc dihesibînî. Ji bo vê tu çalakiyekî dikî tu dawiya wê naynî. Weke ku tu poşman bibî, tu bêjî, yahû min li hemberî vê dewletê sûc kir, gelo wê çi bibe ji min!? Em bala xwe bidinê niha jî hinek hevalên me ji zindanê derdikevin û diçin malê dirûnin. Çima wiha dikin? Mantiq ev e, min li hemberî dewletê sûc kir, dewletê jî cezayê xwe girt, niha em bûn beramber, ez li mala xwe û ew li mala xwe. Ya rastî ew dema yekî/ê çalakiyek kiribe û ketibe zindanê, piştî ku derket divê hîna zêdetir di nava têkoşînê de cih bigire. Ji ber ku dijmin jixwe bêmaf bû, wî xwest wê bêmafiyê ji holê rabike û careke din dijmin ew xist zindanê

û îşkence kir, bi salan ew di hebsê de hişt, vê carê divê nerazîbûna wî hîna zêdetir be û qet bi dijmin re li hev neke. Em li hev bên jî divê ew li hev neyên. Ew qas sal di nav çar dîwaran de derbas kiriye, divê li hev neyên, ji doza PKK'ê bi hezaran însan di zindanan re derbas bûn, îşkence dîtin. Bîst, sî sal di zindanan de mane, niha jî mirov temaşe dike, tiştekî nake! Bi awayekî xwezî heke tiştekî jî nekin, divê di cihê xwe de bisekinin. Lê niha hinek ji wan êdî xerabiyê dikin.

Ev kesayeta nexweş e, yanî ev kesayet, dagirkeran wek dagirker nabîne. Di têkoşînê de mayîndebûn nîne. Radîkal nîne, heta dawiyê nameşe û najo. Divê ev kesayet bê guhertin, wê çaxê divê çi bibe? Ev kesayet di zemînê xwe de tiştan fêm bike û nas bike. Yanî êdî miletê Vîetnamê wiha şer kir, yê Kubayê wiha şer kir, Lenîn wiha got, ev têra çêkirina şoreşgerekî/ê nake. Şoreşger divê nakokiyên Rûsyayê nejîn. Divê nakokiyên Vîetnamê nejîn, divê nakokiyên Kurdistanê bijîn. Divê nakokiyên Kurdê feqîr bi serdestan re, nakokiyê jina Kurd bi desthilatiya zilam re, nakokiyên ciwanên Kurd bi sîstema dagirker re bijîn.

Divê şoreşger van nakokiyan heta mêjiyê hestiyê xwe bijî. Li ser esasê van nakokiyan, şêwazê bersivdayînê wê çi be, wan derbixe zanebûnê. Wê bi çi şêwazî bersiv bide. Lewra PKK'ê xwest vê çareser bike. Ji heştê û şûn ve di van xalan de lêkolîn çêbû. Hîna şênbertir kirin. Di rastiya Kurdayetiyê de şoreşgertî, di rastiya Kurdayetiyê de têkoşîn. Êdî ji bo em şoreşger bin, Vîetnamê wiha dikir, ev jiberkirin e. Ew êdî têrê nake. Mirov moral, ders û

tecrûbeyê jê digire, lê belê Vîetnam Vîetnam e û Kurdistan jî Kurdistan e, Rûsya Rûsya ye û Kurdistan Kurdistan e.

Her rastiyek zimanê wê heye. Pirtûkeke Rêbertiyê heye dibêje: “Her şoreşek zimanê wê heye, her rastiyek zimanê wê heye û xwe îfade dike.” Tu bi zimanê cihekî din nikarî rastiya Kurdistanê îfade bikî. Ji bo vê bi giranî li ser vê xalê hate seknandin. Di encamê de çi bû? Jixwe di vir de gelek berhem derketin. Ev berhem çi ne?

Yek; Problema Rizgariya Neteweya Kurdistanê û Rêka Çareseriyê. Ev pirtûk derket. Di Kurdistanê de Pirsgirêka Kesayetê û Taybetmendiyên Milîtanê Şoreşger û Jiyana Rêxistinê. Ev jî weke pirtûkekê derket. Cardin, Di Kurdistanê De Rola Şîdetê. Ew jî bi vî rengî ye. Siyaseta Rizgariya Netewî Kurdistan û Şerê Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê. Pirtûkek jî bi vî rengî derket.

Cardin, nirxandina sîstema dijmin a asîmîlasyon, înkar û şerê taybet, mînak Çanda Eskerî li ser esasê asîmîlasyonê û erkên tolhildana ji şoreşgerî radiweste. Bi vî rengî gelek metod derketin. Di akademiyên perwerdeyê de analîzên Rêbertiyê, xeberdanên Rêbertiyê, ev hemû hatine danehevkirin û analîzên cuda cuda hatin nirxandin û bûne pirtûk. Kadroyan jî li ser hemûyan jî perwerde dîtin.

Hemû kesên bibin endam jî êdî li ser wan metodan perwerde dîtin. Lewra weke din jî pirtûk hene, berhevkirin hene. Ev hemû bi awayê pirtûk derketin pêş.

## Di Kurdistanê De Çaxa Qehremaniyê

Ev hemû çi ne? Mînak, di Kurdistanê de tiştên ku bi kesayetê ve girêdayî û di pêşberî pêngava şoreşgerî de dibin astang çi ne? Kesayeta ku divê bê şopandin kîjan e, rola kesayetê di dîrokê de çi ye? Mînak însanê Kurd ji xwe bêbawer be, lê baweriya wî bi her kesî heye, lê baweriya wî bi wî nîne. Lewma nikare pêşeng û serok be. Nizane pêşeng be! Ji bo vê jî girîng bû ew kesayet bê nîqaşkirin. Lewra di nava însanan de tercîhê pêş dixe, îdeolojî mijareke tercîhê ye. Tu çi dixwazî, çi naxwazî?!

Mînak kesayeteke kopya, pasîf, lewaz, birçî, perîşan û newêrek, yan jî kesayeteke bi teybetmendiyên herî xweştirîn, maceraperest, jixwebawer, cesûr, zana û bi erkên guhertina civakê derketiye rê. Kîjan ji van kesayeta ya ku em behsê dikin e?

Eger karek di nav wan zor û zehmetiyan de hate kirin, sedemên wê ev e. Ji ber ku kesayeta bêçare hate mehkûmkirin. Li şûna wê kesayeteke milîtan, leheng, a ku wiha zor û zehmetiyan nas nake û çalak e, astengan derbas dike, weke ku di asta pêhlewaniyê de ye, da ku karibe ji vê pêvajoyê re pêşengiyê bike. Heta di vir de Rêbertî dibêje: “Girîng e em di Kurdistanê de çaxekî qehremaniyê bijîn.”

Çaxê qehremaniyê çi ye? Di zemanê berê de li Roma û Yewnanîstanê zemanê qehremaniyê hebû. Însanê derdiketin ne xwezayî bûn. Bi şûr û mertalên xwe, bi tîr û kevanên xwe, bi siwariya xwe ya hespan bûn, mînak yek

beramberî sedî bû. Di wê astê de bihêz bûn. Ew çax navê wê bû çaxa qehremaniyê. Lewra diviyabû ku li Kurdistanê jî çaxekî wiha bihatiba jiyîn.

Ev çax li dijî çi ye? Ev çax li dijî kesayeta kopya, pasîf, feqîr, bêçare ye. Ew kesayeta ku newêre xwe biguhere û newêre nêzikî guhertinê bibe, her tiştê wî dubare ye, bav û dayîka wî çawa ne, ew jî wisa ye… diviya bû ew bihatiba mehkûmkirin. Ev kesayet wê taybetmendiyên wê çi bin? Mînak, taybetmendiyên kesayetê, wê çaxê Rêbertî bi vî rengî diyar dike. Nêrîna wî ya li xwezayê, li cîhanê, yanî nihêrîna Rêbertiyê ya felsefîk çawa ye û çi ye? Mînak cîhanê û xwezayê çawa dibîne? Însanan çawa dibîne, Rêbertî di van aliyan de xwedî nêrîneke felsefîk e.

Xala duyemîn jî divê ew kesayet xwedî nêrîneke îdeolojîk be, yanî karibe bûyeran analîz bike, di derbarê cîhan, herêm û welatê xwe de jî xwedî nêrîn be. Bizane ka nakokî di navbera kê de heye, kî dost e, kî dijmin e!? Kî bi hev re nakokiyan dijî? Pêwîst e van nas bike. Yanî xwedî zanebûn be. Bizane îdeolojî çi ye? Di serî de îdeolojî naskirina nakokiyan e. Heta tu nakokiyan nebînî tu teoriyê nas nakî. Di wateyekî din de îdeolojî çi ye, dîtin e. Tu bi çavan di nav civakê de çi dibînî, yanî nakokiyan dibînî, ew teorî ye. Nakokî di navbera kê de hene, wan baş dîtin teorî ye?

Lewra divê mirov çawa bibe xwedî xeteke siyasî? Timî ji xwe bipirse, ez ji bo çi têkoşînê dikim? Bi çi awayî têkoşînê

dikim? Pêwîst e ev zelal bibin. Di vê têkoşînê de dost û dijminê wî kî ne? Dînamîkên wî yên têkoşînê kî ne? Da ku bibe xwedî xeteke siyasî û eşkere.

Cardin divê di vê têkoşînê de xwedî taktîk û stratejiyeke zelal be. Taktîk û stratejiya mirov pêwîst e hebe. Di mijara taktîk û stratejiyê de hosta be. Ango wê îro çi bike û sibê wê çi bike, wan diyar bike. Bi çi formula rêxistinî wê nêzikî kar û xebatê bibe? Li ku wê çawa bixebite û li cihê din wê çawa bixebite? Wiha çors, bêteşe, ji taktîkê dûr, ji stratejiyê dûr, rojane ev xebat nayê kirin. Divê xebat girêdayî taktîk û stratejiyan be.

Weke din gelo divê xwedî çi taybetmendiyan be? Pêwîst e xwedî prensîbên rêxistinî be, rêxistin be! Têkiliya rêxistinî, berpirsiyariya rêxistinîbûyînê pê re hebe, lewra taybetmendiya milîtanê şoreşger bi vî rengî ne. Rêbertiyê jî van taybetmendiyên berpirsiyariyê berfireh daye diyarkirin. Lê ev taybetmendiyên me gotin di nav şertên Kurdistanê de, tên çi maneyê?

Mînak, dema dibêje taktîk û stratejîk, di wir de behsa Rûsyayê nake, behsa Kurdistanê dike. Tu yê li ku şer bikî, tu yê çawa rêxistinê ava bikî, tu yê kîjan erdnîgariyê esas bigirî? Li ser van xalan disekine. Dema behsa rêxistinê dike behsa rêxistina Kurdan dike. Yanî tu yê çawa bêrêxistiniya di nava Kurdan de mehkûm bikî û prensîbên rêxistinî bidî rûniştandin. Ji ehbabçawîşiyê dûr, ji herêmgeriyê dûr, ji bêprensîpbûnê dûr. Xwedî rêzkarî, ruhekî komîn, afirînerî,

însiyatîf, bi her awayî tu yê ji bo çawa jiyana rêxistinê bidî rûniştandin bixebitî.

Milîtanekî/ê xwedî van danehevan yan xwediyê van bingehan, wê di nava kar de çawa be? Wê dilsoz be, wê girêdayî gel be, wê nirxê gel nefiroşe. Wê di binê zindanan de, li serê çiyan, derve, li hundirê welat radest nebe û bêbawer nekeve. Wê alîgirê sîstema demokratîk be, wê di aliyê sîstema sosyalîst de be, wê exlaqî be! Wê wêrek be, wê van taybetmendiyan hemûyan di xwe de pêk bîne. Wê demê mirov dikare bêje bi awayekî çalak tevlî têkoşînê bûye.

Cardin, di derbarê rêxistinê de pirsgirêka kesayetê çareser dike. Kesayeta têkoşer di Kurdistanê de wê xwedî taybetmendiyên çawa bin, hemû jî di wir de tên zelalkirin.

Pirtûka di derbarê rêxistinê de heye. Rêxistina şoreşgerî wê çawa bibe? Êdî nema em vê bêjin, filan rêxistin di cîhanê de wiha bû, bêvan rêxistin di cîhanê de wiha bû! PKK divê çawa bibe? Têkiliyên rêxistinî di nava PKK'ê de wê çawa bin? Erkê endamekî/e PKK'ê wê çi bin? Li ser van xalan wê bê seknandin.

Li Kurdistanê rola şîdetê, yanî wê şerê Rizgariya Neteweya Kurdistanê di kîjan qonaxên stratejîk re derbas bibe, di kîjan qonaxên taktîk de derbas bibe? Wê çi bi kar bînin? Kîjan taktîkan, kîjan erdnîgariya wê esas bigire? Çi hedefan bide pêşberî xwe, wê li kê bide. Doktrîna wê dê çi be, rêzehedefên tevgerê wê çi bin? Bi giranî li ser van xalan tê rawestandin. Pirtûk çêdibin û heval dixwînin, perwerdê

dibînin û ev komîserhevkirin, ev kûrbûn hîna zêdetir kesayeta PKK'ê da naskirin. Hîna zêdetir rêxistina PKK'ê nasnameya xwe derxist pêş. Nasnameya wê ya îdeolojîk derxist pêş.

Bi milê wê yê demokratîk, bi milê wê yê sosyalîst, bi milê wê yê exlaqî, bi milê wê yê çandî, şêwazê wê yê jiyanê, di van aliyan de derxist pêş. Ev wer nêzikbûneke qalib jî nîne û pir xwezayî ne. Encamê lêgerîn, lêkolîn û tecrûbê ne. Dema PKK derket, ev tiştê ku îro em esas digirin tune bûn. Ev hemû bi tecrûbeyê hate qezenckirin.

Mînak, di serî de nedihat bîra kesî bêje: Di nava PKK'ê de mey vexwarin qedexe ye. Yekî PKK'yî divê venexwe. Tiştekî wiha di bîra kesî de nebû. Yan jî çêkirina malbatan çênabe. Zewac, zarok, malbat, tiştekî wiha nebû, lê bi tecrûbe û bi îdîayê di nava PKK'ê de ev hemû derketin, rû bi rû mayîn çêbû. Ev bû sedem ku hîna bêtir kesayeta kadroyê di nava vê têkoşînê de cih bigire, hîna baştir diyar bibe. Wê demê, ji gelek daxwazî, şêwazê jiyana ku mirovên ji rêzê ji bo xwe qebûl dikin û exlaqî dibînin, divê jê dûr bikeve. Heger ne wiha be wê nikaribin bibin xebatkarên PKK'ê.

## Rêbertî Çavkaniya Pêvajoya Gerîlatiyê ya Îdeolojîk e

Ji bo vê ev weke destwerdaneke li ser însanan, nîne. Peydakirina tîpekî însanan nîne, şûştina mêjî nîne! Ev hemû teoriyên çewt in. Tam berovajiyê vê lêgerîn û lêkolîneke

cidî ji bo peydakirina însanên ku karibin beramberî astengên ku li pêşiya meşa şoreşgerî derdikevin, da ku karibin li ber xwe bidin.

Ev, encamên ezmûn û tecrûbeyan in. Hemû jî encama vê ye. Ji bo vê xurtkirina wan, kûrkirina wan, pejirandina van pêwîst e. Lê yên derveyî me van rexneyan dikin. Ew têkoşîneke li dijî me didin meşandin. Ev tiştek cuda ye, tiştên ew rexne dikin ne rast in. Pêwîst e em tiştên ku egerên jiyanê ji bo me peyda bikin em esas bigirin. Ger ev şêwazê jiyanê nebûya, eger ev pîvan nebûna û PKK'ê dev jê berdaba, va sî û sê sal e têkoşîn bênavber dewam dike, berde sî û sê salan nedikarî sî û sê rojan jî dewam bike. Ev taybetmendî dibe sedem ku her tim PKK karibe li ser piyan bisekine û têkoşînê berdewam bike. Li vê hayîl bûn gelekî girîng e.

Gav bi gav encamên vê pêvajoya îdeolojîk pêş ketin, di encama wê de tevgera gerîla derket. Lewra tevgera gerîla jî bixwe beramberî astengiyan hat, astengiyên wê jî hene. Tevgera gerîla jî em lê temaşe dikin, li ser esasê xurtkirina gerîla û pêşxistina gerîla bû. Bi awayekî rasterast Rêbertiyê ji qada Rojhilata Navîn perspektîf pêş dixist. Analîz dikir, ferman pêş dixist. Ev hemû li ser esasê peydakirina yekîneyeke gerîla ya serkeftî bû.

Gerîla çima bi ser nakeve, çima astengiyan dijî? Ji bo ku pêwîstîbûna gerîlatiyê di kesayet, şêwaz û jiyanê de pêk

nayne wiha dibe. Ji bo vê, li ser vê Rêbertiyê bi awayekî bênavber analîz pêş dixist.

Rêbertiyê ji bo ku bi her awayî karibe yekîneyên gerîla serkeftî bin, li ser kesayeta fermandar, şervan, pîvanê jiyanê, şêwazê çalakiyê, şêwazê serkeftinê pêş bikeve, ji bo van hemû rengên analîzan, lêhûrbûn çêdikir. Mirov dikare bêje ew pêvajoyeke ji pêvajoya gerîlatiyê bû. Rêbertî, çavkaniya wê pêvajoyê ya îdeolojîk bû.

## Îdelojiya Azadiya Jinê û Pêşketina Wê

Rêbertiyê di wê demê de bi pêşxistina gerîlatiyê re, îdeolojiya azadiya jinê jî pêş xist. Di vê derbarê de jî rast e weke her tevgereke sosyalîst PKK jî di derbarê jin û malbatê de nerîneke xwe hebû. Vê nêrînê statûko derbas dikir. Yanî statûkoparêzî derbas dikir. Fikra feodal derbas dikir, nirxên wê yên heyî jî derbas dikir. Lê belê tam ne nêrîna azadiyê bû. Çi bû, yanî di rastiyê de kevneşopiya sosyalîzma pêkhatî bû. Lewra sosyalîzm tiştekî baş e, ji bo vê bangek ji jinê re hebû digot; “Were û tevlî me bibe, eger tu tevlî me bibî, tu yê jî rizgar bibî.” Gelo ev bangewazî tiştekî xerab e, teqez ne xerab e. Lê jinê ber bi azadiyê ve nabe. Eger tu li gorî feodaliyê lê temaşe bikî û heta li gorî kapîtalîzmê lê temaşe bikî, ev bangawazî wê demê tiştekî baş e. Lê perspektîfên azadiyê tê de tune ne.

Jinê weke cewherê wê yê rast nabîne, weke kirde nabîne, weke heyberê (nesne) dibîne. Yanî ji bo sosyalîzmê diviyabû tevlî bibe, ne ku sosyalîzm ji bo jinê be. Jin weke potansiyel xistina xizmeta hinek tiştan, wek heyberê bi kar anîn... Di bingeh de nêzikbûn ev bûn. Mînak, ez radibim û îdîayê min a sosyalîzmê heye, ya rizgariyê heye, ez lê temaşe dikim qismek civakê yê mezin weke potansiyel heye, lê bi awayekî çalak tevlî min nabe. Ez bangekê dikim ew tê tevlî min dibe, lê tevlî xwe nabe. Mirov dikare bêje ew tevlîbûn qonaxek e, lê ne azadî ye.

Rêbertî li ser vê rastiyê kûr bû. Ji bo ku jin azad bibe pêwîst e li tiştên xwe yên wenda vegere. Divê ji teqlîdê, ji girêdana bi zilam ve dûr bikeve. Tu carî di zemînê zilam de îradeya xwe pêk neyne, di zemînê xwe de îradeya xwe pêk bîne. Zemînê ku karibe serbest xwe îfade bike, ji xwe re wê zemînê peyda bike. Di hemû qadan de, di şer de jî û di siyasetê de jî divê zemîn ji xwe re peyda bike. Di rêxistinbûnê de jî divê peyda bike.

Ev weke çirûskan bûn, destpêkê di zemînê şoreşê de ne jinê ne jî zilam ji vê fikrê fêm kirin. Tiştên dihatin gotin kesî fêm nedikir. Dibe ku carina bi hinekan re tesewirek wiha çêdibû, dema ku di serî de Rêbertiyê yekîneyên xweser, yan jî yên serbixwe yên jinê pêşniyar kir û ferman ji bo avakirina wê da, gelekan ev weke tevdîrekê fêm dikirin. Li beramberî hinek qonaxan tevdîrek e. Lê tu têkiliya wê bi vê nerînê re tune ye. Ev li gel xwe hinekan ji xwe re şîrove

dikir. Bi zîhnê xwe yê lewaz, bi fikrê xwe yê lewaz wiha şîrove dikirin. Ancax fikra me digihîşt wê asta şîroveyê.

Lê piştre eşkere bû ku mijara Rêbertiyê ne ev e. Rêbertî bi temamî tiştên nû dibêje. Tiştekî ne pêxemberan gotiye, ne jî serokên Ronesansa Ewrûpayê gotine, ne jî serokên sosyalîzmê gotine.

## Cinsiyetparêzî Nahêle Kesayet û Civak Azad Bijîn

“Jin weke hêmanekî duyemîn e, bê îrade ye, her demê bi zilam xwe rave dike û wê her demê li pey zilam be”, bêguman ne wiha ye! Jin bi xwe kirde (özne) ye û ne heyber e. Ji bo vê agahiyên me yên dîrokî derbarê vê mijarê de û teşegirtina me ya çandî xiste lêpirsînê. Lewra Rêbertiyê behsa kuştina zilam kir. Kuştin ne bi rengekî fizîkî, kuştina wê teşegirtina çandî ya ku bi rengekî xwezayî zilam bi awayekî otomatîk xwe esas digire û weke heyberê nêzikî jinê dibe. Cinsiyetparêziya civakî ev e. Cinsiyetparêziya civakî çi ye? Zilam tê de kirde ye, lewra zilam hemû xerabiyên xwe bi jinê rave dike.

Mînak dibêje filan kes xerabiyek kiriye, dibêje sûcê jinê ye, çima tehrîk (sor kir)! Yanî jin timî tê sûcdarkirin. Tim ew çavkaniya pirsgirêkan tê dîtin. Ev çi ye? Ev cinsiyetparêziya civakî ye. Dibe ku tu şoreşger bî û sosyalîst bî, lê dîsa jî cinsiyetparêziya civakî bi te re heye. Nêzikbûna

te ji jinê re ne li ser esasê wekheviyê ye. Dîsa jî li ser esasê parastinê ye, li gorî xwe teşe dayînê ye.

Însanê herî sosyalîst jî nêzikbûna wî ji jinê re çawa ye? Jinê bikişîne bi aliyê xwe ve. Ne ku jin weke xwe be, hela ku wê jinê hewl dabe gavekî jê pêşdatir bavêje, vê carê zilam dîn dibe û cîhana wî xerab dibe. Çima wiha dibe? Ji ber ku cewherê zilam hatiye xerakirin û xwe li ser jinê dibîne.

Zilam naxwaze dev ji vê berde, sosyalîst be jî naxwaze dev jê berde. Ji bo vê rast e, qaşo qedir dide, qîmet dide, bang dike û radike ser piyan, lê her demê dixwaze jin metroyekê li paş wî be. Yanî di navbera wî û jinê de mesafeyek hebe. Ne ku jin weke wî be.

## Vegera Jinê Ya Li Cewherê Xwe Çavkaniya Jiyanê Ye

Rêbertî ev nêzikbûnên zilam hemû eşkere kirin! Ev qanûnên desthilatiyê û serweriyê di hundirê zilam de eşkere kir û li şûna wê bicewherbûyîna jinê derxist pêş. Lewra jin weke çavkaniya jiyanê ye,  jiyan bixwe ye. Ji ber vê Rêbertiyê got: “Jin jiyan e.”

Ev çavkaniya jiyanê kirde ye ne heyber e. Êdî dema wê hatiye ku karibe di rêxistin, ekonomî, siyaset û îdeolojiyê de bi argumanên zilam na, bi argumanê jinê xwe îfade bike. Di her qadekê de xwe îfade bike û rêxistin jî divê wî mafî biparêze.

## Di Rojhilata Navîn De Îrade, Îdeolojî Û Rêxistina Azad Bingehê Têkoşîna Me Ye

Li ser vî bingehî Rêbertiyê çi kir? Ev pêngav dest pê kir, yanî îdeolojiya azadiyê kir parçeyeke bingehîn ji têkoşîna Rêbertiya Rojhilata Navîn. Rêbertî dibêje: “Sê karên bingehîn di Rojhilata Navîn de min kirine!” Pêşî me behsa sê îdîayên ku Rêbertî li beramberî wan rû bi rû mabû kir; Îradeya azad, îdeolojiya azadiyê û rêxistina azadiyê ye. Peydakirina van armanc e.

Lê Rêbertî dibêje karên ku min di asta destanweriyê de kirine çi ne? Yek, peydakirina gelekî şervan ji bo xwe şer bike, duyemîn peydakirina şervanên azadiyê yanî gerîla û ya sêyemîn jî îdeolojiya azad e. Yanî azadiya jinê.

Rêbertî di Rojhilata Navîn de gelek kar kirin. Bi salan xebitî, demjimêrekê tenê jî nesekinî. Lê encamên karên xwe hemûyî bi sê sernivîsan gotiye: Gelekî Şervan, Şervanên Azadiyê û Jina Azad. Di têkoşîna Rêbertiyê de ev xalên bingehîn bûn. Lewra li ser vî esasî gav hatine avêtin. Di vê çarçoveyê de mirov dikare nasnameya îdeolojîk a PKK’ê bide diyarkirin.

Ev nasnameya îdeolojîk li ser çi esasî ye? Yek; civakbûyîn e û civakê esas digire! Girêdayî vê sernivîsê, kolektîvîzm, komunalîzm, ev esas in. Yanî weke çawa di kapîtalîzmê de em bala xwe bidinê nasnameya wê ferdanetî ye, lê di PKK bûnê de civakbûn e. PKK civakê û nirxên wê esas digire. Komunalîzmê esas digire.

Ya duyemîn; demokrasî ye. Ji bo vê Rêbertiyê têgihîştinên nû ji demokrasiyê re peyda kir. Yanî demokrasî ji nû ve girtina dest.

Xala sêyemîn; a ku em esas digirin ew e ku îdeolojiya me lîberal nîne, azadîxwaz e. Yanî azadiyê esas digire. Ev nasname mehkûmkirina cinsiyetparêziya civakî ye. Ango azadiya jinê ye. Di vê nasnameyê de vegerandina ahenga di navbera însan û xwezayê de ye. Ev nasname li ser çi esasî xwe nîşan dide:

1- Miliyetparêzî.
2- Cinsiyetparêzî
3- Zanistperestî
4- Dîngerî

Tekoşîna me ya îdeolojîk li dijî van xalên me jimartî ne. PKK'yî bûyîn li dijî van tiştan xwe nîşan dide. Nasnameya xwe wisa diyar dike. Lewra em ê li ser van xalan rawestin.

Nasnameya îdeolojîk a tevgera PKK'ê di gelek aliyan de xwe nîşan dide. Di nasnameya îdeolojîk de pîvanên exlaqî esas in. Exlaq tê wateya kirina tiştê herî baş. Pêkanîn e, kar e. Ev bi çi rengî wê çêbibe? Bêguman, ev li ser hinek bingehan çêdibe. Yanî dema em dibêjin karê herî baş, em behsa kîjan karî dikin? Başbûn; pîvanên başbûnê wê çi bin? Pîvanên başbûnê ger ew karê mirov dike ka çiqasî dikeve xizmeta civakê, dikeve xizmeta pêşketina civakê, parastina civakê, heta kîjan asta zîhnî jiyana însanan bilind dike... Wê

çaxê mirov dikare navê wî karî bike karekî baş. Lewma jî pîvanên exlaqî çi ne?

Sekna li dijî kedxwariyê ye! Yanî kedxwarî redkirin û li dijî wê sekinîn e. Têkoşîna ji bo azadiyê ye, bênavber têkoşîn e. Berpirsiyartiya li beramberî nirxan e; nirxên madî yên manewî. Jixwe têkilî ye, danûstandin e. Gelek beşên jiyanê di nav de ye, di çarçoveya pêkanîna erkên şoreşê de ye. Pêkanîna erkên şoreşê çi ne? Di roja me ya îro de pêkanîna erkên têkoşînê çi ne?

Erkên ku bi qada leşkerî ve girêdayî hene. Di aliyê xwe perwerdekirina leşkerî, mewzîbûna rast, tim ji bo parastina nirxên civakê hazir û amade be. Beramberî zêdegaviyên ji aliyê dijmin ve tên kirin û gelek tiştên girêdayî vê rewşê hene.

Cardin erkên girêdayî avakirina civaka exlaqî û polîtîk hene. Bi taybetî jî di aliyê pêkanînê de, birêxistinkirina komun, koperatîf û çêkirina meclîsan… Ev hemû kar in.

Niha sekna exlaqî çi ye? Sekna exlaqî, pêkanîna van karan e. Biberpirsiyartî tevgerandin e. Wiha tewîz dayîn, rev, xwe veşartin, xwe dana paş, ev hemû tiştên ku bi sekna exlaqî ve ne girêdayî ne û ne di tewazinekî de ne. Xwe dayîna paş, nêzikbûnên kar dereng hiştin, bi her awayî bê berpirsiyariya li hemberî erkên şoreşê. Yanî bê berpirsiyariya beramberî pêkanîna erkan, mirov nikare girêdana wê bi sekneke exlaqî re çêbike.

Sekna exlaqî pêkanîna herî rast e; di heman demê de pêkanîna karên herî baş e. Çawaniya başbûnê jî girêdayî bi çarçoveya girêdana kes ka çiqasî xizmeta civakê dike ye. Li ser vî esasî mirov sekna exlaqî dikare binirxîne. Dervayî vê mirov nikare bêje kesayet li ser van pîvanên ku dibêjin: mirovek aram e, bêdeng e, mulayîm e, helîm e, selîm e û xweşbînî ye. Mirov nikare pîvanên exlaqî bi vî rengî tenê bigire dest. Çûna bi ser kar de, çêkirina rêxistin, bilindkirina asta têkoşîna ji bo azadiyê, sekna li beramberî dagirkeran, ev hemû girêdayî sekna exlaqî ne. Yanî şopandina edaletê, heqîqet û azadiyê, ev şopandin exlaqî ne. Bêexlaqiya herî mezin çi ye? Dagirkerî ye, desthilatdarî ye, bi her awayî ev taybetmendiyên civakê kêm dihêlin, bindestiyê tê de çêdikin, paşverûtiyê ferz dikin. Ev bêexlaqiya herî mezin e.

Divê ev he rdu nêzikbûn bi hev re nejîn. Pîvanên exlaqî di nava rêxistinê de ji bo me mijareke têkoşînê ye. Yanî liv û tevgera ku em nikarin peywendiya wê bi exlaqê rêxistinê re çêbikin, divê em bi wan re nejîn. Li gel wan nejîn û mafê jiyanê jî ji wan re nehêlin. Ji ber ku tevgera ferd, yanî yê her ferdekî nêzikbûn, liv û tevger, rabûn û rûniştin, nêzikbûna ji kar re, bi gelemperî taybetmendiyên wî yên jiyanî di jiyanê de, çavkaniyên xwe ji ku digirin? Ji hêza ku ferd dide meşandin, ji wê digire. Yanî ji îdeolojiyê digire.

Însan çiqas di warê îdeolojîk de xwe kûr kiribe, bi çek kiribe, bawer kiribe, ew qas jî ew îdeolojî liv û tevgera kes diyar dike. Ji bo vê yek nikare îdîa bike û bêje: “Ez PKK’yî me, bi îdeolojiya Rêber Apo bawer im, lê dema mirov li liv û

tevgera wan temaşe bike, li gorî xeta têkoşînê nîne! Bi rengekî cuda nêzik dibin. Ev mijar ji bo me esasî ne. Yanî mirov pîvanên exlaqî bi vî rengî dikare diyar bike.

### Di Cewherê Vê Nasnameyê De Demokrasî Heye

Me berê demokrasî bi rengekî din fêm dikir, lê di roja me ya îro de em bi rengekî din fêm dikin. Demokrasî weke taybetmendiyên civakê me nedizanî. Yanî di sosyolojiya derbasbûyî ya sosyalîst de jî, di ya kapîtalîst de jî, demokrasî weke taybetmendiyên civakê yê xwezayî me fêm nedikir. Demokrasî me weke çi nas dikir? Me weke rengê desthilatdariyê nas dikir. Desthilatdarî demokrasî ye, yan ne demokrasî ye, me baş fêm nedikir. Ji ber vê yekê demokrasî weke teşeya dewletê dihat fêmkirin.

Mînak Lenîn vê dibêje: “Bawer bikin, demokrasî rengek ji rengê dewletê ye.” Kengê dewlet tune bibe, wê demokrasî jî tune bibe. Yanî demokrasiyê weke taybetmendiyên dewletê û desthilatdariyê digirtin dest.

Lê em weke tevger êdî demokrasiyê bi vî rengî nagirin dest. Demokrasî weke rengê dewletê nîne, weke rengê desthilatdariyê nîne. Demokrasî rengekî jiyana civakê bi xwe ye. Heta civak hebe wê demokrasî jî hebe. Herwiha weke çawa Lenîn gotiye, bi tunebûna dewletê re, demokrasî jî tune dibe. Ev tespîteke ne rast e û em tevlî nabin. Bi tunebûna dewletê re demokrasî dest pê dike. Di bingeh de

wiha ye. Demokrasî dema ku dewlet tune be heye. Demokrasî dema ku dewlet lewaz be heye. Her ku demokrasî mezin dibe û bi pêş dikeve, ewqasî dewlet paş dikeve û biçûk dibe. Lewra wê demê demokrasî çi ye?

Em bi navê wê re mijûl nebin, li ku derketiye em bi wê re jî mijûl nebin. Lewra hikmê gel e, gelê xwe bi rê ve dibe ye, li gorî wê ew gel kî ye? Di çaxa kevn de demokrasî hemwelatiya Atînayê ye. Di vê çarçoveyê de jin û kole esas nayên girtin. Bi vî rengî weke têgîn, li ku derketiye, çima derketiye, bi çi hatiye naskirin; ji wê bêtir di roja me ya îro de têgihîştina me jê re çawa ye! Yanî fêmkirina me jê re li ser esasekî cuda ye, li ser kîjan esasî ye? Li ser esasê civaka ku hemû çêkerên wê karibin bêasteng xwe îfade bikin e. Di çarçoveya berjewendiyên xwe de xwe bînin ziman, bê ku ziyanê bidin ên din. Ev xwe îfadekirin bi peymaneke civakî pêwîst e bê parastin.

Demokrasî çi ye? Ew sîstema civakê ya ku di nav de hemû çêkerên civakê bêferq û cudatî di navbera mezin û biçûkan de hebe. Di navbera cinsan, rengan, zimanan hwd. hemû çêkerên vê civakê bê ku em ferq û cudatiyê bikin navbera wan, karibin bi rengekî serbest xwe îfade bikin. Mirov dikare bêje ev demokrasî ye.

Ji bo vê demokrasiya em esas digirin ne demokrasiya pirhejmariyê ye, ne jî demokrasiya hindikayî ye. Ne jî ya serdest û bindestan e. Ne ku ya çînan e, lê belê demokrasiya civakê ye.

Me jixwe gotibû demokrasiya em tînin ziman û li ser xeta wê xwe birêxistin dikin, ne ya pirjimar û hindikan e. Mînak bala xwe bidinê heger îro em behsa demokrasiyê bikin û em bêjin: Tenê demokrasî hilbijartin e! Dibêjin demokrasî hilbijartin e. Demokrasî tê maneya ku gel nûnerê xwe hilbijêre. Temam eger îro em dengdanekê li vir çêbikin, dibe ku hejmara hevalên jin beramberî hejmara hevalên mêr kêm e. Em ê bêjin bi awayekî demokratîk vê hejmarê bikin dengdanê. Wê demê wê bi awayekî xwezayî destê zilaman ji yê jinan zêdetir be. Gelo em ê li wir bêjin, me biryar girt, biryar hate girtin, lê di wir de jin heye?! Wê demê wê bêje pirhejmar ev bû. Ev ne demokrasî ye.

Ji ber ku hejmarek çiqasî kêm be jî, mafê wan heye. Dixwazî bila yek be jî, dîsa mafê kesekî jî heye. Girîng e ew jî mafê xwe bîne ziman. Girîng e di wê çarçoveyê de xwe bîne ziman. Ji ber wê demokrasiya ku em esas digirin, demokrasiyeke rasterast e, radîkal e, komunal e û kûr e. Wisa tenê bi hilbijartinan bisînor namîne. Tenê bi hinek mafên qezenckirî ve bisînor namîne. Her demê ji bo her kes bi temamî azad bijî, di nava têkoşînê de ye. Firsenda wê têkoşînê dihêle û peyda dike. Lewma divê em fêmkirina xwe ji demokrasiyê re jî ji nû ve bigirin dest. Demokrasî weke taybetmendiyê civakê ye.

## Îdeolojiya Me Li Ser Hîmê Neteweya Demokratîk E

Em di îdeolojiya xwe de neteweya demokratîk esas digirin. Em miliyetparêziyê nagirin dest, lê neteweya demokratîk esas digirin. Li ser vî esasî, dewletbûyîn, desthilatîbûn û şîdetê em bi awayekî tund rexne dikin.

Niha di van xalan de gelek pirsgirêk derdikevin. Gelek kes heta hinek kesên di nava me de dixwazin bi van tespîtan bileyîzin. Xerab nîşan bidin û dejenere bikin. Gelek caran ev di rastê de pir xwezayî tê qebûlkirin. Ji ber çi wiha tê qebûlkirin? Ji ber ku şiyarî û hesasiyeta me li hemberî xeta îdeolojîk lewaz e. Mînak yek tê dibêje: "Ya rastî miliyetparêzî baş e, lê ji ber ku hêza me tune ye û em nikarin bikin em nakin. Dewlet pir baş e, lê ji ber ku bi destê me neketiye lewra em naxwazin. Şîdet pir baş e, bê şîdet tiştek nabe. Lê ji ber ku me nedikarî me dev jê berda." Ev di hundirê rêxistinê de jirêderketin e, xerabkirin e, li gorî xwe têkoşîneke paşverû ye!

Niha em tevgereke zanistî ne û îlmê esas digirin. Wiha jiberkirî, dogmatîk, tiştên em hînbûne, ji bo me esas nînin. Em zanistê esas digirin. Em bi elimandinan nikarin bijîn, bi hînbûnên xwe yên kevn jî em nikarin bijîn. Bi jiberkirinê jî em nikarin bijîn. Ev karekterê tevgera me ye. Rêbertiya me, rêbertiyekî zanyar e lêkolînê dike, lêgerînê dike, balê dikişîne ser mijaran, bi çavan tiştan dibîne, li gorî wê formulan derdixe. Li gorî wan formulan tevdigere û tiştên nû derdixe.

Demekî me jî ji bo dewleteke neteweyî kar dikir. Dema ku me ji bo dewleteke neteweyî kar dikir, dîsa me şer dikir. Êrîşên li ser me jî ji yên niha ne zêdetir bûn. Lê me ji bo dewleteke netewî kar dikir. Lê îro em ji bo dewleteke netewî kar nakin. Em bala xwe bidinê êrîş li ser me zêdetir bûn. Wê demê ne ku em tirsiyan, yan jî bi dest me neket me dev jê berda, ji bo ku tiştekî pir mezin e û em negihanê rabû me tiştekî biçûktir xwest! Dema mirov wiha bihizire wê demê jirêderketina herî mezin di roja îro de di nav me de dijî. Ev fikarên han hemû çavkaniya xwe ji sistbûnê, ji paşxistinê, ji radîkalbûnê dûrketinê, ji bêprensîbûnê, ji dev ji xwe berdanê digirin.

Lê çavkaniya van têgihîştinên şaş çi ye? Gelek kes hene wiha dihizirin û dibêjin: "Berê me ji bo dewletê şer û têkoşîn dikir. Ev tiştên mezin bûn, lewra hêja bûn. Me fedekarî jî kiriba hêja bû, jiyan jî sererast kiriba, hinekî jî pîvanên xwe di ber çavan re derbas bikira, me xwe kontrol bikira, lê hemû jî hêja bûn. Lê niha ne hêja ye em van bikin, em bi pey çi ketine? Em ji bo çi xwe komî ser hev dikin? Em ji bo çi her demê pîvanên xwe yên exlaqî kontrol dikin! Em ji bo çi kar dikin, ji ber çi em diçin çalakiyê?" Van pirsên neyînî ji xwe dike û bi vî rengî egerên paşxistinê, pasîfbûnê, dev ji xwe berdanê, seknandina têkoşînê, van hemûyan bi xwe re peyda dike. Dibêje: "Berê me şer dikir û me dilê hev dihişt, lê niha çima ez ê dilê hevalên xwe biêşînim? Xetayek kiriye tiştek nabe."

Ev jirêderketineke mezin e. Niha me çima paradîgma guhert? Çima me dev ji dewlet- neteweyê berda? Ji ber ku me fêm kir ku em dema dewlet- neteweyê dixwazin, bi wê re em li dijî xwe kar dikin. Dewlet- netewe durûşme û armanca birjuwazî û kapîtalîstan e. Dewlet- netewe di hundirê civakê de desthilatdarî ye. Dewlet-netewe bi xwe re demokrasî û azadiyê nayne.

Mînakên Rojhilata Navîn, Asya, Efrîqa, Latîn Emerîkayê, vê rastiyê li ber çavan radixin. Bi sedan dewletên netew çêbûne, lê ka demokrasî, wekhevî, azadî, xweşî, pêşketin!? Dema tu ji bo dewleta netew şer dikî, tu wiha fêm dikî ku tu ji bo azadiyê şer dikî. Lê dema tu dibî dewlet, tu azadiyê binpê dikî. Ji ber çi? Jixwe navê wê lê ye, dewlet- netewe armanceke çîna birjuwazî û kapîtalîzmê ye.

## Dewlet-Netewe Tu Carî Hêvî Û Azadiya Gelan Pêk Nayne

Azadî, sînorên azadiyê mirov bi dewletbûnê nikare bisînor bike. Dewletbûn rê li pêşiya azadiyê digire. Ji bo vê dema ku me dît, dewletbûn, dewlet-netewe, hêviyên gel pêk nayne, wê demê me dev jê berda. Rêbertiya me analîz kiriye û lêkolîn li ser kiriye, gihîştiye encam û tespîtan, ev tespîtên kirî jî kes nikare rexne bike. Îro kes nema dikare dewlet-neteweyê biparêze. Tenê kesên paşverû, desthilatdar, dewlemend û maldaran diparêze, heta dawiyê wan

diparêze. Lewra rewşenbîr û însanên hinekî çep û rastê xwe bizanibe, nema dikare dewletê biparêze.

Lê belê li cem me ji ber ku em bi desthilatî û dewletbûnê hatine terbiyekirin, ji bo vê em dewletbûn û azadiyê tiştekî weke hev dibînin. Em dewletbûn û serxwebûnê yek dihesibînin. Lê dewletbûn û serxwebûn ne yek in. Dewletbûn û azadî ne yek in.

Mînak, Macarîstan heye, Moldovya heye, hinek welatên din jî hene niha çi dikin? Dewleta xwe difiroşin. Ji Yekîtiya Ewrûpayê re dibêjin ew qas pereyan bide me, em ê dewletê bifiroşin we. Her tiştê dewletê hûn îdare bikin û tenê hinek pere bidin me.

Mirov dikare li vir behsa azadiyê bike? Di vir de azadî tune ye. Gelek dewlet hene nikarin ji bo xwe biryarê bistînin. Tenê ji bo çi dewlet in, li dijî dijminê derve nikarin kar bikin, li dijî emperyalîzmê hêza wan a ku bersivê bidin tune ye. Emerîka her roj pê li hemû nirxên wan dike, lê hêza wan a bersivê bidin tune ye. Lê dema însanek, gundiyek, karkirek, xwendevanek behsa mafê xwe bike, tenê bi gotin be jî, artêşê bi ser de dibarînin.

Tu têkiliya vê bi azadiyê re tune ye. Lewra em ji bo vê tênakoşin, em ji bo azadiyê têkoşînê dikin. Divê em bigihîjin vê qinaetê, heger rojekê ji rojan me ji bo dewlet-neteweyê hinek fedekarî dikir, niha ji bo demokrasî û azadiya giştî divê hîna bêtir em fedekariyê bikin. Pêwîst e em hîna bêtir taybetmendiyên milîtantiyê pêk bînin. Ne ku em dev jê

berdin û asta tevlîbûna xwe daxînin. Ne ku pîvanan daxînin, biçûk bikin, sist bikin, pasîf bikin, berovajî van jî divê ji hemû rengê jiyana paşverû dûr bikeve. Berovajiyê vê divê milîtantiyê bike. Rêbertî çi dibêje: "Weke derwêşan bijîn."

Derwêş ji bo nirxên civakê dijîn, ji bo xwe najîn. Tûrikê wan li milê wan e û ji gundekî diçin gundekî. Tiştekî wan tune ye. Daxwazên wan ên madî tune ne. Bi temamî tevgereke exlaqî û ruhî esas digirin. Lewra divê em di van mijaran de nêzikbûnên xwe sererast bikin.

## Şîdet Tu Carî Divê Ji Çarçoveya Parastina Rewa Dernekeve

Şîdeta ne di çarçoveya parastina rewa de be, wê demê ew şîdet ne rewa ye. Pesnê şîdetê nayê dayîn, eger me pesnê şîdetê bida ew hevalê ku li Batmanê çalakî kirî, me nedikarî wî lêpirsîn bikin. Berê tiştên xerabtir çêdibûn û me nedikarî bêjin: Çima te wiha kir. Digot: Şer e.

Ji ber ku berê şîdet pîroz bû. Di wê şîdetê de kî bihata kuştin ne girîng bû. Ya girîng ew bû ku şîdet bimeşe. Lê belê îro em bala xwe bidinê em şîdetê mehkûm dikin. Em şîdetê tenê ne hinekî mehkûm dikin, em ji binî ve mehkûm dikin. Em tenê bi awayê taktîkî yan jî stratejîk mehkûm nakin, em mehkûmkirina wê weke prensîbeke bingehîn ya rêxistinê digirin dest.  Çi şîdeta derveyî parastina rewa be, em qebûl nakin.

Lewra kes îro nikare çalakiyên xwe yên şîdetê li ser tevgerê ferz bike. Şîdeta derveyî perspektîfên îdeolojîk em qebûl nakin. Şîdeta derveyî perspektîfên îdeolojîk û polîtîk tê meşandin, em mehkûm dikin û berpirsiyarê wê tê lêpirsînkirin. Ji bo vê em neteweya demokratîk esas digirin.

### Neteweya Demokratîk Çi Ye?

Ew neteweya ku bi nirxên xwe yên netewî xwe mezin dike, bi çand, ziman, erdnîgarî bi her tiştên xwe; av, zevî, çiya, kanî, deşt û zozanên xwe bi her tiştê xwe, di asta eşqê de hezkirin e, heta dawiyê bi wan ve girêdan e. Zêdegaviyên li ser tên kirin, hemû bibin egerên têkoşînê, berxwedanê, şer, parastinê. Zêdegaviyên bên kirin ji bo însanên wî welatî bibin egerên berxwedanê.

Lê li kêleka vê di nav gelê wî welatî de divê ferq û cudatî tune be. Wekhevî, li ser esasê ku her kesek bi nasnameya xwe bijî, lê bi hev re di nava aheng û piştgiriyê de bin. Komên pîşesazî, karker, gundî, xwendevan, jin, mêr, ciwan, zarok, hemû di çarçoveya dengeyeke optîmal de, di çarçoveya ahengeke civakî de, li ser esasê kes zêdegaviyê li ser mafê kesên din neke bi hev re bijîn. Bi rengekî serbest her kes bikaribe xwe îfade bike, bê parastin.

Wê demê neteweya demokratîk pêk tê, hem hezkirina ji welat re, hem jî wekheviya di navbera ferdên ku li ser axa wî welatî dijîn re hebe.

Wê demê neteweya demokratîk di hundirê xwe de bindestî û desthilatdariyê nahewîne û di nav de tune ye. Serdest û bindest di nav de tune ne. Yek şivan e, yek jî pez e, di nav de nîne. Sîstemeke wekheviyê ye. Li ser vî esasî têkiliya bi gelên derdorê re bi bedewî û biratiyê be. Yanî li ser esasê beramberî hev rêzgirtin esas e. Neteweya demokratîk ev e, neteweya ku di hundirê xwe de demokratîk be. Lê demokratîkbûn nayê wê maneyê tewîzdan e!

Gelek kes dibêjin: “Em demokrat in.” Tu dibêjî, em Kurd in, dibêje; “Kurd, Tirk ferq nake”. Tu dibêjî Kurdistan dibêje; “Kurdistan, ne Kurdistan ferq nake.” Tu têkiliya vê bi demokratîkbûnê re nîne. Ev bi temamî otoasîmîlasyon e û xweînkarkirin e. Neteweya demokratîk xwe înkar nake, tam berovajiyê vê nirxên xwe diparêze û zêde jî diparêze. Ji her kesî zêdetir diparêze. Beg, axa, serdest, çîna serdest her demê hazir û amade ne ku welat bifiroşin. Lê kesayeta kedkar welatê xwe nafiroşe. Li beramberî miliyetparêzî, desthilatdarî û şîdetê, em ji bo xwe neteweya demokratîk bingeh digirin.

## Di Nasnameya PKK’ê Ya îdeolojîk de Ne Ferdiyetparêzî; Komunalîzm Û Kolektîvîzm Esas e

Bi her awayî li dijî ferdiyetê sekin heye. Yanî komunalîzm esas e. Civakbûyîn esas e. Ji ber çi ev esas in? Ji ber ku em însan in û însan bi civakbûnê dibin însan. Ji bo vê

têkiliya di navbera ferd û civakê de em her demê di aliyê civakê de herî zêde difikirin. Pêşî civak, tenduristiya civakê, zanistiya civakê, parastin û xwedîkirina civakê, divê ev esas bên girtin. Ferdê baş, ew ferdê ku hunerên xwe bike bin xizmeta pêşveçûna vê civakê ye. Yanî vê pirsê ji xwe neke, dema ez vî karî dikim berjewendiyên min çi ne? Însan dema ev pirs ji xwe kir, dikeve nav refên çîna serdest.

Ferd wê xebatê bike, ne ji bo berjewendiyên xwe, ji bo bilindkirina civakê wê bixebite. Civakek bilind bibe, asta civakê ya xweşiyê bilind bibe û parastin, xwedîkirina wê hebe, tu jî bi wê civakê re mezin dibî û têyî parastin. Ji bo vê ferdiyet bi tu rengî ji rengan nayê qebûlkirin.

Bi çi awayî jî dibe bila bibe dema bandora ferdiyetê derbikeve, divê mirov mehkûm bike. Ew ezmerkez, ezezî, xwe esas girtin, li ser nirxên civakî teserûfkirin, ji jiyana kolektîf dûrketin, ji jiyana komunal dûrketin, yanî nirxên civakî xistina xizmeta xwe; li ser şêwazê xwe israrkirin, li ser a xwe israrkirin, divê ev hemû bên redkirin. Weke çawa tenê berjewendiyên xwe esas girtin, divê ev bên redkirin. Dema mirov ji van têgihîştinan dûr ket, mirov nêzikî xeta PKK'ê dibe.

Lewra di gelek aliyan de divê mirov şiyar be! Mînak, êdî di nava vê rêxistinê de piştî ew qas sal ku em li ser tespîtên nû disekinin û kûr dibin, di esas de têkoşîna me jî li gorî wê dimeşe. Tam dema em van nûbûnan pêşdixin, di vê serdemê de hinek kesên wiha şîroveyên xerab dikin hene,

divê mirov wan nêzikbûnan qet qebûl neke û li hemberî wê têkoşînê bike. Wiha çawa karîkaturîze dikin, lewra dibêjin: “Me nikaribû.” Gotineke din jî heye dibêje: “Devê wî negihîşt, got bila xêra bavê min be.” Ev tiştên ku pê bi rûmeta mirovan tê lîstin in. Rewşeke me ya wiha tune ye. Şer ji bo ku em lewaz bûn me nesekinandiye! Tam berovajiyê wê, di dema ku em bihêz bûn, tenê bihêzbûn na, dema ku hemû endamên PKK’ê ji bo çalakiyan xwe pêşniyar dikirin de me şer sekinand.

Her kesî pêşniyar dikir û rapor dinivîsand digotin: “Em biçin çalakiyên fedayî bikin.” Me wê demê şer sekinand. Yanî ji ber ku em lewaz bûn na, ji ber ku êrîş dihatin bi ser me de me dev ji dewlet-neteweyê berda… tiştekî wiha ne mijara gotinê ye jî. Êrîşên niha li ser me zêdetir in ji yên berê. Deh qat ji yên berê zêdetir in. Berê hinek dewletan çavên xwe li ser xebata me digirt, niha her kes dijmintiyê bi me re dike. Wê demê divê mirov vê mijarê bi vî rengê bêberhem, teng û seranser negire dest.

### Li Dijî Cinsiyetparêziya Civakî Azadkirina Cinsan

Di nasnameya me ya îdeolojîk de li dijî cinsiyetparêziya civakî, azadkirina cinsan heye. Ev jî çi ye, niha em di pêvajoyeke wiha de dijîn: di aliyê zanyarî de, di aliyê pratîk de eşkere bû ku hemû sedemên, bihaneyên ku di rêka wan re sîstema desthilatdariya zilam, jinê ji hemû xebatên siyasî û civakî dûr xistibû, îdeolojiya me ew hincet û nêrîn pûç

kirin. Tiştekî ilmî ye ku tu rastiyên civakî di roja me ya îro de nikarin vê rewa nîşan bikin. Wê demê karekterê çaxa me çi ye? Karekterê çaxa me karekterekî ku di kesayeta wî de hemû hincetan û dûrxistina jinê ji xebatên siyasî û civakî dûrxistin îflas dike, ew qerekterê çaxê ye.

Lê belê sîstema desthilatdar a kapîtalîst, li ser cinsiyetparêziyê israr dike. Xefik û dehfikan datîne. Bi her awayî têkoşîna jinê di derbarê azadiyê de dejenere dike. Azadiya jinê di çarçoveya fizîkî de digire dest. Lewra kapîtalîzm dixwaze jin biçe kargehan kar bike, cilên ew dixwaze li xwe bike, makyaja ew dixwaze li xwe bide, dera ew dixwaze biçê. Azadiyê di vê çarçoveyê de digirin dest. Bi vî rengî di esas de çi dikin? Hewldanên jinê yên azadiyê yên rast dejenere dikin. Provayekê dikin û xefikan datînin pêşberî wê. Ew modela ku weke azadiyê nîşan didin, hem derew e hem jî çewt e!

Lê di heman demê de karekterê tevgera me jî ev e, ew karekter çawa ye?  Di serî de em vê qebûl bikin ku bandora cinsiyetparêziya civakî li ser me serwer e. Ji ber ku em di vê çandê de xwedî bûne û mezin bûne. Vê çandê bi çi rengî xwe wisa dubare kiriye?

Bi salan e nifş li pey nifş, dîn li pey dîn, mîtolojî, felsefe, ev hemû di zemînê desthilatdariya zilam de çêbûne. Yanî berjewendiyên zilam tam esas girtine. Di rexê zilam de li dijî jinê çêbûne ev tişt. Sîstema desthilatdar tim jinê weke çavkaniya xerabiyê nîşan daye. Weke çavkaniya kêmasiyan

nîşan daye, weke bar nîşan daye. Mînak, heta di mîtolojiya kevn ya desthilatdaran de, di pirtûkên dînî Tewrat, Quran… di van hemûyan de jî jin weke amûrekî ye. Ji bo ku ji zilam re pêwîst bûye çêbûye, ne ji bo taybetmendiyên jiyanê û pêdiviyên jiyanê yên esasî ye. Yanî wiha dane diyarkirin ku jin amûrek e. Tevî ku jin çavkaniya jiyanê ye, ev rastî guhertine. Teoriya desthilatdar dibêje, jin ji parsûyê Adem çêbûye. Ev tiştekî derveyî zanyariyê ye, derveyî rastiyê ye. Tewrat vê dibêje, Misilmantî vê dibêje, Xiristiyantî jî vê dibêje. Xiristiyantî dibêje: Zilam bi jinê çêdibe, ne ku jê çêdibe. Yanî jin tenê amûr e û pê çêdibe. Ji bo çêbûna zilam jin heye. Lê di esas de, rastî berovajiyê vê ye. Ne ku jin ji hestiyê zilam çêbûye, zilam di esas de ji jinê çêdibe. Ya rast jî ev e.

Niha li ser wî esasî divê çanda desthilatdariyê di ber çavan re derbas bibe. Ji ber ku wê çandê ji derewekî dest pê kiriye. Yanî yek hatiye û gotiye, ev jin ji hestiyê zilam çêbûye. Lewra di pîleya yekemîn û duyemîn de çêbûye. Lewma jin heyber e. Tim madeyeke cuda ye û tim amûr e.

Yê ku wê weke amûreke anîna zarokan dinirxîne, yê ku weke amûreke cinsî dinirxîne… Ji bo ku jin jî vî tiştî qebûl bike bi salan li ser wê zordestî hatiye meşandin û rojekê ji rojan jinê cesaret nekiriye ku bêje: “Mafê min û yê zilam wekhev e.” Jin bi xwe êdî xwe kêm dibîne.

Yanî gotinên heqaret, timî li ser hatine gotin û ji bo vê jinbûn bûye weke sûcekî. Zilam bi zilamtiya xwe pir

serbilind e, lê jin bi jintiya xwe serbilind nîne, weke sûcekî dibîne. Weke kêmasiyekê dibîne. Divê ev sererast bibe. Li şûna wê edalet çi ye, edaleta civakî çi ye, divê ew esas bên girtin. Ew qas ked, westandin, kar û gelek taybetmendiyên wiha ên civakî yên ku ji nedîtî ve hatine hiştin, pêwîst e bên dîtin. Wiha nêzikî keda jinê dibin, kes bala xwe jî nadê ka jin çi dijî, çiqas diweste, çi karî dike!? Ji ber ku weke obje tê dîtin bala kesî nakişîne. Jin weke esas, cewher nayê dîtin. Kes ne bi êşên wê dihese, ne jî ji keda wê re qîmetek tê dayîn. Divê ev sererast bibin.

Niha di tevgera me de, taybetmendiyên me hene. Di çavkaniya felsefeya azadiyê de du tiştên esasî hene. Yek; ji ber ku em Kurd in çanda xwedavendiyê, çanda dayîkê di esas de li ser vê erdnîgariyê pêş ketiye, mezin bûye. Ji bo vê ji nû ve pêkanîna wê çanda dayîkê, ew erkeke me ye. Duyemîn, ji ber ku em PKK ne bi taybetî jî di şoreşê de tevlîbûna jinê divê em baş bibînin.

Cudatiya di nava PKK'ê de çi bû? Heta roja me ya îro jî mirovê herî zêde sosyalîst û pêşketî jî, demokrat jî, jin kêm didît. Rast e dibêje: "Jin baş e, hêja ye, mirov qedir û qîmet bidiyê, lê di encamê de ne weke zilam e, kêm e." Nêzikbûneke tenê di warê xwedîderketinê de ye. Bi vî rengî nêzikî jinê dibin.

Lê belê di nav PKK'ê de tiştekî din derket. Di nav PKK'ê de eşkere bû ku ne tenê di aliyê mêjî de jin û mêr weke hev in, di karên fizîkî de jî dikarin weke hev bin. Jin di nava

PKK'ê de gerîla bû, di nava komunê de cih digirt. Fermandarî dikir, kete cepha êrîşê, çekên giran rakir, tevlî meşê dirêj bû û ev hemû jî bê kêmasî kir. Nêzikbûnên cinsiyetparêziya civakî carna dibûn sedema ku em kêmasiyên jinê bibînin û yên zilam nebînin. Lê di esas de dema mirov bide ber hev kêmasiyên zilam ji yên jinê zêdetir bûn. Bi taybet jî di nava şoreşê de.

Vê bi xwe re çi kir? Di aliyê fizîkî de jî wekheviya jin û mêr derxist pêş. Ji bo vê di nava PKK'ê de bi taybetî tu bihaneyên em bi çavekî cuda li jinê binêrin nemaye. Dema em vê dibêjin, em weke rêxistin vê dibêjin. Yanî mafê jinê jî tune ye ku bi çavên kêm li jinê binêre.

Ji ber ku cinsiyetparêziya civakî tenê nexweşiya mêr nîne, ya jinê ye jî. Jin jî li hemberî xwe bêbawer e. Ew jî cinsiyetparêziya civakî ye. Ji ber ku di bin bandora çanda desthilatdar de maye, ji bo vê jî li cinsê xwe xwedî dernakeve û cinsê xwe naparêze. Ji xwe bêbawer e, ev jî cinsiyetparêziya civakî ye.

Lewra ev pirsgirêk divê bên çareserkirin. Yanî wiha nêzikbûnên biçûkdîtin divê gav bi gav bi rengekî bingehîn bi bawerî û perwerdê bên derbaskirin. Li şûna wê têkiliyên jin û mêr li ser esasên nû bên danîn. Li ser esasê wekheviyê, rêzgirtina beramberî hev esas be, divê tu carî li ser esasê teqlîdkirinê nebe.

Azadbûna jinê nayê wê maneyê ku wê jin weke zilaman bibin. Yanî nayê wê manê jî ku ew tiştên heta roja îro mêr

dikir, wê êdî jin bike. Em bala xwe bidinê, çanda dayîkbûnê, nayê wateya serweriya jinê! Çanda dayîkbûnê cuda ye, serweriya jinê cuda ye. Çanda dayîkbûnê tîştekî civakî ye. Lê dema tu behsa jerontokrasiyê bikî, serweriya jinê bikî, wê demê tu teqlîda zilam dikî. Ev ne azadî ye û tu têkiliya wê bi azadiyê re tune ye, bi temamî nêzikbûneke desthilatdariyê ye!

Lewma jin xwe nas bike, ji xwe hez bike, bi taybetmendiyên xwe yên jintiyê serbilind be û di çarçoveya rewşa xwe de siyaseta xwe diyar bike, gelekî girîng e. Rêxistina xwe çêbike, îdeolojiya xwe peyda bike, rengê parastina xwe diyar bike. Zilam nikare van diyar bike. Bi şopandina liv û tevgera zilam jin nikare tiştekî pêk bîne, herî zêde jin dibe weke zilam.

Mînak, jinên ku leşkerê Îsraîlê ne hene, niha li xwe mukur hatine, hinek tiştên pir balkêş tînin ziman. Li Îsraîlê jin û mêr diçin leşkeriyê. Heta demekî jin jî esker e piştî wê ger jin bixwaze berdewam bike dikare, lê ger nexwaze berdewam nake. Niha ev demeke hinek li xwe mukurhatinên wan derdikevin çapemeniyê. Tê de dibêjin: “Ya rastî me her kar kir, her kar bi me didan kirin. Lê piştre me dît ku em ji jintiya xwe dûr dikevin, em êdî weke jinan namînin, em dibin weke zilaman.” Jin dema tevlî wan karan dibe, wiha difikire ku ew bi wî rengî azad dibe, lê di esas de azad nabe, tenê dibe weke zilam. Ev rê ne rêya azadiyê ye.

Yanî bi teqlîda zilam, bi kevneşopiyan re jiyîn, bi desthilatdariya di zemînê jinê de pêş bikeve, jin azad nabe. Azadî ji nû ve li ser esasekî zanistî jiyîn e, çanda dayîkê ye. Yanî jin bi huner, zanistiya xwe bibe navenda çalakiyên civakî. Jin bibe pîvan. Jin bigihêje wê astê ku zilam lê temaşe bike û li gorî wê hinek rêkûpêkbûnê bide xwe, pê pîvanên xwe diyar bike.

Di nêvengekê de dema jin hebin divê di wir de rêzkarî hebe. Di wê nêvengê de her kes rêkûpêkiyekê bide ramanên xwe û birêz be. Bi hesab gavan bavêje. Dema ku ew tişt tune bin, wê demê ew jin cewherê xwe temsîl nake. Di vê çarçoveyê de divê em vê wek mijareke ne girîng nebînin. Yek dibêje: “Min hîna xwe îqna nekiriye.” Yek dibêje: “Ez hîna bawer nebûme.” Yek dibêje: “Ez hîna nizanim bûme çi!” Ev hemû jî tiştên çewt in. Ev mijareke îdeolojîk e, ne mijareke taktîkî ye.

Tu çawa PKK’yî yî û ji vê mijarê ne bawer î! Çawa tu têkoşerê azadiyê yî û tu hîna ji vê mijarê bêbawer î, tu yê xwe kîngê îqna bikî!? Piştî ew qas têkoşîn û perspektîf û ew qas ked... Ji bo vê jî di van xalan de mirov xwe bê tewîz kûr bike.

## 6- GIRÊDANA EKOLOJIYÊ BI ÎDEOLOJIYÊ RE

Xaleke din jî mijara girêdana îdeolojiyê bi ekolojiyê re ye. Ev jî mijareke bingehîn e. Ji ber ku pêşketina kapîtalîzmê ya madî, bi pîvanên exlaqî ve negirêdayî ye. Yanî bi pêşketina madî û teknîkî ve parelel, pê re ketineke mezin di aliyê exlaqî de çêdibe. Ji bo vê jî berdewamkirina sîstema kapîtalîst weke çawa ziyan daye civakê, weke çawa ziyan daye gelên bindest; di heman demê de ziyan daye tevahiya xwezayê jî. Ev çi ye, taybetmendiyên kapîtalîzmê yên li ser esasên kar û qezencê ne. Qezenc bike di oxira vê qezencê de çi xerab dibe bila bibe. Nêzikbûna kapîtalîzmê ya ezez û ferdî ev e.

Niha pîşesazî dikare çêbibe, endustrî dikare çêbibe. Ekonomî dikare pêş bikeve, kes li dijî wê nîne, lê divê eko-sanayî be. Yanî sanayî û ekonomiyeke bi hawirdorê ve girêdayî be, ne li ser hesabê xerabkirin û talankirina wê be. Pêwîst e berhem û ekonomî li ser esasê eko-sanayiyê be.

Eko-sanayî çi ye? Eko-sanayî ew sanayiya ku ew qas berheman derdixe, pê re jî ziyana dide hawirdor telafî dike.

Çi dike, mînak ji bo gazên jehrî dernekevin tevdîran digire. Sanayiyên ku zêde ziyanê didin hawirdorê esas nagire. Beşên yan jî sektorên ku gelek cinsên lawiran ji holê radikin, daran ji holê radikin esas nagire. Ev ahengên xwezayê ji bo berjewendiyên xwe xerab nake. Dema van neke, xerabûnê esas digire.

## Tevgerên Hawirdorparêz

Tevgerên hawirdorparêz ne yek tenê ne, gelek in. Tevgerên hawirdorparêz ên cuda cuda hene. Yanî ekolojîparêzên cuda cuda hene. Dema berê hîna kes bi ziyana li ser xwezayê pêk tê nehesiyabûn. Dema pê hesiyan û şûnda, lewra di hinek welatan de asta bîr û zanistê li gel însan kûr dibû û pê dihesiyan. Ji ber vê nerazîbûnên xwe nîşan didan. Nerazîbûnên xwe çawa nîşan didan? Li ser rêkan çalakiyên bi awayê xwe nîşan bidin, nîşan didan. Li cihekî din dirûşme davêtin û li cihekî pankart vedikirin. Bi vî rengî nerazîbûnên xwe nîşan didan.

Pişt re ew tevger gav bi gav mezin bûn û di Ewrûpayê de bûn desthilatdar jî. Mînak, li Almanyayê Partiya Kesk heye, bi vî rengî ew partî derketin. Lê ev partî weke ku çawa îdîa dikin ji bo parastina hawirdorê naxebitin. Ji ber çi wiha bûn? Ji ber ku derdikevin dika desthilatdariyê, hem di desthilatdariyê de cih digirin, hem jî ekolojîk in! Ev xapandinek e, tu çawa di desthilatdariyê de yî, di dewletê de yî, tu jî hevparê wan biryaran î, di heman demê de tu îdîa dikî ku tu ekolojiyê diparêzî!? Ev nêzikbûneke zêde rast jî nîne. Di serî de ne ji xwe ve bi dirûşmên parastina xwezayê derketin. Di van aliyan de gelek nerînên wan hene. Ji wan nerînan nerînek heye ji wan re dibêjin ekolojîstên kûr.

## Ekolojîstên Kûr Çawa Tevdigerin?

Ev nêrîn her tiştî weke zindî dibîne. Li gorî wê tevgerê bi têgihîştineke piralî ango komple, hesasiyetekê pêş dixin, dibêjin: "Divê wiha nêzikî filan tiştî nebin, nêzikî bêvan tiştî nebin." Bi awayekî gelemperî tevdigerin. Lê berpirsiyarên bigehîn ên ku ekolojiyê xerab dikin, di nav giştîkirina wan de tê wendakirin. Di vir de kî berpirsiyarê vê xerabiya li ser xwezayê ye, nayê diyarkirin. Bi vî rengî weke ku hemû însan dijminê xwezayê ne diyar dibin. Li ser wî esasî nêzikbûneke komple heye, di wir de jixwe berpirsiyarê rastîn tên wendakirin. Lewra jî ev nerîneke jirêderketî ye û çewt e.

Ji ber ku mijara ekolojiyê di van demên dawiyê de bala însanan dikişîne, bizavên wiha derdikevin. Lê di bingeh de bi vî rengî hedef şaş dikin. Heta bi vî rengî xizmeta desthilatdariyê dikin.

## Ekolojîstên Femînîst

Ekolojîstên femînîst jî bizaveke girêdayî jinê ye. Ev dibêjin: "Yên di bingeh de xweza xerab kiriye zilam e." Her tiştî bi liv û tevgera zilam ve digirin dest. Yanî sûcdar zilam e. Ew zilam feqîr dibe û dewlemend dibe, zilam bi gelemperî digirin dest. Ew jî nêzikbûnek e, lê bisînor e û çewt e. Lê di bingeh de xeta ekolojîk a ku em esas digirin ekolojiya civakî ye.

## Ekolojiya Civakî

Ekolojiya civakî çi ye? Ekolojiya civakî ew xeta ku dibêjin: "Sedemên xerabûna xwezayê serdestî ye, desthilatdarî ye û di serdema me ya îro de jî kapîtalîzm e." Yanî dijminê xwezayê diyar dike û şênber dike. Li ser vî esasî heke parastinek hebe, divê li hemberî desthilatdariyê û mijokdariyê, kedxwariyê û li hemberî kapîtalîzmê bê kirin.

Însan bi xwe dijminê xwezayê nîne. Dema ku însan dibe dijminê însan, wê demê dibe dijminê xwezayê jî. Însan dema dibe serdest û bindest wê çaxê xwezayê jî xerab dike. Ji ber ku her tişt bi mantiqê şîdetê û înkarkirinê û talanê dimeşîne. Ji ber van nêzikbûnan xweza xerab dibe.

Lewra ji bo me ev çi ye? Niha gelek kes dikarin bifikirin, têkoşîna ekolojîk, ekolojiya civakî, li gorî me tiştekî luks e. Em çima dixin rojeva xwe û li ser nîqaş dikin? Di van derbaran de nêrîn hene.

Bêxemiya li hemberî ekolojiyê, bêhêvitiya li hemberî jiyanê ye. Jiyan di ku de çêdibe di navengekî de çêdibe. Heger îro jiyana li ser rûyê erdê heye, sedema wê navenga vê jiyanê heye. Navenga wê çi ye? Tav e, hewa ye, lawir in, kêzik in, dar in, av e hwd. Her tiştek ji van rolek wê heye. Dema ev hebin jiyan çêdibe. Dema ev tune bin, çavkaniya jiyanê namîne. Ji ber ku ev rengên gelemperî ne.

Em hinekî din jî bînin ber çav û şênber bikin. Niha însanek dema bêsînor xwezayê xerab dike, dişewitîne, dibire, xerab dike, ew kes bi paşeroja xwe nafikire. Tenê li roja xwe ya ku tê de ye difikire. Yanî perspektîfên wî yên pêşerojê tune ye. Ji bo pêşerojê hesabên wî tune ne. Li hemberî pêşerojê bêhêvî ye, lewra komkujiya daristanan dike hwd. Lê mirovê perspektîfên wî yên pêşerojê hebin, wê bêje ez ê îro karekî bikim, ê din bila siba karekî din bike, nifş li pey nifş wiha şiyar dibin. Beramberî ekolojiyê şiyar dibin. Lewra ev prensîbeke jiyanê ye. Yanî luks nîne, taybetmendiyeke jiyana mirov e û însan bi wê temam dibe.

Bê wê mirovheziyê însan dikeve nîqaşê. Hîna zêdetir bi awayekî şênber weke Kurd di mijara ekolojiyê de erkên me yên cidî hene. Destwerdana li ser erdnîgariya Kurdistanê tê kirin, rê li pêşiya trajediyên mezin vedikin. Mînak, bendav tên çêkirin. Bendav ji bo çi tên çêkirin? Biryara Kurdan di çêkirina bendavê de tune ye, dewlet çêdike.

Bendav sektorek e, lê av amûrê jiyanê yê sereke ye. Avê dixin bin kontrola dewletê. Dikin bin serweriya dewletê. Ev ava ku milkê her kesî ye, her kes jê feydê dibîne, dikeve bin kontrola dewletê, wê demê dewlet yên dixwaze dide wan, yên naxwaze nade wan. Mînak li Bîrecîkê, Bendava Ataturk çêkirin. Bi navê Projeya GAP'ê. Wê bandoreke mezin li ekolojiyê kir. Ji ber çi, ji ber ku ev ahengeke xwezayî ye: av dema diherike, li gorî xwe têra xwe diherike. Damarên avê hene û ambarên avê yên bin erdê jî tijî dike. Her sal av bi xwe wan ambaran tijî dike. Lewra mirov li her derê dikare

feydê ji wê avê bibîne. Lê dema bendav datînî pêşberî wê, tu wan damaran qut dikî. Herwiha gelek cih dibin çol. Mînak, çoltareke weke ya Heranê, ku berê dikarî ew qas însan xwedî bike. Bi pembûyê xwe, bi zadê xwe û her tiştê xwe ve. Lê mixabin îro dibe çol.

Gel ji wir bar dikin. Dewlet hem damarê ava xwezayî qut kiriye û hem jî qenala ku çêkiriye jê avê nade wî gelî. Ji ber ku Kurdayetî û welatparêzî li wir heye. Ji ber vê dide derên ji wan dûrtir, lê nade wan. Ji ber çalakiyên wan yê siyasî wan ceza dike. Bio-îqtîdar, bi birçîkirinê anîna rêzê ev e.

Ji milekî din ve jî dîroka vî welatî di bin avê de dihêle. Tiştên têkûz ên dîrokê, peyker… di bin avê de dihêle. Mebesta dewletê ji vê jî hesabên wê yên stratejîk in. Çiqasî golên mezin çêbike, ewqasî têkiliya di navbera eyaletan, di navbera erdnîgariyan de qut bûnê pêk tîne. Bi vî rengî tevgera gêrîla asteng dike. Dixwaze di rêka van bendavan re rêka van av û golan re çi bike? Dixwaze bi vî derfetê mafê jiyanê ji destê Kurdan derbixîne.

Lewra têkoşîna ekolojîk li gel me mijareke sereke ye. Bi şiyariyeke mezin divê em nêzik bibin. Ji ber ku dijmin dixwaze Kurdistanê û erdnîgariya Kurdistanê bi temamî di çarçoveya berjewendiyên xwe de birêxistin bike. Gel çi dixwaze na, lê ew çi dixwaze wê dike. Mînak gelê Dêrsimê nexwest bendav li ser Çemê Mûnzûrê çêbibe, herwiha naxwazin li ser Çemê Dîcle û Firatê jî bendav çêbibin. Lê dewletê çêkir? Bi vî rengî hem Kurdistanê xerab dike,

Kurdistan weke erdnîgariyeke ku gelê wê li ser bijî na, lê tenê ji bo dewlet jê feydê bibîne van bendavan çê dike.

Ev asta herî bilind a dagirkeriyê ye, li beramberî vê rewşê bêdeng mayîn, tewîz dayîna dijmin e. Ji bo vê qada ekolojîk weke qadeke luks yanî vala ye, wer hewce nîne, bê hizirandin şaş e. Tam berovajiyê vê, qadeke divê mirov zêde baldariyê bidiyê û zêde jî li ser bisekine.

Di vê çarçoveyê de bi rêka ekolojî, demokrasî û azadiya cinsan mirov dikare nasnameya îdeolojîk a tevgera PKK'ê nîşan bide. Ferq û cudatiya di navbera dewlet û rêxistinên din de ev mijar diyar dikin.

Baş e, wê bi çi awayî bigihînin gel? Me gotibû metod, metodê xebata îdeolojîk çi ne? Li gel me sê metodên sereke hene ew çi ne?

Yek zanistî, lêgerîn, lêkolîn, xuliqkarî, di aliyê zanyariyê de, di aliyê peydakirina perspektîfên xebatê de ye. Duyemîn, metodên ragihandinê, ragihandin. Sêyemîn metodê çand û hunerê ye. Lewra em ê ji ya yekê dest pê bikin:

## 7- AVAKIRINA CIVAKA EXLAQÎ Û POLÎTÎK

Avakirina civaka exlaqî û polîtîk, di pratîkeke birêxistinî û zanistî re derbas dibe. Bi bîr û baweriyê pêk tê. Zanistîbûn çi ye? Zanistîbûn akademî ne, lêkolîn in û şîrovekirin in. Di van aliyan de, Rêbertiya me di aliyê fikir de, di asta volqanekê de pêşketin çêkir. Bi taybetî ev deh, yanzdeh salên dawiyê, parêznameyên Rêbertiyê di asta hilhatineke nû de ne. Ev rêze parêzname heta asta dawî şîrovekirineke kûr ji civakê re ye, danîna rêkên çareseriyê ye. Li ser van parêznameyan gelek tişt dikarin bên şîrovekirin. Lewra Rêbertiyê li ser zanistperestî, miliyetparêzî, dîngerî, Îslama siyasî, dîroka Kurdistanê û pirsgirêkên Rojhilata Navîn gelek nirxandin û proje pêş xistin. Li ser van hemûyan beş bi beş mirov dikare hem metodên perwerdê peyda bike, hem jî ji gel re bike nirxên jêneger.

Di nav pratîka têkoşîna me de gelek kesayetên ku karibin rêveberiya xebatê bikin her demê hebûne. Bê asteng kadroyên ku karibin xebatê bikin hene. Ew kadro yên em behsa wan dikin, di dibistanên dijmin de mezin nabin, di heman demê de di saziya malbatê de jî mezin nabin. Ew kadro ancax di zemînê akademiyan de perwerdeyeke bi bîr û baweriya girêdayî zanistê de mezin dibin. Di van aliyan de qadeke me ya îdeolojîk heye. Ev qada îdeolojîk çi ye û çi di nav de ye?

Di vê qadê de; komîteya zanist û ronakbîriyê, komîteya ragihandinê û komîteya çand û hunerê heye. Di vê qadê de sîstemên demokratîk jî cih digirin PKK û PAJK jî di nav de ne. Ev qadeke îdeolojîk e. Di milê zanistê de di esas de, komîteya zanist û ronakbîrî cih digire, beşên bi vê komîteyê ve girêdayî di aliyê herêmê de, Başûrê Kurdistanê, Bakûrê Kurdistanê, Rojavayê Kurdistanê û Rojhilatê Kurdistanê wê xwe birêxistin bikin. Erk û peywira van komîteyan çi ye? Di esas de li ser xalên bingehîn ên têkoşînê têkildar dike û lêkolînê pêş dixîne. Di heman demê de bi berhemên nû û derxistina perspektîfan ve mijûl e. Divê pirsgirêkên şîrovê tenê di Kurdistanê de nemîne, lewra pêwîst e Îslama nerm bê nasîn. Desthilatdarî tê çi wateyê divê her kes bizane. Rêkên çareseriyê çi ne divê her kes baş bizane. Lewma divê bi zimanekî bê fêmkirin bê dayîn.  Bi şîroveyên ku li ser esasê rastiyê bin, îqna tê de hebe, şênber bin û razber nebin, rasteqînî bin. Bi rastiya şênber ve girêdayî bin, hêvî û daxwaziya gel esas bigirin. Şîroveyên bi vî rengî girîng in. Wê ew şîrove bihêlin ku pirsgirêkên zanistê di civakê û di nava kadro de gav bi gav ji holê rabin.

Lê gelo em vî karî pêk tînin? Yanî erkên rewşenbîrî, yên îdeolojîk di çarçoveya avakirina civaka exlaqî û polîtîk de pêk tên? Lê divê mirov wiha bi awayekî înkarger jî nêzik nebe, ji ber ku heta astekê ked û xebatek jî heye. Berhem jî hene, lê ev berhem têrê nakin. Ji ber çi têrê nakin? Ji ber ku em lê temaşe dikin hîna jî çalakiyên tevgera me yên siyasî li Bakûrê Kurdistanê, me hîna jî nekişandiye zemînê azadiyê! Em temaşe dikin hîna jî çalakiyên tên kirin û tevgera me ya

siyasî weke tên xwestin nehatine rûniştandin. Lê belê kesên van çalakiyan dikin ji ber ku xerab in, na! Tiştekî wiha nîne, kesên van çalakiyan dikin piranî dilsoz in. Lê dibe ku di nav de mirovên xerab jî hebin. Sedemên van hemû jî ji ber ku zanistîbûn lewaz e.

Ev pirsgirêk di esas de bi akademiyan çareser dibe. Di mijara avakirina akademiyan de jî pir giran tevgerîn dihat kirin, dema hate pêkanîn jî wiha pêkhatineke formalîte bû. Ji ber ku Rêbertiyê rexne kir û rêxistinê jî giranî dayê hatin avakirin, lewra akademî hatin vekirin. Lê armancê ji wan akademiyan weke tê xwestin tam pêk nehat. Lewra divê ev pirsgirêk bên çareserkirin. Pêwîst e bi lez em van pirsgirêkan di qada xwe ya çalakiyê de derbas bikin.

Di vî warî de rast e destpêkirinek çêbû, hinek gav hatin avêtin, dibe ku kêmasiyên wê jî hebe. Lê bê ku dem wenda bibe divê ev kêmasiyên di vê qadê de hene bên telafîkirin. Ji ber ku ev di aliyê metodê têkoşîna me ya îdeolojîk de tiştekî pir girîng e. Girêdayî vê wêjeya şoreşê ya girêdayî civaka nû, pêwîst e li ser bê rawestîn.

Xala duyemîn; rexê wê yê çandê ye. Niha çand temsîla ruhê netewekî dike û ruhê wê ye. Neteweyek bê çanda xwe nikare bijî. Dema dev ji çanda xwe berda, wê demê ji netewbûnê derdikeve, dibe tiştekî din.

Ev çand xweser e, netewî ye, bêguman tiştê hevpar ên însanî hene, gerdûnî hene, lê di çanda netewî de divê mirov tewîzan nede. Di bin navê modernîteyê de, di bin navê

modernbûy, nûbûyînê de mirov dev ji çanda xwe ya netewî berde, wê demê ziyaneke mezin dide xwe. Globalîzma rast li ser esasên parastina çanda netewî çêdibe. Li ser esasên parastina çandên netewî çêdibe.

Wendakirina her çandekê qat bi qat ji ziyana ew bombeya nuklêr a ku li Hiroşîma û Nagazakiyê teqiya, zêdetir e. Di encamê de ew jî ji bo tunekirina netewekî ye. Lê dema çanda mirov wenda bû, tu şûnpêyên mirov jî namînin. Ji bo vê divê çanda netewî bê bihêzkirin. Lê belê em lê temaşe dikin di xebata me ya çandê de heta roja me ya îro jî çalakiyên ber bi populîstbûnê ve hene, hîna jî ji vê têgihîştinê xelas nebûne. Çalakiyên ku çanda netewî esas nagire û bazara giştî esas digirin hene. Ya ku nahêle çanda me pêşkeve ev bi xwe ye.

Ya duyemîn; di xebata me ya çandê de standartên demokratîk zêdetir, standartên modernîst esas tên girtin. Yanî şano, stran, fîlm hwd, lê modernîteya demokratîk çi dibêje? Rengê modernîteya demokratîk, şêwazê jiyana wê, ji xerckirinê dûr, ji dirûvbûnê dûr, wiha xwerû, xwedî peyam, ji van zêdetir bi giranî li ser teqlîtkirina modernîteya kapîtalîst disekine.

Weke standartekê ji bo xwe esas digire. Lê ya rastî ew ne standarteke însanî ye, ew ya birjuwaziyê biçûk e. Dema tu teqlîd dikî tu, tu carê bi ser nakevî. Her yek divê di zemînê xwe de serkeftî be. Ev nêzikbûn modernîteya kapîtalîst diyar dike. Lê tu yê jî modernîta demokratîk diyar bikî. Ne

şert e tu weke wan bî. Lê yên me jî dikevin nav xetayeke wiha û dibêjin; na divê em weke giştî bin, yanî weke sîstemê bin. Divê em di her tiştekî de weke wan bin. Ji ber ku weke pîvan ew ji bo xwe esas girtine. Li gorî tê xwestin hîna jî taybetmendiyên moderniteya demokratîk negirtine. Lewra herî zêde teqlîdkirin li pêş e.

Cardin pirsgirêk di ku de ye? Dibêjin: “Divê çand ji rêvebirina îdeolojîk dûr be. Çand û huner divê ne alîgir bin.” Ev jî jirêderketineke mezin e. Ji ber ku dema di welatekî de dijmin hebe, dagirker hebin, însan nikare bêalî be. Însan nikare bêeleqe be, divê alî hebe, divê partî hebe. Yan wê li gel dijmin cih bigire, yan jî li cem gel cih bigire. Bêalî qet nabe, lewra beriya her tiştî huner û çand îdeolojîk in. Li ser vî esasî dema ku huner û çand hebe, wê demê çanda netewî dijî, di heman demê de çi dike, gel teşwîqî serhildanê dike.

Wê çaxê çand û huner xwedî nirx in. Tevgera çand û hunerê niha di nava têkoşîneke dijwar de ye. Ji ber ku di bin êrîşên îdeolojîk de ye. Gelek kes dixwazin vê tevgerê ji perspektîfên wê yên azadiyê dûr bixin. Ji civakbûnê dûr bixin, ji komunalîzmê dûr bixin. Ji bo vê em lê temaşe dikin hemû rengê ezezî, ferdiyetparêzî, madiyetgerî, teqlîtgerî di wir de serwer e.

Ya rastî divê mirov xwe li hemberî moderniteya kapîtalîst bigire. Rêbertî çi dibêje: “Erka me ew e ku bi temamî em xwe li hemberî moderniteya kapîtalîst bigirin, tiştê girêdayî moderniteya kapîtalîst di hundirê me de be jî,

em vereşin. Dev jê berde em teqlîd bikin, tiştê di hundirê me de be jî em vereşin. Xwe bi vî rengî jê xelas bikin. Ji bo vê divê rastiya sîstema konfederal û demokrat bê naskirin. Ev sîstem ne sîstemeke dewletger e, ne jî sîstemeke kapîtalîst e. Ev sîstem nakokiyên wê bi kapîtalîzmê re di şêwazê jiyanê de ne, ne tenê di siyasetê de ne. Dema ku em li dijî kapîtalîzmê têkoşînê bikin, lê şêwazê jiyana me ya wê be; wê demê têkoşîna me zêde bi bawerî nabe. Ev tê vê wateyê ku em şewazê jiyanê, ferdiyetê, keyfiyetê, bê rêzkariyê, ji cewherê xwe dûr, di dirûvekî wiha de be ku dirûvê mirovan ê esasî nade teqlîd dikin. Lê tevî van kêmasiyan îdîa me hebe ku em li dijî kapîtalîzmê ji aliyê siyasî ve têkoşînê dikin, ew nêzikbûn wê têkoşîna me pêbawer neke. Yanî zêde kesên bawer nekin. Ya din jî ew têkoşîn serkeftinê bi xwe re nayne. Ji ber ku heman taybetmendiyên kapîtalîzmê digire nava xwe.

## Di Avakirina Civaka Exlaqî Û Polîtîk De Rola Çand Û Hunerê

Ji bo vê têkoşîna çandî tune ye, di çarçoveya stranek, şanoyek û derketina ser sahneyekê de divê mirov negire dest. Têkoşîna çandê peydakirina ruh e. Ew ruhê ku xwe li beramberî modernîteya kapîtalîst girtiye. Ew ruhê ku xwe li beramberî dagirkeriyê girtiye, ruhê têkoşînê ye. Ruhê taybetmendiyên netewî dana jiyîn e. Ruhê teşwîqkirina berxwedanê û bilindkirina wê ye. Ruhê ku bi bindestiyê re

jiyanê heram dike ye. Dev jê berde keyfiyetê bike, jiyana bi bindestiyê re heram dibîne. Ji bo vê jî ev cepheya çand û hunerê di aliyê avakirina civaka exlaqî û polîtîk de roleke xwe ya mezin heye. Divê wê rolê bigire ser milê xwe. Di wan aliyan de divê ji rê derketinê, sorkirinên heyî sererast bike û li dijî van ferzkirinan jî têkoşîneke cidî bide meşandin.

Bêalîbûn nabe. Dema dijmin, dagirkerî, îmha û tunekirin hebe, dema Rêbertiya mirov di zindanê de be, dema ku her roj operasyonên tunekirinê li dijî milîtanên gelê me bên meşandin, em nikarin bêalî bin. Em nikarin ji xeta siyasî û îdeolojîk dûr bin.

Çand ji bo çandê nabe, huner ji bo hunerê nabe. Çand û huner ji bo çareserkirina pirsgirêk û krîzên civakî çêdibin. Ji bo sekna li hemberî dagirkeran çêdibe, ji bo jiyîna civakê çêdibe. Çand û huner divê nirxên civakî yên ku divê bên ecibandin li civakê şêrîn bike. Yên ku mirov divê jê dûr bikeve di şanoyê de teşhîr bike. Di wêjeyê de teşhîr bike. Di stran, fîlman de teşhîr bike. Nirxên xerab û kevneşopiyên xerab teşhîr bike, yên baş, bi mane bilind bike. Bihêle bi uslûb û hunera xwe, bihêle ku mirov biecibîne. Divê wan erkên civakê bigire ser milê xwe.

Napolyon çi digot, digot: “Şanoyekê bidin min, ez ê neteweyekê bidim we.” Bi vî rengî Napolyon çi dikir, rola şanoyê di çêkirina netewê de nîşan dida. Ji ber çi, ji ber ku şano di Şoreşa Fransayê de roleke mezin dileyîst. Tekstên

şanoyê yên ku li ser sahneyê dihatin pêşkêşkirin, bi temamî li ser esasê teşhîrkirina monarşiyê bûn. Bi temamî li ser teşhîrkirina qraltiyê, axatiyê û dejenerebûna ku di wir de dihate jiyîn bû. Dizî û talana ku li wir dihate jiyîn nîşan didan, şano li ser wî esasî bû. Ev ji aliyê hunermendan ve li ser dikê dihate pêşkêşkirin. Bi sedan însanan lê temaşe dikir. Nerînek bi wan re çêdibû, ruhek li cem wan çêdibû. Dema derdiketin hemberî desthilatdariyê nerazîbûnên xwe bi awayekî zelal nîşan didan.

Şano çi kir, şano nexweşî, xerabî, dejenerebûna sîstemê eşkere kir. Tiştekî xweş nîşanî gel dikirin. Bi vî rengî gel li hemberî sîstemê nerazî bûn, vê jî alîkariyeke mezin di Şoreşa Fransayê de li dijî feodaltiyê û qraliyetê çêkir.

Lewra berhemên me yên hunerî yên çandî divê xizmetê ji rêxistinkirina gel re çêbikin. Di bihêzkirina ruhê kolektîf, di exlaqê civakî de, di berxwedanê de, di sekna li hemberî dagirkerî û teşhîrkirina sîstema dagirkeriyê de, teşhîrkirina siyaseta înkar û tunekirinê, paşverûtiyê, tecawiza li hemberî jinê, teşhîrkirina hemû zêdegaviyên ku li ser Kurdan tê meşandin, bide nîşandan. Divê hunera me vê ji bo xwe esas bigire. Eger vê neke, wê demê zêde nirxekî wê namîne.

## Di Roja Me Ya Îro De Ragihandin Cîhanê Beralî Dike

Li gel vê cephê ragihandin heye. Ragihandin, agahiyên rast e. Niha sîstema desthilatdar cîhanê bi rêka ragihandinê dimeşîne. Yanî ragihandina serbixwe nîne. Ragihandin hemû bi hêzên desthilatdar ve girêdayî ne. Ajans, yan jî ne ajans be, komên medya di cîhanê de hene. Çend kom in, ew kom çavkaniya agahiyan li hemû derê cîhanê ne. Ev agahiyên em digirin hemû di bin destê wan koman re derbas dibin. Bi şîroveyên wan, ew di esas de çi nîşan didin, ziraviyên însanan nîşan didin. Yanî ew bi xwe vê ferz dikin. Mînak nûçeya zêde têkiliya te pê re tune be, wê nûçeyê wiha nîşan didin heçko bi te re têkildar e. Wisa li mirov dike ku mirov dev ji êşên xwe yên esasî berde û bi wan nûçeyan re mijûl bibe. Bi vî rengî di çarçoveya berjewendiyên xwe de hemû cîhanê beralî dike. Ev xebateke bi zanebûn derdikeve pêş.

Ji bo vê pêdiviya me bi awayekî cidî bi ragihandina alternatîf heye. Ragihandina alternatîf taybetmendiyên xwe yên milîtantiyê hene. Ragihandina alternatîf ne weke ragihandina heyî ye, berovajiyê wê ye.

Di wir de hinek şaştiyên me hene, mînak em dibêjin di ragihandinê de divê em standartan esas bigirin. Mînak BBC çawa ragihandinê dike, Show çawa ragihandinê dike, TIMES çawa ragihandinê dike hwd. Huriyet çawa ragihandinê dike, Milliyet çawa ragihandinê dike, em vê esas digirin. Heke em weke wan bikin, divê ji bo vê çapxana me jî hebe, divê

amûrên me yên nû hebin, li gorî vê divê kamerayên me yên bireng hebin… Bi van re em mijûl dibin. Ji me ye ger em van tiştên madî bidest bixin em ê karibin bibin alternatîf! Alternatîfbûyîn bi madiyatê qet nabe. Alternatîfbûyîn bi peydakirina amûrên madî û teknîkî re çênabe. Rast e ew jî pêwîst e, lê ne di wê asta ku îro hevalên me girîngiyê didinê de ye.

Ragihandin beriya her tiştî divê pêla gelemperî esas negire, xwe ji wê dûr bixe. Rastiya gel çi ye, êşên gel çi ne, pêkanînên li ser gel tên kirin çi ne, van rewşan ji hev cuda bike, li gorî girîngiya wan di ragihandinê de rê bide wan. Bi rojname, tv û radyoyê mirov karibe bi uslûbê herî jêhatî bigihîje her kesî. Xwendevanekî/e dibistanê, şivanekî li ber pez, dikandarekî/e di dikana xwe de, wezîfedarekî/e di mekteba xwe de, yê di buroya xwe de, li ku dibe bila bibe; divê ragihandin bigihîne wan. Tenê bi gihandinê ne, di çarçoveya berjewendiyên gel de agahiyan bide her kesî. Mînak nûçeyekî bide, lê di heman demê de analîza wê jî bike. Analîza wê li gorî rewşa heyî bike. Ew analîz li dijî dijmin be û di aliyê gel de be. Li ser wî esasî, ragihandin dikare rola xwe bileyîze. Lê mînak, carna di nûçeyên me de pêşî ne li gorî êş û elemên gel çêdibin, li gorî modela heyî çêdibin.

Hinek caran nûçeyek heye ne ji rêzê ye, lê weke ku ji rêzê ye didin, yanî “li filan cihê polîsan zarokek kuşt,” bi vî rengî derbas dikin. Ma wiha çêdibe, hema derbas bike?! Li

Filîstînê zarokek li kêleka bavê xwe hate kuştin, heta roja me ya îro jî TV'yên Ereban dubare wan dîmenan didin.

Tu yê çawa bindestiyê teşhîr bikî, dagirkerî çi ye? Dagirkerî kuştina zarokan e, xesb e, îşkence ye, girtin e, divê mirov van esas bigire. Li ser van raya giştî çêbike. Ji gelek milan ve divê mirov bigire dest. Di van aliyan de piralîbûn, jêhatîbûn, xuliqkarî lewaz dimîne. Amûrên di destê me de em nikarin bişixulînin. Lê tu rastiyê jî bixwazî amûrên di destê me de pir li pêş in. Niha teknîka me ya TV, standartên navnetewî jî derbas kirine. Mînak yên Tirkan weke wê nîne. Amûrên herî biha li gel me ne, lê mirov lê temaşe dike rêza nûçan, çêkirina raya giştî, hwd, gelek rewş hene li ser nayê sekinandin.

Mînak radyo, firsendek e, wiha bi destê me ketiye, lê em baş bi kar naynin. Hîna jî di Kurdistanê de radyo amûreke ragihandinê ya cidî ye. Lê radyoya me bi giranî stranan didin. Yan jî nûçe ne, wisa bernameyên çandî, hunerî li ser esasê bala civakê bikişîne ser xwe, li gorî wê peyaman bide, di wan aliyan de zêde çalak nîne û lewaz e.

Yek jî di kadro de pirsgirêkeke cidî heye, ew jî weke çawa kadro, di çand û huner de, di ragihandinê de jî heta asta dawiyê di bin bandora moderníteya kapîtalîst de ye. Heta asta dawiyê ferdî ye, ji rêzkariya rêxistinê dûr e. Yanî ragihandina vê rêxistinê û îdeolojiya wê bi awayekî bê pîvan dixebitîne. Ya rastî rêxistineke têkoşînê dide meşandin û pîvanên ragihandinê divê yê herî milîtan bide.

Ji ber ku xebateke îdeolojîk e. Dibe ku di nava gerîla de carekî bêrêzkariyê bike, ev xwezayî ye, lê di ragihandinê de ev xeta nabe! Dibe ku di nava gerîla de mêjiyê wî tevlîhev bibe ev jî xwezayî ye, lê di ragihandinê de çênabe wiha be. Divê zelal be, girêdayî be, milîtanê xetê be. Lê mirov lê temaşe dike yê herî dûrî xetê di nava ragihandinê de ye. Lewra berhemeke baş dernakeve, metod pir in, lê berhem dernakevin.

Ev rewşeke çewt e. Gelo niha ev tiştên em dibêjin, em behsa hinek xerabiyan dikin! Lê rewşa em tê de jî rewşeke xwezayî nîne, rewşeke baş e, heta astekê em dikarin xwe îfade bikin. Lê ya girîng em zû xwe ji van kêmasiyan xelas bikin.

Ev qadên zanistê, ronakbîriyê, qadên çand, huner, ragihandinê bibin qasidên belavkirina fikrê azadiyê li hemû civakê. Bibin qasidên ku gel rakin ser piyan û bibin parêzvanên xeta Rêber Apo. Beramberî van êrîş û jirêderketina ku bi dehan radyo, tv, rojname yên seferber bûne bi yek devî êrîş dikin, divê mirov bizane çawa xetê biparêze. Bi vî rengî ev qad wê rola xwe bileyîzin. Ji bo vê bi gelemperî di xebatê îdeolojîk de vereşandin pêwîst dike. Bi temamî xwe ji mayîna bin bandora modernîteya kapîtalîst, ji lîberalîzmê, ji ferdperestiyê, ji dîngeriyê û miliyetparêziyê safî û rizgar kiribe. Beramberî wê xwe girtibe. Tiştê di hundirê xwe de bi rexnedayîneke cidî bavêje û ji bo di hundirê kes de nemîne pêwîst e vereşe. Li ser wî esasî pratîka birêxistinî û zanistî bide meşandin. Yanî ji dozê re

bijî, weke derwêşan bijî. Wiha her tiştê xwe, jiyana xwe li gorî berjewendiyên şoreşê, gel û civakê bigire dest. Ne li gorî ferdiyet û ezeziya xwe bigire dest. Bi vî rengî wê karibe xebatên îdeolojîk bi rengekî sererast bi ser bikevin.